



### Naveroka hejmara 14

#### Sernivîsar

Bi vekolînên zimanî ber bi serxwebûnê, r. 2

#### Husein Muhammed

Razên rengan, r. 3

#### Halil Aktuğ

Nirxandina rêbereke rastnivîsînê, r. 13

#### Kovareke derûnnasiyê

Psychology Kurdî, r. 60

#### Roşan Lezgîn

Munaqeseyê "lehce" û "zimanî" de problemî, r. 63

#### Demhat Alêşkî

Bo zimanê kurdî dewletek divê!, r. 72

#### Deham Ebdufetah

Lêker di zimanê kurdî de (4), r. 74

#### Hesen Qazî

Zorbey zimane zînduwekan firestandard in, r. 52

#### Dengnasî

Dengê Q – peydabûn û guherîna wî dengî, r. 157

#### Ferhengok

Peyvên rêzimanî yên Komxebata Kurmancî, r. 162

#### Çiya Mazî

Marugulov û alfabeya wî ya kurdî, r. 189

#### Rehber Mehmûdzade

Nerîtêkî nwê le ferhengnûsîy kurdî da, r. 192

#### Ebdullah Hacıyan û Umîd Demirhan

Gulbijêrkek ji zargotina kurdên Xorasanê, r. 203

#### Mehmet Încesu

Çend gotin li ser devoka mamedî, r. 213

#### Îbrahîm Seydo Aydoğan

Kurdkujî û nîqasha zarava û alfabeyan, r. 217

#### Komxebata Kurmancî

Rêbera rastnivîsînê, r. 231

#### Rêbîn Kerîm

Verbal inflection in Kurdish, r. 276

#### Zarname

ferhengoka zimannasî, r. 295

## Sernivîsar

# BI VEKOLÎNÊN LI SER ZIMAN BER BI SERXWEBÛNÊ

Dîsa kerem bikin hejmara nû ya kovara zimanê kurdî *Kanîzarê*, xwandevevanên hêja. Di vê hejmarê de em dîsa 300 rûpelan vekolînên li ser zimanê kurdî bi kurmancî, soranî, zazakî û inglîzî pêşkêşî we yên delal dikin.

Do vê hejmarê de **Husein Muhammed** li ser "razên rengan" dinivîse anku navên rengan û reh û rîşên navên wan pêşkêş me dike.

**Halil Aktuğ** di vekolîna xwe ya dirêj de pêdeçûnekê bi "rêberên rastnîvîsînê" yên Komxebata Kurmancî dike û li cihan wan dijwarî – lê bi heq – rexneyan li wan digire – bi taybetî li wan beşên rêbernameyê yên ku dixwazin normên heyî yên kurmanciya nivîskî biguherînin.

Vekolîna **Deham Ebdulfetah** li ser lêkerên kurdî di vê hejmarê de jî didome û dê di hejmara bê de jî berdewam be.

**Ebdullah Hacıyan** û **Umîd Demirhan** kurdên Xorasanê û kurmanciya wan bi ferhengokeke gotinên pêşyan pêşkêşî me dikin. Ferhengok dê di hejmarên bîn de jî bidome.

**Demhat Alêşkî** li ser wê qenaetê ye ku bo parastina zimanê kurdî û bikaranîna wî di her warê jiyanê de, zerûrî ye ku kurd bibin xwedî dewlet (yek an çend dewletan). **Çiya Mazî** yekem alfabeya kurdî-latînî anku alfabeya **Îsahak Marogulov** bi me dide nasîn.

Bi *soranî* **Hesen Qazî** li ser pirstandardî û pirnavendîtiya zimanên jîndar dinivîse û **Rehber Mehmûdzade** jî li ser ferhengsaziyê. Bi *zazakî* **Roşan Lezgîn** behsa pirsgirêkên minaqeşeyên li ser "ziman" û "lehceyê" dike.

Bi *inglîzî* em beşek ji vekolîna **Rêbîn Kerîm** li ser sîstema lêkerên kurdî (bi taybetî soranî) pêşkêşî dikin û beşên din yên wê lêkolînê dê di hejmarên bîn de jî belav bidin.

Di beşa dengnasyê de vê carê em dengê Q û peydabûna wî dengî bi berfirehî û bi nimûneyan dinasînin. Em herwiha kovara derûnnasyê anku psîkolojiyê *Psychology Kurdish*.

Di pişka ferhengokan de em hem ferhengoka Kanîzarê ya zimannasyê anku *Zarnameyê* berfirehkirî belav dikin û hem jî cih didin ferhengoka zimannasyê ya Komxebata Kurmancî.

## RAZÊN RENGAN – VEKOLÎNEKE ZIMANNASÎ

*Husein Muhammed*

Navên rengan di her zimanî de hene. Navên rengan herwiha hinek ji peyvên herî bingeîn yê her zimanî ne. Sebeb ew e ku piraniya rengên bingeîn – eger ne hemû – li her dera dinyayê hene. Reng ne tenê bi sinayî / pîşesazî tên çêkirin lê ew herwiha di tebîet û xwezayê de jî peyda dibin û herdem hebûne jî.

Lê gelo navên rengan di zimanê kurdî de çi ne û – bi taybetî jî – ew nav ji aliyê zimannasiya dîrokî ve çawan in? Gelo ew navên xwemalî ne yan ji zimanên din hatine? Yan jî hinek xwemalî û hinekî bi eslê xwe biyanî ne? Gelo yê xwemalî çi ne, çawa peyda bûne û hevrehên wan di zimanên xizm de çi ne? Gelo yê bi eslê xwe biyanî jî hene, eger hebin ji kîjan zimanî ne û çima wan cihê navên rengên xwemalî girtiye?

Li jêr em ê yek bi yek li ser navên rengên serekî vekolin û agahiyên hûrgiliyane bidin.

### Spî

Spî (an "sipî" – bi inglîzî "white", bi tirkî "beyaz") rengê berfa / befra paqij e. Bi awayekî berfirehtir ew herwiha maneya her tiştê rengê wî ne tarî jî dide, bo nimûne "mirovên spî" (bo nimûne mirovên ewropî, ne yê afrîkayî). Bi mecazî spî sembola qencyê, aştîyê û hêviyê ye jî.

"Spî" peyveke xwemalî ye. Ew di hemû lehceyên kurdî de "spî" yan "sipî" ye. Ji nav zimanên xizm bi farisî "sipîd / sifîd" e, bi pehlewî "spêt", bi belûçî "ispêt", bi avestayî "speête" û bi sanskrîtî jî "svête" ye. Heman rehê peyvê di rûsî de jî bi awayê "svêt" heye lê maneya "ronahî" dide ku ew jî di bingeîn de spî ye. Di zimanê lîtwanî de heman peyv bi awayê "šviēsti" heye ku wateya wê "biriqîn, çirisîn,

teyisîn” e. Hemû ev peyv ji peyva “\*kweytos” (spî) ya makezimanê proto-hindûewropî hatine. Heman peyva proto-hindûewropî herwiha serekaniya peyvên bi maneya “spî” yê zimanên germeî ye jî, bo nimûne swêdî “vit”, inglîzî “white” (bixwînin “wayt”) û almanî “weiss” (bixwînin “vays”). Dengê \*kw- ya proto-hindûewropî di kurdî û zimanên din yê arî dibe çv, dûv re sv û taliyê jî sp.<sup>1</sup>

Lê di her zimanî de navê vî rengê bingehîn ji peyveke xwemalî peyda nebûye. Di tirkî de li şûna “spî” ya kurdî du peyv hene: “beyaz” û “ak”. Peyva “ak” di tirkî de xwemalî ye lê ew bi piranî tenê di hin gotinên hevîrtî de tê bikaranîn. Rengê spî bi awayekî giştî di tirkiya niha de bi peyva “beyaz” tê binavkirin ku ji “beyadh” (spîtî) ya erebî hatiye wergirtin.

Mirov dikare guherîna navê vî rengî ji makezimanê proto-hindûewropî heta kurdiya niha wiha diyar bike:

- \*kweytos → \*kweyte- → \*sweyte- → sveyte- → speyte- → spête- → spêt → spêd → spîd  
→ spîy → spî

## Reş

Reş (bi inglîzî “black”, bi tirkî “siyah”) rengê şevên tarî ye, rengê komir û rejiyê ye. Bi awayekî berfirehtir ew herwiha maneya her rengê tarî yan qehweyî dide, bo nimûne “mirovên reş” (wek afrîkayîyan). Bi mecazî reş tê maneya bêsiûdiyê û xirabiyê.

Berevajî peyva “spî”, peyva “reş” di lehceyên kurdî û zimanên lêzim de ne berbelav e. Peyva “reş” wek navê rengekî tenê bi kurmançî û soranî ve sinordar e. Gava ku mirov derbazî lehceyên din yê kurdî (bo nimûne zazakî û hewramî) yan jî zimanên din yê îranî (wek mînak farisî û pehlewî) dibe, mirov li cihê peyva “reş” peyva “siya(h)” dibîne.

Di nav zimanên hindûîranî de “siya(h)” bi rastî jî peyva xwemalî ya bi maneya “reş” bû (bi sanskrîtî “syave-”) lê ew di kurmançî û soranî de nemaye û wê bi temamî cih daye peyva “reş”. Sebebê nemana peyva “siya(h)” di kurmançî û soranî de bi texmîna me tabû ye. Ji ber ku rengê reş bi mecazî

<sup>1</sup> Binêrin bo nimûne: [https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/\\*E1%B8%B1weytos](https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/*E1%B8%B1weytos)

mane û wateyên gelek xirab û nexweş dide, heta behskirina wê jî di kurmancî û soranî de bûye tabû û peyva wê ya wê demê "siya(h)" jî bûye tabû û taliyê bi peyva "reş" hatiye guherandin.

Etîmolojiya peyva "reş" bi esehî nayê zanîn lê bi ihtimaleke gelek mezin peyveke bi eslê xwe biyanî ye. Texmînen ew têkilî peyva "rejî" ye lê etîmolojiya wê jî nayê zanîn. Ihtimalen ji aramî "reşa'a" ("xirab, bed") e - ji ber ku sembola xirabiyê rengê reş e - ku hevreh û hevwatera wê wek "reşa" di îbrî de jî peyda dibe. Dikare herwiha ji peyva bi maneya "ser" ya zimanekî samî jî hatibe ji ber ku ser anku "pirç/porr" li Kurdistanê bi piranî reş in. Bo nimûne ji aramî "rêşa" (ser), hevrehê îbrî "roş", erebî "reis"... ji proto-samî \*re'ş-. Bo çêkirina navê rengan ji tiştan bide ber "qehweyî, pirteqalî, pembeyî, pîvazî, narincî, torincî..." Ji aliyê dengnasî ve girêdana bi hevwatera xwe ya sanskrîtî "krşṇá" (reş) ve zehmet e.

Wek din jî di şaxên cuda yên zimanên hindûewropî de ti peyveke hevreh ya bi maneya "reş" nîne yan nemaye. Loma peyva bi vê wateyê di şaxên cuda yên zimanên hindûewropî de bi tamamî ji hev cuda ye. Bo nimûne inglîzî "black", fransî "noir", rûsî "çorniy" ku qet ne peyvên hevreh in anku ne ji eynî peyva proto-hindûewropî pêk hatine.

Di tirkî de bi maneya "reş" du peyv tê bikaranîn: "kara" û "siyah". Peyva xwemalî ya tirkî "kara" ye lê ew jî wek peyva "ak" (spî – li jortir binêrin) zêdetir tenê li gel hin peyvên hevgirtî tê bikaranîn. Peyva berfirehtir tê bikaranîn "siyah" e ku ji zimanên îranî, bi taybetî ji farisî hatiye wergirtin lê vê peyva "siyah" ya bi eslê xwe îranî di tirkî de cih li "kara" ya xwemalî teng kiriye. Li aliyekî din, "kara" ya tirkî jî di hin peyvan de wek "qere" ketiye kurdî jî, bo nimûne "Qere Tajdîn" yan "Qeredax" (navê deverekê li Başûrê Kurdistanê).

## Sor

Sor (bi inglîzî "red", bi tirkî "kırmızı") rengê xwînê ye. Bi mecazî ew maneya xeter / tahlûke, di siyasetê de wateya çepgiriya û di têkiliyên cinsî de jî maneya evînê yan seksê dide.

"Sor" peyveke xwemalî ye û hevrehên wê di lehceyên din yên kurdî û zimanên din yên îranî û hindî de berbelav in: kurmanciya kevn "suh", soranî û zazakî "sûr", kurdiya başûrî "sür", hewramî "sur",

belûçî "suh", farisî "sor", pehlewî "suxr", avestayî "suxre", sanskrîtî "sukre". Ji bilî zimanên hindûîranî, ew herwiha di zimanên baltîkî de peyda dibe: latviyayî "sarks, sarkans" û lîtwanî "sárkanas". Ji wê pêvetir, di zimanên hindûewropî de hevrehên vê peyvê peyda nabin.

Dîsa di tirkî de wek navê "sor" du peyv hene: "kırmızı" û "kızıl". Peyva "kızıl" di tirkî de xwemalî ye lê "kırmızı" bi rêya farisî ji sanskrîtî hatiye wergirtin. Lê dîsa jî peyva "kırmızı" ya biyanî di tirkî de cih li peyva xwemalî "kızıl" teng kiriye. Peyva "kızıl" ya xwemalî êdî tenê di hin peyvên hevgerî de tê bikaranîn û peyva giştî bi maneya "sor" êdî "kırmızı" ye.

## Zer

Zer (bi inglîzî "yellow", bi tirkî "sarı") rengê zêrrî û roja li esmanan e.

Zer peyveke xwemalî ye û hevrehên wê di lehceyên din yê kurdî, di zimanên din yê îranî û herwiha di gelek zimanên din yê hindûewropî de jî peyda dibe. Soranî, zazakî, hewramî û farisî "zerd", belûçî "zer-gon", pehlewî "zert", avestayî "zeyrî", sanskrîtî "herî", rûsî "zoltîy", almanî "gelb", inglîziya kevn "geolu" (> inglîziya nû "yellow"), lîtwanî "geltonas", latînî "galbus", yûnaniya kevn "xloros"... hemû ji proto-hindûewropî \*gel-wos (zer; kesk) ji \*gelh- (biriqîn, geş bûn). Adeten G-ya proto-hindûewropî di kurdî û zimanên din yê îranî de dibe Z û L-ya proto-hindûewropî jî dibe R loma.

Mirov dikare guherîna navê vî rengî ji makezimanê proto-hindûewropî heta kurdiya niha wiha diyar bike:

- \*gel- → \*zel- → \*zer-

D-ya li dawîya navê vî rengî di hin lehceyên de kurdî de û di farisî de (zer-d) yan T-ya di peyva pehlewî de (zer-t) dûv re li peyvê zêde bûye loma bo nimûne di avestayî de (zeyrî) yan di sanskrîtî (herî) de T yan D di navê vî rengî de peyda nabe. Mimkin e ku D yan T carekê li peyva kurmançî jî zêde bûbe lê eger wisa be jî, dûv re li gel ketina D ji dawîya peyvên kurmançî ketibe (bidin ber "kirin, birin, xwarin, mirin" yê kurmançî beramberî "kirdin, birdin, xwardin, mirdin" yê soranî yan "kerdene, berdene, werdene, merdene" yê zazakî).

Hêjayî gotinê ye ku nêzîkiya dengî ya peyva "zer" li gel peyva "sarı" (zer) ya tirkî tenê tesedufî ye, peyva tirkî ji zimanê proto-tirkî ye (ne peyveke ji zimanên hindûewropî wergirtî ye).

## Şîn

Şîn (bi inglîzî "blue", bi tirkî "mavi") rengê heşê, rengê esmanê sahî û rengê avên kûr e. Di devokên kurmancî de peyva "şîn" herwiha bi awayên "şên, hêşîn, hêşin" jî peyda dibe.

Peyva "şîn" û varyantên wê "şên, hêşîn, hêşin..." xwemalî ne. Hevrehên wê di lehce û zimanên xizm de wiha ne: soranî "şîn", peştûyî "şîn", osetî "exşên", sogdî "exsêne", avestayî "exşeêne". Li derveyî zimanên îranî, ew herwiha di zimanên slavî de jî berbelav e, bo nimûne: bulgarî "sîn", rûsî "sîniy", polonî "siny"...

Li aliyekî din, hevrehên wê di şaxên din yên zimanên hindûewropî de peyda nabin. Heta di ziman û zaravayên îranî de jî li gelek deveran peyda nabe. Bo nimûne, di nav lehceyên kurdî de ew di zazakî de peyda nabe, di kurdiya başûrî de jî peyda nabe yan nadir e. Di van lehceyan de peyva "kewe" maneya "şîn" dide lê hevrehê wê di kurmancî û soranî de "kew" e ku navê teyrekî ye. Di farisî de jî navê vî rengî ne "şîn" lê "abî" ye "avî, wek avê, rengê avê".

Zimanên ku tê de hevrehên peyva "şîn" hene jî, maneya wan herdem ne wek rengê "şîn" yê kurdî ye. Bo nimûne, "sîniy" ya rûsî tenê maneya şîne tarî dide lê ne şîne esmanî ku bi rûsî "goluboy" e. Di sirbokrowatî de "sîniy" ne maneya "şîn" lê wateya "gewr, xwelîkî" dide.

Heta di zimanên îranî de jî ew herdem maneya rengê şîn nade. Bo nimûne, di osetî de "exşên" wateya "gewr" dide, di peştûyî de "şîn" hem maneya "şîn" û hem jî wateya "kesk" dide. Di rastiyê de di kurmancî de jî "şîn, şên, hêşîn, hêşin" hem maneya "şîn" ya bingehîn (bi inglîzî "blue", bi tirkî "mavi") û hem jî wateya "kesk, sewz" (bi inglîzî "green", bi tirkî "yeşil") dide, wek di gotina "giya şîn bûye" de ji ber ku rengê giyaî di rastiyê de ne şîn lê kesk e.

Bi heman awayî peyva "kew" (ku niha di zazakî de maneya "şîn" dide) di rastiyê de wek hevrehên peyva "şîn" bi hin zimanan, dîsa wateya "gewr" jî dida loma ew ji navê regekî bûye navê teyrekî (kew) ku gewr e. Herwiha peyva "kevok" jî ji navê heman rengî hatiye çêkirin.

Herçi navê vî rengî yê bi tirkî anku "mavi" ye, ew ji erebî "mawî" ye ku maneya "avî, wek avê, rengê avê" dide (bidin ber "abî" ya farisî ku ew jî maneya "avî, wek avê, rengê avê" dide.) Peyva xwemalî ya tirkî ya bi maneya "şîn" peyva "gök" e lê wê êdî maneya "esman, banê dinyayê" girtiye ji ber ku rengê esmanî şîne vebûyî ye. Lê di gelek zimanên xizmên tirkî de "kök / gök" hê jî bi wateya rengê şîn maye (bo nimûne bi kazakî, kirgîzî, oyxurî, ozbekî...

## Kesk

Kesk (bi inglîzî "green", bi tirkî "yeşil") di kurmançî de rengê çilû û pelgên daran yê terr û taze ye. Kesk dikare bi têkilkirina rengên şîn û zer were peydakirin.

Peyva "kesk" bi berfirehî tenê di kurmançî de tê bikaranîn. Ew eger li hin deverên soranî û zazakî were gotin jî, bergeh û berpiyên wê di wan lehceyan de teng in. Di soranî de bi piranî peyva "sewz", di zazakî de li gor deveran "hewz, zergûn, kew/ko" tên xebitandin ("kew/ko" li hin deveran jî di zazakî de maneya "şîn" didin.)

Di nav zimanên xizm ji bilî kurdî (ew jî bi piranî tenê kurmançî) de tenê di pehlewî de hevreh peyva "kesk" peyda dibe. Di pehlewî de ew "kaskênên" bû ku ji peyva "kaskên" (laciwerd, lapis lazuli) hatiye çêkirin ku ew bi xwe jî ji peyva \*kes- (geş, biriqok, çirisij, teyisok) ya îraniya kevn e.

Lê wek ku baş tê zanîn, lacîwerd ne kesk e lê awayekî rengê şîn e. Ev jî baş diyar dike ka çawa cudahiyeke mutleq di navbera rengên kesk û şîn de herdem nebûye û heta navên wan jî bi hev guherîne.

Soranî wek piraniya ziman û zarên din yê îranî peyva "sewz" bi kar tîne ku di farisî û gelek ziman û zaravayên din yê îranî de bi awayê "sebz" e.

Peyva "hewz" ya zazakî ya bi wateya "kesk" bi bilî dengê xwe yê destpêkî wek "sewz" ya soranî be jî, ne ihtimal e ku ew hevreh bin. Bi ihtimaleke mezintir "hewz" dîsa hevreh "kew" e anku bi eslê xwe heman peyv in ku paşî "hewz" bûye navê rengê (kesk) û "kew" jî navê rengê din (şîn). Di devokên zazakî de hê jî lihevnekirinek di navbera maneya "kew" de hene: piranî wê bi maneya "şîn", kêmanî jî wê bi wateya "kesk" dixebitîne.



Berevajî navê gelek rengên din, tirkî ti peyveke bi maneya "kesk" ji zimanên biyanî wernegirtiye lê peyva xwe ya xwemalî "yeşil" parastiye. Li aliyekî din, tirkî ji farisî peyva "sebze" (sebze, şînkatî, keskatî, riwekên xwerbar) wergirtiye ku ji navê rengê "sebz" (kesk) hatiye çêkirin.

### Pirteqalî

Pirteqalî (bi inglîzî "orange", bi tirkî "turuncu"), wek ku ji navê wî jî diyar e, rengê pirteqalên gihiştî ye. Pirteqalî regekî navbera sor û zerî ye û dikare bi têkilkirina wan jî were çêkirin. Peyva "pirteqalî" dikare herwiha bi şêweyên "porteqalî, purteqalî, pirtiqalî" jî di kurdî de were bihîstin û di nivîsan de jî tê dîtin.

Li hin deveran herwiha peyvên wek "qîpik, tûtik" jî wek navên vî rengî hene.<sup>2</sup>

Wek di kurdî de, di piraniya zimanên din jî de navê vî rengî ji navê pirteqalan hatiye wergirtin. Bo nimûne, di erebî de navê vî fêkî "burtuqal" û navê vî rengî jî "burtuqalî" ye. Di farisî de navê vî fêkî "narinc" û navê vî rengî jî "narincî" ye. (Ev peyv carinan di kurdî de jî bi maneya vî rengî tê bihîstin, bi taybetî li Rohhilata Kurdistanê.) Di fransî û inglîzî de hem navê vî fêkî û hem jî navê vî rengî "orange" e.

Di tirkî de navê vî fêkî "portakal" lê navê vî rengî "turuncu" ye (kêm caran herwiha "portakal rengî" anku "rengê pirteqalê") lê "turuncu" bi xwe ji navê "turunç" bi xwe jî her cûrekî pirteqalan/lîmonan e. (Heman peyv carinan di kurdî de jî bi awayê "torincî, tûrincî" tê dîtin, bi taybetî li Bakurê Kurdistanê.) Di almanî de navê vî fêkî "Apfelsine" ye (carinan "Orange" jî) lê navê vî rengî "Orange" ku bi zimanên din (bo nimûne bi fransî û inglîzî) dîsa nameya vî fêkî jî dide.

Meseleya etîmolojiya navê vî rengî û vî fêkî bi taybetî balkêş e. Di kurdî, erebî û hin zimanên din de navê vî rengî "pirteqalî" û vî fêkî jî "pirteqal" e (li gor zimanan dengên van peyvên piçekê ji hev diguherin – bo nimûne bi erebî "burtuqal, burtuqalî" lê di bingeh de eynî peyv in). Ev peyv ji navê welatê Portugal hatiye.<sup>3</sup>

<sup>2</sup> Binêrin:

[https://www.facebook.com/groups/zimaneKurdi/?multi\\_permaLinks=1519719741418696&notif\\_t=like&notif\\_id=1499110619549332](https://www.facebook.com/groups/zimaneKurdi/?multi_permaLinks=1519719741418696&notif_t=like&notif_id=1499110619549332)

<sup>3</sup> <https://en.wiktionary.org/wiki/%D8%A8%D8%B1%D8%AA%D9%82%D8%A7%D9%84>

Li aliyekî din, di piraniya zimanên ewropî de bi maneya vî rengî û/yan vî fêkî peyveke wek "naranjo" ya spanî, "arancia" ya îtalî û "orange" ya fransî û inglîzî tê bikaranîn. Berevajî peyva "pirteqal" ku ji Ewropayê hatiye Rojhilata Navîn, "naranjo, arancia, orange" û hevrehên wan di zimanên ewropî de ji Rojhilatê hatine. Ew hevrehên peyva "narinc" in ku niha jî di farisî de tê bikaranîn û navê vî rengî jî bi awayê "narincî" jê hatiye çêkirin. Bi eslê xwe "narinc" hê ji rojhilattir ve hatiye û serekaniya wê hin zimanên Hindistanê ne.<sup>4</sup>

### Qehweyî

Qehweyî (bi inglîzî "brown", bi tirkî "kahverengi") wek navê xwe dişibe rengê qehweyê. Ew dikare bi têkilkirina rengên sor û kesk yan şîn û pirteqalî were çêkirin.

Di soranî ("qaweyî"), di farisî de ("qahveî") û di tirkî ("kahverengi") de jî navê vî rengî ji navê qehweyê hatiye çêkirin. Lê di piraniya zimanên dinyayê de ne wiha ye. Hin zimanan navê vî rengî ji berrûyan çêkiriye, bo nimûne îtalî "castano" û portugalî "castanho", hinan jî ji navê darçînê, bo nimûne rûsî "korîçnêvîy" (qehweyî) ji "korîça" (darçîn). Di hin zimanan de jî têkiliya navê vî rengî ji aliyê etîmolojî ve bi navê hirçan ve heye, bo nimûne bi inglîzî "bear" (hirç) û "brown" (qehweyî).

### Binefşî, mor, erxewanî, xemr...

Binefşî (bi inglîzî "violet, purple" û bi tirkî "mor") wek navê xwe jî rengê gulbinefşan e. Ew reng bi têkilkirina rengên sor û şîn peyda dibe.

Bi taybetî eger ev reng bi forma xwe ya tarîtir be, ew bi navê "mor" tê nasîn ku rêya tirkî ji yûnanî yan ermenî ketiye kurdî. Bi taybetî li Başûrê Kurdistanê ev reng bi forma xwe ya tarî bi navê "xemir, xemr" jî tê nasîn ku ji erebî "xemr" (mey, bade, şerab) hatiye wergirtin. Di zimanê edebî de carinan

<sup>4</sup> <https://en.wiktionary.org/wiki/orange>

navên "yasemînî" û "erxewanî" jî li vî rengî tê kirin ji ber ku kulîlkên gula yasemînê û kulîlkên dara erxewanê dişibin vî rengî.

Di zimanên ewropî de jî çendî navên cuda ji van rengan re hene ku piraniya wan jî ji navên kulîlkan hatine çêkirin. Bo nimûne, bi inglîzî "violet" (binefş), "lilac" (lîlek).

### **Gewr, boz, bor, grî, xakisterî...**

Gewr (bi inglîzî "grey, gray", bi tirkî "gri") rengê xweliyê ye. Ew renekî navbera spî û reşî de ye.

Vî rengî çendî nav hene: gewr, boz, bor, grî. Ji van nava "grî" bi zelalî van salan ji zimanên ewropî (belkî bi rêya tirkî) hatiye, bo nimûne ji fransî "gris" (bixwînin "grî") yan ji inglîzî "grey / gray" (bixwînin "grey"). "Xakisterî" jî vê dawiyê ji farisî (ihtimalen bi rêya soranî) ketiye hin nivîsên kurmançî lê di nav xelkê de cih negirtiye. Ew ji peyva "xak" (ax, erd, toz) ya farisî ye.

"Boz" ji mêj ve di kurmançî de tê bikaranîn lê li gor belavbûna peyvê di zimanên de, ew ji tirkî derbazî kurdî bûye û eslê wê peyvê tirkî ye. Li aliyekî din, hevwateriya wê ya ji aliyê dengnasî ve jî nêzîkî wê anku "bor" peyveke xwemalî ye/bû lê êdî pirr kêman bi maneya vî rengî di kurmançî de tê bihîstin. Hevrehên wê ya farisî "bûr", ya osetî "bûr" (bi maneya "zer") û bi sanskrîtî "bebhrû" bû. Di avestayî de hevrehên wî "bebr" bi maneya "seavî, heywanê darbir, kastor, qundiz" bû ku heywanekî gewr e. Bi heman awayî hevrehên wê peyvê di inglîzî de "beaver" e maneya vî heywanê gewr dide.

Herçi peyva "gewr" ya niha wek navê vî rengî di kurmançî de berbelav e, etîmolojiya wê bi esehî nayê zanîn. Ew hinekî dişibe hevwateriyên xwe yên zimanên ewropî, bo nimûne inglîzî "grey, gray", almanî "grau" û fransî "gris" (bixwînin "grî") lê ji aliyê dengnasî ve zehmet e ku were bawerkirin ku ew hevreh bin. Herwiha di zimanên kevn û navîn yên îranî de ti hevrehên peyva "gewr" nehatine peydakirin.

## Pembeyî, pîvazî

Pembeyî yan pîvazî (bi inglîzî "pink", bi tirkî "pembe") rengê sorê vebûyî ye û ji têkilbûna rengên sor û spî ye.

"Pembeyî" ji navê pembû, bi farisî "penbe, pembe" hatiye çêkirin û ji bilî kurdî herwiha di tirkî de jî tê bikaranîn. Lê herçi farisî ye, ew bi xwe êdî peyva "pembeyî" bi kar naîne yan pir kêm bi kar tîne.

Bi taybetî li Başûrê Kurdistanê li Behdînan navê vî rengî "pîvazî" ye, ji peyva "pîvaz". Navê din yê serekî ji vî rengî re "sorê vebûyî" yan "sorê vekirî" ye.

Di piraniya zimanên ewropî de navê vî rengî ji navê gulekê peyda bûye. Ew bi inglîzî "pink" e ku bi eslê xwe navê gulan qerenfil e û di fransî de jî "rose" e ku bi eslê xwe navê sorgulê ye.

## Serencam

Armanca vê kurtevekolînê ew bûye ku diyar bike ka navên rengên serekî di kurdî de çi ne û ji kû hatine. Wek ku me dît, hinek ji navên rengan pir kevnar in, hinek xwemalî ne, hinek ji zimanên din hatine wergirtin û hinek jî navên nebatan hatine çêkirin.

Wek ku berhevdanên me yê kurt li gel navên rengan bi tirkî û inglîzî de jî diyar kirin, ne tenê di kurdî de lê di zimanên din de jî serekaniya navên rengan gelek piralî û heta tevlihev e jî.

Vê nivîsar nikariye û hewl jî nedaye ji her alî ve li binavkirina rengan di zimanê kurdî de vekole. Armanc binavkirina rengên serekî û herwiha peydakirina etîmolojiya wan bûye. Hêvîdar im ku ev bibe destpêka vekolînên kemilandîtir di vê mijarê de.

## KOMXEBATA KURMANCÎ Û RÊBERA RASTNIVÎSÊ

*Halil Aktuğ*

*Komxebata kurmancî ji min re pêşniyarên xwe yên di derheqê “RÊBERA RASTNIVÎSÎNÊ” de şîyandin. Daxawaz kirin ku ez jî di derheqê pêşniyarên wan de fikra xwe pêşkêş bikim. Min jî ev pêşniyarên komxebatê nîrxandin. Ezê fikrên xwe pêşkêş bikim.*

Di rastnivîsê de standartkirina ziman, bingeha çand û zimanan e. Hêmana herî girîng ji bo zimanan rastnivîs e. Bê guman amadekirina rastnivîsa zimanekî bi xebata sazîyan tê zelalkirin, bi biryara dewletê tê safîkirin. Mixabin îro di vî warî de tevlihevîyeka mezin heye. Ez berhêvîme ku sazîyên kurd ji bo rastnivîsa kurmancî biryarekê bidin. Qaîde û rastnivîsa kurdî (kurmancî) serast bikin.

Xebata Komxebata Kurmancî, gaveka gelekî pîroz e. Ez kesên ku di komxebatê de cih digrin tevan pîroz dikim.

Vê komxebatê tiştên gelek minasib pêşniyar kirine. Wekî “î”ya berî “y”yê. Wekî lêkerên pevedanî yên tebatî ku piştî hatinê tên bi kar anîn. Nivîsandina peyvên ji zimanên bîyanî di kurdî de hatine bikaranîn. Hin qertafên ji zimanên Awrupîyan hatî bikaranîn.

Lê ezê di vê gotarê de li ser kêmayiyên komxebatê rawestim.

Ji berî her tiştî ev xebat, xebata birêz Mustafa Aydoğan e. Divê komxebat bi keda Aydoğan methê xwe nede.

Çend gotinên min ji birêz Aydoğan re jî hene:

“Rêbera Rastnivîsînê”, berî sê salan hatîye çapkirin. Birêz Malmisaniy, Reşo Zîlan, Remzî Kerîm, Newzat Hirûrî û Zana Farqînî ji Mustefa Aydoğan re imze kirin ku qaîdeyên rastnivîsa wî gelek minasib û bi zanyarî hatine tesbitkirin.

Îro jî piraniya van kesan di Komxebata Kurmancîyê de cih digrin.

Gelo di van sê salan de çi hat guhertin van kesan û Aydoğan qaîdeyên rêbera xwe guherandin û qaîdeyên nû tesbît kirin?

Di kitêba Mustefa de; daçekên “de, ve, re” hatine bikaranîn. Ev pêncî salin kurd bi van daçekan dinivîsin û bi kar tînin. Heta îro problemek nederketî ye. Melodîya van daçekan sehtir û zimanê me hêsantir dike. Gelo bi çi sedemî vê komxebatê daçekên “de, ve, re” guherîn û kirin “da, va, ra” divê komxebat bi zanyarî îzahatekê ji kurdan re bike. Ka çi feydeya vê guherandinê ji zimanê me re heye?

Ku komxebat îdea bike, zimanzanekî wekî LESCOT û CELADET hay ji van devokan û “da, va, ra”yê tine bû, bila li qusurê nenêrin, xweyîyê “Rêberê” Birêz Mustefa Aydoğan û yên di komxebatê de cih digrin heta îro di vî warî de gazindex jî nekirine. Gelo bê îzahat guherandina “de, ve, re”yê çiqazanyarî ye? Milletê kurd yê çawa ewleyîyê li wan bîne?

Dîsa di kitêba Aydoğan de qertafa nekifşîyê “**eka**” hatîye bikaranîn.

Aydoğan û Komxebatê bê îzahat “**eka**” kirine “**eke**”. Ew kesên ku di sê salan de li fikrên xwe ne bawer bin, gelo karin çi ji kurdan bixwazin?

Ezê di derheqê qertafa nekifşîyê (nebinavkirinê) “**eka**”yê de fikra xwe pêşkêş bikim. Da ku Komxebat di vê derheqê de biryarekê bide.

Di hevokê de lêker **negerguhêz** be û kirde jî mê be, kirde qertafê nastîne.

Mînak:

**Fatim** hate malê.

**Bizin** çû ser darê.

**Çêlek** hate ga.

Di hevokê de lêker gerguhêz be û kirde mê be, kirde qertafa (ê) distîne.

Mînak:

**Keçikê** nan peht.

**Bizinê** nan xwar.

**Çêlekê** rît bi destîyê bivir ve.

Ku di hevokê de nekifşî hebe û lêker gerguhêz be, kirde jî mê be, kirde peyva “**yek-ê**” distîne. Di pevedanînê de “**y**” dikeve “**ek-ê**” tê dawîya peyvê.

Mînak:

Bizinê nan xwar.

Bizin-ek-ê nan xwar. (nekifşî)

Keçikê nan peht.

Keçik-ek-ê nan peht.(nekifşî)

Di van hevokan de lêker gerguhêz e. Peyva “**nan**” bireser e. Qertafa “**ê**” qertafa mêtîyê ye. “**ê**” ya li dawîya “**ek-ê**”, “**ê**” ya li dawîya peyva “**bizinê û keçikê**” ye.

Ku lêker gerguhêz be û navdêr jî bireserê dîyarkirî be navdêra “**mê**” qertafa “**ê**” distîne.

Mînak:

Vê **bizinê** bikire.

Bizin-ek-**ê** bikire.(nekifşî)

Ku lêker gerguhêz be û navdêr jî bireserê dîyarkirî be navdêrê “**nêr**” qertafa “**î**” yê distîne.

Mînak:

Vî **hespî** bikire.

Hesp-ek-**î** bikire.(nekifşî)

### **Ji bo raveka (îzafeya) rengdêran**

Ku navdêr “**nêr**” û raveka rengdêrê be navdêr qertafa “**ê**” distîne.

Mînak:

Hespê **boz** revî.

Hesp-ek-**ê** boz revî.(nekifşî)

Ku navdêr “**mê**” û raveka rengdêrê be, navdêr qertafa “**a**” distîne.

Mînak:

Mehîna **sor** zîtik avêt.



Mehîn-ek-a sor zîtik avêt. (nekifşî)

### Ji bo raveka (îzafeya) navdêran

Ku navdêr “nêr” û raveka navdêran be, navdêrê raveber qertafa “ê” navdêrê raveker qertafê nastîne. Lê di kevnare de “î” distand.

Mînak;

Bi kefçîyê dar/î bixwe.

Nanê garis/î nekire.

Nan-ek-ê garis/î bide min.

Ku navdêr “mê” û raveka navdêran be, navdêrê pêşî (raveber) qertafa “a”, navdêrê paşî (raveker) qertafa “ê” distîne.

Mînak;

Zelala fatimê hat.

Dara sêvê nebire.

Dar-ek-a sêvê bi de min.

Gelo qertafa ku komxebatê qebûl kirî, “ek-e” yanî qertafa “e” yê di kîjan wezîfeyê de tê bikaranîn. Ma ne lazim e ku komxebat di vî warî de îzahatekê bike? Peywira (wezîfeya) qertafa “e” yê di kurdî de çi ye?

De ka em li îzaha komxebatê binêrin:

*“Her çî her du awayên din in (-ek-a, -ek-e), Komxebata Kurmancîyê her du awayan jî ji bo nivîsînê rast dibîne. Lê ji ber sedema têrbelavbûna awayê duyem (-ek-e), Komxebat di giranîyê da vî awayî tercîh dike.” (rûpel 144)*

Gelo zanyarî di ku dera vê biryaran de ye. Biryara Komxebatê bê serûber e. Komxebat pêşnîyar dike ku “-eka” jî rast e û “-eke” jî rast e “**lê biryara me ji ber “têrbelavbûnê” “-eke”** ye. Halbukî me li jorê îzah kir ku wezîfeya “**ek**”ê nekifşî ye. Lê wezîfeya “**a**”ya li dawîya “mehîn-a sor” qertafa raveka rengdêra mêyîtîyê ye. “**a**” ya li dawîya “dar-ek-a sêv-ê” qertafa raveka navdêra ye. Em nikarin qertafa “**ek-e**”yê di şûna “**ek-a**”yê de bi kar bînin. Çimku em nikarin bêjin “**e**” qertafa ravekê ye. An jî qertafa zayenda mêyîtîyê ye. An jî tewang e. Di vî warî de jî tiştê Komxebat dike ne ilmî ye.

Dîsa komxebat di derheqê qertafên (-ek-ê, -ek-î)yê de ji heq dernakeve û waha dinîrxêne.

*“Her çî her du awayên din in (-ek-ê, -ek-î), Komxebata Kurmancîyê her du awayan jî ji bo nivîsînê rast dibîne. Lê ji ber sedema têrbelavbûna awayê duyem (-ek-î), Komxebat di giranîyê da vî awayî tercîh dike.”*

*“Her çî awayê duyem e (-ek-î), di îzafeya navdêrên nêr yên yekhejmar yên nebinavkirî da tewang û îzafeyê tev li hevûdin dike û loma <î>ya pirtika tewangê ji bedêla <ê>ya morfema îzafeya navdêrên nêr bi kar diîne.”*

Komxebat di derheqê “**ekê**” û “**ekî**” de, her duwan jî rast dibîne. Lê têrbelavbûnê dike sedemê biryara xwe. Di vê tesbîtê de jî tiştê ilmî nîne. Me li jorê îzah kir ku “**ekî**” di peywira dîyarkirina bireser û nekifşîyê de tê bikaranîn. “**ekê**” jî di peywira raveka rengdêrê nêr û nekifşîyê de tê bikaranîn. Du qertafên wezîfeya wan cida çawa di şûna hev de tên bikaranîn?

**Di nîrxandina gelek mijaran de aqlê komxebatê tevilhev e. Komxebat di derheqê nekifşîya (nebinavkirina) pirhejmarîyê de vê dibêje:**

*“Nebinavkirina navdêrên her du zayendan yên pirhejmar, bi pirtika <(y)in>ê pêk dihê.”*

**Nimûne:**

*Hin hesp* → *hespin*

Lê heman Komxebat di derheqê “*Nebinavkirinê*” de vê îzahatê jî dike:

*“Lê her çî tercîha vê rêberê ye, awayê pêşîn e, ango awayê ku di nivîsîna kurmancîyê da, “-n”ya nîşana pirhejmarîyê li derveyî nahêle û îzafeya navdêrên her du zayendan **yên pirhejmar û nebinavkirî bi awayê “-(y)ên”ê dinivîse.**”*

Komxebat qertafa (pirtika) “-in” û “-ên”ê her duwan jî wekî qertafên “*nebinavkirî*” dide dîyar kirin.

Halbukî qertafa piranîya nekifşîyê (*nebinavkirî*) “hin (-in)” e. Qertafa piranîya raveka (îzafeya) her du cinsan “-ên” e.

Komxebat tîpa “-n”yê “*nîşana pirhejmarîyê*” dide dîyarkirin. Ku ez bim, ev mijareka lêkolînê ye.

Komxebat di derheqê vê mijarê de waha dibêje:

*“Divê bihê dîyarkirin ku di vê mijarê da fikireke din jî heye. Nimûneyên vê fikira ku Celadet Bedirxan jî piştgirîya wê dike, weha ne:”*

*“Ez hin hespan dibînim. → Ez hespina dibînim.*

*Ez hin bizinan dibînim. → Ez bizinina dibînim.*

*Ez hin derîyan dibînim. → Ez derîyina dibînim.”*

*“Li gor vê fikirê, ev “a” di esilê xwe da “-an” bûye lê paşê “n”ya dawîn ketiye, ev “n” îşareta pirhejmarîyê ye lê ji ber ku di eynî bêjeyê da “n”yek heye, êdî pêwîstî pê namîne.”*

*“Lê terciha vê rêberê ew e ku di nivîsîna kurmancîyê da, “-n”ya “-an”a pirtika tewanga navdêrên her du zayendan yê pirhejmar û nebinavkirî bihê nivîsîn. Nenivîsîna “n”yê ku nîşana pirhejmarîyê ye, dikare bibe sedema tevlihevîyê. Loma ji bo tewanga navdêrên her du zayendan yê pirhejmar û nebinavkirî, divê ku “-an” bihê nivîsîn.” (rûpel 144)*

Ezê li ser vê mijarê bi berfirehî rewestim.

### **Di kurmancî de qertafên piranîyê**

Di kurmancî de qertafên piranîyê, hejmara hemcinsan ji yekê zêdetir didin dîyarkirin.

Di nav gel de qertafên pirhejmarîyê: “-a, -î” ne. (Di zazakî de jî heman qertaf tên bi kar anîn.)

Lê nivîskaran qertafa “-an”ê wekî qaîdekî serast bi kar anîye.

Kurmanca ji bo pirhejmarîyê qertafa “a”yê bi kar anîye. Di be ku “a”ya pirhejmarîyê ji “ha”ya farisî hatibe. An jî “ha”ya farisî ji “a”ya kurmancî hatibe. Kurmanca “h”ya di pêşîya “ha”yê de wekî gelek peyvên dîtir qurmiçandîye. Maye “a”. Îro kurmancî pirhejmarîyê bi “a” yê pêk tînin.

Ez vê dibêjim: Ku milletek û nivîskarên xwe hevqasî ji hev dûr bi fikirin, lazim e ku lêkolîn li ser vê mijarê bê kirin.

“Komxebatê” di derheqê qertaf lêkerên “im” û “me”yên li dawîya “-an”a pirhejmarîyê de xwe nebihîstî kirîye. Qet ev mijar neanîye zimên. Divê komxebat di vê mijarê de jî fikra xwe ji raya gel re pêşkêş bike.

Gelo emê ji van mînakên li jêr kîjanan bikar bînin?

Mînak:

Ez dîya lawa me.

Ez keça kurda me.

Ez hostayê dîwara me.

Ez ji nav Xerza tēm.

Ez ji nav Batûwa tēm.

Ku em qertafa pirhejmarîyê “-an”ê bikarbînin, wê demê divê hevokên li jor waha bîn bi kar anîn.

Mînak:

Ez dîya lawan im.

Ez keça kurdan im.

Ez hostayê dîwaran im.

Ez ji nav Xerzanê tēm.

Ez ji nav Batûwanê tēm.

Tu kes nabêje “Ez Xerzanî me.” “Ez Batûwanî me.” “Ez Botanî me”

Lê tê gotin: “Ez Xerzî me.” “Ez Batûwî me.” “Ez Botî me.” “Ez Torî me.”

Ev jî delîla wê ye ku bingeha peyvan “xerz”, “batû”, “bot” û “tor” e.

Qertafa “-an”ê qertafçêker e. Em dikarin bêjin: “Govenda Xerzanî” Şal û şapikê Batûwanî” “Xemla Botanî” an jî “durêyan, sêrêyan, Şêxan, Pîran, gulan, jîyan ...”

**Mîr Celadet jî di mînakên jêr de ev mijar anîye zimên, Ji bo pirhejmarîyê “a” bi tenê bi kar anîye. Lê ev mijar nehatîye zelalkirin.**

*“Ez hin hespan dibînim. → Ez hespina dibînim.*

*Ez hin bizinan dibînim. → Ez bizinina dibînim.*

*Ez hin derîyan dibînim. → Ez derîyina dibînim.”*

*“sedema hin kuştinan → sedema kuştinina*

*encama hin lêgerînan → encama lêgerînina*

*xweşbûna hin xeberdanan → xweşbûna xeberdanina*

*pîrozkirina hin biserketinan → pîrozkirina biserketinina*

*îmkana hin liberxwedanan → îmkana liberxwedanina*

*şansa hin biserxwevehatinan → şansa biserxwevehatinina”*

Kurmanca qertafa pirhejmarîya “î”yê, sadece ji bo navdêrên piştî: bist, sih, çil, pêncî, şêst, heftê, heştê, not, sed, hezar, milyon, milyar û tirilyonî bi kar anîye.

Mînak:

**Ji şêstî heta bi sedî bihejmêre.** (Ji şêst zebeşî heta bi sed zebeşî bihejmêre.)

Di vê mînakê de qertafa “î”ya li dawîya “**şêstî û sedî**” di şûna “a”ya pirhejmarîyê de hatîye bi kar anîn. Em dikarin vê hevokê waha jî bi kar bînin.

Mînak:

Ji **şêstan heta bi sedan bihejmêre**.(Ji şêst zebeşan heta bi sed zebeşan bihejmêre.)

### Navên Hêlan

Komxebatê di derheqê navên hêlan de dev ji qaîdeyê zimanê kurdî berdaye. Xwe sipartîye qaîdeyê zimanê tirkî.

Ka em li pêşnîyra komxebatê binêrin.

*“Navên hêlên nesereke: bakurê rojhilatî, bakurê rojavayî, başûrê rojhilatî, başûrê rojavayî”*

Herhalde komxebat wateya navehêlan (hêlên nesereke) nizane çîye. An jî wateya ravekên **“bakurê rojhilatî, bakurê rojavayî, başûrê rojhilatî, başûrê rojavayî”** nizane, çîye.

Maneya **“bakurê rojhilatî”** eve: Bakur aîdê rojhelat e.Yanî rojhelat deverek e (cihek e) bakurê wî cihî jê tê fêhmê. Wateya navehêlê (arayön) tê de nîne. Wateya van hevokan weke raveka tirkî hatîye damezrandin.

Komxebatê di vê derheqê de waha şirove kirîye:

*“Lê em di wê bawerîyê da ne ku awayê hêsantir û pratîktir ew e ku em jî wekî gelek zimanên din bikin û xwe bispêrin yektêgihîyê û weha binivîsin: bakurrojhilat bakurrojava, başûrrojhilat, başûrrojava.”(rûpel 38)*

Komxebat eşkere dibêje, emê van peyvên pevedanî li gor qaîdeyê raveka tirkî saz bikin.

Lê mixabin peyvên pevedanî di kurdî de bi vî qaîdeyê nehatine damezrandin.

Çimku bi tirkî **“kuzeydoğu”** rojhelat aîdê bakur e. Lê di kurdî de **“bakurê rojhilat”** bakur aîdê rojhelat e. Jiber wê çendê em nikarin raveka kurdî bi maneya raveka tirkî şirove bikin.

**Ezê di derheqê vê mijarê de fikra xwe pêşkêş bikim.**

Di kurdî de nivîsandina navên hêlan

Navê hêlên **serehêl** (ana yönler) ev in: Rojhilat, rojava, bakur, başûr

Navê hêlên **navehêl** (ara yönler) ev in:

1. a) Rojhilatê bakur,
2. b) Rojavayê bakur,
3. c) Rojhilatê başûr,
4. d) Rojavayê başûr.

Di kurdî de navê hêlan nêr in.

Navên hêla bi du awayî tên bikaranîn.

**1. Bakurê Kurdistanê hînik e.**

Di vê hevokê de peyva “bakurê” navê hêlekî ye. Ne navê deverê ye. “Bakurê Kurdistanê” raveka navdêrî ye. Qertafa li dawîya peyva “bakurê” qertafa raveka nêrîtîyê ye. Qertafa li dawîya peyva “Kurdistanê” qertafa raveka mêyîtîyê ye.

**2. Kurdistana Bakur hînik e.**

Di vê hevokê de peyva “bakur ” navê deverê ye. Ne navê hêla ye. “Kurdistana Bakur” raveka rengdêra ye. Qertafa li dawîya peyva “Kurdistana” qertafa raveka mêyîtîyê ye. Li dawîya peyva “Bakur” qertaf nehatîye bikaranîn.

Em nikarin bêjin “Ezê herim Kurdistana başûrê.”

Çimku di vê hevokê de peyva “**başûr**” raveka rengdêra ye. Di kurdî de rengdêr qertafê nastînin.



Di zimanên dinyayê de navê hêla bi serê xwe (bi tenê) nebûne navê herêma. Lê komxebatê hevoka “**Ezê biçim başûrê**” ji xwe re saz kirîye. Navê hêlekê kirîye navê herêmekê.

Em dikarin bêjin, bi navê herêmekê re navê hêla bê bikaranîn û alîyê wê herêmê bide diyarkirin an jî bi arîkarîya Qertafçêkera “î”yê peyvên wateya ehlê wî cihê bidin dîyarkirin, dibe.

Mînak: Ez Başûrî me. Ez Bakurî me. Ez ji Kurdistanê Başûr im.

Bikaranîna navên hêla, di dinyayê de ji bo dewletên Kore, Almanya û qiteya Emerîkayê hatîye bikaranîn.

Mînak: Emerîka bakur, Emerîka Başûr, Koreya Bakur û Koreya Başûr. Almanyaya Rojhilat, Almanyaya Rojava, di erebî de “Şerqul Ewsat” Di kurdî de jî ji bo “rojhilata navî”, “rojhilata nêzîk” hatîye bikaranîn.

Hevoka “Rojhilata Navî” di eslê xwe de waha ye. “Rojhilatê Herêma Navî” ye. Peyva rojhelat nêr e. Divîbû qertafa raveka “Rojhelata Navî” di şûna “a”yê de “ê” bihata bikaranîn. Yanî hevok waha bûya “Rojhilatê Navî”

Lê di hevokê de peyva “herêma” ketîye. Qertafa “a” ya li dawîya “herêma” hatîye dawîya peyva “rojhilatê” û bûye “Rojhilata Navî”

Komxebatê ev hevok bi kar anîye. “Ez ji paytextê başûrê hatim.”

Di vê hevokê de lêkera “hatim” ne gerguhêz e. Lê di hevokê de “paytextê Başûrê” ravek e (îzafe ye). Kêmayî di mana hevokê de heye. Ravek nehatîye timamkirin. Em nizanin gelo peyva “başûrê” başûrê Koreyê ye an başûrê Hindistanê ye an jî başûrê Kurdistanê ye.

Divê ev hevok waha be:

“Ez ji paytextê Kurdistanê Başûr hatim.” An jî;

“Ez ji paytextê Koreya Başûr hatim.”

Eger em bikarin navê hêlan di şûna navê Almanya an di şûna navê Koreyê, an di şûna navê Emerîkayê de bikarbînin, wî çaxî em dikarin ji bo Kurdistanê jî bi kar bînin.

Eger komxebat bêje em nikarin navê hêla ji bo Almanyayê, an ji bo Emerîkayê, an ji bo Koreyê bi kar bînin lê emê ji bo Kurdistanê bi kar bînin. Wê demê mexseda komxebatê cida ye. Divê mexseda xwe îzah bike.

### **Nivîsandina cihnavên pirsîyarîyê (kî, kê, kîjan, kîjanê, kîjanî, kîjanan)**

Komxebatê nivîsandina “kî û kê”yê waha şirove kirîye.

#### **Grûpa xweser**

#### **Grûpa tewandî**

kî

kê

kîjan

kîjanî (di cihê navdêrên nêr de)

kîjan

kîjanê (di cihê navdêrên mê de)

kîjan

kîjanan (di cihê navdêrên pirhejmar de)

*“Pirsên ku bi **cihnavên pirsîyarî** yê grûpa xweser dest pê dikin, bersivên wan ji **cihnavên kesî** yê grûpa xweser dihên wergirtin û weha dihên nivîsîn.”*

#### **Nimûne:**

*Kî dibêje?*

*Ez dibêjim.*

*“Pirsên ku bi **cihnavên pirsîyarî** yên grûpa tewandî dest pê dikin, bersivên wan ji **cihnavên kesî** yên grûpa tewandî dihên wergirtin û weha dihên nivîsîn” (rûpel 151)*

**Nimûne:**

*Kê got?                      Min got.”*

Ez pêşnîyara komxebatê kêm dibînim. Pêşnîyara Komxebatê ne ilmî ye. Lazim e ku bê îzahkirin.

**Di vê mijarê de ezê fikrên xwe pêşkêş bikim.**

Mînak:

**Kê got? (wê got.)**

Di vê hevokê de lêkera “got” gerguhêz e. Peyva “kê” cînavka pirsîyarîyê ye. Bersiva cînavka pirsîyarîyê “kê”yê bi gruba cînavkên tewandî bi “min, te, wî/wê, me, we, wan” tê dayin.

**Te ji kê re got? (Min ji wî re got.)**

Di vê hevokê de lêkera “got” gerguhêz e. Cînavka “kê” bûye navdêr. Wateya berpêbûnê dîyar dike. Daçeka “ji...re” cînavka “kê”yê dike têrker. Bersiva cînavka pirsîyarîyê “kê” bi gruba cînavka tewandî “wî” tê dîyarkirin ji bo zayenda nêr.

**Adar bi kê re çû? (Adar bi wê re çû)**

Di vê hevokê de lêkera “çû” ne gerguhêz e. Cînavka “kê” bi arîkarîya daçeka “ji...re” yê wateya bihevrebûnê dîyar dike. Ji bo mêyîtîyê tê bi kar anîn. Bersiva “kê” bi cînavka tewandî hatîye dayin.

**Te di kîjan sinfê de xwend? (Min di wê sinfê de xwend.)**

Di vê hevokê de lêkera **“xwend”** gerguhêz e. Peyva **“kîjan”**ê rengdêra pirsyarîyê ye. Daçeka **“di...de”** rengdêra **“kîjan”** kirîye têrker.

**Ji vê mînakê dîyare ku peyva “kîjan”ê rengdêr be, bi gruba cînavkê tewandî re tê bikaranîn. Di tesbîta komxebatê de kêmayî heye.**

#### **Te di kîjanê de vexwar? (Min di wê de vexwar.)**

Di vê hevokê de lêkera **“vexwar”** gerguhêz e. Rengdêra **“kîjan”** bûye navdêr. Esasê vê hevokê waha ye: **“Te di kîjan pîyanê de vexwar?”** Ji hevokê, peyva **“pîyanê”** ketîye. Qertafa li dawîya **“pîyanê”** “ê” hatîye dawîya rengdêra **“kîjan”**ê peyva **“kîjanê”** bûye cînavka pirsyarîyê. Daçeka **“di...de”** cînavka **“kîjanê”** kirîye têrker.

#### **Te ji kîjanî kirîye? (Min ji wî kirîye.)**

Di vê hevokê de lêkera **“kirîye”** gerguhêz e. Rengdêra **“kîjan”** bûye navdêr. Esasê vê hevokê waha ye: **“Te ji kîjan zilamî kirîye?”** Ji hevokê, peyva **“zilamî”** ketîye. Qertafa li dawîya **“zilamî”** “î” hatîye dawîya rengdêra **“kîjan”**ê peyva **“kîjanî”** bûye cînavka pirsyarîyê. Daçeka **“ji”** cînavka **“kîjanî”** kirîye têrker.

#### **Te ji kîjanê kirîye? (Min ji wê kirîye.)**

Di vê hevokê de lêkera **“kirîye”** gerguhêz e. Rengdêra **“kîjan”** bûye navdêr. Esasê vê hevokê waha ye: **“Te ji kîjan keçikê kirîye?”** Ji hevokê, peyva **“keçikê”** ketîye. Qertafa li dawîya **“keçikê”** “ê” hatîye dawîya rengdêra **“kîjan”**ê peyva **“kîjanê”** bûye cînavka pirsyarîyê. Daçeka **“ji”** cînavka **“kîjanê”** kirîye têrker.

#### **Tu bi kîjanê re çûyî? (Ez bi wê re çûm.)**

Di vê hevokê de lêkera **“çûyî”** ne gerguhêz e. Rengdêra **“kîjan”** bûye navdêr. Esasê vê hevokê waha ye: **“Tu bi kîjan keçikê re çûyî?”** Ji hevokê, peyva **“keçikê”** ketîye. Qertafa li dawîya **“keçikê”** “ê”

hatîye dawîya rengdêra “kîjan”ê, peyva “kîjanê” bûye cînavka pirsyarîyê. Daçeka “ji” cînavka “kîjanê” kirîye têrker.

### **Tu bi kîjanî re çûyî? (Ez bi wî re çûm.)**

Di vê hevokê de lêkera “çûyî” ne gerguhêz e. Rengdêra “kîjan” bûye navdêr. Esasê vê hevokê wahaye: “**Tu bi kîjan kurikî re çûyî?**” Ji hevokê, peyva “kurikî” ketîye. Qertafa li dawîya “kurikî” “ê” hatîye dawîya rengdêra “kîjan”ê peyva “kîjanê” bûye cînavka pirsyarîyê. Daçeka “ji” cînavka “kîjanê” kirîye têrker

## **2. Celebên xweser (ez tu, ew, em, hûn, ew) ji bo dema niha û dema bê tên bikaranîn.**

### **Te kîjan qelem kirî? (Min ew qelem kirî.)**

Di vê hevokê de lêker gerguhêz e. Peyva “kîjan” rengdêr e. Peyva “qelem”ê bireserê dîyarkirî ye. Bersiva vê hevokê bi cînavka xweser “ew”ê tê dayîn.

### **Kî dersê dide te? (Ew dersê dide min.)**

Di vê hevokê de lêker gerguhêz e. peyva “kî” cînavk e. Peyva “dersê” bireserê nedîyarkirî ye. Bersiva vê hevokê bi cînavka xweser “ew”ê tê dayîn.

### **Kîjan, dersê dide te? (Ew, dersê dide min.)**

Di vê hevokê de lêker gerguhêz e. Peyva “kîjan” rengdêra pirsê ye. Eslê vê hevokê waha ye: **Kîjan mamoste dersê dide te?** Ji hevokê peyva “mamoste” ketîye. Peyva “dersê” bireserê nedîyarkirî ye. Bersiva vê hevokê bi cînavka xweser “ew”ê tê dayîn.

### **Kîjan yê dersê bide te? (Ewê dersê bide min.)**

Di vê hevokê de lêker gerguhêz e. Peyva “kîjan” rengdêra pirsîyarîyê ye. Eslê vê hevokê waha ye: **Kîjan mamoste yê dersê bide te?** Ji hevokê peyva “mamoste” ketîye. Qertafa dema bê “ê” hatîye

dawîya peyva “**kîjanê**” bûye cînavka pirsyarîyê. Bersiva vê hevokê bi gruba cînavkê xweser “**ew**”ê tê dayin.

Lê me di hevokên “**Te di kîjan sinfê de xwend?**” û “**Kîjan, dersê dide te**” de dîyar kir ku peyva “**kîjan**” bi gruba tewandî “**wê**” û bi gruba serast “**ew**”ê re tê bikaranîn.

**Ez ji hevokên Komxebatê yên di vî warî de bi kar anî, dimînim heyîrî.**

Li hevokên ku Komxebatê bi kar anîne danêrin. (inceleyîn)

*“Kîjanî ji wan ji te ra got? Wî xortî ji min ra got.*

*Kîjanê ji wan ji te ra got? Wê xwendekarê ji min ra got.*

*Kîjanan ew dîtiye? Wan kesan ew dîtiye.”*

**“Kîjanî ji wan ji te ra got?”**

Ev bikaranîn bê wateye. Eslê vê hevokê waha ye. **Kî ji wan mamosteyî ji wan ji te re got?**

Di vê hevokê de peyva “mamosteyî” ketîye. “î” ya li dawîya “mamosteyî” hatîye dawîya “kîjanî”. Ji xwe peyva “kîjan” ji peyvên “**kî -ji -wan**” hatîye damezrandin. Ne lazim e ku peyva “**ji wan**” du caran bê bi kar anîn.

Ev hevok waha bî serastkirin çêtir e.

**Kîjanî ji te ra got?** An jî;

**Ji wan mamosteyan kîjan mamosteyî ji te re got?** An jî;

**Ji wan mamosteyan kîjanî ji te re got?**

Ez dikarim bêjim ku bikaranîna Komxebatê ne rast e.

### Nivîsandina cînavka peywendîyê

Di kurdî de cînavka peywendîyê peyveka bi serê xwe ye. Ne qertaf e. Ji ber wê çendê divê wek peyvekê bê nivîsandin. Da ku tevilhevî di navbera “a”ya qertafa raveka xwemalîyê ya zayenda mê û “ya”ya cînavka peywendîyê de çênebe.

Mînak:

Ev kitêba min e. “a”qertafa raveka xwemalîyê (aîdîyet) ya zayend mê ye.

Ev kitêb a min e. “a”peyva cînavka peywendîyê ye.

Ku em di van her du hevoka de jî “a”yê bi tenê binivîsin tevilhevî çêdibe.

Mînak:

Ev kitêba min e. Ev kurê min e

Ev kitêb a min e. Ev kur ê min e.

Bi kurtayî ez dixwazim bejim: Cînavka peywendîyê ji bo mê “ya”, ji bo nêr “yê” ye. Û ji bo piranîya her du zayenda divê “yên” bê bikaranîn.

Mînak:

Ev kitêb ya min e.

Ev gumlek yê min e.

Eger em tîpa “y”yê, tîpa kelijandinê (vezeliqandinê) bifikirin, wî çaxî divê gengeşe bê kirin, gelo di zimanê kurdî de kelijandin di navbera du peyva de tê kirin an na.

Ne di kurdî de û ne di zimanê dîtir de tîpa kelijandinê di navbera du bêjeyan de nayê bikaranîn.

### **Komxebatê di derheqê peyvên kelijandinê (vezeliqandinê) de xwe nebihîstî kirîye.**

Halbukî problemeka herî mezin herfên kelijandinê û bikaranîna wan e. Ez berhêvîme ku komxebat bi berferêhî li ser vê mijarê raweste.

### **Nivîsandina hejmaran (hejmarnavan)**

Mejîyê Komxebatê di derheqê hejmaran de tevilhev e. Li fikra komxebatê binêrin da hûn karibin biryarekê bidin.

Komxebat waha pêşnîyar dike.

*“c) Pirtika tewangê, parçeyekî hejmarnavan e û nabe ku ji wan cuda, bi serê xwe dihê nivîsîn. Loma jihev cudanivîsîna vê pirtikê û hejmarnavan ne awayekî minasib e*

*“Di kurmançiyê da zayenda hejmarnavan jî heye. Lê di warê zayenda wan da, di nivîsîna kurmançiyê da du awa xuya dibin:*

*“a) Lewra hin kurmançîxêv zayenda hejmarnavên bingehîn “mê” dihesibînin, li gor wê dinivîsin û her weha di halê tewandinê da jî wan li gor zayenda “mê” ditewînin.”*

### **Nimûne:**

*“ji yekê, ji duyê, ji sêyê, ji çarê, ji pêncê, ji şeşê, ji heftê, ji nehê, ji dehê, ji bîstê, ji sihê, ji heftê û pêncê, ji nodê, ji sedê, ji hezarê, ji mîlyonê, ji mîlyarê û hwd[1]”*



**“b)** *Hin kurmancîaxêv jî hejmarnavan nêr dihesibînin û di wan rewşan da ku rêzimana kurmancîyê tewangê ferz dike, hejmarnavan li gor zayenda nêr ditewînin.”*

**“Komxebata me** *piştî mînaqeseyên pirhêl her du awayan jî di nivîsîna kurmancîyê da qebûl dike. Lê heger meriv ji bo nivîsînê sîstemekê ji van her du sîsteman hilbijêrê divê ku pêgirîya sîstema hilbijartî bi awayekî lihevkerî bike.”*

*“Ev awayê duyem ku zayenda hejmarnavan nêr dihesibînin, di kovara Hawarê da û her weha di nivîsîna kurmancîyê ya dema me da jî awayê têrbelav e[2].”*

**Li gor vî awayî:**

**“1)** *Hejmarnavên kurmancîyê yên bingehîn, ji bilî hejmarnava “yek”ê[3], hemû “nêr” in*

*“2. Ji hejmarnava “du”yan heta “nozdeh”an hemû hejmarnav bi “-an”ê dihên tewandin”*

**“5)** *Hejmarnavên bîst, sih, çil, pêncî, şeş, heftê, heştê, nod, sed, hezar, mîlyon, mîlyar û hwd bi [-î]yê dihên tewandin. Helbet, gava ku hejmarnav bi dengdêrekê biqede, berî vê [-î]yê [-y-]ya pevgerêdanê dihê. “*

**“8)** *Hejmarnava “hezar”î, gava ku bi serê xwe be, wekî li jorê dîyarkirî dihê tewandin lê gava ku bi hejmarnaveke din ra bihê bikarînan û ew bi xwe jî hejmarnava paşîn be, dikeve bin hikimê wê hejmarnavê û li gor wê dihê tewandin.”*

**“Nimûne:**

*ji sê hezaran, ji çar hezaran, ji pênc hezaran, ji şeş hezaran, ji heft hezaran, ji heşt hezaran, ji neh hezaran, ji deh hezaran, ji yazdeh hezaran, ji duwazdeh hezaran, ji sêzdeh hezaran, ji çardeh hezaran, ji panzdeh hezaran, ji şazdeh hezaran, ji hevdeh hezaran, ji hejdeh hezaran, ji nozdeh hezaran”*

*“Lê piştî hejmarnavên bîst, sih û hwd bi [-î]yê dihê tewandin.”*

Komxebat, hejmaran jî wekî navdêran ditewîne. Komxebatê hejmarên “ji yekê, ji duyê, ji sêyê, ji çare” tewandî ye û gotîye “ê” qertafa mêyîtîyê ye.

Qertafa li dawîya hejmaran, “î” jî wekî tewangê şirove kirî ye.

### **Ezê di vê derheqê de fikra xwe pêşkêş bikim.**

Divê pêşî ev bê zanîn hejmar ku rengdêr be qertafa diyarkirinê (tewangê) nastîne.

Reqem deh in: Sifir, yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh.

Yên dîtir hejmar in. Ji reqema pêk hatine. Hejmar jî bi serê xwe qertafa nastînin.

Minak: Deh, yazdeh, dozdeh, sêzdeh, çardeh, pazdeh, şazdeh, hefdeh, hejdeh, nozdeh, bist, sih, çil, pêncî, sêst, heftê, heştê, not, sed.

Di kurdî de reqem bi hev ve nayên nivîsandin.

### **Mînak:**

Bîst û yek, sih û çar, çil û şeş, pêncî û heşt, şêst û yek, heftê û çar, heştê û pênc, not û neh, sed û bîst û yek, hezar û du sed û çil û çar, milyon û hezar û sed û deh, sed û bîst û pênc milyon û sê hezar û du sed û çardeh, du sed û şeş milyar û sed û bîst û neh milyon û heşt sed û pêncî û du hezar û sed û bîst û pênc.

Lê di kurdî de ev reqemên li jêr bi hev ve tînin nivîsandin: :Yazdeh, dozdeh, sêzdeh, çardeh, pazdeh, şazdeh, hefdeh, hejdeh, nozdeh

- 1. Di kurdî de rengdêrên hejmara resen qertafê nastînin. Nayîn tewandin û nayên diyarkirin.**

Ku hejmar qertafa bistîne, hejmar wê demê dibin navdêr.

Mînak:

Azad ji deh kitêba zêdetir nexwendîye.

Azad ji deha zêdetir nexwendîye.

Di mînaka “Azad ji deh kitêba zêdetir nexwendîye” de “deh”ê qertaf nestandîye. Rengdêr e. “deh kitêb” jî raveka rengdêrê ye.

Di mînaka “Azad ji deha zêdetir nexwendîye” de “deh”ê qertafa “a” yê sitandîye. Peyva “deha” di peywira navdêrê de ye. Di şûna “kitêbê” de “a” hatîye bi kar anîn.

1. Di raveka rengdêra hejmarê de ku lêker negerguhêz be, navdêra piştî hejmarê ne bireser be û nediyarkirî be, wî çaxî ne hejmar ne jî navdêr qertafê nastînin.

Mînak:

Çar zarok kenîn.

Di vê hevokê de peyva “çar”ê û peyva “zarok”a qertaf nestandîye. Piranî bi “în”a li dawîya “kenîn”ê pêk hatîye.

2. Di raveka rengdêra hejmarê de ku lêker gerguhêz be, navdêra piştî hejmarê di peywira biresera nediyarkirî de be, wî çaxî ne hejmar ne jî navdêr qertafê nastînin.

Mînak:

Min çar zarok birin.

Di vê hevokê de peyva “çar”ê û peyva “zarok”ê qertaf nestandîye. Piranî bi “in”a li dawîya “birin”ê pêk hatîye.

3. Di raveka rengdêra hejmarê de ku lêker gerguhêz be, navdêra piştî hejmarê di peywira biresera diyarkirî de be, wî çaxî hejmar qertafê nastînin lê navdêr qertafa “-an”yê distîne.

Mînak:

Ez çar zarokan dibim.

Di vê hevokê de peyva “**çar**”ê qertaf nestandîye. Peyva “zaroka” qertafa “-an”yê standîye. Piraniya hemcinsa bi “-an” ê hatîye damezrandin.

Di mînaka duwem de lêker gerguhêz e. Ji ber ku bireser ne dîyarkirî ye, navdêrê piştî hejmarê qertaf nestandîye.

Lê di mînaka sêyem de lêker gerguhêz e. Ji ber ku bireser dîyarkirî ye, navdêrê piştî hejmarê qertafa “-an”ê standîye.

Nexwe em dikarin bêjin qertafa “-an”ê bi dîyarkirina navdêr ve an jî bi pirhejmarîya navdêr ve girêdayîye. Ev di mînaka “**2 û 3**”yê de hatîye dîyarkirin.

4. Ku hejmar di peywira têrkerê de be, wê demê hejmar qertafa “-an”ê distîne.

Mînak: Ji dehan heta bi bîstan bihejmêre.

Di eslê xwe de ev hevok waha ye. “ Ji deh hejmaran heta bi bîst hejmaran bihejmêre.”

Ji hevokê peyvên “**hejmaran**” ketîye. Qertafa “-an”a li dawîya “**hejmarna**” hatîye dawîya

“**dehan û bîstan**”

5. 5. Ku berî hejmarê daçeka “**bi, ji, li, di**” bê bikaranîn, wê demê hejmar qertafa “-an”ê distîne.

Mînak:

**Bi pêncan bileyîze.** (Bi pênc **kaban** bileyîze)

**Li pêncan gerîyan.** (Li pênc **malan** gerîyan)

**Di şeşan de zarok hene.** (Di şeş **sinfan** de zarok hene.)

Di her sê mînakên de jî peyvên “**kaban, malan û sinifan**” ketine qertafa “-an” a li dawîya wan hatîye dawîya reqeman.

6. Ku hejmar, raveka hejmara rêzê be, wî çaxî navdêr berî hejmarê tê nivîsandin, hejmar jî qertafa raveka nêrîtîyê “ê” distîne.

Mînak:

**Ez di sinfa çarê de me.** (Ez di sinfa çar sireyê de me.)

**Ez di sinfa çarem de me.**

Di mînakê de jî peyva “**sireyê**” ketîye. Qertafa “ê” ya li dawîya “**sireyê**” hatîye dawîya reqemê.

7. Ku hejmar raveka navdêrê be, wî çaxî hejmar berî navdêrê tê nivîsandin. Hejmar qertafa raveka piranîyê “ên” distîne. Navdêr jî qertafa raveberê distîne

Mînak:

Îro heştê hezîranê ye.( Îro heşt rojên hezîranê ye.)

Bîst û yekê hezîranê berê xwe da zivistanê.

Di eslê xwe de ev hevok waha ye. “**Bîst û yek rojên hezîranê berê xwe da zivistanê.**”

Di vê hevokê de qertafa li dawîya “yekê” qertafa raveka piranîyê ye. Yanî kurdan qertafa raveka piranîyê “ê” bi kar anîye. Çimku ev gotina pêşîya ye. Ne qertafa mêyîtîyê ye.

1. Di derheqê qertafên tên dawîya hejmarê de xususîyetek dî jî heye. “î”ya tê dawîya hejmaran. Me berî niha jî dîyarkiribû, di kurdî de rengdêrên hejmara resen qertafê nastînin. Ku hejmar qertafa bistîne, hejmar wê demê dibin navdêr.

### **Mînak:**

Min sed pez firotin.

Adar, sed pezî bifiroşe.

Adar, sedî bifiroşe.

Di vê mînakê de ne peyva “sed”ê ne jî peyva “pezî” qertafa pirhejmarîyê “-an” nestandîye. Peyva “pezî” qertafa “î” standîye.

Mînak: Adar, sed pezan bifiroşe. Adar, sedan bifiroşe.

Ji bo ku tevilhevî çênebe, navdêrên piştî hejmara; bîst, sih, çil, pêncî, şêst, heftê, heştê not, sed, hezar, milyon û milyarî jî, di şûna qertafa piranîyê “î” yê de qertafa “an”a piranîyê bikarbînin çêtir e.

### **Mînak:**

Sed pezan bikire. Hezar pezan bifiroşe.

**Balkêşî:** “î”ya di dawîya navdêrên piştî hejmara; sih, çil, pêncî, şêst, heftê, heştê not, sed, hezar, milyon û milyarî de tê bikaranîn, qertafa piranîyê ye. Îhtîmal e ku asarên di navbeyna kurmancî û zazakî de be. Divê li ser vê lêkolîn bê kirin.

**Komxebat di derheqê “yek” ê de waha pêşniyar dike.**

**“11)** Hejmarnava “yek”ê mê ye û bi “-ê”yê dihê tewandin.

**Nimûne:**

*ji yekê*

*pehlika bîst û yekê*

*sala şeşt û yekê*

*şeva hezar û yekê”*

**“Gava ku hejmarnava “yek”ê dikeve pêşîya navdêrekê, tesîra wê ne mîna tesîra hejmarnavên din e. Lewra ew li ser tewandina navdêran tesîrê nake. Navdêrên ku li gel hejmarnava “yek”ê dihên bikarînan, li gor zayenda xwe dihên tewandin:**

**Nimûne:**

*Ji yek zilamî, ji yek jinê, ji yek kurî, ji bîst û yek bajarî, ji sih û yek dewletê, ji çil û yek miletî, ji pêncî û yek destî, ji şeşt û yek dibistanê, ji heftê û yek neteweyî, ji heştê û yek xanimê, ji heştê û yek xulamî, ji nod û yek mêvanî, ji sed û yek mêrî”*

Mixabin qertafa li dawîya “yekê” ne qertafa tewanga mêyîtîyê ye.

Ezê di vê mijarê de fikrê xwe pêşkêş bikim.

1. **Bikaranîna “yek”ê**
2. Di raveka rengdêra hejmarê de ku lêker negerguhêz be, navdêra piştî hejmarê ne bireser be û nediyarkirî be, wî çaxî ne **“yek”** ne jî navdêr qertafê nastînin.

Mînak: Yek zarok kenî. (Zarokek kenî)

Di vê hevokê de peyva “**yek**”ê û “**zarok**”ê qertaf nestandîye.

2. Di raveka rengdêra hejmarê de ku lêker gerguhêz be, navdêra piştî hejmarê di peywira biresera nediyarkirî de be, wî çaxî ne hejmar ne jî navdêr qertafê nastînin.

Mînak: Min yek zarok anî. (Min zarokek anî)

Di vê hevokê de lêker gerguhêz e. Ji ber ku bireser ne diyarkirî ye, peyva “**yek**”ê û “**zarok**”ê qertaf nestandîye.

3. Di raveka rengdêra hejmarê de ku lêker gerguhêz be, navdêra piştî hejmarê di peywira biresera diyarkirî de be, wî çaxî hejmar qertafê nastînin lê navdêr qertafa zayendê “**î**” û “**ê**”yê distîne.

Mînak:

Ez yek kurikî dibim. (Ez kurikekî dibim.)

Ez yek keçikê dibim. (Ez keçikekê dibim.)

Di van hevokan de peyva “**yek**”ê qertaf nestandîye. Peyva “**kurikî**” qertaf a “**î**”yê standîye. Peyva “**keçikê**” qertaf a “**ê**”yê standîye. Qertafên zayendê “**î**”, “**ê**” hatine bikaranîn.

4. Ku hejmar, di peywira navdêrê têrkerê de be, wê demê hejmara “**yek**”ê qertafa “**ê**”yê distîne.

Mînak: Ji yekê heta bi bîsta bihejmêre. Di eslê xwe de ev hevok waha ye: (Ji yek hejmarê heta bi bîst hejmara bihejmêre.)

Ku peyva “**yek**”ê nekifşîya hejmarê dîyar bike, di wê hevokê de navdêr tê piştî “**yek**”ê qertafa zayendê distîne.



Mînak:

Ezê yek zebeşî bikirim. (Ezê zebeşekî bikirim.)

Ezê yek sêvê bikirim. (Ezê sêvekê bikirim.)

5. Ku berî **“yek”ê** daçeka **“bi, ji, li, di”** bê bikaranîn, wê demê **“yek”** qertafa **“ê”**ya li dawîya navdêra distîne peyva **“yek”** ê ji rengdêrî dikeve û dibe navdêr.

Mînak:

Bi yekê bileyîze (Bi yek **xarê** bileyîze)

Li yekê gerîyan (Li yek **malê** gerîyan)

Di yekê de zarok hene. (Di yek **sinfê** de zarok hene.)

6. Ku **“yek”**, raveka hejmara rêzê be, **wî** çaxî navdêr berî hejmarê tê nivîsandin, hejmar jî qertafa raveka nêrîtîyê **“ê”** distîne.

Mînak:

Ez di sinfa yekê de me. (Ez di sinfa yek hejmarê de me.)

Ez di sinfa yekem de me.

7. Ku hejmar raveka navdêrê be, wî çaxî hejmar berî navdêrê tê nivîsandin. Hejmar qertafa raveka nêrîtîyê **“ê”** distîne. Navdêr jî qertafa raveberê distîne

Mînak: Îro yekê hezîranê ye. (Îro yek rojê hezîranê ye.)

8. Di hevoka “**Ez yek zilamî dibînim.**” de, “**zilamî**” qertafa nêrîtîyê standîye û bireserê dîyarkirî ye. Di hevoka “**Ez yekî dibînim.**” de, “**yekî**” qertafa nêrîtîyê sitandîye. Di vê hevokê de peyva “**yekî**” ji rengdêrî ketîye di peywira cînavkê nekirîyê de ye. Peyva “**yekî**” di şûna “**zilamekî**” de bûye bireserê dîyarkirî.
9. Di hevoka “**Yekê gulanê**” de peyva “**yekê**” qertafa raveka (îzafeya) pirhejmarîyê standîye. Lê em dizanin ku peyva “**yek**”ê mê ye.

### **Bikaranîna peyva “nîv”ê**

Li pêşnîyara Komxebatê binêrin. Da em karibin fikra xwe bêjin.

**”12)** Her çî “nîv” e, gava ku bi serê xwe be, bi “-î”yê dihê tewandin.

*Nimûne: ji nîvî”*

*“Gava ku “nîv” li gel hejmarnavên din bihê bikarînan, wan naxe bin hikimê xwe lê ew bi xwe dikeve bin hikimê wan û li gor wan dihê tewandin.”*

**Nimûne:**

*“ji yek û nîvê, ji du û nîvan, ji deh û nîvan, ji bîst û nîvî, ji sih û nîvî, ji çil û nîvî, ji pêncî û nîvî”*

*“Gava ku “nîv” li gel navdêran jî dihê bikarînan, wan naxe bin hikimê xwe û navdêr bi tewanga xwe dihên tewandin.”*

**Komxebatê di derheqê peyva “nîv”ê de jî tevlihevî kirîye.**

Ezê di derheqê peyva “nîv”ê de fikrê xwe pêşkêş bikim.

Peyva “nîv”ê peyveka nêr e.

1. Peyva “nîv”ê bi hejmarê re bê bikaranîn, peyva “nîv”ê qertafa nastîne.

Mînak:

Min nan û **nîv** kirî.

Te sê wereqe û **nîv** anîn.

Wî sed û bîst û şeş metre û **nîv** qumaş firotin.

Adar, du milyon û hezar û sê sed û çil û heft wereqe û **nîv** xerç xirin.

2. Di hevokê de ku peyva “**nîv**”ê bi navdêra pîvanê re bê bikaranîn, wê demê peyva “**nîv**”ê piştî navdêrê pîvanê tê bikaranîn. Peyva “**nîv**”ê qertafê nastîne.

Mînak:

Şeş kêlo û **nîv** pembû bikire.

Wî du metre û **nîv** kumaş firotin.

Sê lître û **nîv** şîr kirîn.

Di van hevokan de peyva “**nîv**”ê piştî peyvên pîvanê “**kêlo, metre û lître**”yê hatîye bi kar anîn.

**Balkêşî:** Peyva “**nîv**”ê ji bo tiştên tene (heb) bin tê bikaranîn.

Yanî em nikarin bêjin: “**Pênc xwarin û nîvê bide me.**” (Ev mînaka komxebatê ye.)

**Balkêşî:** Lê bi wateya mecaz em dikarin bêjin:

**Nîv** mela, **nîv** xwenda, **nîv** alim, **nîv** zana, **nîv**co, **nîv** insan

3. Di hevokê de ku lêker gerguhêz be, bireser jî nedîyarkirî be, wê demê navdêr û peyva “**nîv**”ê jî qertafê nastînin.

Mînak:

Ahmed du nan û **nîv** xwarin.

Zana sê wereqe û **nîv** xerç kirin.

Di van hevoka de peyva “**nîv**”ê bireserê nedîyarkirî ye. Peyva “**nîv**”ê qertaf nestandîye.

4. Di hevoka “**Bi qasî du wereqe û nîvên xwe jê hilde.**” de, lêker gerguhêz e. Qertafa “-ên” qertafa ravekê ye. Eslê vê hevokê waha ye. “**Bi qasî du wereqe û nîv wereqeyên xwe jê hilde.**” ye. Peyva “**wereqeyên**” ketîye. Qertafa “-ên” hatîye dawîya “**nîv**”ê.

5. **5. Çar metre û nîvan bikire.**

Di vê hevokê de, lêker gerguhêz e, peyva metreyê bireserê dîyarkirî ye. Peyva “nîva” jî bi “metre”yê ve girêdayî ye. Qertafa li dawîya “**metre**”yê hatîye dawîya peyva “**nîvan**”. Qertafa “-an”ê qertafa “**Çar metre û nîv metreyan**” e.

6. **Ji şeş û nîvan, çar û nîvan derêxe.**

Eslê vê hevokê ev e:

Ji şeş kêloyan û nîv kêloyan, çar kêloyan û nîv kêloyan derêxe.

Peyva “**nîv**”ê bi hejmara şeş û çarê ve girêdayî ye. Ji ber wê çendê qertafa “-an” ya li dawîya “**kêloyan**” hatîye dawîya “**nîv**”ê.

Di vê hevokê de “**şeş û nîvan**” û “**çar û nîvan**” têrker e.

7. Ku peyva “nîv”ê raveka (îzafeya) rengdêra be, peyva “nîv”ê qertafê nastîne lê navdêrê piştî “nîv”ê qertafa nêrîtîyê “î” û “ê”yê distîne.

Mînak:

**Nîv** metreyê bikire. ( ji nîvî)

**Nîv** wereqeyî bide min.

Ji **nîv** sêvê ev maye.

8. Ku peyva “nîv”ê raveka navdêra be, wê demê peyva “nîv”ê qertafa raveka nêrîtîyê “ê” distîne.

Mînak:

Nîvê malê xwe bide min.

Nîvê zebeş bide cîrana.

Nîvê sêvê xira bûye.

### **Bikaranîna peyva saetê û daçekê “di...de”yê û daçekê “ji”yê**

Komxebatê hevokên wisa dane ku aqlê mirova disekine. Wezîfa daçekan îzah nekirîye.

Gelo peyv, raveka rengdêran be “bazindaçek” çi dike? Gelo peyv, raveka navdêran be “bazindaçek” çi dike? Gelo peyv, bireser be “bazindaçek” çi dike? Divê bê îzah kirin.

### **Em li mînakên Komxebatê binêrin û serast bikin.**

1. “Ez di saet pêncan de hatim.”

Di vê hevokê de têkilîyê peyva “saet”ê ne bi pêncê re ne jî bi raveka rengdêrê ve nîne. Mexsed jê ne pîvana dem e. Ji ber wê çendê ne hewceye peyva “saet”ê di nav qalibê daçeka “di...de”yê de bê nivîsandin.

Em dikarin bêjin ku peyva “saet”a di pêşîya pêncê de zêdeye ne lazime bê nivîsandin. Bê peyva “saet”ê jî wateya hevokê xira nabe. Çimku qertafa li dawîya peyva “pêncan” qertafa li dawîya “pênc saetan” e. Peyva “saetan” ketîye. Di hevokê de ne lazim e, du caran peyva “saet”ê bê bi kar anîn. Nexwe hevok waha bê bi kar anîn rastir e.

Mînak: “Ez di pêncan de hatim.” An jî; “Ez saet di pêncan de hatim.” Di vê hevokê de mexsed dîyarkirina hatinê di “pênca” de ye.

Ezê çend mînakên di jî bidim da mijar bê zelalkirin.

### 3. “Ez di du saetan de hatim”

Di vê hevokê de peyva “du saeta” raveka rengdêrê ye. Mexsed jê pîvana deme. Ji ber wê çendê peyva “saet”ê di nav qalibê daçeka “di...de”yê de cih girtîye. Raveka “du saeta” kirîye hokera mîqtarî.

Di vê hevokê de wezîfeya (peywira) peyva “saet”ê heye.

Peyva “saet”ê dide zanîn ku “hatin” ne di du deqîqeya de ye. Ne du roja de ye. Hatin di du saeta de pêk hatîye.

### 4. “Ez di saeta çarem (çarê) de gihatim wir.”

Di vê hevokê de peyvgruba “di saeta çarem de” raveka navdêrê ye. Qalibî daçeka “di...de”yê ev peyvgrub êxistîye di bin bandora xwe de. Peyvgrub hêmana (öğe) hokerî ya demî ye.

Di vê hevokê de peyva “saet”ê divê di nav qalibê daçekê de bê nivîsandin. Ji ber ku peyva “saet bi çarê” re hejmara rêzê dide dîyar kirin. Ku di vê hevokê de peyva “saet”ê neyê nivîsandin hevok bê wate dibe.

Mînak: “Ez saeta di çarem de gihatim wir.” Hevok bê wateye.

#### 5. “ Di saeta min de milla sanîyeyê nîne.

Di vê hevokê de peyvgruba “saeta min” ravek e. Wateya xwemalitîyê têxê di hevokê de. Ji ber wê çendê daçeka “di...de” peyvgruba “saeta min” tevde êxistîye di bin hukmê xwe de û kirîye têrker.

#### 6. “ Adar li saeta xwe nenêrî.”

Di vê hevokê de peyvgruba “saeta xwe” ravek e. Wateya xwemalitîyê têxê di hevokê de. Ji ber wê çendê daçeka “li” peyvgruba “saeta xwe” kirîye têrkera berpêbûnê.

**Komxebatê peyvên “dehekî, sedekî û hezarekî” pêşnîyar kirin e.**

Pêşnîyara min di derheqê nivîsandina van hejmaran de ev e: “**Dehkî, sedkî û hezarkî**” ye. Yanî qertafa “e”yê bê nivîsandin. Axaftinê giran dike.

Lazime ku Komxebat îzah bike ka “an” bi çî awayî dibe tewang û “î” bi çî awayî dibe tewang di nivîsandina salê de.

“30.6. Tewang[4] di nivîsîna salê da

**Nimûne:** (bnr. beşê “Nivîsîna hejmarnavan”)

*di sala 1914an de*

*di sala 1920î de*

*di sala 1870yî de”*

Eger em van hevokan bi nivîsandinê binivîsin emê waha binivîsin:

**Di sala hezar û neh sed û çardehan de ye.** (Di sala hezar û neh sed û çardeh **salan** de)

**Di sala hezar û neh sed û bistî de** (Di sala hezar û neh sed û bist **salî** de )

qertaf “-an” û “î” yê, ev her du jî qertafên piranîya “**salan û salî**” ne.

Di derheqê hejmarnavên rêzê de jî mejîyê Komxebatê tevlihev e. *Komxebat vê mijarê waha şirove dike.*

#### 29.5. Hejmarnavên rêzîn

“Hejmarnavên rêzîn, li gor qayîdeyên jorîn û bi alîkarîya “yê”, “ya”, “yên”ê dihên çêkirin.[\[5\]](#)”

#### **Nimûne:**

“yê/ya yekê, yê/ya duyan, yê/ya sêyan, yê/ya çaran, yê/ya pêncan, yê/ya şeşan, yê/ya heftan, yê/ya heştan, yê/ya nehan, yê/ya dehan, yê/ya yazdehan, yê/ya duwazdehan, yê/ya sêzdehan, yê/ya çardehan, yê/ya panzdehan, yê/ya şazdehan, yê/ya hevdehan, yê/ya hejdehan, yê/ya nozdehan, yê/ya bistî, yê/ya sîyî, yê/ya çilî, yê/ya pêncîyî, yê/ya şêstî, yê/ya heftêyî, yê/ya heştêyî, yê/ya nodî, yê/ya sedî, yê/ya hezarî, yên”

#### **“b) Ji bo standardkirina hejmarên rêzîn**

*Ji ber ku di nava kurmancîaxêvan da di pirsê zayenda hejmaran da cudabûnek heye û li gor hin devokan zayenda wan nêr e, li gor hin devokan jî mê ye, ji bo çareserkirina vê pirsê û peydakirina standardekê, hewcedarî bi rêyeke çareserkirinê ya pratîk heye. Piştî tecrubeyan, rêyeke pratîk peyda bûye ku ew jî bikarînanana morfema “-em”ê ye. Hin nivîskarên kurmancîyê êdî bi vî awayî dinivîsin. Hilbijartina vî awayî dê rêyê li ber aloziyan bigire û dê di warê **hejmarên rêzîn** da standardekê peyda bike.”*



*“Ji ber vê yekê, tevî qayîdeya li jorê dîyarkirî jî ya baştir ew e ku kurmancîaxêv ji bo hejmarnavên rêzîn li ser vê “-em”ê li hevûdin bikin, wê bikin bingehê standardkirinê û hejmarên rêzîn bi vî awayî binivîsin: **hejmarnav + -em**”*

Komxebatê şirove kirîye ku hejmarên rêzê bi arîkarîya “yê”, “ya”, “yên”ê tên damezrandin. Gelo wazîfeya “yê”, “ya”, “yên”ê di kurdî de çî ye? Divê Komxebat vê îzah bike. Ya duwê divê komxebat vê jî îzah bike. Gelo hejmarên rêzê sadece bi arîkarîya “yê”, “ya”, “yên”ê tên çêkirin? An bi awayekî dîtir jî tên çêkirin. Divê Komxebat vê jî îzah bike.

Di vê derheqê de komxebatê pêşnîyar kirîye ku hejmara rêzê bi qertafa “-em”ê bê damezrandin çêtir e.

Gelo emê bêjin: Em di sinfa çareman de ne. An jî: Ez di sinfa ya çaremê de me.

Emê “yê”, “ya”, “yên”ê di hevokê de çawa bi kar bînin. Divê komxebat vê mijarê bi berferehî îzah bike.

#### **Di vê derheqê de ez waha difikirim:**

Ez di **sinfa çarê** de me.

Di vê hevokê de peyvgruba “**sinfa çarê**” ravek e. (Îzafe ye)

Lê ku em bêjin: Ez di **sinfa çaran** de me.

Qertafa ravekê nayê bikaranîn. Wezîfeya qertafa “-an”ê çî ye? Me got hejmar qertafan nastînin. “-an” qertafa navdêrekî ye hatîye dawîya “**çarê**”.

Ku em bêjin: Ez di **sinfa çarem** de me. Gelo wezîfeya “-em” ê di kurdî de çî ye?

Ku em bêjin: Ez ya çareman **im.**, an jî ez ya çaremê **me.** Di van hevokan de wezîfeya qertafa “-em” û “-an”ê, an jî “-em” û “-ê” çî ye

Divê Komxebat vê mijarê bi berferêhî îzah bike. An nexwe alozî xilas nabin.

Di sernivîsa vê mijarê de jî ez dimênim ecêbmayî. Gelo “**Hejmarnavên rêzîn**” ne ravek e? Belê. Qertafa “-în”ê ji kengî ve bûye qertafa ravekê. Herhalde Komxebatê jibîr kirîye. Ev terîmek e hatî peydakirin lê divê ev terîm qertafa ravekê bistêne. Yanî waha bê tewandin: “**Hejmarnavên rêzîne**”

### “Nivîsîna lêkeran”

*“Kopula di kurmançiyê da li gel parçeyên axaftinê yên din (parçeyên ku bi dengdêran diqedin û nedengdêran diqedin) weha dihê nivîsîn:”*

*“Ez kurd **im***

*Tu kurd **î***

*Ew kurd **e***

*Em kurd **in***

*Hûn kurd **in***

*Ew kurd **in**”*

Qey ne lazim e ku Komxebat îzah bike, mexset ji “kopula” û “**parçeyên**” çî ye? Komxebat di derheqê qertaf lêkeran de çî difikirê? Gelo “**im, î, e, in**” qertafin an jî lêkerên serbixwe ne?

**Di vê mijarê de ez waha difikirim:**

Di eslê xwe de qertaflêkerên li dawîya navdêran, bi wezîfeya ku navdêra bikin pêveber tîn bi kar anîn. Ev qertaf waha ne: **“im, î, e, in”**

Qertafên di mînakên jêr de jî, heman qertaf in. Yanî **“ime, yîye, ye, ine”** ne.

“Ez swêdî **im-e**

Tu swêdî **yî /y e**

Ew swêdî **ye**

Em swêdî **in-e**

Hûn swêdî **in-e**

Ew swêdî **in-e”**

Gelo ma ne lazim e ku Komxebat îzah bike di hevoka **“Tu siwêdî yî”** de, di şûna **“e”** de çima **“î”** hatîye bikaranîn? Wezîfeya **“î”** yê li wê derê çîye? An jî çire **“e”** bûye **“î”**?

Ev xeletê meşhur e? An jî qaîdeyekê rastnivîsê ye di kurdî de?

Me berî niha jî îzah kiribû ku di vî mijarê de alozî hene.

Mînak:

**“Ez keça kurda me”** an jî **“Ez keça kurdan im.”** Komxebatê ev mijar pêşnîyar nekirîye.

**Têbinî:** Li hinek deveran hevoka **“Tu swêdî ye”** jî tîn bi kar anîn.

Şivan Perwer di strana **“kirîvo”** de waha bikar tîne: **“Tu jî êzîdî ye.”**

Bi gelemperî "tu jî êzîdî yî" tê bi kar anîn. Ez bim, ev mijara lêkolînê ye.

"Nivîsîna lêkerên nesade"

Gelo mexseda Komxebatê ji peyva "nesade" çîye? Em li pêşnîyara Komxebatê binêrin û paşî jî şirove bikin.

*"Lêkerên nesade jî wekî hemû lêkerên din, ji parçeyên axaftinê yên nelêkerî cuda dihên nivîsîn. Lê ji navên wan jî dîyar e ku lêkerên nesade bi xwe ji çend bêjeyan pêk dihên. Hin beşên lêkerên nesade hene ku bi parçeyên xwe yên lêkerî ra bûne yek lê hin jî cuda ne."*

***"Loma lêkerên nesade ji aliyê nivîsînê va dabeşî du grûpan dibin:"***

*"1. Lêkerên nesade yên ku bi hevûdin va dihên nivîsîn*

*2. Lêkerên nesade yên ku ji hevûdin cuda dihên nivîsîn"*

Ji pêşnîyara komxebatê waha tê fêhmê: Lêkerên ku ji du peyvan hatî damezrandin tên fêhmê. Hinek ji van lêkeran, bi hev ve tên nivîsandin, hinek jî cuda tên nivîsandin.

Komxebatê di derheqê yên bi hev ve tên nivîsandin de waha gotîye:

*"Lêkerên nesade yên ku bi hevûdin va dihên nivîsîn*

*Hin lêkerên nesade hene ku bi hevûdin va dihên nivîsîn.*

*pêşgir + lêkera sade*

*Ev cureyên lêkeran ji pêşgiran (da-, hil-, ra-, rû-, ve-, vê-, wer-) û lêkerên sade pêk dihên. Bi serê xwe tu maneya van pêşgiran tune ye. Loma di rastnivîsîna vî cureyî da, qayîdeya sereke ew e ku divê pêşgir bi tu awayî ji lêkerên sade nehên veqetandin û hertim bi wan va bihên nivîsîn."*

Gelo (*da-, hil-, ra-, rû-, ve-, vê-, wer-*) qertafên an daçek in? Divê bên îzah kirin. Komxebat vana wek qertafan şirove dike. Komxebat waha didomîne. *“Divê pêşgir bi tu awayî ji lêkerên sade nehên veqetandin û hertim bi wan va bihên nivîsîn.”*

Gelo hevokên ku Komxebatê ji bo mînakên dayîn, ne muxalifê vê tesbîtê ne? Ka li hevokan binêrin:

“Ez **dadigirim**.

Ez **dadikim**.

Ez **vedixwim**.

Ez **vedigerim**.

Ez **çêdikim**.

Ew **çêdibe**.

Ez **hildikim**.”

Rastîya van hevokan li gorî Komxebatê gereke waha bûna:

“Ez **didagirim**.

Ez **didakim**.

Ez **divexwim**.

Ez **divegerim**.

Ez **diçêkim**.

Ew **diçêbe**.

Ez **dihilkim**.”

Divîbû ku **“bi tu awayî”** (*da-, hil-, ra-, rû-, ve-, vê-, wer*) ji lêkerên sade cuda neyên nivîsandin. Lê Komxebatê daçeka dema niha **“di”** anîye di navbera wan de bi kar anîye. Rastî ewe ku qertafa **“di”** di pêşîyê de bê bi kar anîn. Wekî **“Ez divexwim.”**

Ezê fikra xwe ya di derheqê **“vê-xistin, vê-ketin”**ê de jî pêşkêş bikim. Divê bê zanîn ku lêkera **“vêketin, vêxistin”**ê devokî ne. Ev hevok bi eslê xwe waha ye: **“pêketin, pêxistin”**e. Ji hev vekirina van hevokan **“bi- wê- ketin”** û **“bi- wê- xistin”**e. Di tesbîtên Komxebatê de kêmayî hene.

#### **Di derheqê qertafa dema bê (dahatû) de**

Komxebatê di derheqê qertafa dema bê de biryarek daye. Lê di derheqê biryara xwe de îzahat nekirîye. Komxebatê waha pêşnîyar kirîye:

*“Di nivîsîna kurmancîyê da, ji bilî hin awayên pêkvenivîsandî (Nimûne: Tuê bibînî, tuwêbibînî, tuyê bibînî) – ev awa hene:*

**dê, ê, wê, yê, tê**

#### **Nimûne:**

*Tu **dê** bibînî, tu **ê** bibînî, tu **wê** bibînî, tu **yê** bibînî, **tê** bibînî*

*Ji van awayan du awa hene ku herî û **pir dihên bikarînan: “dê”** û **“ê”**.*

*Ji van her du awayan tercîha Komxebata me ya di vî warî da **“dê”** ye.*

*Divê ku ev **“dê”** cuda bihê nivîsîn.*”

Komxebatê lêkolîn kengî kirîye û danekên di destê Komxebatê de çine? Ma ne lazim e ji raya gel re pêşkêş bike. Gelo **“pir bikaranîn”** li kîjan deveran e? Da ku gel di derheqê biryara wan de serwext bibe. Jiber vê sedemê ev ne pêşnîyareka zanyarî ye.

Tiştê ez dizanim; devera Behdîna xariç, kurd bi gelemperî **“ê”** bi kar tînin. Mîr Celadet jî ev mijar bi **“ê”** yê serast kirîye.

Di mînakên komxebatê de eşkere ye ku di **“dê, ê, wê, yê, tê”** de qertafa dema bê **“ê”** ye. Di van mînakan de **“w, y”** herfên kelijandinê ne. **“d, t”** jî di şûna herfên kelijandinê de ne. Eslê wanan jî evin: **“di-hê”** û **“ti-hê”** ne. Di eslê van de jî **“h”** kelijandin e. **“di”** û **“ti”** hatine zêdekirin.

Nexwe em dikarin bêjin, esasê qertafa dema bê **“ê”** ye. Evên dîtir hemû jî zêde ne. Kelijandin jî îşaretê qertafa dema bê **“ê”** yê bi peyva pêşîya xwe ve dide nivîsandin.

Komxebatê di derheqê dema bê (dahatû) de ev pêşnîyar kirîye:

*“Di nivîsîna dema dahatû da, divê ku pirtika **“bi-”** yê bihê nivîsîn. Di zimanê nivîskî da, **nenivîsîna wê ne rast e.**”*

**“Nimûne:”**

**“Awayê rast                  Awayê nerast**

Ez dê **biçim.**                  Ez dê çim.

Ez dê **bikim.**                  Ez dê kim.

Ez dê **bixwim.**                  Ez dê xwim.

Ez dê **bikujim.**                  Ez dê kujim

Ez dê **bigirim**.            Ez dê *girim*.

Ez dê **bimeşim**.            Ez dê *meşim*. “

**Heman Komxebat van mînakan jî dide:**

“Her çî lêkerên nesade ne, -ji bilî lêkerên mîna “çêbûn” û “çêkirin”ê- **bêyî** “bi-”yê **dihênnivîsîn**. “

**“Nimûne:**

Ez dê *dagirim*.

Ez dê *rawestim*.

Ez dê *vexwim*.

Ez dê *vegerim*.

Ez dê *rûnim*.”

**Lazime Komxebat, sedemê nenivîsandina qertafa dema bê “bi”yê îzah bike.**

**Gelo ku mînakên li jêr waha bînin nivîsandin çênabe?**

Ezê *bi-dagirim*.

Ezê *bi-rawestim*.

Ezê *bi-vexwim*.

Ezê *bi-vegerim*.



Ezê bi-rûnim.

Ezê di-dagirim.

Ezê di-rawestim.

Ezê di-vexwim.

Ezê di-vegerim.

Ezê di-rûnim.”

Fikra min eve ku lêkerên bi “*da-, hil-, ra-, rû-, ve-, wer*” yê bên afrandin, qertafên “*di*” û “*bi*” yê di pêşîya lêkerêde bên nivîsandin, sergêjî nemîne.

#### **Komxebatê di derheqê lêkerên ne sade de waha pêşnîyar kirîye:**

*“Ev cureyên lêkeran ji pêşgiran (da-, hil-, ra-, rû-, ve-, vê-, wer-) û lêkerên sade pêk dihên. Bi serê **xwe tu maneya van pêşgiran tune ye**. Loma di rastnivîsîna vî cureyê da, qayîdeya sereke ew e ku divê pêşgir **bi tu awayî ji lêkerên sade nehên veqetandin** û hertim bi wan va bihên nivîsîn.”*

*“Lê kategorîyeke din ya bêjeyên din+lêkera sade heye ku di esilê xwe da hejmareke lêkeran ya zêde nakeve ber. Hêmanên ku lêkerên weha pêk diînin, di proseseke leksîkalîzebûnê ra derbas bûne û li gel lêkerên sade êdî bûne yekparçe. Divê ew wekî leksemên nû bihên dîtin. Loma divê ku ev hêmanên lêkerî hemû bi hevûdin va bihên nivîsîn.”*

**“Nimûne: Çêbûn, çêkirin, berdan, derxistin, derbûn, derketin, derxistin”**

Komxebat di derheqê lêkerên “**nesade**” de tevlihev kirîye. Di vî warî de îzahatek jî nekirîye. Di vegotîna de pêşnîyar kirîye ku “**bi tu awayî ji lêkerên sade nehên veqetandin** û hertim bi wan va bihên nivîsîn.” Lê di van mînakên ku Komxebatê dayîn de qertafa dema niha “*di*” êxistîye di navbera

(*da-, hil-, ra-, rû-, ve-, vê-, wer-*) û lêkerên sade de. Gelo komxebat wateya “**bi tu awayî**” bi çi mexsedê nivîsîye?

Ma nelazimbû ku Komxebat, mînakên “**çêbûn, çêkirin, berdan, derxistin, derbûn, derketin, derxistin**” dayîn îzah bike. Ka yê çawa bêne nivîsandin.

**Gelo mexseda komxebatê kîjan ji vanên li jêr e?**

**Çê-bi-bûn, çê-bi-kirin, ber-bi-dan, der-bi-xistin, der-bi-bûn, der-bi-ketin, der-bi-xistin**”

An jî: **bi-Çêbûn, bi-çêkirin, bi-berdan, bi-derxistin, bi-derbûn, bi-derketin, bi-derxistin**”

Divê Komxebat, bi zanyarî vê mijarê jî îzah bike.

Hevokên komxebatê nayên fêhmê. Di vê derheqê de ezê çend mînaka bidim, Hûn hevokên wan şirove bikin û binixênin.

“Ziman di axaftinê da û di nivîsînê da bi awayên cuda dîyar dibin. Ji ber wê ye ku meriv **wekî dipeyive, nanivîse**

“Loma dihê gotin ku **axaftin zimanek e ji bo guhan e** û nivîs jî zimanekî din e ji bo çavan e”

“Ji bo nivîsîneke baş, birêkûpêk, fêambar û her weha ji bo berlêgirtina tevlihevî û sergêjîyan qayîdeyên zelal -çi yê ku xwe bispêrin rêzimanê, çi jî yê ku xwe bispêrin hevîkirî û lihevîkirinê- şert in.”

“Her çî nivîsîna rêbereke rastnivîsînê ye, ji bo wan zimanan hêsantir e ku di warê qayîdeyên rastnivîsînê da lihevhatinên wan yê civatî hene.”

“Her çî kitêbên dersan in jî bi cudayîyan va mişt in.”

*“Di nivîsîna kurmancîyê da qayîdeya giştî ew e ku lêker ji parçeyên **axaftinê** yên din cuda dihên nivîsîn.”*

*“Her çî bilêvkirina 23 nedengdêrên alfabeya kurmancîyê ye, bi vî awayî dihê kirin:”*

*“**Kopula di kurmancîyê da** li gel parçeyên axaftinê yên din (parçeyên ku bi dengdêran diqedin û nedengdêran diqedin) weha dihê nivîsîn”*

*“Her çî **alfabeya kurmancîyê ya herfgotinê** ye, ango alfabeya herf bi herf gotinê ye, maneya wê ew e ku gotinek herf bi herf û her herfeke wê jî bi alîkarîya navên merivan dihê bilêvkirin”.*

*“Herfên ducare yên bêjeyên ji zimanê erebî, di kurmancîyê da bi herfekê dihên nivîsîn. Ji ber vê yekê ye ku kurmancîya van bêjeyên ji zimanê erebî weha dihê nivîsîn:”*

*“Herfên bêjeyên zimanên ewropayî yên ducare jî di kurmancîyê da dibin herfek.”*

*“Gava ku bêjeyeke nû bi pêşgirekê bihê çêkirin û ew pêşgir her bi herfa destpêka morfema sade biqede, divê ku herfa ducare bimîne.”*


*“Di xwendinê da, gava ku meriv çav li wê bikeve, divê ku raweste.”*

*“Ez ji ber van tiştên xerab jî wî bajarî ji bîr nakim.”*

*“Di saet dehan de”*

*“Kîjanî ji wan ji te ra got?”*

## Kovareke derûnnasiyê bi kurdî: Psychology Kurdî



Hejmara nû ya (Îlon-Cotmeh-Mijdar-Kanûn) Kovara Derûnnasiyê “Psychology Kurdî” derket. “Psychology Kurdî” yekem Kovara Derûnnasiyê Kurdî ye û wek di çar mehê de yek derdikeve.

Yekem Kovara Derûnnasiyê “Psychology Kurdî” bi hejmara xwe ya 4em derket pêşberî xwendevanên xwe. Kovara derûnnasiyê dosyayeke derbarê “ziman û derûniya perwerdehiyê” bi xwendevanên xwe re parve dike. Edîtoryaya kovarê derbarê hejmara 4em wisa dibêjin;

Silav gelî xwendevanên hêja,

Weke ku hûn jî dizanin di ragihandinê de tiştê herî girîng ziman e. Armanca me ya sereke ew e ku em bi zimanê xwe hevdu fêhm bikin û bi zimanê xwe, rê li ber wê vekin ku kesekî/e kurd çû cem derûnnasekî xwe lal hîs neke. Em bikaribin platformekê ava bikin ku hemû lêkolîner, akademîsyen û derûnnas û hwd. derbirînen xwe binin zimên. Mixabin ev xebateke dijwar e û em nabêjin di vî karî de kesek di ser me re nîn e lê em dixwazin bingehekê deyin. Ji xeynî vê jî nivîsên ku di warê derûnnasiyê de hatine nivîsîn bigihîjînin hev. Li gel van armancan em bikaribin “psychology” bi kurdî bi kar binin û di vî warî de dewlemendiya kurdî derbixin holê.

Di ser xebata Psychology Kurdî re salek derbas bû. Bi vê hejmarê re em bi hev re saleke nû pêşwazî dikin. Ji ber eleqeya we em spasdar in. Di vê hejmara xwe ya nû de weke dosyayekê bi giranî em li ser ziman, xweza û girîngiya zimên, duzimanî û derûniya perwerdehiya bi zimanê dayîkê rawestiyan. Ji bo xwendavanên hêja hejmareke dewlemend amade kiriye. Di vê hejmarê de nivîsên curbicur û balkêş hene; Prof. Dr. Jan Îlhan KIZILHAN bi nivîsa xwe ya “Pêwistiya Çareserîya Dîrokî û Derûniya Trawmayê” bi zimanekî zanistî û lêkolînan li ser şidet, trawma, trawmaya nifşî, takekesî û ya hevpar radiweste.

Doç. Alk. Dr. Duygu CANTEKÎN bi nivîsa xwe ya “Tendirustiya Derûnî ya Penaberên Sûrî”yê cih dide lêkolîna xwe ya ku li ser tendirustiya derûnî ya penaberên Sûrî yên li Tirkîyê û agahiyên derbarê van penaberan de bi me re parve dike. Vecdi DEMİR bi nivîsa xwe ya “Li ser Tepisandinê” nasîna tepisandinê dike û bi çavekî derûnkolînerî li ser temsîlên tepisandinê, pêvajoyê û qonaxên wê radiweste.

Derûnnas Mihemed Elî ALÛCÎ bi nivîsa xwe ya “Bi Çavekî Derûnkolînerî ‘Xwe’bûn û Nasname”yê avakirina nasname û ‘xwe’bûnê rave dike û pirsgirêkên wê bi nêrîneke derûnkolînerî bi xwendevanan re parve dike. Bi nivîskar, zimanzan û lêkoler Deham EBDULFETTAH re me hevpeyvîneke balkêş li dar xist. Di vê hevpeyvînê de em li ser girîngiya zimanê bavûkalan, derûnî û rola zimên rawestiyan.

Luqman GULDIVÊ bi nivîsa xwe ya “Helwêsta Beramberî Ziman û Tecrûbeyên Erênî” behsa xweza û guhestina zimên û helwêsta beramberî zimên dike û girîngiya zimanê dayîkê ji xwendevanan re rave dike. Derûnnas Darius WINZER bi nivîsa xwe ya “Li Ser Zimanê Zikmakî” behsa lêkolînan ku li ser zimanê dayîkê hatine kirin dike û rola zimanê zikmakî bi xwendevanan re parve dike. Derûnbijîşk Dr. Azad DILDAR bi nivîsa xwe ya “Zarokên Bêziman” pênaseya zimên vedibêje û pêşketina zimanê zarokên pêşdibistan û dibistanê, bandorên nêyînî yên perwerdehiya ne bi zimanê dayîkê, duzimanî û nîvzimanîyê bi me dide nasîn.

Mamosteyê perwerdehiya taybet Wehab ŞEHÎN bi nivîsa xwe ya “Girîngiya Perwerdehî û Hîndekariyê ji bo Astengdaran” armanc û girîngiya perwerdehiyê ji bo kesên astengdar bi xwendevanan re parve dike. Prof. Dr. Cem KAPTANOĞLU bi hevpeyvîneke têr û tijî ya li ser

“Derûndermaniya Alîkar” bi me re ye. Derûnnas Samed DOĞAN bi nivîsa xwe ya “Depresyon”ê sedemên depresyonê, nîşêt, vexuyanî û cureyên wê û dermankirina wê ji xwendevanan re dide nasîn.

Xwendekara Beşa Derûnnasiyê Jiyan AY bi nivîsa xwe ya “Ceribandina Milgram”ê behsa rê û rêbazên ceribandina Milgram dike û hêza rewşê ya li ser reftariyan vedibêje. Derûnnasê Klinîkî û Terapîstê Zayendî Murat CAYMAZ bi nivîsa xwe ya “Jiyana Zayendî û Mafên Zayendî”yê behsa tendirustî û mijara zayendî, têkiliyên zayendî û danezana mafên zayendî dike. Ji bilî van nivîs û nivîskarên hêja, di vê hejmarê de danasîna kurte-fîlmê derhênêr Kadir EMAN û Velit ATAKLI ê bi navê “Baskên Şikestî” jî em bi we re parve dikin ku ev kurte-fîlm di hêla peyamên civakî û hezkirina ajalan û kesayetiya mirovan de pir bi angaşt e.

Navnîşanên Ragihandina Kovara Psychology Kurdî

Facebook: <https://www.facebook.com/psychologykurdi>

Instagram: <https://instagram.com/psychologykurdi>

Twitter: <https://twitter.com/psychologykurdi>

## Munaqeseyê “Lehçe” û “Ziwan”î de Problemî

*Roşan Lezgîn*

Munaqeseyo ke derheqê “lehçe” û “ziwanî” de beno, yan zî rasterast ma vajin derheqê “zazakî” û “zazayan” de beno, newe yo. Tarîx de ma rastê munaqese yan fikrêkê winasî nêbenê. Xora no munaqese delîlanê tarîxî ser o nêbeno. Ancî kulturî ser o, nasnameyî ser o; xohîskerdiş, xonamekerdiş û xotarîfkerdişê şarî ser o zî nêbeno. Hîna zaf kategorîzekerdişê ziwanî ser o karakterê propaganda de aver şino.

“Propaganda” çî ya? Propaganda sey enstrumanêkê polîtîkî, bi mesajan komelî (*toplum*) goreyê fikrêk ra manîpule kena û îqna kena. Yanî xo rê yew hedef tayîn kena û seba ke bireso meqsedê xo, her tewir metodî ceribnena.

Derheqê metodê propaganda de ez wazena yew nimûne bidî. Seserra vîyartîye de munaqeseyê “kurdî estê yan çin ê” bîyêne. Hîna zaf tirkan no munaqese kerdêne. Destpêk de, seba ke nê munaqeseyî rê çimeyêko îlmî îcad bikerê, 1918 de kitabêk bi nameyê “**Kürtler: Tarihi ve İçtimai Tetkikat**” hetê *Osmanlı Muhacirin Müdüriyet-i Umumisi* ra weşanenê. Nuştoxê nê kitabî qaşo Dr. Friç o, û Habîl Ademî zî almankî ra tadayo. Hetanî serranê 1980an zî no kitab sey “referansêkê îlmî” nîşan dîyayêne. La dima eşkera bi ke nuştoxê kitabî Teşkilatê Mexsusa ra yew kadroyê Îttihad Teraqî yo, nameyê ey Nacî Îsmail Pelister o. Ey bi xo no kitab bi tirkî nuşto. Herhal wina fikirîyayê, weşanayîşê kitabî bi nameyê ewropayîjêk ke wayîrê tîtrêkê akademîkî yo, hîna zaf qebul vînenê, ci ra yeno bawerkerdiş.

Derheqê kitabê M. Şerîf Firatî “**Doğu İlleri ve Varto Tarihi**” de zî supekulasyonî estê ke qismêko muhîm yê nê kitabî ey nênuşto.

Eynî bi no qayde, qismêk merdimê ke munaqêşeyê derheqê zazakî û zazayan de nameyê înan vîyareno de zî şubheyê cidî este. Nînan ra derheqê **Xeyrî Başbuğî** de, derheqê **Ebubekir Pamukçuyî** de zaf spekulasyonî benê. Mesela, yew şîra tirkî ya Ebubekir Pamukçuyî wina ya:

**“Ben Kimim**

*Ben **Oğuz** um, be **Oruc**’um*

*Mertlerin beyi, **Osman**’im ben*

*Çaldıran’da Ridaniye’de, Mekke’de*

*Müslümanlar’ın beyi **Yavuz**’um ben*

*At üstünde **Mustafa Kemal**’im ben*

*Adımız **Türk***

*Dilimiz **Türkçe***

***Türk**’üm, **Türk**’üm ben”*

Gelêk balkêş o, merdimêko wayîrê nê hîsîyatî dima wirzene beno serkêşê zazakî û zazayan! Helbet nê vurîyayîşî rê yew îzehet lazim o. Gelo heqîqeten vurîyayo yan nameyê tirkîstîye ser o fealîyetê xo sey wezîfedarêk dewam kerdo? Na nuqta meşuk a.

Na tarîti û xumamîye dezgeyan ser o zî esta. Mesela, derheqê **“Zaza Kültürü Yayınları”** ke kitab û broşurî weşanayê de melumat çin o, dezgeyêko nimite yo. Ancî, ge-ge tora înternetî ser o vilawekê (bilidiri) basîti û bêsewîyeyî vila benê, bin de **“Zaza Ulusal Hareketi”** nusîyeno. La no hereket key, kamca, çi wext ronîyayo, hetanî nika se kerdo, program û tuzukê xo çi yo, hedefê xo çi yo, kes çiyêk nêzano. Esto yan çin o, bellî nîyo.

Tora înternetî ser o bi sernameyê **“Diyarbakır’dan bir Zazaca Alevi metni”** yew meqale şeklê dosyaya pdf de esta. Ser o nuşte yo ke Fexrî Pamukçu na meqale înglîzkî ra tadaya tirkî. Îdîa beno ke



Mustefa Dehqanî na meqale nuşta. Seba nuştoxî binê meqale de îbareyê “*bağimsız bilim insanı, Iran*” nuşte yo. Meqale de behs beno ke yew destnuştayê zazakî ke hetê kesêkê elewî yê bi nameyê Sultan Efendî ra nusîyayo Dîyarbekir de sehafêk ra kewto destê ey. Mustefa Dehqan vano, no metn 1798 de nusîyayo û 32 rîpelî yo. Meqale de behsê nê metnî beno la metn bi xo çin o! Hetanî nika zî îsbat nêbîyo ke metnêko winasî esto. Cêrnotêkê na meqale de behs beno ke “*Sponsorê nê cigêrayîşî Weqfa Îlmî ya Neteweyî ya Îranî*” ya. Yanî meqale bi sponsorîye amade bîya. Meqale de, tarîx de şêxanê sunîyan ke bi kurdî metnê dînî nuştê, bi sextekarî îtham benê. La îhtîmalêko pîl na meqale bi xo yew sextekarî ya.

Meqale û nuştayê ke derheqê zazakî û zazayan de nusîyayê, zafê înan de tehrîfat esto; dîyardeyî, kelîmeyî tehrîf benê. Tayê dîyardeyê sabîtî estê ke qet behsê înan nêbeno. Sey nimûneyî, zafê zazayan xo ra vanê “kird”, zıwanê xo ra zî vanê “kirdkî”, heta kitabo tewr verên ke zazakî nusîyayo nameyê xo *Mewlidê Kirdî* yo. Labelê kesê ke nê munaqeseyî kenê qet behsê nê nameyî nêkenê.

Nê munaqeseyî de problemêko cidî zî no yo ke kesê bêehlîyetî, bêeleqeyî zaf zêde ra kewenê mîyan, xo tede tetmîn kenê. Sey nimûneyî, Alî Kemal Özcan doçent o, Unîversîteya Mamekîye de xebitîyeno, werîsto derheqê zazakî de meqale nuşta, kitabê sempozyumê Unîversîteya Çewlîgî de daya weşanayîş. Sere de îdîa keno vano, *na xebatêka akademîk a, datayê (veri) zanistî ke kes nêşkeno red bikero, ez ana meydan*. Û 200 tene çekuyî panc estunan de; yanî tirkî, kurmanckî, zazakî, înglîzkî û almankî de dayê têver. La çekuyan de tu sîstematîk çin o; tayê estê name yê, tayê estê fîil ê, tayê zî fermanê raweyî de fîilî şuxulnayê. Kurmanckî û zazakî de, tu çeku yan têvernayîşê înano rast çin o, xora çekuyî pênegênê. Mesela, estuna zazakî de “**kıştayış**” nuşto, kurmanckîya ci “**Hatın kuştın**” nuşto. Kurmanckî de “**Dê, dayik**”, vera ci de “**ma**” nuşto. Estuna kurmanckî de “**Bav**”, vera ci de “**pî**” nuşto. Kurmanckî de “**Bikuj, kujandin**”, zazakîya ci “**kıştene**” nuşto. Peynî de vano, *mi tesbît kerd ke kokê % 51ê çekuyanê zazakî û kurmanckî cîya yo. Bi no qayde mi îsbat kerd ke zazakî yew zıwano cîya yo*.

Nê munaqeseyî de, exlebê xo seke Alî Kemal Özcanî kerdo, zazakî û kurmanckî ra *tayê çekuyanê izoleyan* wina keyfî û bi hawayêko xelet danê têver, tayê ferqan vejenê meydan û lebitîyenê ke zazakî sey “ziwanêkê cîyayî” nîşan bidê. Kîştê naye de, ge-ge behsê yewbînan ra “*fehmnêkerdiş*”ê kurmancan û zazayan zî beno.

Eke zazakî yew ziwano xoser û cîya yo, ganî tarîx de yew ziwano bi nameyê “zazakî” estbîyêne û zazayî zî tewr tay qasê kurdan yew mileto xoser û cîya bîyêne! Yanî wayîrê tarîxêkê cîyayî, wayîrê cografyayêka cîyaye ke bi nameyê zazayan name bena, wayîrê kulturêkê cîyayî, ancî gereka zazayî wayîrê nasnameyêkê milî yê xoserî bîyêne. La ne tarîx de ne zî ewro tu emareyêk, tu îşaretêk ke nê çîyan nîşan bido çin o. Mesela, ma qet tarîx de nêvînenê ke sey millet behsê zazayan bîyo. Ne zazayan xo ra vato ma milletêko cîya yê ne zî teber ra kesî vato. Eksê naye, heme çimeyan de behs beno ke zazayî yew qebîle yan zî eşîra kurdan ê.

Helbet tarîxê nuşteki, belgeyê arkeolojîki zaf muhîm ê, la tarîx tena çîyo ke seyahan, mîsyoneran, weqanusan, katiban yan zî akademîsyenan nuştî nîyo. Tarîxê fekkî, mavajin rîwayetî, efsaneyî û heme eserê folklorîki yê milletêk zî zaf muhîm ê. Mîyanê folklorê zazayan de yew emare, yew vatiş yan temayul ke zazayan sey milletêkê cîyayî nîşan bido, o zî çin o. Eksê naye, çiqas efsaneyî, estanîki, vateyê verênan, îdyomî heta bi lorîgê zazayan, kurdanê bînan reyde muştêrek ê. Coka no munaqêşe hetêk ra fantastîk aseno; munaqêşeyêko viraşte û sînî yo, zemînê xo heqîqî nîyo.

Munaqêşeyê derheqê “zazakî” û “zazayan” de, xususîyetêko muhîm, seke problemê zazayan tena kurmancan reyde esto, coka hertim vera kurmancan de bi hawayêko zaf mubalexe muxalefet beno. Yanî kesê ke vanê “zazakî ziwaneko xoser o” çekuya “kurdki” teşmîlê kurmanckî kenê û muxalefet kenê. Mesela, belkî çarine ra yewê zazayan ancax kurmanckî bizanê û fehm bikerê. La heto bîn ra, tamamê zazayan tirkî zanê. Zazayê ke kurmanckî fehm kenê yan zî qisey kenê, netîceyê asîmîlasyonêkê organîzekerdeyî de nêmusayê. Zazayê ke kurmanckî zanê, mîyanê cuya rojane de bi hawayêko tebîî musayê. Mesela, ez bi xeyretê xo yê şexsî kurmanckî musaya. Yanî yew dezgeyê kurmancan ke ronîşo, qerar bigîro, vajo ma zazayan asîmîleyê kurmanckîye kenê, ne tarîx de estbîyo ne zî ewro esto. La musayîşê tirkî wina nîyo! Zazayî zî kurmanckî zî netîceyê polîtîkaya milletê serdestî de, bi plan û program ziwane xo ra dûr kewtê û tirkî musayê. Labelê nê munaqêşeyî de na perse nêpersenê ke nê zazayî senî, bi çî metodî, netîceyê kamcîn polîtîkayan de tirkî musayî. Vera asîmîlasyonê tirkî de, vera polîtîkayanê dewleta tirkan de tu îtirazêk yan zî qayîlnêbîyayîşêkê nê kesan çin o. Tam eksê naye, kesê ke nê munaqêşeyî kenê, bi asîmîlebîyayîşê zazayan seba tirkî zaf qayîl asenê. Coka se vanê wa vajê, vateyê înan sehîh nîyo. Yanî no munaqêşe hetêk ra zî sehîh nîyo, heqîqî nîyo.

Munaqeseyê derheqê “zazakî” û “zazayan” de yewna xususîyet zî no yo ke, vera kesanê ke zazakî aver benê, nusenê, edebîyatê zazakî anê meydan de muxalefetêko bêedeb beno. Mesela, tayê merdimî bi nîk-nameyanê cîya-cîyayan, networkanê sosyalî yê sey Facebookî de vera aktîvîstanê ke zazakî aver benê de hertim vateyanê teberê exlaqî de vanê, nengan çînenê. Bi tirkî qisey kenê yan zî nusenê, vanê “zazakî ziwaneke cîya yo” la kesê ke zazakî qisey kenê û nusenê û edebîyatê zazakî anê meydan rê zî dişmenîye kenê.

No munaqese de tayê çî estê, zaf mubalexe benê. Sey nimûneyî, bitaybetî xerîbanê ke derheqê zazakî de çîyê nuşto, nameyê hemîne rêz kenê û vanê “nê alimî” yanî “*bilim adamları* vanê zazakî ziwaneke xoser o”. Tîtrê înan çî beno wa bibo, merdimanê xerîban çî nuşto, bêteredut vanê “no îlmî yo”, yanî “*bilimsel o.*” Îlm çî yo, *bilim* çî yo, nuşte senî beno îlmî, yan zî yew merdim senî beno alim, senî beno *bilim adamı*, qet hewce nêvînenê ke îzeh bikerê.

Mesela, **C. M. Jacobson, Eberhard Werner, Brigitte Werner** ke nê munaqeseyî de nameyê înan vîyareno, dezgeyanê mîsyonerîye reyde hemkarîye kenê. Seke yeno zanayîş alemê xirîstîyanîye de mîsyonerîye edetêko kan o. Merkezê fealîyetanê mîsyonerîye de tadayîşê *Încîlî* bi heme ziwananê dinya esto. Yanî wazenê ke *Încîlî* bitaybetî tercumeyê ziwananê grûbanê zeîfan bikerê û *Încîlî* ser o xirîstîyanîye vila bikerê yan zî xirîstîyanîye sempatîk nîşan bidê. Seba naye dezgeyî ronîyayê. Nê dezgeyî hîna zaf ziwannasan û akademîsyenan reyde hemkarîye kenê, înan ra ardim gênê. Mesela, Maurizio Garzoni (1734-1804) ke reya verêne gramerê kurmanckî (**Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda**) ey nuşto, nê tewir merdiman ra yo. Seba ke kurmanckî bimuso, qasê vîst serrî mîyanê kurdan de ciwîyayo. Ancî, Andranîk ke bi nameyê “**Dêrsim, Raywanîye û Cografya**” yew kitab nuşto, o zî mîsyoner o.

Dezgeyê mîsyonerîye, melumato ke danê arê, sey *data-bank* (*veri bankası*) arşîv kenê. Mesela, dezgeyê sey **Ethnologue Languages of the World, SIL (Summer Institute of Linguistics)** û **Joshua Project** nînan ra çend heb ê. Xebata Eberhard Wernerî ke derheqê tercumekerdişê *Încîlî* de ya, û tede behsê tercumekerdişê *Încîlî* bi zazakî zî esto, keyepelê **Ethnologue** de mîyanê referansan de ya.

Helbet kesê xerîbî ke zazakî ser o xebitîyayê heme girêdayeyê dezgeyanê mîsyonerîye nîyê, cigêrayox yan akademîsyenê cîya-cîyayî zî zazakî ser o xebitîyayê. La qismêko muhîm yê kesanê ke

zazakî ser o xebitîyayê û hertim sey *“bilim adamları”* behsê înan beno, bi taybetî kesê almanî, eşkera yo ke dezge yan zî weşananê mîsyonerîye rê xebitîyenê.

No munaqeşe de çîyo balkêş no yo. Kesê ke dezgeyanê mîsyonerîye rê xebitîyenê, tim têkilîya înan û kesê ke vanê *“zazayî kurd nîyê”* esta. Na têkilîye de her di hetî zî yewbînan weye kenê. Kesê ke vanê zazayî kurd nîyê, seba ke tezanê xo rê bingeyêko akademîk virazê, yan zî fikrê xo bi fekê akademîsyenan bidê vatiş, xo resnenê nê kesan. Tabî akademîsyenî zî seba ke melumat bidê arê, hewceyîya înan bi merdimanê winasîyan esta. Nînan ra êyê ke ma zanê, **Ludwing Paul, Jost Gippert, Eberhard Werner, Brigitte Werner** û beno ke hema zaf kesan netîceyê na têkilîye de dest bi xebata zazakî ser o kerda. Ancî **C. M. Jacobson** zî bi no qayde yo. Derheqê zazakî de di kitabê ey estê. Her di zî fekê Dêrsimî de yê. Heqîqeten nê kitabî ey nuştê? O hende baş kirmanckîya Dêrsimî zano? Ez şubhe de ya! Kesê ke dezgeyanê mîsyonerîye rê xebitîyenê, eleqeyê înan hîna zaf bi elewîyan sînorkerde yo. Ez vana qey wina bawer kenê ke fealîyetê mîsyonerîye mîyanê elewîyan de hîna rehet beno coka hende bala înan fekê Dêrsimî ser o ya.

Helbet heqê her kesî esto ke zazakî ser o bixebitîyo, binuso, fikrê xo çî beno wa bibo, eşkera vajo yan binuso. La ganî ma zî bala xo bidin ser ke, nê kesî bi kamcîn saîqî zazakî ser o xebitênê. Yê diyin, verê verkan gereka ma vate yan zî nuştayê înan baş fehm bikin, analîz bikin, test bikin ke hela çiqas rast yan xelet o. Mesela, tayê xebatê ke hetê xerîban ra bîyê şefaf nîyê. Mi behsê nuştayê Mustefa Dehqanî kerdbi. La yewna numûne zî nuştayê **Jost Gippertî** yo. Destpêkê meqaleya xo de vano *“Tayê embazê ke tîya amade yê, bîyî sebeb ke ez verê xo bidî nê ziwani ser. Nêzdîyê serrêk o ke ma pîya gramere nê ziwani tetkîk kenê.”* Nameyê nê embazan çî yo, kam ê, çî kes ê, dîyar nîyo. Madem xebata ey *“îlmî”* ya, qey nameyê hemkaranê ey nimite bo? Îlm de çîyo nimite yan zî nimitişê çîyan çin o.

Meqaleyê ke akademîsyenan derheqê zazakî de nuştê, zêde tetkîk nêbîyê. Yanî test nêbîyo ke îdîayê înan çiqas rast yan çiqas xelet ê. Xora meqaleyanê kesanê xerîban de bi hawayêko qetî îdîa nêbeno ke zazakî ziwaneko xoser û zazayî zî kurd nîyê. Eksê naye, mesela, Ludwig Paul vano *“Di varyantê ziwaneke hetê kulturî ra beno ke her yew sey lehçeyêk tarîf bibê, hetêk ra zî beno ke temamen sey ziwaneke xoserî tarîf bibê.”* Paul dewam keno vano, *“Persa ‘ziwan’ û ‘lehçe’ tarîfkerdiş û taybetîyan*

*ra girêdaye qismen keyfî ya.*” Yanî yew tarîfo sabît û îlmî ke bi hawayêko qetî “ziwan” û “lehçe” cêra bikero, çin o.

Feraza, ma vajin ke îlm de terazî, mêzîn yan zî formulêk esto ke eşkeno “ziwan” û “lehçe” cêra abirno. A game, gereka tena çekuyan ser o ney, sîstemê ziwani analîz bibo. Yanî seba ke bêro zanayîş zazakî û kurmanckî di ziwane xoserê cîya yê, yan di qolê ziwaneêk ê, ganî bi hawayêko tekuz her hetan ra hem zazakî hem kurmanckî komple bêro şinasnayîş. Verê verkan, ganî heme kelîmeyê zazakî û kurmanckî bi heme versiyonanê xo qeyd bibê. Dima ganî sîstem û xususiyetê ziwani yê zazakî û kurmanckî cîya-cîya tam tesbît bibê. Û warê fonolojî, morfolojî, sentaks û leksikolojî de; yanî hetê vengî ra, hetê kokê çekuyan ra, hetê gramerî ra, hetê şuxulîyayîşê ziwani ra, hetê nêrkî, makî û zafhûmarîye ra, hetê oblîkîye ra, hetê ergatîvîye ra... xulasa çiqas xususiyetê ziwani estê, heme hetan ra zazakî û kurmanckî bêre pêveronayîş. Neke tena zazakî û kurmanckî, ganî zazakî bi heme lehçeyanê kurdkî bêro pêveronayîş, muqayese bibê. Yanî tena bi pêveronayîşê *çend çekuyanê izoleyan* ne ferqê cîyayî yê zazakî û kurmanckî fehm benê, ne muşterekîya înan fehm bena, ne zî ziwانبîyayîş û lehçebîyayîşê înan tesbît beno.

Mesela, Alî Kemal Özcan xebata xo de zazakî de çekuya “**cuwen**”î kurmanckî de bi çekuya “**bênder**”î dano têver. Çekuya “**bênder; beydere (m)**” erebkî ya. Kurmancê Botan, Behdînan û Hekarya vanê “**cuxwîn**”. La kurmancê hetê Dîyarbekirî, yê Berîya Mêrdînî vanê “**bênder**”. Eke xebera merdimî çekuya “**cuxwîn**” ra çin bo, tena çekuyê “**cuwîn**” û “**bênder**” bêre têvernayîş, do îdîa bibo ke nê di ziwane cîya yê. La wina nîyo, çekuya “**cuwîn**” û “**cuxwîn**” eynî yê, yew zazakî, a bine kurmanckî ya.

Zilfî Selcan zî tezê xo de di cumleyî nimûne nîşan dayê, vano:

“**Zazaca:** Ez son mali. ‘Ben davara gidiyorum.’

**Kurmancca:** Ez terım mal. ‘Ben eve gidiyorum.’”

Zilfî Selcan, bi nê di cumleyan zazakî û kurmanckî cêra keno! La her di cumleyê ey zî xelet ê. Wexto ke nimûne bi no qayde xelet bo, êdî hewce nêkeno merdim halê tezî ser o zêde qisey bikero. Mesela, eynî îbareyî Licê de wina benê:

**Zazakî:** “Ez şina verê dewarî.”

**Kurmanckî:** “Ez diçim malê.”

Licê de çekuya “mal”î tena manaya “mal-milk-keye” de ya. La Dêrsim zî tede hetê Serhedî de, neke tena zazayî kurmanckî zî dewarî ra vanê “mal”. Kurmanckê ê cayan hem keye ra vanê “mal” hem dewarî ra vanê “mal”. Heta ke tirkî zî dewarî ra vanê “mal”. Mesela, tirkî de îdyomê “mal mal bakmak” yan zî “mal gibi bakmak” estê. Yê diyin, karê “şiyene” yê zazakî kurmanckî de “çûyîn” o. Zafê kurmanckan vanê “Ez diçim malê.” Cumleya Zilfî de fîlê “diherim” sey “terim” xelet nusîyayo. Herçiqa Zilfî nê di cumleyî dayê, o zî sey xebatanê bînan tena çekuyan ser o vindeno, behsê manaya cumle keno. Mesela, behsê sentaksê her di lehçeyan nêkeno. Yanî nêvano rêzbîyayîşê *kerdox*, *fîl* û *obje* hem zazakî de hem kurmanckî de sey yewbînan ê.

Na xeşimî û xamîye, yan zî no tehrîfato ke îdîyanê Zilfî Selcanî û Alî Kemal Özcanî de esto, esas heme nuşte û îdîyanê nê munaqeseyî de esto. Temamê lîteraturê na mesela de hertim seqetîye, çiyê ke pênegênê estê.

Meselaya “yewbînan fehmênkerdiş”ê zazayan û kurmanckan zî meselayêka subjektîv a. Çünke “fehmkerdiş” yan “fehmênkerdiş” krîter yan zî qîyasêko îlmî û sabît nîyo. Yanî merdim biwazo fehm keno, nêwazo fehm nêkeno. Hetêk ra zî, no problem rewşa komelî ya psîko-sosyalîye ra girêdaye yo, helbet îhtîyac zî zaf muhîm o. Mesela, seba ke merkezê Pîran û Hênî de kirdkî qisey bena, şarê dorê nê her di qezayan ke kurmanckê, kirdkî zanê. La Licê û Pasûr wina nîyê. Merkezê Licê û Pasûrî kurmanckê, coka kurmanckê Licê û Pasûrî kirdkî nêzanê. La pêro nêbê zî zafaneyê kirdanê nê doran kurmanckî zanê. Heto bîn ra zazayê Licê, Pasûr, Pîran, Hênî, Gêl û ê doran kurmanckî fehm kenê la zazakîya Dêrsimî ra fehm nêkenê.

Belkî hezar serrî ra vêşêr o ke mîyanê kurdan de perwerde bi lehçeya kurmanckî beno. Yanî medreseyê kurdan heme bi kurmanckî bîyê. Ma vajin Mela Mehemedê Hunî, Mela Mehemedê Muradan, Mela Kamilê Puexî ke bi zazakî nuşt, hemîne medreseyanê kurmanckî de wendo. Yanî zaf verî ra, hezar serrî verê cû ra, lehçeya kurmanckî mîyanê kurdan de sey zîwanê tederîsatî, sey zîwanê resmî ca girewto. Mesela, Andranîk kitabê xo **Dêrsim** de vano: “Her eşîrêka înan wayîrê lehçeyêk a, la heme eşîrî yewbînan ra fehm kenê. Mîyan ra tayê vateyan zî fehm nêkenê. Gama ke

*yewbînan ra fehm nêkerd, dest bi kurmanckî kenê, çunke hetê hemîne ra fehm bena û ê nê ziwani sey ziwane resmî hesibnenê."*

Sey netîceyî, merdim eşkeno vajo ke munaqeseyê "lehçe" û "ziwan"î, yanî munaqeseyê "zazakî" û "zazayan" munaqeseyêko heqîqeten îlmî nîyo. Kesê ke nê munaqeseyî kenê zî homojen nîyê. Yanî munaqese hetê kesanê cîya-cîyayan ra beno. Hîna zaf tirkî, almanî, armenî û îraniyî nê munaqeseyî kenê. Her het, xo gore yew hesabê xo esto. Hesabê tirkan xora bellî yo. Hesabê farsan zî teqrîben maneno yê tirkan. Hesabê armenîyan, hîna zaf erdî ser o yo, çimê înan Dêrsim de yo. Çiyo ke almanan konsantre keno zî, fealîyetê mîsyonerîye yo. Coka xebata înan hîna zaf grûba elewîyan ser o ya, yanî ziwani ser o, bitaybetî fekê Dêrsimî ser o xebitîyenê. Kesê zazayî zî, cîya-cîya paralelê nê hetan de şuxulîyenê. Mesela, elewîyê ke vanê zazayî kurd nîyê hîna zaf nêzdîyê mîsyoneran ê, armenîyan reyde zî têklîye de yê. Zazayê sunî ke vanê zazayî kurd nîyê zî hîna zaf tirkan reyde xebitîyenê, nêzdîyê fikrê tirkperestîye yê, êyê ke îraniyan reyde xebitîyenê zî estê.

Xulasa bi nê munaqeseyê bêbingeyî, bi nê munaqeseyê bêserûberî, bi nê delîlanê sexteyan, bi nê tehrîfatî na saeta ra pey "yew millet" îcad nêbeno, xora derdêkê înano winasî zî çin o. Belkî hetanî dereceyêk hêşê çend masumanê nezanan lêl bikerê la peynîya xo çin a. Labelê wezîfeyê ma zî no yo ke, ganî ma nê munaqeseyî kaş bikin zemînêkê zelalî ser, bi şeklêko şefaf, bi delîlanê sehîhan, heqîqeten bi hawayêko îlmî bikin. No wezîfe her wextî ra vêşêr, ewro ma ser o ferz o.

\*Eno metn qiseykerdişêk o. Şûbeyê Eğitim-Senê Çewlîgî roja 17.04.2014 de salona Bingöl Kültür Merkezi de bi sernameyê "Zazakî Ziwan o yan Lehçe ya?" yew konferans organîze kerdbi. Eno metn qiseykerdişê nuştoxî yê enê panelî yo.

## Bo zimanê kurdî dewletek divê!

### *Demhat Alêşkî*

Niha wisa tê texmînkirin ku li dinyayê nêzîkî 6 000 zimanan hene. Lê roj bi roj hejmara zimanan kêmtir dibe. Di sedsala borî û vê sedsalê de ziman bi lezeke nedîtî dimirin.

Sebebê serekî ew e ku qisekerên zimanên biçûk dest ji zimanên xwe berdidin û dest bi bikaranîna zimanên mezintir dikin. Lê ji tiştê ji hejmara qisekerên zimanan giringtir jî ew e ka gelo zimanek xwedî dewleta xwe ya yan jî ne.

Zimanên bêdewlet bi leza bayî cih didin zimanên bidewlet. Roj bi roj zimanên kêmaniyê cih didin zimanê resmî anku fermî.

Berê zimanên resmî li meydana siyasî, aborî û zanistî û zimanên kêmanî jî di jiyana rojane de dihatin bikaranîn. Bo nimûne, gelek kurdan bi erebî, farisî yan tirkî dixwand, dinivîsî û guhdariya radyoyê yan temaşeyî televizyonê dikir lê dîsa jî li gel derdorên xwe bi zimanê xwe, bi kurdî diaxift. Lê êdî rewş diguhere û zimanê axiftina rojane jî bo nimûne li Bakurê Kurdistanê li gelek bajar û heta gundan jî dibe tirkî.

Bo rêgirtina li ber vê pêla zimankujiyê anku kuştina zimanê kurdî û serdestbûna zimanên dagirker li seranserî Kurdistanê, êdî qet ne bes e ku bo nimûne hin radyo yan televizyon bernameyên bi kurdî biweşînin. Ew jî ne têra nake ku hin rêveberiyên herêmî yan deverkî li gel zimanê dagirker, carinan hin tiştan bi kurdî jî biweşînin. Heta ew jî ne kafî ye eger xwandina dibistanan jî bibe bi zimanê kurdî.

Mixabin ti "mafên kultûrî" yan "mafên zimanî" jî têra nakin eger kurdî nebe zimanê resmî û zimanê serdest li wan deran yê ku kurd lê dijîn.

Pêla zimankuj ya nûjen dê di çend dehsalên bê de piraniya zimanên niha heyî bin-av bike û bixeniqîne û ew dê êdî li ser rûyê dinyayê neyên axiftin.



Tek rê û çareya ku kurdî ji vê pêla zimankuj rizgar bike ew e ku kurd bibin xwedî dewletekê yan çend dewletan ku tê de her tişt bi zimanê kurdî were kirin: jiyana rojane, perwerde, medya, aborî, qanûn, zanist û hwd.

Ev jî tenê bi rêya hebûna yek yan çend dewletên neteweyî bo kurdan bi cih tê.

Di vî warî de niha Başûrê Kurdistanê gavên giring avêtine û ber bi dewletbûnekê ve diçe û li wê dewletê zimanê serdest dê kurdî be.

Başûrê Kurdistanê bo zimanê kurdî bi taybetî devereke gelek giring e ji ber ku li wê derê teqrîben hemû lehceyên serekî yên kurdî tên axiftin:

- soranî (li parêzgehên Hewlêr, Silêmanî û Kerkûkê)
- kurmancî (li parêzgehên Dihokê û Deşta Nînewayê)
- feylî (li Xaneqînê)
- hewramî (li hin derên Helebceyê)
- şebekî / goranî (li hin derên Deşta Nînewayê)

Di rastiye de tek lehceya kurdî ya ku li Başûrê Kurdistanê peyda nabe, zazakî ye. Lê di rastiye de zazakî jî gelek nêzîkî hewramî û goranî ye ku li Başûrê Kurdistanê peyda dibin. Heta mirov dikare bibêje ku li Başûrê Kurdistanê hewramî û goranî nûneratiya zazakî jî dikin.

Hêvî dikim ku di demeke nêzîk de Rojavayê Kurdistanê jî bide ser rêya Başûrê Kurdistanê û li şûna komîn û komunîzmê, li rê û rêbazên gelê xwe û li kurdperweriyê vegere.

Herwiha hêvî dikim ku li Bakurê Kurdistanê jî kurd xwe ji partî û hêzên çepgir yên niha di nav kurdan de serdest rizgar bikin û di zûtirîn demê de vegerin ser xeta neteweyî û milletê xwe û zimanê xwe serbilind û serfiraz bikin.

## LÊKER (KAR) DI ZIMANÊ KURDÎ DE (4)

*Deham Ebdulfettah*

### BIRRÊ HEŞTEM

#### - Neyîniya Karan

- Ne
- Na
- Ni
- Me
- Têbînî

#### Neyîniya lêkeran

Hemî celebên karan di raweyên xwe yê resen de erênî ne. Wek:

- Min xwend, ez dixwînim, ez ê bixwînim...
- Tu çûyî, tu diçî, tu yê biçî.....

Di van mînakên de bûyerên (xwendin, çûn) bi şêweyekî eşkere û erênî bûne û dibin, yan jî ew ê bibin. Lê dema ku ew bûyer nebin, yan jî em nexwazin ku bibin, hingê em ê alavên neyîniya karan li pêş wan her du karan bixebitînin. Wek:

- Min nexwend, ez naxwînim.....
- Tu neçûyî, tu naçî.....

Alavên neyîniya karan di Kurmanciya Jorîn de ev in:

(ne, na, ni, me). Her alavek ji van alavan, li gora cor û demên karan, dikeve ser wan û neyîniya wan pêk tîne. Anku, ev alav li pêş karên erênî bikar tên û wan vediguhêzin raweya neyîniyê.

**Ne:**

Ev alava neyîniya di van cihên jêrîn de dikeve ser karan û wan derbasî raweya neyîniyê dike:

**1 - Karên Demên Borî:**

Nimûne:

	<u>Erênî</u>	<u>Neyînî</u>
<b>Hatin:</b>	- Ez hatim	ez nehatim
	- Ez hatime	ez nehatime
	- Ez dihatim	ez nedihatim
	- Ez hatibûm	ez nehatibûm
<b>Çûn:</b>	- Ez çûm	ez neçûm
	- Ez çûme	ez neçûme
	- Ez diçûm	ez nedîçûm
	- Ez çûbûm	ez neçûbûm
<b>Ketin /keftin:</b>	- Tu ketî	tu neketî
	- Tu ketiyê	tu neketiyê
	- Tu diketî	tu nediketî
	- Tu ketibûyê	tu neketibûyê
<b>Nivîsîn:</b>	- Wî nivîsî	wî nenivîsî
	- Wî nivîsîye	wî nenivîsîye
	- Wî dinivîsî	wî nedinivîsî
	- Wî nivîsîbû	wî nenivîsîbû
<b>Wêrîn:</b>	- Te wêrî	te newêrî
	- Te wêrîye	te newêrîye
	- Te diwêrî	te nediwêrî
	- Te wêrîbû	te newêrîbû
<b>Şiyan:</b>	- Min şiya	min neşiya
	- Min şiyaye	min neşiyaye

- Min dişiya min nedişiya
- Min şiyabû min neşiyabû

- Viyân:**
- Me viya me neviya
  - Me viyaye me neviyaye
  - Me diviya me nediviya
  - Me viyabû me neviyabû

**Kenîn / kenîyan:**

- Hûn kenîn / kenîyan hûn nekenîn
- Hûn kenîne / kenîyane hûn nekenîne
- Hûn dikenîn hûn nedikenîn
- Hûn kenîbûn hûn nekenîbûn

**Gerîyan / gerîn:**

- Ew gerîyan ew negerîyan
- Ew gerîyane ew negerîyane
- Ew digerîyan ew nedigerîyan
- Ew gerîyanbûn ew nwgerîyanbûn
- HD.....

Lê karên (zanîn, karîn) di dema nêzboriya xwerû û boriya sergihayî û ya çîrokî de bi alava / ni / raweya neyînîyê werdigirin:

<u>Erênî</u>	<u>Neyînî</u>
Zanîn: - Min zanî <sup>(5)</sup>	min nizanî / nezanî
- Te zanîye	te nizaniye
- Wî zanîbû	wî nizanîbû

<sup>5</sup> - Li hin herêman (nezanî, nazanî) û (nekarî, nakarî) jî bikar tên.

Karîn: - Me karî me nikarî / nekarî  
 - We karîye we nikarîye  
 - Wan karîbû wan nikarîbû

Lê di boriya berdewam (biserveçûyî) de, karên (zanîn, karîn), bi alava / ne / yê dikevin raweya neyînê.

Wek:

Zanîn: - Wan dizanî wan nedizanî

Karîn: - We dikarî we nedikarî

Li hindek herêmên Kurdistanê ev her du kar jî, wekî yên dîtir, di her çar demên borî de bi alava / ne / tên neyînkirin. Wek:

Zanîn: - Min nezanî , min nezanîye

- Min nedizanî, min nezanîbû

Karîn: - Te nekarî , te nekarîye

- Te nedikarî, te nekarîbû

2 - Alava / ne / bo neyînîya karên (wêrîn, şîyan) di dema nuha de jî tê xebitandin.

Wek:

**Erênî**

**Neyînî**

Wêrîn: - Ez wêrim ez newêrim

- Ez (diwêrim) ez newêrim

Şîyan: - Hûn dişên hûn neşên

3 - Hemû raweyên daxwazî, yên beranberî karên demên borî, bi alava / ne / yê raweya neyînîyê werdigirin.

Nimûne:

**Boriya Erênî**

**Daxwazîya Neyînî**

Çûn: - Ez çûm xwezî ez neçûma

- Ez çûme belkî hûn neçûbin

- Ez diçûm xwezî ez neçûbama

- Ez çûbûm gerek ez neçûbûma

Ketin: - Ez ketim xwezî ew neketa

- Ew ketiye gerek tu neketibî

- Em diketin                      bila em neketibana
- Ew ketibûn                      belkî hûn neketibûna

Xistin: - Min ew xist      xwezî min ew nexista

- Te ew xistiye                      gerek wî tu nexistibî

Dîtin: - Wî ez didîtîm      gerek min ew nedîta

- Me ew dîtibû                      xwezî wî ez nedîtibûma

Rakirin: - Te ew rakir      bila te ew ranekira

- Wî ew radikir                      gerek kesî ew ranekiriba

Çêkirin: - Memo ew çêkir      bila Memo ew çênekira

- Memo ew çêdikir      xwezî Memo ew çênekiriba
- Memo ew çêkiribû      gerek Memo ew çênekiribûya
- HD.....

4 - Raweyên daxwazî, yên beranberî dema nuha, bi alava / ne / yê tîn neyînkirin.

Nimûne:

**Erênî**

**Neyînî**

- Ez direvim      gerek ez nerevim
- Tu dibezî      xwezî tu nebezî
- Ew dibêje      bila ew nebêje
- Em divên      belkî hûn nevên
- Hûn dimînin      gerek em nemînin
- Ew dinoşin      bila ew nenoşin

- HD.....

1 - Daxwazîyên dema paşeroj (ayinde) jî bi alava / ne / yê dikevin raweya neyînîyê.

Nimûne:

**Paşeroj      Daxwazîya Erênî      Daxwazîya Neyînî**

- Ez ê biçim      gerek ez biçim                      gerek ez neçim
- Tu yê herî      xwezî tu herî                      xwezî tu nerî
- Ew ê binivîse      bila ew binivîse      bila ew nenivîse
- Em dê berdîn      divê em berdîn      divê em bernedîn

- Hûn dê ragirin- kêşka hûn ragirin <sup>(6)</sup> -kêşka hûn  
ranegirin

- Ew ê rakevin gerek ew rakevin gerek ew ranekevin

- HD.....

Lê eger daxwaziya paşeroj di raweya pirs û gumanê de be, anku pêjina guman û dudiliyê jê bê,  
hingê daçeka paşerojê / ê, dê / bikar tê:

**Paşeroj:** - Îşev ez ê herim Amedê

**Daxwazî:** - Bi gumana min, ez ê îşev nerim Amedê

**Paşeroj:** - Sibe em ê bigihîjin

**Daxwazî:** - Gelo, em ê negihîjin?

**Paşeroj:** - Tekez em dê bixwînin

**Daxwazî:** - Ma hûn ê tiştêkî nexwînin?

6 - Alava / ne / dikeve ser karên raweya fermanî û wan duguhêze raweya neyîniya fermanî. Wek:

<u>Erênî</u>	<u>Neyîni</u>
Çûn: - Biçe dibistanê (tu)	neçe dibistanê
Xwestin: - Bixwaze (tu)	nexwaze
Revîn: - Bireve (tu)	nerewe
Daxistin: - Daxe (tu)	danexe
Berdan: - Berdin (hûn)	bernedin
Avdan: - Avbidin (hûn)	avnedin
Hildan: - Hildin (hûn)	hilnedin
- HD.....	

Li rex / ne / yê alava / me / jî, bo raweya fermaniya neyîni tê xebitandin. (li dawiya mijarê em ê nêzî wê bibin).

**Na:**

Alava / na / jî, di van cihên jêrîn de, derbasî ser karên erênî dibe û wan vediguhêze neyîniyê:

<sup>6</sup> - Kêşka : Xwezka.

1 - Hemû karên dema nuha bi / na / yê dikevin raweya neyînîyê, ji bilî (zanîn, karîn) ku bi / ni / yê tên raweya neyînîyê û (şiyar, wêrîn) ku bi / ne / yê dikevin raweya neyînîyê, (me berî nuha amaje bi wan kiriye). Nimûne:

**Nuhaya Erênî****Nuhaya Neyînî**

Çûn: - Ez diçim

ez naçim

Hatîn: - Ew tê (dihê)

ew nayê (nahê)

Bezîn: - Tu dibezî

tu nabezî

Firoştin: - Em difiroşin

em nafiroşin

Bihîstin: - Hûn dibihîzin

hûn nabihîzin

Daxistin: - Ew dadixin

ew danaxin

- HD.....

2 - Alava / na / bo neyînîkirina karên dema paşerojê (ayinde) bi kar tê. Lê hinek têvelî di navbera şarezayên zimanê Kurdî de peyda bûne.

Seyda S.B.Amêdî di rêzimana xwe de (rêzimana Kurdî)<sup>7</sup>, dibêje: Karên dema (paşê siriştî) (paşeroj) bi du şêweyan dikevin raweya neyînîyê:

1 - Ez dê çim (erênî)

- Ez ne dê çim (neyînî)

2 - Ez dê çim (erênî)

- Ez naçim (neyînî).

Bi dîtina min, şêweyê neyînîyê, yê mînaka / 2 / em (ez naçim), ew neyîniya rast û durist e. Lê mînaka / 1 / em, ne cîgirtî ye, ji ber ku:

a - Alava neyînê / ne / di navbera cînavê kesîn / ez / û daçeka (alava) dema paşerojê (dê) de hatiye. Ev şêwazê neyînîyê di Kurmanciya Jorîn de bikar nayê. Anku, nayê gotin (ez ne dê çim), li şûna ku em bibêjin (ez dê neçim).

b - Eger / ne / ya neyînê li pêş kar jî bihata (ez dê neçim), dîsan ne durist e, çiku ev şêwaz di raweya daxwazî de bikar tê, wek: (Gelo, ez ê neçim Şamê?).

- Prof: Qenatê Kurdo jî di pirtûka xwe de, ya bi navê (Zimanê Kurdî) <sup>(8)</sup> dibêje: Karên dema paşwext bi van her du şêweyan dikevin raweya neyînîyê:

<sup>7</sup> -B.Amêdî : Rêzimana Kurdî. Bexda (1987 ). Rû. / 97 /.

<sup>8</sup> - Qenatê Kurdo : Zimanê Kurdî - Rêziman. Firankfort (1988 ) - Rû. / 109 /.



Wek:

Erênî: - Ez ê bikevim

Neyînî: 1 - Ez nakevim

2 - Ez ê nekevim.

Di van mînakên Q.Kurdo, yên neyînî de jî, mînaka / 1 / em: (Ez nakevim) rast e. Çiku hevok di raweya pêşkerî de ye û bi / na / yê hatiye neyînkirin.

Lê mînaka /2/ em, digel ku erênîya wê pêşkerî ye jî:

(Ezê bikevim), bi alava / ne / hatiye neyînkirin. Ev jî ne durist e, çiku / ne / bo neyîniya raweyên daxwazî ye.

**Ni:**

Alava / ni / bo neyîniya her du karên (zanîn, karîn) di hemû dem û raweyan de, ji bilî dema boriya berdewam (biserveçûyî), tê xebitandin.

Wek:

<u>Erênî</u>	<u>Neyînî</u>
Dema Borî: - Min zanî	min nizanî
- Min zaniye	min nizaniye
- Min zanîbû	min nizanîbû
- Te karî	te nikarî
- Te kariye	te nikariye
- Te karîbû	te nikarîbû

Lê di boriya berdewam de ev her du kar bi alava / ne / dikevin raweya neyînê:

- Wî dizanî wî nedizanî

- Wî dikarî wî nedikarî

Dema nuha: - Ez dizanim ez nizanim

(Ez zanim) <sup>(9)</sup>

- Ez dikarim ez nikarim

(Ez karim)

<sup>9</sup> - Li hin herêman pêşgira dema nuha / di /, bi egera sivikbûnê, ji (ez di-zanim, di-karim ) tê avêtin.

Raweyên daxwazî: Hemû raweyên daxwazî, yê karên (zanîn, karîn) bi alava / ni / tîn neyînkirin:

<u>Erênî</u>	<u>Neyînî</u>
- Eger te bizaniya	eger te nizaniya
- Eger te bikariya	eger te nikariya
- Eger te zanîba	eger te nizanîba
- Eger te karîba	eger te nikarîba
- Eger te zanîbûya	eger te nizanîbûya
- Eger te karîbûya	eger te nikarîbûya
- Gerek tu zanibî	belkî tu nizanibî
- Gerek tu karibî	belkî tu nikaribî
- HD.....	

Di fermaniya van her du karan de, dîsan alava / ni / di raweya neyînê de bikar tê:

- Zanibe (tu) nizanibe
- Karibe nikaibe.....

**Me:**

Alava / me / jî, di zimanê me de, bo neyînkirina raweya fermanî bikar tê. Ev alav li şûna / ne / yê di gelek şêwezarên Kurdî û di zimanê Farisî de jî tê xebitandin. Nimûne:

<u>Jêder</u>	<u>Erênî</u>	<u>Neyînî</u>
- Kirin	bike (tu)	meke / neke
- Bûn	bibe (tu)	mebe / nebe
- Kenîn	bikene	mekene / nekene
- Dan	bide	mede / nede

- Hêlan                      bihêle              mehêle / nehêle
- Parastin                  biparêze      meparêze/neparêze
- Raxistin                  raxin (hûn)    ramexin / ranexin
- Girtin                      bigirin              megirin / negirin
- Hilgirtin              hilgirin      hilmegirin / hilnegirin
- HD.....

Diyar e ku her du alavên neyînê / me, ne / di raweya fermanî de, li cihê hev bikar tên. Di vê navê re pirsek raberî me radiweste: Ji wan her du alavan, gelo, kîjan resen e?

- Seyda Feqî Huseyn Sagniç dibêje: (Ji daçekên neyînê / me /. Ev daçek ji bo fermana neyînîye. Hindek herêm daçeka / ne / bikartînin jî lê ya rast / me ye /.....) <sup>(10)</sup>.

- Mamoste **Samî Tan** jî derbarî mijarê dibêje: (Li gorî dîtina me jî, qertafa neyînî ya raweya fermanî / me / ye....) <sup>(11)</sup>.

**Feqî Huseyn** nabêje ka çima alava neyînî, ya rast / me / ye. Samî jî alava / me / dide pêş. Lê Samî / 2 / sedeman bo çespendina vê nêrîna xwe berçav dike:

1 - Alava / me / bi berfirehî di nav gel de bikar tê.

2 - Ev alav di Kurmanciya Jêrîn (Sorani) de jî bikar tê.

Bi dîtina min, xebitandina her du alavan jî rast û durist e. Lê ji hêla resenê û nereseniyê ve, ez dibînim ku / ne /, ew alava neyînê ya resen e û / me / jê hatiye guherîn. Dengên van her du tîpan / m,,n / gelekî nêzî hev in, lê bilêvkirina / m/ yê ji ya / n / yê, di pêvajoya gotinê de, siviktir e. Wek: (meçe - meke) ji (neçe, neke) siviktir e.

Min ev dîtina xwe ji van xalên jêrîn girtiye:

1 - Hemû alavên neyînê bi tîpa / n / destpê dibin.

Wek: (ne, na, ni, no), lê alava / me / tenê bi / m/ yê destpê dibe.

2 - Tîpa / n / di neyîniya karên hemû dem û raweyan de bikar tê, wek (neket, nakeve, wê nekeve, nekeve....). Lê tîpa / m /, di neyîniya raweya fermanî tenê de bikar tê, wek (mekeve).

<sup>10</sup> - Feqî Huseyn Sagniç : Hêmana Rêzimanê Kurdî. Stanbol (1991 ) - Rû. / 119 - 120 /.

<sup>11</sup> - Samî Tan : Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî. Stanbol (2005 ) - Rû. / 251 /.

3 - Navê raweya (neyînî) jî, ji tîpa / n / ya destpêka wan alavên neyînê (ne, na, ni, no) hatiye.

4 - Eger tîpa / n / ji alavên neyînê bê avêtin, tîpa / m / cihê wê (ji bilî raweya fermanî) nagire, anku li şûna (ez neçûm, naçim) em nikarin bibêjin (ez meçûm, maçim). Lê ku / m / ji (meçe, meke) bê avêtin, em karin bibêjin (neçe, neke). Bo van egeran ez dibînim ku / ne / alava resen e û / me / jê hatiye guherîn. Lê ji hêla kiryarî ve, her du alav jî bi berfirehî tên xebitandin û her du jî durist in.

### Têbînî:

1 - Di raweya neyîniya dema nuha de, nîşandika dema nuha / di / tê avêtin û alava neyîniyê li şûna wê bikar tê:

- Em dixwînin , em na~~x~~wînin

- Hûn diwêrin , hûn newêrin

2 - Di neyîniya karên dariştî de, alava neyîniyê dikeve navbera kar û pêşgirê:

- Ew rabûne , ew ra~~n~~ebûne

- Me vexwariye , me ven~~e~~xwariye

3 - Li hindek herêman alava neyîniya karên dariştî berî pêşgiran bikar tê:

- Ew rabûne , ew ne~~r~~abûne

- Me vexwariye , me ne~~v~~exwariye

4 - Eger kar bi dengdêra / a / destpê bibe û alava neyînî bikeve ser wî, hingê dengdêra alavê tê avêtin:

- Ajotin: Min ajot = min ne-ajot = min najot

- Avêtin: Te avêtiye = te ne-avêtiye = te navêtiye

Di hemû dem û raweyên dîtir de jî ew / a /, bi egera sivikbûnê, tê avêtin:

**Nuha:** - Ez dajom = ez na-jom = ez najom

- Ez davêjim = ez na-avêjim = ez navêjim

**Paşeroj:** - Ez ê bajom = ez na-ajom = ez najom

- Ez ê bavêjim = ez na-avêjim = ez navêjim

**Fermanî:** - B,ajo = ne-ajo = najo / majo

- B,avêje = ne-avêje = navêje / mavêje

Eger / a / ya destpêka karan, di dema nuha û paşerojê de bibe / î /, hingê dengdêra alava neyînî bi du şêweyan dikeve ser wan karan, wek karê (anîn):

Borî: - Min anîye = min ne-anîye = min nanîye

- Min anîbû = min ne-anîbû = min nanîbû

**Nuha:**1 - Dengdêra alavê tê avêtin:

- Ez di-înim / tînim = ez na-înim = ez nînim

2 - Dengdêra alavê dimîne û navbirra dengdêran / y / her du dengdêrên (ya alavê û ya destpêka kar), ji hev dibirre:

- Ez di-înim / tînim = ez na-y-înim = ez nayînim

**Paşeroj:** Di vê raweyê de jî, dengdêra alavê bi du şêweyan tê xebitandin:

1- Ez ê bi-înim / bînim = ez ê ne-înim = nînim /

Neynim

2- Ez ê bi-înim / bînim = ez ê ne-y-înim = neyînim /

neynim.

**Fermanî:** Di raweya fermanî de jî, ew dengdêr bi du şêweyan bikar tê:

1 - Bi - îne / bîne = ne-îne = nîne:

: Hevalê xwe nîne vir.

**1** - Bi-îne / bîne = ne-y-îne = neyîne = neyine:

Hevalê xwe neyine / neyne vir.

**5 - Karê (anîn) li herêma Behdînan bi şêweyê (înan) bikar tê. Di raweya neyînî de, dengdêra alava neyînê li gora demê bikar tê:**

1 - Di dema borî de dengdêra alavê nayê avêtin:

- Min înaye = min ne-înaye = min neînaye

- Min înabû = min neînabû

2 - Di dem û raweyên dîtir de, weku şêweyê (anîn) bikar tê.

**6** - Eger kar bi dengdêra / ê / destpê bibe, wek (êşyan / êşîn), di raweya neyîniyê de, dengdêra alava neyînî bikar tê, anku di hemû dem û raweyan de ew dengdêr nayê avêtin:

**Borî:** - Ez êşiyam = ez ne-êşiyam = ez neêşiyam

- Ez êşiyabûm = ez neêşiyabûm

**Nuha:** - Ez di-êşim / dêşim (têşim) = ez naêşim

**Paşeroj:** - Ez ê bi-êşim / bêşim = ez naêşim

**Fermanî:** - Ne - êşe, neêşe (neêşe).

(Êşandin): - Xwe neêşîne (tu)

- Xwe neêşînin (hûn)

Di encamê de, em dikarin bi kurtebirrî bibêjin, ev mijar mijareke dengsazî (fonîtîkî) ye. Ji bilî sivikbûn û rewaniya bilêvkirina bêjeyan, çî rêzan û destûrên rêzimanî jê re nîn e, tenê divê ku avêtina tîpan û kurtkirina bêjeyan ziyane negihînin wateya gotinan. Ev tenê mercekî bingehîn e. Ji vî mercî pêve, raweya siviktir, ew a xweştir û rewantir e.

(9)

**BIRRÊ NEHEM****Kar ji hêla Demê ve (veguhestin)****- Raweyên karan****1 - Raweyên Pêşkerî****A - Karên Nederhingêv**

- Demên Borî
- Nêzboriya Xwerû
- Boriya Sergihayî
- Boriya Berdewam
- Boriya Çîrokî
- Dema Nuha
- Dema Paşeroj

**- Karên Derhingêv****- Demên Borî**

- Nêzboriya Xwerû
- Boriya Sergihayî
- Boriya Berdewam
- Boriya Çîrokî

**- Dema Nuha****- Dema Paşeroj****- Çend têbîniyên Giring****2 - Raweyên Daxwazî****- Raweya Fermanî****- Raweya Mercî**

- Alavên Mercî
- Karê Sermerc

- Karê Bermerc
  - Raweya Bilanî
  - Raweya Xwezîni
  - Raweya Gerekî
  - Raweya Paşeroja Boriya
- Berguman**

### Kar Ji Hêla Demê Ve (Veguhestin - التصريف)

Beriya nuha me gotibû, çî karê heye raweya xwe ji binasaziya jêdera xwe werdigire. Jêder jî ew bêje ye, ya ku têgeha bûyerekê, yan bizavekê bi xwe ve digire, bêyî ku pêjina demê jê bê. Anku, çî jêdera heye têgeha bûyereke bêdem bi xwe ve digire, wek: (çûn, hatin, dan, birin, xwendin, nivîsîn, çinîn, çandin, raperîn, bûyîn, şewitîn, kişandin, rakişandin...).

Berçav e ku her jêderê, ji van jêderan têgeha bûyerekê bi xwe ve digire. Lê ku bûyer ket qûnaxa bûyîn û qewimandinê divê demê destnîşan bibe. Ew jî dema qewimandina bûyera jêderê ye. Çiku, bi nîşankirina demê re jêder dikevin raweya karan:

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Borî</u>	<u>Nuha</u>	<u>Paşeroj</u>	
- Çûn	çû		diçe	ew ê biçê
- Ketin	ket		dikeve	ew ê bikeve
- Rabûn	rabû	radibe	ew ê rabe	
- Nivîsîn	nivîsî		dinivîse	ew ê binivîse
- HD.....				

Ev guhertina forma jêderan (li gora dem û kesan) em navê (veguhestin) lê dikin û hin jî navê (kêşan) û (kesandin) jî, lê dikin.

Di veguhestinê de raweya karên veguhestî li gora van her du hêmanan (dem, kes) tê guherîn. Em dizanin ku / 3 / demên sereke hene. Ew jî ev in (borî, nuha, paşeroj). Di veguhestina karan de / 3 / kes jî



hene, (kesê dipeyive, kesê guhdar û kesê nediyar). Her kesek ji van jî, yekjimar û komjimariya wî jî hene, ku raweya karên veguhestî li gora jimara wan kesan pêk tê, wek (ez diçim, em diçin) û (min sêvek xwar, min sêvin xwarin). Li gora erkên van her du hêmanan (kes, dem) em ê xwe nêzîkî mijara veguhestina karan bikin. Me gelek caran gotiye, kêşeya herî aloz di zimên de kêşeye navlêkirina mijaran (têrm) e. Ji ber ku ta nuha dezgeheke giştî, rengfermî li ser asta zimanê Kurdî hêj ava nebûye, da ku karibe nav û zaraveyên (têrmên) hemû mijar û babetên zimên binav û destnîşan bike. Ji ber vê egerê jî, her şarezayekî zimên, li gora baweriyên xwe, nav li mijaran kiriye. Di pêvajoya şirovekirinê de em ê hindekan ji wan navlêkirinên têvel destnîşan bikin.

### **Raweyên Karan (صبيغ الأفعال):**

Di zimanê Kurdî de du raweyên karan, ên bingehîn hene: - Raweya pêşkerî - Raweya daxwazî

#### **1-Raweya Pêşkerî (الصبيغ الإخباريه):**

Raweya pêşkerî ew rawe ye, ya ku di bûyîna karan de salixdana rûdanekê yan qewimandina bûyerekê pêşberî me dike. Dibe ku ew salixdan derbarî bûyereke qewimî be, yan jî wê (ew ê) biqewime. Anku, raweya pêşkerî ew rawe ye, ya ku dem tê de eşkere û destnîşankirî ye. Bi vê danasînê karên dema borî û dema nuha û yên dema paşeroj (ayinde), tev di raweya pêşkerî de ne. Li gora vê pîvanê jî em dikarin bibêjin, bûyerên karên raweya pêşkerî di navbera rastbûyîn û nerastbûyînê de ne. Anku, dema em van hevokên jêrîn bibihîzin:

- Remo çûye Amedê
- Şêro zevîyê avdide
- Zîn dê here seyranê

Gerek em bizanin, di hevoka pêşîn de dibe ku Remo çûbe Amedê û dibe jî ku neçûbe. Wisan jî di salixdana her du hevokên dîtir de, ew jî di navbera rastbûyîn û nerastbûyînê de ye.

Piştî vê ronîkirinê em ê li ser veguhestina karên raweya pêşkerî, li gora beş û demên wan, rawestî û wan bi firehî rave bikin.

**Beriya nuha me gotibû, ku kar, ji hêla hêzê ve, du beş in:**

- Karên Nederhingêv
- Karên Derhingêv

Her beşek ji wan jî li gora taybetiya xwe tê veguhestin:

#### **A - Karên Nederhingêv:**

Karên nederhingêv bi her sê corên xwe ve (xwerû, dariştî û lêkdayî) di hemû dem û raweyan de bi cînavên koma / ez / re tên veguhestin. Me berê jî amaje pê kiribû, ku kar di raweya pêşkerî de gerek di her sê demên salixdar, (borî, nuha û paşê) de bîn xebitandin.

#### **- Demên Borî:**

Karên demên borî ew kar in, ên ku bûyîna bûyerên wan berî dema axaftinê qewimîne. Di zimanê me de karên demên borî, li gora nêzîkbûn û dûrbûna bûyerên wan ji dema axaftinê, dibin / 4 / beşên berçav:

- Nêzboriya xwerû (sade)
- Boriya sergihayî (temam)
- Boriya berdewam (biserveçûyî)
- Boriya çîrokî (mêjborî)

#### **1 - Nêzboriya Xwerû:**

Navlêkirina vê demê di nav şarezayên zimên de cihê têvelî û newekhevîyê ye. Her rêziman nivîsekî li gora zanîna xwe, navek lê kiriye:

- Prof. Qenatê Kurdo navê (berê borî) lê kiriye.
- Seyda Sadiq Behadînê Amêdî navê (boriya dema rast) lê kiriye.
- Reşîdê Kurd bo vê demê gotiye (nêzbuhêrk).
- Feqî Huseyn Sagniç û Samî Tan navê (boriya têdayî) lê kiriye.
- Hindekan navê boriya (sade) û (xwerû) jî lê kiriye. Hindekan jî navê (borî) tenê lê kiriye.

**Dema** (nêzborî) demek vekirî ye, ji dema axaftinê û pêde dikişê bêyî ku sînorên dûrbûn û nêzîkbûnê ji dema axaftinê bîn nîşankirin, tenê di pêvajoya hevokê de tê texmînkirin, wek. (Remo hat vir û çû). Di vê mînakê de dibe ku hatin û çûna Remo berî kêlîkekê be, dibe jî ku dûrtir be:

- Remo (berî kêlîkekê) hat vir û çû
- (berî demekê) Remo hat vir û çû
- HD.....

Berçav e ku dûrbûn û nêzîkbûna vê boriyê li gora pêvajoya hevokê tê destnîşankirin. Lê dûrbûna vê demê jî, beranberî boriyên dîtir nêzîkbûn e, wek: (Remo hatiye û çûye) û (Remo hatibû û çûbû....).

- **Karên Xwerû: (Nivistin)**<sup>(12)</sup>

**Erênî:** - Ez nivistim (ez razam)

- Tu nivistî
- Ew nivist
- Em nivistin
- Hûn nivistin
- Ew nivistin

**Neyînî:** - Ez nenivistim

- Tu nenivistî
- Ew nenivist
- Em nenivistin
- Hûn nenivistin
- Ew nenivistin

**Pirsiyarî:** - Gelo ez nivistim?

- Ma tu nivistî?
- Çima ew nivist?
- Bo çi em nenivistin?
- Çire hûn nivistin?
- Kengî ew nivistin?

- **Karên Dariştî: (Rûniştin)**

**Erênî:**

- Ez rûniştim

<sup>12</sup> - karên nêzboriya xwerû bi avêtina nîşandekên jêderî pêk tên, wek (hatin = hat, çûn = çû, rabûn = rabû).

- Tu rûniştî
- Ew rûnişt
- Em rûniştin
- Hûn rûniştin
- Ew rûniştin

**Neyînî:** (Di forma neyînê de alava neyînê dikeve navbera pêşgir û karê xwerû <sup>(13)</sup>)

- Ez rûneniştim
- Tu rûneniştî
- Ew rûnenişt
- Em rûneniştin
- Hûn rûneniştin
- Ew rûneniştin

**Pirsyarî:**

- Ma ez rûniştim?
- Kengî tu rûniştî?
- Bo çi ew rûnişt?
- Çima em rûniştin?
- Ma hûn jî rûniştin?
- Çire ew rûniştin?

**-Karên Lêkdayî: (Derketin)**

**Erênî:**

- Ez derketim
- Tu derketî
- Ew derket

---

<sup>13</sup> - Di dema nêzboriya xwerû de paşkoka kesê sêyemê yekjimar / e / tê avêtin, wek (ew kete = ew ket....)

- Em derketin
- Hûn derketin
- Ew derketin

**Neyînî:** (Di neyîniya karên lêkdayî de jî, alava

Neyînê / ne / di navbera her du hêmanên  
karê lêkdayî de bikar tê).

- Ez derneketim
- Tu derneketî
- Ew derneket
- Em derneketin
- Hûn derneketin
- Ew derneketin

**Pirsiyarî:** - Ma çima ez derketim?

- Tu çima derneketî?
- Ew derket? <sup>(14)</sup>
- Bo çi em derketin?
- Kengî hûn derketin?
- Gelo ew jî derketin?

## 2 - Boriya sergihayî (temam):

Navlêkirina vê demê jî, di nav şarezayên zimên de cihê têveliyê ye. Hindekan navê (Boriya nêzîk) lê kiriye, hinekan jî (Boriya Dûdar) lê kiriye û hinan jî (Mêjbuhêrk) lê kiriye û (Boriya Berê nuha) û (Boriya tamam) jî hatine gotin.

Berî nuha jî me gotiye, têgeha dûrbûn û nêzîkbûnê (bi şeweyekê giştî) li gora pîvan û lêpîvanê destnîşan dibe. Anku, dema ku em tişteki li tişteki dîtir bipîvin, em ê bibêjin ev tişt ji vî tiştî dirêjtir e

---

<sup>14</sup> - Raweya pirsîyarî bêyî alava pirsê jî pêk tê, lê divê nîşandeka pirsê /? / li dawîya hevoka pirsîyarî bê danîn, wek : (Tu çûyî Amûdê? ).

yan kurtir e, mezintir e yan piçûktir e. Dem jî dikeve ber vê yaseya tevayî. Bi vê pîvanê, eger em gotina (dîwar ketiye) li gotina (dîwar ketibû) bipîvin, bêguman dema ku dîwar tê de (ketiye) wê ji dema ku dîwar tê de (ketibû) nêzîktir be.

**Berevajî** vê jî, eger me got (dîwar ketiye) û (dîwar ket), dema ku dîwar tê de (ketiye) dê ji dema ku dîwar tê de (ket) dûrtir be. Bi vê wateyê em karin bibêjin (dîwar berê ketibû), lê em nikarin bêjin (dîwar berê ket).

Ji hêla bûyer û qewimandina karan ve, di vê demê de bûyerên karan bi tamamî pêk tên. Anku, eger em bibêjin (min erkên xwe nivîsîn), dibe ku min erk nivîsîbin. Lê eger em bibêjin (min erkên xwe nivîsîne), hingê tê wê wateyê ku min nivîsîna erkên xwe tamam kiriye.

Nimûne:

- **Karên Xwerû: (ketin)**

**Erênî:**

- Ez ketime

- Tu ketiyî

- Ew ketiye

- Em ketine

- Hûn ketine

- Ew ketine

**Neyînî:**

- Ez neketime

- Tu neketiyî

- Ew neketiye

- Em neketine

- Hûn neketine

- Ew neketine

**Pirsiyarî:**

- Ma ez ketime?

- Kengî tu ketiyî?

- Gelo ew ketiye?

- Ma em jî ketine?

- Çawa hûn ketine?

- Bo çi ew neketine?

Di vê veguhestina karê (ketin) de, bi egera sivikbûnê, gelek guhertinên danganî gihîştine binesaziya raweyên resen û ew bi van şewazên jêrîn saz kirine. Em dizanin ku veguhestina karên nederhingêv di boriya sergihayî de bi vê rêzîkê pêk tê:

(cînav + binyata borî + paşkoka kesîn + e)

1 - Ez ketime: (ez + ket / i / + im + e)

- Du tîpên dengdêr (i + im) gihîştine hev, / i / ya

ji / im / hatiye avêtin:

(Ez + keti + .....m + e = ez ketime)

2 - Tu ketiyî: (tu + ket + i + î + e = tu keti - î - e)

- Navbirra dangan / y / dikeve navbera van

dengdêran (i - î - e): (Tu keti - y - î - ye) = (tu

ketiyîye). Bi egera sivikbûnê jî, / ye / tê avêtin

: (tu ketiyîye = tu ketiyî....).

3 - Ew ketiye: (Ew + keti + i + e + e = ew keti - e - e) =

(ew keti - ye - ye = ew ketiye - ye)

- Bi egera sivikbûnê / yê / ya nîşana

boriya sergihayî tê avêtin: (ew ketiye..).

4 - Em ketine: (Em + ketî + in + e).

- Du dengdêr / i - in / gihîştine hev, / i /

Ya / in / ê tê avêtin: (em keti.....ne).

Hebûna tîpa / i / di van darêjan de (ketime, ketiyî, ketiye, ketine) ne hebûneke resen e. Anku, ev /i/ li tîpên binesaziya wan zêde bûye. Ji ber ku hemû binyatên dema borî, yên ku bi tîpeke dengdar (bêdeng) kuta dibin, wek (hat, kuşt, ket, xwend, şand, revand...) di dema boriya sergihayî de tîpa / i / li dawiya binyatê zêde dibe (ew binyat, çi ya karên derhingêv be, çi ya karên nederhingêv be).

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Binyata Borî</u>	<u>Boriya Sergihayî</u>	
- Hatin		hat	hatiye
- Kuştin		kuşt	kuştiye
- Ketin	ket		ketiye
- Xwendin	xwend		xwendiye
- Çandin		çand	çandiye
- Şandin		şand	şandiye
- Revandin	revand		revandiye
- Ramedandin	ramedand		ramedandiye
- HD.....			

Lê ku dawiya binyata borî tîpeke dengdêr be, wek (çû, rabû, kenî, bezî, da, ma..), hingê ew / i / ya zêde nakeve nav binesaziya boriya sergihayî.

Wek:

<u>Jêder</u>	<u>Binyata Borî</u>	<u>Boriya Sergihayî</u>	
- Çûn	çû		ew çûye
- Rabûn		rabû	ew rabûye
- Kenîn	kenî		ew kenîye
- Bezîn	bezî		ew bezîye
- Dan	da		wî daye
- Kolan	kola		wî kolaye
- Man	ma		ew maye



- HD.....

Berçav e, ku / i / li binyatên van karan, di boriya sergihayî de zêde nebûye. Çunkî zêdebûna vê / i / yê bo sivikbûna bilêvkirinê pêk tê. Di van mînakên de tîpa / i /, ji / im, in / hatiye avêtin:

- Ez çû - ime = ez çû.....me = ez çûme

- Hûn raza- ine = hûn raza-----ne = hûn razane.

Li vê gorê, reseniya darêja van karan di boriya sergihayî de, ew e, ku du tîpên dengdêr, di wan de, digihêjin hev (tîpa dawiya binyatê û tîpa / i / ji / im - in /) bo sivikbûnê tîpa / i / tê avêtin.

Nimûne:

**Jêder Binyata Borîn Darêja Resen Darêja Sivik**

- Rabûn	rabû	ez rabû- ime	ez rabû....me
- Derçûn	derçû	ez derçû-ime	ez derçû....me
- Man	ma	ez ma - ime	ez ma.....me
- Geriyan	geriya	em geriya - ine	em geriya..ne
- Bezîn	bezî	ew bezî - ine	ew bezî.....ne
- Revîn	revî	hûn revî - ine	hûn revî....ne

- HD.....

Li gora rêzimana Kurdî, her du şeweyên darêjê (resen û sivikbûyî) jî durist in ku bikar bên, lê yê sivikbûyî rewantir û xweştir e.

- **Melayê Cizîrî** dibêje: <sup>(15)</sup>

Mela me l,gerdina dîlber

Ji nû sed bose mayin deyn

Mecalê dê bixwazim jê,

Dibê: Deynê te (fewqel'eyn)

Diyar e ku **Cizîrî** karê (mayin), bêyî sivikbûn xebitandiye.

<sup>15</sup> - Melayê Cizîrî : Dîwan - şirovekirina Zivingî. Çapa / 2 / em - Heleb (1987). Bergê / 2 / em - Rû. / 442 /.

**- Karên Dariştî: (Daketin)**

Hemû guhertinên danganî, yê gihiştine karê  
xwerû (ketin) digihêjin karê dariştî (daketin)jî.

**Erênî:**

- Ez daketime
- Tu daketiya
- Ew daketiye
- Em daketine
- Hûn daketine
- Ew daketine

**Neyînî:**

- Ez daneketime
- Tu daneketiya
- Ew daneketiye
- Em daneketine
- Hûn daneketine
- Ew daneketine

**Pirsiyarî:**

- Ma ez daneketime?
- Bo çî tu daketiya ?
- Çima ew daketiye?
- Kengî em daketine?
- Hûn kengî daketine?
- Ma ew jî daketine?

**- Karên Lêkdayî: (Derketin)**

**Erênî:**

- Ez derketime
- Tu derketiyê
- Ew derketiye
- Em derketine
- Hûn derketine
- Ew derketine

**Neyînî:**

- Ez derneketime
- Tu derneketiyê
- Ew derneketiye
- Em derneketine
- Hûn derneketine
- Ew derneketine

**Pirsiyarî:**

- Ma ez derketime?
- Gelo tu jî derketiyê?
- Çima ew derketiye?
- Bo çi em derneketine?
- Gelo hûn jî derneketine?
- Ma ew çire derneketine?

**3 - Boriya Berdewam:**

Di pirtûkên rêzimanî de navlêkirinên vê dema borî jî, cihê têviliyê ye. Gelek nav li vê boriyê bûne. Wek: (boriya biserveçûyê, boriya serêk, berdest, wextê berê dirêj, buhêrbêj, boriya berdewam...). Min jî navlêkirina (boriya berdewam) begem kiriye û min ew xebitandiye.

**Dema boriya berdeyam ew dema borî ye, ya ku bûyîna bûyerên karan tê de berdeyam e. Dema ku em bibêjin: ( min nan dixwar), hingê tê zanîn ku (xwarina nê) hêj temam nebibû, anku (wê demê) xwarina nanî berdeyam bû. Bi vê wateyê em dikarin van mînakên şirove bikin:**

- Min dixwend: Min dest bi xwendinê kiribû û min xwendina xwe berdeyam dikir.

- Zî nê name dinivîsî: Zî nê bûyera nivîsînê dikir û hêj ew nivîsîn berdeyam dikir.

Ji bilî têgeha vê berdeyamîya bûyerê jî, gelek caran sînorên dema wê berdeyamîyê ji pêvajoya hevokan tên nasîn. Wek:

- Di navbera salên (1999 - 2000)ê de min li zanîngehê dixwend.

- Remo deh salan zeviya dostê xwe diçand û diçinî.

**Veguhestina karên nederhingêv di dema boriya berdeyam de li gora vê rêzîkê pêk tê:**

(Cînavê koma / ez / + di + binyata borî + paşkoka kesîn).

Her sê corên karên nederhingêv (Xwerû, dariştî û lêkdayî) jî li vê rêzîkê tên pîvan.

Nimûne:

**- Karên Xwerû: (Hatin)**

**Erênî:**

- Ez dihatim

- Tu dihatî

- Ew dihat

- Em dihatin

- Hûn dihatin

- Ew dihatin

**Neyînî:**

- Ez nedihatim

- Tu nedihatî

- Ew nedihat

- Em nedihatim

- Hûn nedihatin

- Ew nedihatin

**Pirsiyarî:**

- Ma ez nedihatim?

- Kengî tu dihatî?

- Bo çî ew dihat?

- Gelo em dihatin?

- Çima hûn dihatin?

- Aya ew jî dihatin?

**- Karên Dariştî: (Rahatin)**

**Erênî:**

- Ez radihatim

- Tu radihatî

- Ew radihat

- Em radihatin

- Hûn radihatin

- Ew radihatin

**Neyînî:**

- Ez rannedihatim (neradihatim)

- Tu rannedihatî

- Ew rannedihat

- Em rannedihat

- Hûn rannedihat

- Ew rannedihat

**Pirsiyarî:**

- Ma ez radihatim?
- Bo çi tu radihatî?
- Çima ew radihat?
- Kengî em radihatin?
- Hûn jî radihatin?
- Çire ew radihatin?

**- Karên Lêkdayî: (Derhatin)**

**Erênî:**

- Ez derdihatim (ez ji malê derdihatim)
- Tu derdihatî
- Ew derdihat
- Em derdihatin
- Hûn derdihatin
- Ew derdihatin

**Neyînî:**

- Ez dernedihatim
- Tu dernedihatî
- Ew dernedihat
- Em dernedihatin
- Hûn dernedihatin
- Ew dernedihatin

**Pirsiyarî:**

- Ma ez derdihatim?
- Çima tu derdihatî?
- Ew bo çi derdihat?

- Kengî em derdihatin?
- Ma hûn jî derdihatin?
- Gelo ew jî derdihatin?

Li hin herêmên Kurdistanê raweya boriya berdewam bi vî şêweyê jêrîn jî bikar tê:

- Ez dihatime
- Ez radihatime
- Ez derdihati

Hindekan ji şarezayên zimên raweya veguhestina karên van mînakên (dihatime, rahatime û derhatime) bi navê (boriya berdesta dirêj) daye nasîn. Bi dîtina min, ev şêweyê veguhestinê devokek xweçî ye, li radeyeke teng bikar tê. Bo vê yekê, min jî (weku pîrraniya zimanzanên Kurd) ev şêweyê veguhestina boriya berdewam paşguh kiriye.

#### 4 - Boriya Çîrokî:

Hemû navlêkirinên ku li vê dema borî bûne ji çarçova boriya çîrokî û boriya dûr derneketine, wek (boriya dûr, boriya çîrokiya têdayî, wextê berê zêde buhirî, mêjbêj, dûrbor...). Ev navlêkirin tev jî, di pirtûkên rêzimana Kurdî de cihê xwe girtiye.

Min jî, di wê çarçovê de, navê (boriya çîrokî) begem kiriye û ez pê xebitîme.

Rêbaza veguhestina karên nederhingêv di boriya çîrokî de li gora vê rêzikê pêk tê:

(Cînavê koma / ez / + binyata borî + bû + paşkoka kesîn)

Helebt, di vê rêzikê de (bû) binyata borî, ya karê (bûn) e. Ev binyat di hemû raweyên veguhestinê de wekî xwe dimîne (nayê guhertin):

- Ez çû**bûm**
- Tu çû**bûyî**
- Em çû**bûn**

Li vê gorê, binyata borî ya her sê corên karan (Xwerû, dariştî û lêkdayî) digel binyata borî, ya karê (bûn) û paşkokên kesîn, raweya dema boriya çîrokî saz dikin. Nimûne:

- **Karên Xwerû: (Hatin)**

**Erênî:**

- Ez hatibûm
- Tu hatibûyî
- Ew hatibû
- Em hatibûn
- Hûn hatibûn
- Ew hatibûn

**Neyînî:**

- Ez nehatibûm
- Tu nehatibûyî
- Ew nehatibû
- Em nehatibûn
- Hûn nehatibûn
- Ew nehatibûn <sup>(16)</sup>

**Pirsiyarî:**

- Ma ez hatibûm?

---

<sup>16</sup> - Ji ber ku ev (bûn) a ku bi karan re raweya dema çîrokî saz dike karekî jar e (kêm e), digihêje karan bo hevgerêdana hêmanên hevokê, anku karê girêdanê ye. Taybetiya vî karî ew e, ku bi karên berî xwe re (yên xwerû û dariştî) karên lêkdayî saz nake.

Wek :

- Ez hatibûm (xwerû ye)
- Ez rahatibûm (dariştî ye)
- Ez derhatibûm (lêkdayî ye)

Bo vê egerê jî alava neyînê / ne / dikeve pêş karê xwerû.

Wek:

- Ez nehatibûm
- Ez ranehatibûm.

Lê eger (hatibûm) karekî lêkdayî ba, gerek / ne / ketiba navbera her du hêmanan (hati - ne - bûm). Ev jî ne durist e. Bo van taybetiyan em dibêjin, ev (bûn) karekî rêzder e, anku awarte ye.



- Kengî tu hatibûyî?
- Ew bi kê re hatibû?
- Çima em hatibûn?
- Bo çî hûn hatibûn?
- Gelo ew jî hatibûn?

### **-Karên Dariştî: (Rahatin)**

#### **Erênî:**

- Ez rahatibûm
- Tu rahatibûyî
- Ew rahatibû
- Em rahatibûn
- Hûn rahatibûn
- Ew rahatibûn

#### **Neyînî:**

- Ez ranehatibûm
- Tu ranehatibûyî
- Ew ranehatibû
- Em ranehatibûn
- Hûn ranehatibûn
- Ew ranehatibûn

#### **Pirsiyarî:**

- Kengî ez rahatibûm?
- Ma tu rahatibûyî?
- Gelo ew jî rahatibû?
- Çawa em rahatibûn?

- Hûn li kê rahatibûn?
- Çima ew ranehatibûn?

**- Karên Lêkdayî: (Derhatin)**

**Erênî:**

- Ez derhatibûm
- Tu derhatibûyî
- Ew derhatibû
- Em derhatibûn
- Hûn derhatibûn
- Ew derhatibûn

**Neyînî:**

- Ez dernehatibûm
- Tu dernehatibûyî
- Ew dernehatibû
- Em dernehatibûn
- Hûn dernehatibûn
- Ew dernehatibûn

**Pirsiyarî:**

- Ma ez derhatibûm?
- Bo çî tu derhatibûyî?
- Ew kengî derhatibû?
- Çire em derhatibûn?
- Hûn jî derhatibûn?
- Kengî ew derhatibûn ?

**- Dema Nuha:**

Navlêkirinên vê demê jî di pirtûkên rêzimanî de ne wekî hev hatine nivîsîn. Her şarezayekî navek, li gora zanîna xwe, lê kiriye, wek (niha, niho, nuhok, noka, êsta, êstak...).

Diyar e ku ev navlêkirin tev jî bi wateya (dema axaftinê) ne. Min jî navê (nuha) bo vê demê xebitandîye, anku ev dema ku (nuh, nû) bi ser me de hatiye û hêj em tê de ne).

Bi vê têgehê dema nuha ew dem e, ya ku bûyer û rûdanên karan tê de destpê dibin û di demeke nenas de berdewam dikin.

Wek:

- Ez nameyê dinivîsim.

Di vê mînakê de min dest bi nivîsîna nameyê kiriye, lê ez nizanim, ka piştî xulekekê, pênc xulukan, yan jî (zêdetir.... kêmtir) ez ê nivîsîna nameyê kuta bikim.

Veguhestina her du corên karan (derhingêv û nederhingêv) li gora vê rêzîkê pêk tê:

(Cînavê koma / ez / + di + binyata dema nuha + paşkoka kesîn)

Mînak:

- Gerîn: Ez + di + ger + im = ez digerim

- Xistin: Hûn + di + x + in = hûn dixin

- HD.....

Hemû tîpên karan, ên ku bi egera sivikbûnê hatine guhertin yan avêtin, di dema nuha de vedigerin reseniya xwe.

Wek:

**Forma Sivikbûyî    Dema Nuha    Forma Resen**

- Kuştin (kuşt)                dikuje                kujtin

- Bihîstin (bihîst)            dibihîze            bihîztin

- Firotin (firo)                difiroşe            firoştin

- Avêtin (avêt)                davêje            avêjtin

- HD.....

- **Karên Xwerû: (Ketin)**

**Erênî:**

- Ez dikevim <sup>(17)</sup>
- Tu dikevî
- Ew dikeve
- Em dikevin
- Hûn dikevin
- Ew dikevin

**Neyînî:**

- Ez nakevim
- Tu nakevî
- Ew nakeve
- Em nakevin
- Hûn nakevin
- Ew nakevin

**Pirsiyarî:**

- Bo çî ez dikevim?
- Çima tu dikevî?
- Ma ew jî dikeve?
- Çire em dikevin?
- Bo çî ew dikevin?
- Ew jî dikevin?.

**- Karên Dariştî: (Veketin)****Erênî:**

- Ez vedikevim

---

<sup>17</sup> - Karê (ketin ) jî (keftin ) sivik bûye. Resenîya karê (keftin ) jî (kevtin ) e. Tîpa / v / bi egera sertbûna tîpa / t / bûye / f /. Di dema nuha de tîpa / t / tê avêtin û tîpa / f / jî pêre dibe / v /.

- Tu vedikevî
- Ew vedikeve
- Em vedikevin
- Hûn vedikevin
- Ew vedikevin

**Neyînî:**

- Ez venakevim
- Tu venakevî
- Ew venakeve
- Em venakevin
- Hûn venakevin
- Ew venakevin

**Pirsiyarî:**

- Ma ez vedikevim?
- Kengî tu vedikevî?
- Ma ew jî vedikeve?
- Bo çi em vedikevin?
- Çima hûn vedikevin?
- Gelo ew jî vedikevin?.

**- Karên Lêkdayî: (Derketin)****Erênî:**

- Ez derdikevim
- Tu derdikevî
- Ew derdikeve
- Em derdikevin

- Hûn derdikevin

- Ew derdikevin

**Neyînî:** (Di raweya neyînî de alava / na / dikeve

navbera her du hêmanên karê lêkdayî):

- Ez dernakevim

- Tu dernakevî

- Ew dernakeve

- Em dernakevin

- Hûn dernakevin

- Ew dernakevin

**Pirsiyarî:**

- Ma ez derdikevim?

- Bo çî tu derdikevî?

- Çima ew derdikeve?

- Gelo em derdikevin?

- Ma hûn derdikevin?

- Çire ew derdikevin?.

**- Dema Paşeroj (Ayinde):**

Di pirtûkên rêzimanî de danasîna vê demê jî, weku demên dîtir, bi çend navlêkirinên têvel hatiye xwendin, wek (demê paşê, wextê paşwext, dema wêbê, dema bê, mand, paşeroj, ayinde...). Berçav e ku ev navlêkirin tev jî bi wateya dema piştî axaftinê hatine. Li vê gorê, dema paşeroj ew dem e, ya ku bûyerên karan, piştî dema axaftinê, tê de diqewimîn. Bi vê danasînê dema paşeroj demeke vekirî ye, ji piştî dema axaftinê destpê dibe û di nav demên nehatî de dirêj dajo.

Ev dem bi alîkariya daçekên (ê, dê), li gora vê rêzika jêrîn, saz dibe:

(Nav û cînavên koma / ez / + ê / dê + bi + binyata nuha + paşkokên kesane).<sup>(18)</sup>

<sup>18</sup> - nav jî li şûna cînavên koma (ez)bikar tên,

Wek:

(Ez + ê / dê + bi + ç + im) = ez ê/dê biçim.

Karên derhingêv û yên nederhingêv, di dema paşeroj de wekî hev tîn veguhestin, her du bi cînavên koma / ez / re tîn xebitandin û nîşandekên jimara kara li her du corên karan jî xuya dibin:

Nivistin:

- Ez ê binivim (xew bikim)

- Hûn ê binivin

Nivîsîn:

- Tu yê gotarê binivîsî

- Em ê gotarê binivîsin

Berî ku em dest bi veguhestina karan bikin, divê em bizanin, ku li hin herêman, di veguhestina karên vê demê de, (bi) nakeve ser binyata karên veguhestî:

- Ez ê çim (biçim)

- Hûn dê nivîsin (binivîsin)

Piştî vê ronîkirinê em ê li veguhestina karan, di dema paşeroj de vegerin.

**- Karên Xwerû: (Gerîn / geriyan)**

Erênî:

- Ez ê / dê bigerim

- Tu yê bigerî

- Ew ê bigere

- Em ê bigerin

- Hûn ê bigerin

- Ew ê bigerin

**Neyînî:** (Alava neyîniya karên dema paşeroj /na/ ye.

Piştî ku alava dema paşerojê (ê, dê) tê avêtin, / na / dikeve ser karê veguhestî û li şûna / bi / yê bikar tê:

- Ez nagerim
- Tu nagerî
- Ew nagere
- Em nagerin
- Hûn nagerin
- Ew nagerin <sup>(19)</sup>

**Pirsiyarî:**

- Ma ez ê bigerim?
- Bo çî tu yê bigerî?
- Çima ew ê bigere?
- Gelo em ê bigerin?
- Hûn ê jî bigerin?
- Çire ew ê bigerin? .

**- Karên Dariştî: (Vegerîn / vegeriyan)**

**Erênî:**

- Ez ê / dê vegerim
- Tu yê vegerî
- Ew ê vegere
- Em ê vegerin
- Hûn ê vegerin
- Ew ê vegerin

**Neyînî:**

---

<sup>19</sup> - Her wekî me berê jî gotiye, neyîniya dema paşeroja pêşkerî bi / na / yê pêk tê, wek : (Va îro ez ê biçim, sibe ez naçim ). Lê neyîniya paşeroja daxwazî bi / ne / yê pêk tê, wek : (Va îro ez ê biçim, sibe gerek ez neçim, xwezî tu jî neçî ).



- Ez venagerim
- Tu venagerî
- Ew venagere
- Em venagerin
- Hûn venagerin
- Ew venagerin

**Pirsiyarî:**

- Ma ez ê vegerim?
- Kengî tu yê vegerî?
- Ew ê jî vegere?
- Em ê çima vegerin?
- Ma hûn ê jî vegerin?
- Bo çî ew ê vegerin?.

**- Karên Lêkdayî: (Pêşketin)****Erênî:**

- Ez ê pêşkevim
- Tu yê pêşkevî
- Ew ê pêşkeve
- Em ê pêşkevin
- Hûn ê pêşkevin
- Ew ê pêşkevin

**Neyînî:**

- Ez pêşnakevim
- Tu pêşnakevî
- Ew pêşnakeve

- Em pêşnakevin
- Hûn pêşnakevin
- Ew pêşnakevin

**Pirsiyarî:**

- Ma ez ê pêşkevim?
- Gelo tu yê pêşkevî?
- Ew ê jî, pêşkeve?
- Em ê kengî pêşkevin?
- Çawa hûn ê pêşkevin?
- Ew ê çilo pêşkevin?.

Di veguhestina karên dema paşeroj û neyîniya wan de jî ew têveliya di navbera şarezayên zimanê me de derketiye holê. Pirraniya şarezayan karên dema paşeroj li gora rêzik û rêbaza derbasbûyî veguhestine.

Hindekan jî li gora baweriyên xwe, yan jî li gora devoka herêmên xwe, ew kar veguhestine:

- Seyda Sadiq Behadîne Amêdî di rêzimana xwe de dibêje <sup>(20)</sup>: Karên dema paşê (paşerojê) bi du coran tên

veguhestin, anku dema paşê du dem in:

1 - Dema paşê nêzîk:

- Ez ê dê çim (biçim)
- Ez ê dê gerim (bigerim)

2 - Dema paşê siriştî:

- Ez dê çim (biçim)
- Ez dê girim (bigirim)

Neyîniya karên dema (paşê nêzîk) bi vî şeweyî saz

dibe:

<sup>20</sup> - S. B. Amêdî : Rêzimana Kurdî. Bexda (1987 ). Rû. (351 - 352 - 353 ).

- Ez ne dê çim

- Ez ne dê girim

Neyîniya karên dema (paşê siriştî) jî bi van her du

Şêweyan saz dike:

1 - Ez ne dê çim

- Ez ne dê girim

2 - Ez naçim

- Ez nagirim.

Diyar e ku erênî û neyîniya karên dema (paşê nêzîk) ne li ser asta hemû herêmên şêwezarê Kurmancî bikar tê, dibe ku devokeke Behdînanî be.

Wisan jî şêweyê yekê , ji neyîniya karên dema (paşê siriştî), ew jî devokeke herêmî ye. Bi dîtina min, gerek ew devok nekevin zimanê nivîskî, tenê weku devokên xwecî bêne bihîstin.

- **Mamoste Samî Tan** jî, dibêje<sup>(21)</sup>: (qertafa neyîniyê ya dema bê / ne / ye...). Li vê gorê Mamoste Samî van mînakên berçav dike:

- Ez ê negirim

- Ez ê hilnegirim

**Beriya nuha** me amaje pê kiriye, ku ev / ne / bo neyîniya dema paşeroja pêşkerî bikar nayê, lê di raweya paşeroja daxwazî de, weku alava neyînê bikar tê.

Wek:

- Gelo ku ez te bibînim, ma ez ê silavê li te

nekim?

- Bi gumana min, em ê neçin Amedê û em ê

hev nebînin.

Di heman jêderê de (Rû. 239 - 240), Samî dibêje, dema (bê ya nêzîk) jî heye. Li gora dîtina Samî ev dem bi alîkariya karê (lêkera) " kirin " pêk tê.

<sup>21</sup> - Samî Tan : Rêziman û rênivîsa zaravayê Kurmancî. Stanbol (2005). Rû. (239 - 240 ).

Wek:

- Ez dikim nên bixwim
- Tu dikî bizinê bidoşî.

Ji hêla wateyê ve, têgeha dema (bê ya nêzîk) di vê raweyê de heye, wekî ku em bibêjin:

- Wextî ez nên bixwim
- Ez karê xwe û (nanxwarinê) dikim.
- Ez li ber (dema) xwarina nên im.
- (Hêj min nan nexwariye, lê ez li ber

destpêkirina xwarinê me.

Bi vê watedariyê, rast ew rawe dema (bê ya nêzîk) destnîşan dike. Lê ji hêla teşe û binasaziyê ve, ev rawe nakeve bin sîwana hel û mercên dema paşeroj. Mercê serekî, yê vê demê ew e, ku yek ji alavên (nîşandekên) paşerojê / ê, dê / di hevokê de peyda bibe. Ji aliyekî dî ve, karê (kirin) di demên dîtir de jî wê wateyê nîşan dike:

- Dikira ez biketima (wextî ez biketima)
- Te dikir ku tu bibêjî
- Kirî te bigota

Raweya vê hevokê (ez dikim nên bixwim) raweyek daxwazî ye, beranberî dema nuha û paşeroj raweya xwe girtiye.

Ji ber ku ev hevok di raweya daxwazî de ne, neyîniya wan bi alava / ne / pêk hatiye:

**Erênî:**

- Ez dikim biçim
- Ez dikim bigirim

**Neyîni:**

- Ez dikim neçim
- Ez dikim negirim

Lê eger ew hevok di dema paşeroja pêşkerî de bûna, gerek neyîniya wan bi alava / na / pêk hatibûya. Ev jî nebûye û nabe.

Aheng û kategoriya karên nederhingêv bi karayên (kiryarên) wan ve girêdayî ye. Anku, nîşandekên jimara karayan di hemû dem û raweyan de li karên wan xuya dibin:

**Dema Borî:**

- Mêvan çûye (yekjimar)
- Mêvan çûne (komjimar)

**Dema Nuha:**

- Mêvan diçe
- Mêvan diçin

**Dema Paşê:**

- Mêvan ê biçe
- Mêvan ê biçin

**Daxwazî:**

- Bila mêvan biçe
- Bila mêvan biçin

**b - Karên Derhingêv:**

Me berê jî gotiye, ku raweya karên pêşkerî bi xebitandina karên derhingêv û nederhingêv di demên borî, nuha û paşeroj de pêk tê. Beriya nuha me karên nederhingêv di her sê demên pêşkerî de veguhestin, nuha jî em ê karên derhingêv di demên pêşkerî de veguhêzin:

**- Demên Borî:**

Beriya ku em dest bi veguhestina karên derhingêv bikim dixwazim çend têbîniyan diyar bikim:

a - Hemû guhertinên danganî, yên ku di pêvajoya veguhestinê de ghiştine karên nederhingêv digihêjin karên derhingêv jî.

b - Karên derhingêv di her çar demên borî de bi karayên (kiryarên) ku ji cînavên kesîn, koma (min) re tên veguhestin:

- Te pirtûk xwendiyê.

Lê di dema nuha û paşerojê de, bi karayên ku ji cînavên kesîn, koma / ez / re tîn veguhestin:

-Tu pirtûkê dixwînî

-Tu yê pirtûkê bixwînî

Di veguhestina karên nederhingêv de me dît, ku dema borî li gora dûrbûn û nêzîkbûna ji dema axaftinê dibe / 4 / borî, (nêzboriya xwerû, boriya sergihayî, boriya berdewam û boriya çîrokî).

### 1- Nêzboriya Xwerû:

- **Karên Xwerû: (Çandin)**

**Erênî:**

- Min darek çand

- Te darek çand

- Wî / wê darek çand

- Me darek çand

- We darek çand

- Wan darek çand

**Neyînî:**

- Min darek neçand

- Te darek neçand

- Wî / wê darek neçand

- Me darek neçand

- We darek neçand

- Wan darek neçand

**Pirsiyarî:**

- Ma min darek neçand?

- Bo çî te darek neçand?

- Çima wî darek neçand?
- Gelo me jî darek çand?
- We jî darek neçand?
- Çire wan darek neçand?.

**- Karên Dariştî: (Hilçînîn)**

**Erênî:**

- Min gulek hilçînî
- Te gulek hilçînî
- Wî / wê gulek hilçînî
- Me gulek hilçînî
- We gulek hilçînî
- Wan gulek hilçînî

**Neyînî:** (Di neyîniya karên dariştî de alava / ne /

dikeve navbera pêşgir û karê xwerû:

- Min venexwar

**Li hin herêman / ne / dikeve pêş karê dariştî:**

- Min nevexwar
- Min gulek hilneçînî
- Te gulek hilneçînî
- Wî / wê gulek hilneçînî
- Me gulek hilneçînî
- We gulek hilneçînî
- Wan gulek hilneçînî

**Pirsiyarî:**

- Ma min gulek hilçînî?

- Kengî te gulek hilçinî?
- Bo çî wî gulek hilçinî?
- Çima me gulek hilçinî?
- We jî gulek hilçinî?
- Çire wan gulek hilçinî?

**- Karên Lêkdayî: (Avdan)**

**Erênî:**

- Min zevî avda
- Te zevî avda
- Wî / wê zevî avda
- Me zevî avda
- We zevî avda
- Wan zevî avda

**Neyînî:** Di neyîniya karên lêkdayî de jî alava / ne/

dikeve navbera her du hêmanên karê lêkdayî:

- Min berneda

Li herêminan alava / ne / dikeve pêş karê lêkdayî:

- Min neberda
- Min zevî avneda
- Te zevî avneda
- Wî / wê zevî avneda
- Me zevî avneda
- We zevî avneda
- Wan zevî avneda

**Pirsiyarî:**



- Gelo min zevî avda?
- Ma te jî zevî avda?
- Bo çî wî zevî avda?
- Me jî zevî avda?
- Çima we zevî avda?
- Çire wan zevî avda?

## **2 - Boriya Sergihayî:**

### **- Karên Xwerû: (Xistin)**

#### **Erênî:**

- Min ew xistiye
- Te ew xistiye
- Wî / wê ew xistiye
- Me ew xistiye
- We ew xistiye
- Wan ew xistiye

#### **Neyînî:**

- Min ew nexistiye
- Te ew nexistiye
- Wî / wê ew nexistiye
- Me ew nexistiye
- We ew nexistiye
- Wan ew nexistiye

#### **Pirsiyarî:**

- Min kengî ew xistiye?
- Ma te ew xistiye?

- Çima wî ew xistiye?
- Me li kû ew xistiye?
- Bo çi we ew xistiye?
- Wan ew bi çi xistiye?

**- Karên Dariştî: (Raxistin)**

**Erênî:**

- Min xalîçe raxistiye
- Te xalîçe raxistiye
- Wî / wê xalîçe raxistiye
- Me xalîçe raxistiye
- We xalîçe raxistiye
- Wan xalîçe raxistiye

**Neyînî:**

- Min xalîçe ranexistiye
- Te xalîçe ranexistiye
- Wî / wê xalîçe ranexistiye
- Me xalîçe ranexistiye
- We xalîçe ranexistiye
- Wan xalîçe ranexistiye

**Pirsiyarî:**

- Ma min xalîçe raxistiye?
- Kengî te xalîçe raxistiye?
- Bo çi wî / wê xalîçe raxistiye?
- Me li kû xalîçe raxistiye?
- Ma we jî xalîçe raxistiye?

- Çima wan xalîçe raxistiye?

**- Karên Lêkdayî: (Derxistin)**

**Erênî:**

- Min ew derxistiye
- Te ew derxistiye
- Wî / wê ew derxistiye
- Me ew derxistiye
- We ew derxistiye
- Wan ew derxistiye

**Neyînî:**

- Min ew dernexistiye
- Te ew dernexistiye
- Wî / wê ew dernexistiye
- Me ew dernexistiye
- We ew dernexistiye
- Wan ew dernexistiye

**Pirsiyarî:**

- Ma min ew derxistiye?
- Kengî te ew derxistiye?
- Çima wî / wê ew derxistiye?
- Bo çi me ew derxistiye?
- Ma we jî ew derxistiye?
- Ma kengî wan ew derxistiye?

- ....

**3 - Boriya Berdewam:**

**- Karên Xwerû: (Kirin)****Erênî:**

- Min karek dikir
- Te karek dikir
- Wî / wê karek dikir
- Me karek dikir
- We karek dikir
- Wan karek dikir

**Neyînî:**

- Min karek nedikir
- Te karek nedikir
- Wî / wê karek nedikir
- Me karek nedikir
- We karek nedikir
- Wan karek nedikir

**Pirsiyarî:**

- Ma min karek dikir?
- Te çi kar dikir?
- Ka wî çi dikir?
- Me ji kê re kar dikir?
- Wan bo kê kar dikir?

**- Karên Dariştî: (Vekirin)****Erênî:**

- Min pencere vedikir
- Te pencere vedikir

- Wî / wê pencere vedikir
- Me pencere vedikir
- We pencere vedikir
- Wan pencere vedikir

**Neyînî:**

- Min pencere venedikir
- Te pencere venedikir
- Wî / wê pencere venedikir
- Me pencere venedikir
- We pencere venedikir
- Wan pencere venedikir

**Pirsiyarî:**

- Ma min pencere vedikir?
- Gelo te pencere vedikir?
- Bo çi wî pencere vedikir?
- Me çima pencere vedikir?
- Çima we pencere vedikir?
- Ma wan jî, pencere vedikir?

**- Karên Lêkdayî: (Serjêkirin)****Erênî:**

- Min berxek serjêdikir
- Te berxek serjêdikir
- Wî / wê berxek serjêdikir
- Me berxek serjêdikir
- We berxek serjêdikir

- Wan berxek serjêdikir

**Neyînî:**

- Min berxek serjênedikir
- Te berxek serjênedikir
- Wî / wê berxek serjênedikir
- Me berxek serjênedikir
- We berxek serjênedikir
- Wan berxek serjênedikir

**Pirsiyarî:**

- Ma min berxek serjêdikir?
- Çima te berxek serjêdikir?
- Bo çi wî berxek serjêdikir?
- Kengî me berxek serjêdikir?
- Ma we jî berxek serjêdikir?
- Çire wan berxek serjêdikir?

**4 - Boriya Çîrokî:**

**- Karên Xwerû: (Anîn / Înan)**

**Erênî:**

- Min pirtûkek anîbû / înanbû
- Te pirtûkek anîbû / înanbû
- Wî / wê pirtûkek anîbû / înanbû
- Me pirtûkek anîbû / înanbû
- We pirtûkek anîbû / înanbû
- Wan pirtûkek anîbû / înanbû

**Neyînî:**

- Min pirtûkek nanîbû (ne- anîbû)
- Te pirtûkek nanîbû
- Wî / wê pirtûkek nanîbû
- Me pirtûkek nanîbû
- We pirtûkek nanîbû
- Wan pirtûkek nanîbû

**Pirsiyarî:**

- Ma min pirtûkek nanîbû?
- Bo çi te pirtûkek nanîbû?
- Çima wî pirtûkek nanîbû?
- Kengî me pirtûkek nanîbû?
- Ma we jî pirtûkek nanîbû?
- Çire wan pirtûkek nanîbû?

**- Karên Dariştî: (Danîn)**

**Erênî:**

- Min pirtûkek danîbû ser maseyê
- Te pirtûkek danîbû ser maseyê <sup>(22)</sup>
- Wî / wê pirtûkek danîbû ser maseyê
- Me pirtûkek danîbû ser maseyê
- We pirtûkek danîbû ser maseyê
- Wan pirtûkek danîbû ser maseyê

**Neyînî:**

- Min pirtûkek dananîbû

---

<sup>22</sup> - Danîn : (da + anîn ). - Mîn (danî ) = min (da-anî ). Du tîpên dengdêr gihiştine hev, / a / ya / da/ tê avêtin = min (d....anîbû ).

- Te pirtûkek dananîbû
- Wî / wê pirtûkek dananîbû
- Me pirtûkek dananîbû
- We pirtûkek dananîbû
- Wan pirtûkek dananîbû

#### **Pirsiyarî:**

- Ma min pirtûkek danîbû?
- Çima te pirtûkek danîbû?
- Bo çi wî pirtûkek danîbû?
- Kengî me pirtûkek danîbû?
- We li kû pirtûkek danîbû?
- Çire wan pirtûkek danîbû?

#### **- Karên Lêkdayî: (Deranîn)**

##### **Erênî:**

- Min pirtûkek deranîbû
- Te pirtûkek deranîbû
- Wî / wê pirtûkek deranîbû
- Me pirtûkek deranîbû
- We pirtûkek deranîbû
- Wan pirtûkek deranîbû

##### **Neyînî:**

- Min pirtûkek dernanîbû <sup>(23)</sup>
- Te pirtûkek dernanîbû
- Wî / wê pirtûkek dernanîbû

---

<sup>23</sup> - Dernanî : Derne-anî = dern....anî = dernanî.



- Me pirtûkek dernanîbû
- We pirtûkek denanîbû
- Wan pirtûkek dernanîbû

**Pirsiyarî:**

- Ma min pirtûkek deranîbû?
- Kengî te pirtûkek deranîbû?
- Bo çi wî / wê pirtûkek deranîbû?
- Me pirtûkek deranîbû?
- Çima we pirtûkek deranîbû?
- Wan çilo pirtûkek deranîbû?

**- Dema Nuha:**

(Me berê jî gotiye, karên derhingêv di demên borî de bi cînavên kesîn ên koma (min) re tîn veguhestin. Lê di dema nuha û paşê de, ev kar, weku karên nederhingêv, bi cînavên kesîn ên koma / ez / re tîn veguhestin:

**- Karên Xwerû: (Dan)****Erênî:**

- Ez pênuşê didim Nazê
- Tu pênuşê didî
- Ew pênuşê dide
- Em pênuşê didin
- Hûn pênuşê didin
- Ew pênuşê didin

**Neyînî:**

- Ez pênuşê nadim Nazê
- Tu pênuşê nadî
- Ew pênuşê nade

- Em pêûsê nadin
- Hûn pêûsê nadin
- Ew pêûsê nadin

**Pirsiyarî:**

- Ma ez pêûsê didim Nazê?
- Çima tu pêûsê didî?
- Kî pêûsê dide?
- Çire em pêûsê didin?
- Bo çi hûn pêûsê didin?
- Ew çima pêûsê didin?

**- Karên Dariştî: (Vedan)****Erênî:**

- Ez xapikê vedidim <sup>(24)</sup>
- Tu xapikê vedidî
- Ew xapikê vedide
- Em xapikê vedidin
- Hûn xapikê vedidin
- Ew xapikê vedidin

**Neyînî:**

- Ez xapikê venadim
- Tu xapikê venadî
- Ew xapikê venade
- Em xapikê venadin
- Hûn xapikê venadin

---

<sup>24</sup> - Xapik : Xefik.

- Ew xapikê venadin

**Pirsiyarî:**

- Ez xapikê li ber çi vedidim?

- Ma tu jî xapikê vedidî?

- Bo çi ew xapikê vedide?

- Ma em jî xapikê vedidin?

- Hûn li kû xapikê vedidin?

- Çima ew xapikê vedidin?

**- Karên Lêkdayî: (Avdan)**

**Erênî:**

- Ez gulê avdidim

- Tu gulê avdidî

- Ew gulê avdide

- Em gulê avdidin

- Hûn gulê avdidin

- Ew gulê avdidin

**Neyînî:**

- Ez gulê avnadim

- Tu gulê avnadî

- Ew gulê avnade

- Em gulê avnadin

- Hûn gulê avnadin

- Ew gulê avnadin

**Pirsiyarî:**

- Ma ez gulê avdidim?

- Tu kengî gulê avdidî?
- Çilo ew gulê avdide?
- Em gulê avdidin?
- Hûn çima gulê avdidin?
- Çawa ew gulê avdidin?

**- Dema Paşeroj (Ayinde):**

**- Karên Xwerû: (Xistin)**

**Erênî:**

- Ez ê / dê birincê bixim <sup>(25)</sup> tûr
- Tu yê birincê bixî tûr
- Ew ê birincê bixe tûr
- Em ê birincê bixin tûr
- Hûn ê birincê bixin tûr
- Ew ê birincê bixin tûr

**Neyînî:**

- Ez birincê naxim tûr <sup>(26)</sup>

---

<sup>25</sup> - Karê (bixim) ji jêdera (xistin) e. Lê karê (bêxim) ji jêdera (êxistin) e :

- Xistin : Ez ê bixim.

- Êxistin : Ez ê bêxim (bi - êxim).

<sup>26</sup> - Berê jî me amaje pê kiriye, ku neyîniya paşeroja pêşkerî bi alava / na / pêk tê : (Îro ez ê biçim û sibe ez naçim ). Lê paşeroja daxwazî bi alava / ne / dikeve raweya neyînê : (Îro ez ê biçim, lê sibe gerek ez neçim, xwezî ez neçim.....

- Tu birincê naxî tûr
- Ew birincê naxe tûr
- Em birincê naxin tûr
- Hûn birincê naxin tûr
- Ew birincê naxin tûr

**Pirsiyarî:** - Ma ez ê birincê bixim çi?

- Tê (tu yê) çima birincê bixî tûr?
- Ew ê jî birincê bixe tûr?
- Em ê bo çi birincê bixin tûr?
- Ma hûn ê jî birincê bixin tûr?
- Çire ew ê birincê bixin tûr?

**- Karên Dariştî: (Daxistin)**

**Erênî:**

- Ez ê / dê satilê daxim çalê
- Tu yê satilê daxî
- Ew ê satilê daxe
- Em ê satilê daxin
- Hûn ê satilê daxin
- Ew ê satilê daxin

**Neyînî:**

- Ez satilê danaxim çalê
- Tu satilê danaxî
- Ew satilê danaxe
- Em satilê danaxin
- Hûn satilê danaxin

- Ew satilê danaxin

**Pirsiyarî:**

- Ma ez ê satilê daxim?
- Tu yê kengî satilê daxî?
- Ew ê çawa satilê daxe?
- Ma em ê jî satilê daxin?
- Hûn ê çima satilê daxin?
- Ma ew ê jî satilê daxin?

**- Karên Lêkdayî: (Derxistin)**

**Erênî:**

- Ez ê satilê derxim
- Tê (tu yê) satilê derxî
- Ew ê satilê derxe
- Em ê satilê derxin
- Hûn ê satilê derxin
- Ew ê satilê derxin

**Neyînî:**

- Ez satilê dernaxim
- Tu satilê dernaxî
- Ew satilê dernaxe
- Em satilê dernaxin
- Hûn satilê dernaxin
- Ew satilê dernaxin

**Pirsiyarî:**

- Ez ê çawa satilê derxim?

- Kengî tu yê satilê derxî?
- Ew ê jî satilê derxe?
- Gelo, em ê çawa satilê derxin?
- Çima hûn ê satilê derxin?
- Bo çi ew ê satilê derxin?

Aheng û kategoriya karên derhingêv li gora dema veguhestinê, bi kara û berkarên re saz dibe:

1 - Di borî de kara di raweya verêse (tewangê) de ye, nîşandekên jimara wan li wan xuya dibin. Hingê aheng û kategoriya karan bi berkarên rasteder ve girêdayî ye. Anku, nîşandekên jimara berkarên li karan xuya dibin:

- Hevalan belavok xwend  
(Yek belavok hat xwendin)
- Hevalan belavok xwendin  
(gelek belavok xwendin).

2 - Di dema nuha û paşeroj de berkar dikeve raweya verêse û nîşandekên jimarê li wan xuya dibin. Hingê, aheng û kategoriya karan bi karayan ve girêdayî ye. Anku, nîşandekên jimara karayan li karên wan xuya dibin:

- Heval belavokê dixwîne (yek heval dixwîne)
- Heval belavokê dixwînin (gelek heval dixwînin)

Di paşerojê de jî heman şêwaz e:

- Heval dê belavokê bixwîne (yek heval)
- Heval dê belavokê bixwînin (gelek heval)

### **Çend Têbîniyên Giring:**

Piştî ku me karên derhingêv û nederhingêv di demên pêşkerî (borî, nuha û paşê) de veguheztin, em ê çend têbîniyên giştî derbarê veguhestina karan, di ber çavên xwe re derbas bikin.

1 - Hemû karên ku ne li ser rêzik û rêbaza wan karên derbasbûyî tên veguhestin, anku karên rêzder (awarte), wek: (viyan, şiyar, zanîn, karîn, wêrîn, hatin, bûn û hebûn...), em ê li dawîya veguhestina raweyên daxwazî li wan vegerin û li ser veguhestina wan rawestin.

2 - Seyda **Feqî Huseyn Sagniç** di pirtûka xwe de (Hêmana Rêzimanê Kurdî). Rû / 126 / vê gotina pêşiyar di ber çavan re derbas dike: “Nediçim newalên kûr, Nedibînim xewnên hûr .” Di vê gotinê de her du karên dema nuha (diçim, dibînim) bi alava / ne / ketine raweya neyînê (nediçim) û (nedibînim). Ev jî arîşeyekê raberî me dike. Çiku me berî nuha gotibû, alava neyîniya karên dema nuha / na / ye û li wê gorê jî me mînakên xwe nivîsîne. Lê di vê gotina pêşiyar de, alava / ne / li şûna /na / bikar hatiye. Ka ev çawa dibe?

Bi dîtina min, alava / ne / ji bo neyîniya tevaya hevokê (li ser hev) bikar hatiye, ne ku li şûna / na / bo neyîniya karên nuha (diçim, dibînim) bikar hatiye.

Bi vê dîtînê gerek ev gotina pêşiyar, bi vî rengî bihata: (Ne / ez / diçim newalên kûr, ne / ez / dibînim xewnên hûr). Bi bawerîya min, reseniya vê gotina pêşiyar jî ev e, lê bi egera sivikbûna derbirînê cînavê / ez / hatiye avêtin û / ne / hatiye pêş karê dema nuha<sup>(27)</sup>.

3 - Eger karê li ber veguhestinê bi tîpeke dengdêr dest pê bibe, di dema nuha de tîpa / i / ji pêşgira dema nuha / di /, bi sedema sivikbûnê, tê avêtin:

- Ajotin: Ez di-ajom = ez d...ajom = ez dajom (tajom)
- Êşan: Ez di-êşim = ez d...êşim = ez dêşim (têşim)
- Înan (anîn): Ez di-înim = ez d...înim = ez dînim (tînim).

4 - Li hin herêmên Kurdistanê raweya veguhestina karên dema nuha vederî rêzika vê veguhestina giştî (ez diçim) bikar tê:

a - Li herêma Behdînan, Sadiq Behadînê Amêdî di pirtûka xwe de (Rizimana Kurdî). Bexda (1987). Rû / 347 / dibêje: Di Kurmancî de dema nuha du cor in:

- Nuha berçav: (Ez ê diçim)
- Nuho paşê berçav: (Ez diçim)

<sup>27</sup> - Hevok bi / ne / ye tê neyînkirin : - Ne tu tîyê û ne tu diçî.

- Kesê ev tişt kir, ne ez bûm û ne tu bûyî.



Ev (nuho) ya berçav ne li hemû herêmên Kurmancî bikar tê. Bi dîtina min ev (nuha) devokeke xwecî ye. Li hin herêmkên teng (li Sûriyê) jî ev devok tê bihîstin: (Ez î diçim), (Va ez î diçim).

b - Prof. **Qenatê Kurdo** di pirtûka xwe de, ya bi navê (Zimanê Kurdî - Rêziman). Firankfort (1981) - Rû. / 95 - 96 - 97 / dibêje: Du corên wexta niha hene:

- Nihaya dirêj:

- Ez dikevim

- Nihaya berçavan:

- Ez wê dikevim

- Ez wa dikevim

- Ez va dikevim

**Q. Kurdo** dibêje, ev nîşandek (wê, wa, va) dikevin ser nihaya dirêj û nihaya berçavan saz dikin.

Bi dîtina min ev alav (va, wa)alavên agadariyê ne, bala guhdaran dikişînin ser karekî ku dest pê bûye, wek:

- Ka tu neçûyî?

- Belê va ez diçim !

c - Li hin herêmên Bakur û Rojavayê welêt tîpa / e / bi ser karê dema nuha ve tê berdand, wek (ez diçim + e = ez diçime). Ev şewaz di hinek pirtûkên rêzimanî de bi navê nuhaya (fireh) û nuhaya (domdar) hatiye nasîn.

Bi egera ku zimanê me demeke pir dirêj, weku zimanekî devikî (bê nivîsîn) maye, gelek şewezarên herêmî û derbirînên xwecî ketine rêzik û rêzanên reseniya wî û lê zêde bûne. Gelek tiştên resen jî, bi dirêjahiya demê re, jê ketine û wînda bûne. Ev pîrbûna raweyên veguhestina karan jî, yek ji encama wê pîrbûna zar û devokiyên herêmkî ye.

Bi baweriya min gerek em hindekî, bi şeweyekî zanistî, li ser zimanê xwe rawestin, em wî ji gelek bargiraniyên zêde dawêşînin û em wî li gora xwestekên vê serdemê vekolin û wî bi rêzik û destûrên pêdivî biparêzin.

Bi vê baweriyê min hindek dem û raweyên veguhestina karan, ên devokiyên xwecî paşguh kirine û min veguhestina karan di van demên pêşkerî, yê sereke tenê de xebitandiye:

\* - / 4 / demên borî:

- Nêzboriya Xwerû
- Boriya Sergihayî
- Boriya Berdewam
- Boriya Çîrokî

\* - Dema Nuha: - (Ez diçim)

\* - Dema Paşeroj: - (Ez ê / dê biçim)

Raweyên veguhestinê yên mayî jî raweyên daxwazî ne. Em ê wan li pey van têbîniyan şirove bikin.

## 2 - Raweyên Daxwazî:

Di destpêka veguhestina karan de me got, demên (Borî, Nuha û paşeroj) pêşkerî ne, kar di wan her sê deman de salixê qewimandina bûyeran pêşberî me dike, çî ew salix rastbûyîn be çî nerastbûyîn be, lê herî salixdan e.

Raweyên daxwazî jî ew rawe ne, yên ku nakevin ber pîvana rastî û nerastiya qewimandinê. Anku, bûyerên karên van raweyan di çarçova xwestek û dilniyazan de dimînin, wekî ku em bibêjin: (Xwezî baran bibare, gerek baran bibare, eger baran bibare...). Berçav e ku çî salixdan di van hevokan de nîn e, tenê xwestek û daxwazî ne.

Mijara raweyên daxwazî di zimanê Kurdî (Kurmancî) de mijareke tevhev û aloz e. Ev mijar di pirtûkên rêzimana Kurdî de baş zelal nebûye. Dema ku mirov bixwaze arîşeya vê mijara giring bipîve, gerek di pirtûkên rêzimanî de lê bigere, nemaze pirtûkên van şarezayan (Qenatê Kurdo, Feqî Huseyn Sagniç û Murad Ciwan<sup>(28)</sup>).

Digel ku van şarezayên zimên bi firehî mijar tevdaye jî, lê xwendevan di nav wiqas rawe û wiqas navlêkirin de winda dibe.

Nuha jî em ê bi hev re li ser raweyên daxwazî rawestin û wan yekayek rave bikin.

## - Raweya Fermanî:

<sup>28</sup> - Murad Ciwan : (Kurdçe Dilbilgesî - Kurmanc Lehcesî ). Jîna Nû - Siwêd / 1992 /.

**Raweya fermanî ew rawe ye, ya ku bûyîna karên wê bi xwestekeke fermanî pêk tê, yan jî tê xwestin ku pêk bê. Dem di vê raweyê de vekirî ye, ji dema fermanî ta pêkanîna dirêj dibe.**

Rêzika bikaranîna raweya fermanî ev e:

(Pêşgira fermanî / bi/ + binyata nuha + paşkoka / e, in /)

Wek:

- Ketin:

- (Bi + kev + e) = bikeve

- (Bi + kev + in) = bikevin

**Karên ku binyata wan ya dema nuha bi tîpeke dengdêr kuta bibe, di fermanî de paşkoka / e / û tîpa / i / ji paşkoka / in /, bi egera sivikbûnê tîpê avêtin.**

Wek:

- şuştin: Bişo, bişon

- Cûtin: Bicû, bicûn

- Ajotin: Bajo, bajon

- Guran: Bigirû, bigirûn

**Di fermaniya karên dariştî de pêşgira fermanî / bi / nayê xebitandin.**

Wek:

- Rabûn: rabe, rabin

- Daxistin: daxe, daxin

- Vekirin: veke, vekin

- HD.....

**Di raweya fermanî de kesê berferman, herî kesê duwem ê guhdar e, yê ku pêşberî fermanî guhdarî fermanî ye. Anku, ne durist e ku em fermanê bidin xwe, yan jî bidin kesê sêyem ê nediyar. Bi sedema ku kesê berferman pêşber û guhdar e, pêwîstî nîn e ku em navê wî yan cînavê wî destnîşan bikin.**

Hin caran alavên agadariyê (de, dê) li pêş karên fermanî tîpê xebitandin:

- De rabe em biçin
- De rabin em biçin
- Dê bibêje (bêje) <sup>(29)</sup>
- Dê bibêjin

Beriya nuha me gotibû, ku pêşgira fermanî / bi / dikeve ser karên fermanî yên xwerû û nakeve ser karên dariştî. Wek:

- Xwarin: bixwe, bixwin
- Vexwarin: vexwe, vexwin

Lê hin karên dariştî û lêkdayî hene, li hin herêman pêşgira / bi / dikeve navbera hêmanên wan karan û li hin herêman nakeve navbera wan.

Wek:

- Hilgirtin: hilbigire = hilgire
- Wergirtin: werbigire = wergire
- Têdan: têbide = têde
- Hilkirin: hilbike = hilke
- Jêkirin: jêbike = jêke
- Lêkirin: lêbike = lêke
- Lêdan: lêbide = lêde
- HD.....

Di neyîniya raweya fermanî de yek ji van her du alavên neyîniyê (ne, me) dikeve ser karên fermanî.

Wek:

- Nekeve / mekeve
- Nekevin / mekevin

---

<sup>29</sup> - Ji ber ku tîpa / b / di (bibêje) û (bêje) de dubare dibe, bi egera sivikbûnê, carinan pêşgira / bi / nakeve ser (bêje). Lê li gora rêzikê gerek bikeve ser, (bibêje).

- Xwe newestîne / xwe mewestîne

- Xwe newestînin / xwe mewestînin

Diyar e ku alava neyîniyê li şûna / bi / ya fermanî bikar tê. Di neyîniya karên dariştî û lêkdayî de jî alava neyîniyê cihê / bi / yê digire.

Wek:

- Werbigire = wernegire / wermegire

- Têbide = tênede / têmede

- Jêbike = jêneke / jêmeke

- Lêbide = lêneke / lêmede

Eger / bi / di raweya fermanî de bikar nehatibe jî, dîsan / ne, me / li şûna wê bikar tên:

- Wergire = wernegire / wermegire

- Hilde = hilnede / hilmede

- Berde = bernede / bermede

- Vexwe = venexwe / vemexwe

- Rakeve = ranekeve / ramekeve

- Lêxe = lênexwe / lêmexwe

Gelek caran jî, wateya karê fermanî, ji têgeha xwestina fermandarî derdikeve û dikeve warê hevî, tika, lavij û amojgariyê (şîretê).

Wek:

- Berdewam serkevtî be !

- Li min negire !

- Di jiyana xwe de xêrxwaz bin !

- Gerek hûn zimanê xwe jibîr nekin !

- Serfiraz bijîn !

- HD.....

Raweyên daxwazî yên dîtir (mercî, bilanî, gerekî, xwezînî...), li gora demên pêşkerî (borî, nuha û paşê) formên xwe werdigirin û bi wan forman jî demên daxwaziyên wan tên nasîn. Bi vê girêdana di navbera raweyên daxwazî û demên pêşkerî de, em rêbazeke nû ji veguhestina van raweyan re ronî dikin.

Weku nimûne, karên (ketin, xwestin) di raweya (gerekî) de:

**Demên Pêşkerî      Raweyên Daxwazî**

**Borî:**

- |              |                      |
|--------------|----------------------|
| - Ez ketim   | gerek ew jî biketa   |
| - Ez ketime  | gerek ew jî ketibe   |
| - Ez diketim | gerek ew jî ketiba   |
| - Ez ketibûm | gerek ew jî ketibûya |

**Nuha:**

- |              |                    |
|--------------|--------------------|
| - Ez dikevim | gerek ew jî bikeve |
|--------------|--------------------|

**Paşeroj:**

- |                |                    |
|----------------|--------------------|
| - Ez ê bikevim | gerek ew jî bikeve |
|----------------|--------------------|

**- (Xwestin):**

**Dema Pêşkerî      Raweyên Daxwazî**

**Borî:**

- |                |                        |
|----------------|------------------------|
| - Min xwest    | gerek wî jî bixwesta   |
| - Min xwestiye | gerek wî jî xwestibe   |
| - Min dixwest  | gerek wî jî xwestiba   |
| - Min xwestibû | gerek wî jî xwestibûya |

**Nuha:**

- |               |                     |
|---------------|---------------------|
| - Ez dixwazim | gerek ew jî bixwaze |
|---------------|---------------------|

**Paşeroj:**

- |                 |                     |
|-----------------|---------------------|
| - Ez ê bixwazim | gerek ew jî bixwaze |
|-----------------|---------------------|

Ji van nimûneyan tê zanîn ku:

1 - Raweyên daxwazî, yên beranberî dema nuha û

paşeroj weku hev tên (bikeve, bixwaze).

2 - Formên hemû raweyên daxwazî / 5 / form in:

- / 4 / ji wan beranberî demên borî ne, (biketa, ketibe,  
ketiba, ketibûya).

- / 1 / beranberî dema nuha û paşeroj, (bikeve).

3 - Ev her / 5 / form di hemû raweyên daxwazî de bikar tên, her yek ji wan li gora dem û wateya raweyê, cihê xwe di hevoka daxwazî de digire.

Piştî vê ronîkirinê em ê li raweyên daxwazî yên dîtir vegerin û wan li gora nimûneyên jorîn rave bikin.

#### - Raweya Mercî (Şertî):

Hevoka mercî, ya watedar û sergihayî (temam), ji / 3 / hêmanên (regezên) sereke pêk tê:

1 - Alava mercî

2 - Karê sermerc

3 - Karê bermerc

Ev jî tê wê wateyê, ku hevoka mercî ya sereke ji du hevokên hevgirêdayî saz dibe:

1 - Hevoka sermerc, ku dibe sedema hebûna

hevoka duwem (bermerc).

2 - Hevoka bermerc, ku encama hebûna hevoka

Yekem (sermerc) e.

Wek:

- Eger tu bixwînî , tu yê biserkevî

/ 1 /        / 2 /

Diyar e ku di vê mînakê de, mercê serkeftinê xwendin e.

Me got, hevoka mercî ya sergihayî bi sê hêmanan saz dibe:

### 1 - Alavên Mercî:

Alavên mercî ew alav in, ên ku dikevin ser karên sermerc û bi egera wan karên bermerc û sermerc bi hev ve tînin girêdan. Ew alav jî ev in: (Heger, eger, ger, heke, ku, er).

Wek:

- Heger: Heger derfet hat xwe nedin paş

- Eger: Eger tu mîr bî şevên tarî pirr in

- Ger: (Heger, eger).

- Ger hûn hatin, me agadar bikin

- Heke: Heke baran bibare, giya dê şîr bê

- Ku: Ku giya şîr hat çêre dê xweş bibe

- Er: (Heger, eger):

Melayê Cizîrî dibêje:

(Er bi kuştin wer bi hiştin                      Emr û fermana te bit) <sup>(30)</sup>

### - Karê Sermerc:

Karê sermerc ew kar e yê ku di pêvajoya hevokê de dibe egera kirin û bûyîna girêbenda mercî.

Wek:

- Eger ez hatim Amûdê, ezê te bibînim.

Di vê mînakê de, (dîtina te) bi (hatina min) ve

girêdayî ye. Anku, (hatin) mercê (dîtinê) ye, bêtî

(hatin) (dîtin) nabe.

Berçav e ku di rêxistina hevokê de karê sermerc, bi şêweyekî asayî li pey alava mercî bikar tê, lê bi mebesteke rewanbêjî carinan, pêşxistin û paşxistin di hevokê de çêdibe. Hingê karê sermerc li pey karê bermerc tê. Wek:

<sup>30</sup> - Dîwana Cizîrî . Heleb (1987 ). Bergê duwem. Rû. / 229 /.



- Ez ê pirtûkê bidim te, ger tu wê bixwînî !

- Em ê hev bibînin, eger te xwest !

**- Karê Bermerc:**

Karê bermerc ew kar e, yê ku di hevoka mercî de dibe bersiv û encama bûyîna karê sermerc. Anku, bûyîna karê bermerc bi karê sermerc ve pabendkirî ye, ku sermerc pêk hat bermerc jî dê pêk bê.

Wek:

- Ger tu çûyî ez ê jî biçim

Li vir (çûna min) bi (çûna te) ve girêdayî ye, eger tu biçî ez ê jî biçim, tu neçî ez jî naçim !

Hindek caran, alava mercî tê avêtin û wateya wê ji pêvajoya hevokê tê nasîn.

Wek:

- Te kilît bidaya min, ez ê biçûma malê.

- Ez pirtûkê bidim te, tu yê (tê) wê bixwînî?

Piştî ku me hêmanên hevoka mercî nas kirin, em ê li veguhestina raweya mercî vegerin.

Di hevoka mercî de, dibe ku karê sermerc û yê bermerc, di raweya pêşkerî de bin.

Wek:

- Eger te dar çandin, ez ê wan avbidim.

- Ku te pirtûk xwend wê bide Zîne

Di mînakê pêşîn de karê dema borî (çandin) sermerc e û karê dema paşeroj (avbidim) bermerc e. Di mînakê duwem de jî, karê borî (xwend) sermerc e û karê raweya fermanî (bide) bermerc e. Lê digel ku karên sermerc û bermerc pêşkerî ne jî, lê hevoka mercî herî ji raweyên daxwazî ye.

Dibe jî ku karên sermerc û bermerc di raweya daxwazî de bin. Hingê, em ê wan raweyan beranberî demên pêşkerî destnîşan bikin:

**Borî: Sermerc**

**Bermerc**

- (Ketin):

- ket: Eger ez biketama tu yê jî biketaya (biketayîya)<sup>(31)</sup>

- ketiye: Eger ez ketibim ew ê neketibe

- Diket: Eger ez ketibama hûn ê jî ketibana

- Ketibû: Eger ez ketibûma lingên min ê şikestibûna

### **Sermerc**

### **Bermerc**

- (Xwestin)

- Xwest: Heke min bixwesta min ê ew bidîta

- Xwestiye: Heke min xwestibe min ê ew dîtibe

- Dixwest: Heke min xwestiba min ê ew dîtiba

- Xwestibû: Heke min xwestibûya min ê ew dîtibûya

### **Nuha: Sermerc**

### **Bermerc**

- Dikeve:

-Ku ez bikevim ez ê bêşim (bi - êşim)

- Dixwaze:

-Ku ez bixwazim ez ê wî bibînim

### **Paşeroj:**

Raweya mercî, ya beranberî dema paşeroj jî, weku ya beranberî dema nuha tê xebitandin:

- Ez ê bikevim:

-Ku ez bikevim ez ê bêşim (bi - êşim)

- Ez ê bixwazim:

-Ku ez bixwazim ez ê wî bibînim

Raweyên daxwazî yê dîtir jî li gora wateyên daxwazî nav li wan dibin, wek (bilanî, xwezînî, gerekî....). Ev rawe jî beranberî demên pêşkerî, di çarçewa wan her pênc formên destnîşankirî de tên veguhestin:

<sup>31</sup> - Reseniya raweyê, gerek (biketayîya) bihata, lê bi egera sivikbûna bilêvkerinê (yî) hatiye avêtin û bûye (biketaya).

**- Raweya Bilanî:**

Raweya bilanî fermaniyeke nerasteder e. Di raweya fermaniya rasteder de, ferman arastî kesê duwem ê pêşberî femandêr dibe. Lê di raweya bilanî de ferman arastî her sê kesan (peyîver, guhdar û nediyar) dibe. Ji ber ku ev rawe bi bêjeya (bila) destpê dibe, navê (bilanî) lê bûye:

- Bila ez biçûma
- Bila tu biçûya (biçûyîya)
- Bila ew biçûya.

Karên raweya bilanî jî beranberî demên pêşkerî, di çarçewa her / 5 / formên daxwazî yên desnîşankirî de tên veguhestin:

**Borî:Pêşkerî****Bilanî**

- |              |                        |
|--------------|------------------------|
| - Ez ketim   | bila ew jî biketa !    |
| - Ez ketime  | bila ew jî ketibe !    |
| - Tu diketî  | bila em jî ketibana    |
| - Ew ketibûn | bila hûn jî ketibûna ! |

**Nuha:**

- Ew dikeve bila tu jî bikevî !

**Paşeroj:**

(Bilaniya beranberî dema paşeroj, weku ya beranberî dema nuha forma xwe werdigire).

- Tu yê bikevî bila ez jî bikevim.

Karên derhingêv jî bi wê pîvanê raweyên xwe yên bilanî werdigirin:

**Borî:Pêşkerî****Bilanî**

- |               |                         |
|---------------|-------------------------|
| - Min xwest   | bila te jî bixwesta !   |
| - Te xwestiye | bila wî jî xwestibe !   |
| - Wî dixwest  | bila wan jî xwestiba !  |
| - Me xwestibû | bila we jî xwestibûya ! |

**Nuha:**

- Em dixwazin      bila ew jî bixwazin !

**Paşeroj:**

- Hûn ê bixwazin      bila ew jî bixwazin !

- HD.....

Bilaniya karên dariştî û lêkdayî, li gora karên xwerû formên xwe digirin, tenê / bi / nakeve ser raweyên wan:

- Ez daketim      bila ew jî daketa !

- Te raxist      bila wî jî raxista !

- Tu dadikevî      bila ew jî dakeve

- Ez radixim      bila ew jî raxe

- HD.....

**Neyînî:**

Di neyîniya raweya bilanî de alava neyînê / ne / dikeve ser karê xwerû. Anku, / ne / şûna / bi / yê digire:

- Bila ez neketama !

- Bila min nexwesta !

Lê ku karê raweya bilanî dariştî yan lêkdayî be, hingê / ne / dikeve navbera pêşgir û karê xwerû:

- Bila ez daneketama !

- Bila min venexwara !

Heke kar lêkdayî (hevedudanî) be, / ne / dikeve navbera her du hêmanan:

- Bila ew derneketa !

- Bila min lînexista !

**- Raweya Xwezîni:**

**Borî: Raweya Pêşkerî      Raweya Xwezîni**

- Ez ketim      xwezî ew jî biketa !

Ew raket      xwezî ew raneketa !

- Ez ketime            xwezî ew neketibe !
- Em raketine        xwezî hûn jî raketibin !
- Ew diketin         xwezî hûn neketibana !
- Ew radiketin      xwezî ez jî raketibama !
- Tu ketibûyî         xwezî ew jî ketibûya
- Tu raneketibûyî    xwezî em tev raketibûna

**Nuha:**

- Em dikevin         xwezî ew jî bikevin !
- Em ranakevin      xwezî ew jî ranekevin !

**Paşeroj:**

- Em ê bikevin        xwezî hûn jî bikevin !
- Hûn ê rakevin      xwezî em jî rakevin

Karên derhingêv jî bi wê rêbazê tên xebitandin:

**Borî:**

- Min xwar            xwezî we jî bixwara
- Min xwariye        xwezî we jî xwaribe
- Min dixwar         xwezî we jî xwariba
- Min xwaribû        xwezî we jî xwaribûya

**Nuha:**

- Ez didim            xwezî hûn jî bidin !
- Ez nadim            xwezî hûn jî nedin !

**Paşeroj:**

- Ez ê bidim          xwezî hûn jî bidin !
- Ez nadim            xwezî hûn jî nedin !

Berçav e ku neyîniya dema nuha û ya dema paşeroj di raweya pêşkerî de wekî hev tîn, (îro ez nadim û sibe jî ez nadim). Di raweya daxwazî de jî wekî hev tîn, (gerek, îro ez nedim û gerek sibe jî ez nedim).

**- Raweya Gerekî (pêdivî):**

**Borî: Raweya Pêşkerî      Raweya Gerekî**

- |            |                       |
|------------|-----------------------|
| - Ez çûm   | gerek hûn jî biçûna   |
| - Ez çûme  | gerek hûn jî çûbin    |
| - Ez diçûm | gerek hûn jî çûbana   |
| - Ez çûbûm | gerek hûn jî çûbûna ! |

**Nuha:**

- |            |                      |
|------------|----------------------|
| - Ez diçim | gerek hûn jî biçin ! |
| Ez naçim   | gerek hûn jî neçin ! |

**Paşeroj:**

- |              |                      |
|--------------|----------------------|
| - Ez ê biçim | gerek hûn jî biçin ! |
| Ez naçim     | gerek hûn jî neçin ! |
| - HD.....    |                      |

Karên dariştî û lêkdayî jî li wê gorê, di raweya erênî û neyînî de, tîn xebitandin.

Hemû navlêkirinên raweyên daxwazî, yê dîtir ku di hinek pirtûkên rêzimanî de hatine û me ew binav nekirine, ew jî dikevin ber rêzik û yaseyên jorîn. Anku, ew jî weku wan beranberî demên pêşkerî tîn veguhestin û ji çarçewa van her pênc formên karan nayên der:

- Kir ----- bikira / 1 /
- Kiriye----- kiribe / 2 /
- Dikir ----- kiriba / 3 /
- Kiribû ----- kiribûya / 4 /
- Dike ----- bike / 5 /
- Ew ê bike ----- bike / 5 /

Ev formên karên daxwazî, li gora wateyên hevokan, di gelek raweyan de bikar tên, (eger bikira..., xwezî bikira, bila bikira, gerek bikira...), forma beranberî dema boriya sergihayî (kiribe) jî, hin caran wateya gumanê dide, weku em bibêjin:

- (Hilo, em herin serdana Zînê !
- Ma wê ji nexweşxanê hatibe malê?
- Bi gumana min, wê hatibe !)

Ev raweya ku pêjina dema (paşeroja borî) jê tê, bûyîna karên wê di çarçova gumanê de dimînin. Bo vê egerê jî, em navê raweya (paşeroja borî) lê dikin.

#### - Raweya Paşeroja Boriya Bergûman:

Wek:

- Xwedê zane, tu yê (tê) çûbî civînê !
- Azad ê hatibe gund !
- Berî nuha min ê tu dîtibî !
- Gelek gotinên pêşiyên dê hatibin jibîrkin !

Di van mînakên de, alavên paşeroj (ê, dê) wateya dema paşê didin hevokan û daxwaziya beranberî boriya sergihayî jî têgeha dema borî dide wan.

Di bin bandora van her du hêmanan (alava paşeroj û daxwaziya borî) de, raweya paşeroja borî, ya berguman pêk tê.

Gelek caran ev rawe di pêvajoya pirsê de jî bikar tên:

Wek:

- Ma derfet ê bi destê wî ketibe?
- Ma heval dê li wir razabin?
- Berf ê ketibe?
- Kulîlkên daran dê bişkiwîbin?
- Berî nuha, me yê hev dîtibe?

***Dê bidome.***

## Zorbey zimane zînduwekan firestandard û firenawend in

*Hesen Qazî*

Ziman wekû binçîney bîr û hokarî pêwendî tak û komell yekêk le babete girîngekanî komellnasî u hellawardin u zordarî zimanîş yekêk le qêzewentirîn şêwekanî çewsandinewe û diyaredekanî naberaberiye le komellgey miroyî da.

Peywest bew bas û gengeşaney sebarêt be hellkewt û çoniyetî şêwazekanî Kurdî le gorêdaye, layenêkî zor aşkîra û bederewey hellkewtî zimanekan le astî cîhanî da kemtir bas u lêduwanî le ser dekirê, ewîş fire nawndêtî û fire standard bûnî zorbey zimane zînduwekanî cîhane, ke eger sebarêt be ewan le komellgey

kurdîş da zaniyarî u agadarî hebê, temî zorêk lew dilerawkê û peroşyaney le mer pêşkewtinî şêwaze Kurdiyekan û "parçe kirdinî" komellgey Kurdistan- ke be naheq xirawete arawe- namênê û derewêtewe û boçûnu hellwêstêkî pitew u zanstiyane lemer pirsî ziman dekirê reçaw bikirê.

Zimane fire nawendekan, ew core zimananen le ber ewey le cugrafiyay ciyawaz û le layen xellk û netewey ciyawazewe qiseyan pê dekirê u pêyan denûsrê, xawen standardî ciyawazî qise kirdin û nûsînîşn. Wate tenê hellgir û gwêzerewî kultûr û nerîtî neteweyekî taybetî nîn bellkû herkam lew deste û gelaney dekaryan deken, nasêne û kultûrî xoyan lew zimaneda debînnewe û şeqlî xoyanyan lê dawe.

Reçaw kirdinî boçûnêkî ewto le layen axêweranî ew şêwe zimananey le Kurdistan û le derewey Kurdistan le layen Kurdekanewe de kar dekrên, dergayekî niwêy tebayî û rêzî fire layeneman be rûda dekatewe. Dananî Kurdî be zimanêkî fire nawend u fire standard zemîney dewllemendtir kirdin u bexodahatinî xêratirî hemû şêwazekan derexsênê, bewe ciyawazî ziyatir nabê, bellkû le sayey



têknolojî taze û geyandinê xêra, şêwazekan ziyatir le yektirî degen eger betekûzî pêweyan biçardrê dekirê le yektirîş nizîk bibnewe.

Wek le serewe bas kira yek le nîşanekanî zimananî fire nawend eweye ke xellkî ciyawaz qiseyan pê deken, ême xoşman bê û tirşman bê debînin êsta Kurd be Kurdîy Soranî, [stendardî Silêmani u şêwazî Mukrî], Kurdîy Kirmancî [stendardî Hawar û Botî, Badînî, Hermenstanî, Berfiratî, Xorasanî], Kurdîy Hewramî [be hemû zarekaniyewe], Kurdîy Dimlî [stendardî Dêrsîm u zarekanî dîke], Kurdîy Kelurî [Kirmaşanî, Ilamî u Feylî] be hemuyan qise deken û le astî ciyawaz da be hemûşyan denûsin. Zorbey here zorî ew axêwer û nûseraneş xoyan be Kurd dezanin û le ziman wekû amrazêk bo dewllemend kirdin û pitew kirdinî kultûr û wuşıyariyek kelik werdegirn ke be kultûr û wuşıyarî Kurdî dadenên. Eger ême ew rastiye bibînin u yekêtî neteweyî le wexo kirdin u cê kirdinewey ciyawaziyekanda berewpêş berîn, ew demî her bezeynîşmanda naye, hebûnî take ziman u take stendarêk be ser yektirî da bisepênîn û bew şêweye çemkî zanstî komellnasî zimanîş pere pêdedeyn. Le xuwarewe be kurtî basî hêndêk le zimane fire standardu fire nawendekan dekeyn:

### Zimanî Inglîzî

Inglîzî zimanêkî fire nawend u fire stendarde û ciyawaziyekî zor le nêwan şêwazekanî Inglîzî Birîtanyayî u Inglîzî Emrîkayî u stendarekanî dîkey Inglîzî dîke da heye ke jimareyekî zor le xelkî be reçekek xeyrî Inglîzî dekarî deken. Ew ciyawazîane hem le astî eksênt û rawêj û hem le buwarî dîkte û nûsînda xo derdexen. Inglîzî zimanêkî fire nawendî hawtaye, hawtayî bew manaye ke hîçkam le şêwazekanî le ruwangey kultûriyewe be ser ewanîdî da zall niye. Le barî jimarey axêweranewe ewaney be Inglîzî Emrîkayî dedwên rêjeyan 65%, Inglîzî Birîtanyayî 18% û axêweranî şêwazekanî dîkey Inglîzî herkamyan rêjey 5% pêk dehênin. Be cîhanî bûn be taybetî le bîst sî sallî duwayî bem layewe heta deçê ziyatir debête hoy billaw bûnewey Inglîzî be hemû çuwar qurney em kure xakiyeda. Pêştir le sîstmî perwerde da lew cêgayaney Inglîzî wekû zimanî bêgane be deris da dedra, bo nimûne le koloniyekanî pêşuy Birîtaniya şêwazî Inglîzî Birîtaniyayî zal bû. Le Ewropa û le çuwarçêwey wulatanî endamî Yekêtî Ewropa, le sîstmî perwerdeda stendardî Inglîzî Birîtanyayî be birewe, bellam le zorêk le herêmekanî dîkey cîhan da rewî bekarhênanî Inglîzî Emrîkayî bo fêr bûnî

wekû zimanî duwem u betaybetî le buwarî bazrganî da wepêş Inglîzî Birîtanyayî kewtuwetewe. Şêwaz û stendarekanî dîkey zimanî Inglîzî birîtîn le Inglîzî Ustiraliyayî, Kanadayî, Hîndî, Nîwzîlendî, Efrîkay Başûrî. Ew şêwazane le çaw şêwazekanî stendardî Inglîzî Birîtaniyayî û Inglîzî Emrîkayî bo xwêndin wekû zimanêkî duwem û le sîstimî perwerde da zor kemtir nasrawin.

### Zimanî Almanî

Be pêçewaney zimanî Inglîzî, zimanî Almanî zor car be helle wekû nimûneyekî stendardî nahawtay fire nawend pênase dekirê, ewîş le ber ewey ew stendardey le wulatî Alman dekar dekirê be şêwazêkî zall u balladest dadendrê, yek le ber ewey jimarey axêweranî le çaw axêwerekani dîkey zimanî Almanî zortirin u hoy duwemîş eweye le Alman be asayî agadariyekî zor kem heye sebare be şêwazekanî stendardî Almanîy Utirîşî û Almanîy Swîsî. Willatanî Almanî ziman tenya le buwarêk da stendardêkî taqane reçaw deken ewîş zimanî şanoye. Le hemû cêyek amojgariyekanî (Qamûsî Zîbs) bo belêw kirdinî wişan le zimanî şano da reçaw dekirê dena wekû dî ew stendardaney zimanî ke le Utirîşî û Swîs dekar dekirên çî le barî telefuz, çî wişe û tenanet hêndêk car rêzimanîş ciyawazyan heye legell zimanî Almanîy Alman. Tenanet le nêw cugirafiyay Almanîş da le herêmî Bavêriya hêndêk zarawey ke le billaw kirdinewey dengubas da dekar dekirên ciyawazin le zimanî "dayegewre". Ew herêmey Alman nasênayekî kultûrî behêz û serbexoy le beşekanî dîkey Alman heye. Tenanet stendare Almaniyekan bo buwarî qanûnî u îdarîş stendardî ciyawaziyan heye. Pêristî zincîreyek zarawey le mer madey xorakî ke be taybetî le Almanîy Utirîşî da be kar dehêndrê wekû mercêk bo endametî Utirîşî le rêsay Yekêti Ewropada guncêndrawe.

### Zimanî Feranseî

Sê stendardî serekî zimanî Feranseî birîtîn le stendardî Feranseî Parîsî, stendardî Feranseî Kanadayî (Kîyubêkî), u Feranseiyekî nêwneteweyî ke le mîdiya u perwerde da bo fêr kirdinî zimanî Feranseî wekû zimanî duwem be kar dehêndrê. Em stendaredey zimanî Feranseî zorêk le wişe û bêjey konî parastuwe ke îtir çibirr le Feranseî mêtropo lida bawyan nemawe û le birew kewtûn.

Stendardî Feranseyî Kîyubêkîş be zanayiyekî zorewe xoragirî deka le beramber têwehatinî wişey bêgane, bo wêne le birî wuşey Ingîlîzî (parkîng) ke le Feranseyî Feranse da be kar dehêndrê bêjey "stasîonma" yan darştuwe ke le rîşey wuşeyekî Feranseyî wergîrawe. Stendardî piçûktirî zimanî Feranseyî le Bêljîk u Swîs hen, u be taybetî karlêkerî zimananî Jêrmenîyan le astî rêziman u wişewe pêwe diyare. Bo wêne le stendardî Feranseyî Bêljîk da karlêkerî cor be corî zimane Jêrmeniyekan le zimanî qisekirdin da cuwan hest pê dekirê.

### Zimanî Hîndî-Ûrdû

Dekirê miro billê Hîndî u Ordû yek zimanin, yan haw sîstimin. Ew zimane le Hîndûstan yek le 23 zimanî fermî em willate û le Pakistan zimanî fermiye. Hekarêk ke ew dû şêwaze le yektirî dadebirê be kar hênanî dû sîstmî ciyawazî elfupêtkeye. Ordû le Hîndûstan be xetî Dêvanagarî u le Pakistan be xetî alugorkirawî 'Erebî denûsrê. Le her dû şêwazeke da wişey xuwazrawe le 'Erebî u Farsiye zorin, bellam le şêwazî Orduyî Hîndûstan da zor wişey Sansikrîtî maliyan danawe.

### Zimanî Swêdî

Dû standard û şêwazî Swêdî hen ke her dûkiyan hellkewtî fermî yan heye. "Rîkssivênska" ke zimanî fermî Swêde, u "Fînland-Sivinska" –ke be tenîşt zimanî Fenlandiyewe- yek le zimane fermiyekanî Felande. Le nêw ew dû stendardaney zimanî Swêdî da hem le astî rêziman u hem le barî wişewe ciyawazî heye, Siwêdî Fenlandî hêndêk be parêztire. Ciyawazî here berçaw le telefuz u tonî ziman da xoy derdexa. Le sîstmî dengszazî da kartêkerî zimanî Fenlandî ke le reg û binawanewe dûre le zimane Sikandînaviyekan, be ser zimanî Swêdî Fînlandewe debîndrê.

Ew nimûnaney serewe çend nimûneyekî kem bûn le zimane zînduwe fire standard û fire nawendekanî cîhan. Le willatêkî wekû Hîndûstan 23 zimanî fermî be tenîşt yekewe û le çuwarçêwey serwerî dewllet da dekar dehêndrên u dirêje be man u jiyanyan deden, eger lay êmeş şêwaze

Kurdiyekan dekar bikirên û le sîstimî perwerde û le buwarî pêwendî giştî da derfetî geşe û neşeyan pê bidrê asman be 'erdiyewe nanûsê.

*Têbînî: bo em base lem serçaweye kelik wergîrawe:*

"Pluricentric Languages: Differing Norms in Different Nations", Michael Clyne (Editor)

## Dengnasî

### Dengê Q – peydabûn û guherîna wê

Di dengnasiya kurdî de **Q / q** nîşana dengê “zimanokî-seknî-bêlerz” e. Mebest ji “seknî” ew e ku di derxistina wê de lêv pêşî bi temamî girtî ne û paşî tîen vekirin. Mebest ji “zimanokî” ew e ku cihê derxistina vî dengî paşîya devî li nêzîkî qirrikê ye ku parçeyeke wek zimanî lê biçûktir (zimanok) lê heye. Merem ji “bêlerz” jî ew e ku di dema peydabûna vî dengî de perdeyên dengî nalerizin.

Ev deng di alfabeya kurdî-latînî de – û di hin zimanên din ên bi alfabeya latînî dinivîsin de – bi awayê **Q** (gir) û **q** (hûr) tê nivîsîn. Ev herf herwiha bo transkrîbekirina nav û peyvên erebî bi alfabeya latînî di zimanên ewropî de jî tê bikaranîn, bo nimûne bi inglîzî Quran an Qasim. Lê di gelek zimanên ewropî de Q ne vî dengî lê dengêkî wek K dide, bo nimûne inglîzî “queen” anku “şahbanû, melike, kralîçe” wek “kwîn” tê gotin û fransî “qui” anku “kî” wek “kî” tê gotin.<sup>32</sup>

Di alfabeya kurdî-erebî de û di zimanên din jî yê erebînivîs de ev deng bi herfa **ق** tê nivîsîn. Di alfabeya kurdî-krîlî de ev deng bi **Q** (gir) û **q** (hûr) dihat diyarkirin lê di gelek zimanên din ên krîlînivîs de ew bi şiklê **Қ / қ** tê nivîsîn. Di alfabeya dengnasî ya navneteweyî de jî ew wek [q] tê nîşankirin.

Mirov li vê derê dikare guh bide vî dengî:

[https://en.wikipedia.org/wiki/File:Voicelessuvular\\_plosive.ogg](https://en.wikipedia.org/wiki/File:Voicelessuvular_plosive.ogg)

<sup>32</sup> Li destpêka nivîsîna kurdî bi alfabeya latînî di kovara Hawarê de K bo diyarkirina dengê Q û Q jî bo diyarkirina dengê K dihat nivîsîn. Bo nimûne, navê welatê me wek Qurdistan dihat nivîsîn û peyva bi maneya “baş, çê, çak” jî wek “kenc” dihat nivîsîn ku niha wek “qenc” tê nivîsîn.

## Peydabûna Q di peyvan de

Di kurdî de herfa Q dikare niha li destpêk, nav û dawiya peyvê peyda bibe

- **destpêk:** qazan, qeşmer, qîr, qumar ...
- **nav:** aqar, meqes, reqem, ...
- **dawî:** beq, heq, req...

Li gor lêkolînên me<sup>33</sup>, rêjeya herfa Q di nivîsên kurmançî de 0,27 % e anku yek ji kêmtirîn herfên nivîsên kurmançî ye. Li gor heman vekolînê, tenê herfa F ji Q kêmtir di nivîsên kurmançî de peyda dibin.

## Peydabûn û guherîna dîrokî ya Q

Dengê Q di piraniya zimanên hindûewropî de peyda nabe. Erê di gelek zimanên ewropî de herfa Q heye lê ew wek kurdî nayê gotin, ne dengê Q-ya me ye. Di zimanên îranî yê kevn û navîn de jî (avestayî, hexamenişî, pehlewî, soxdî...) ev deng peyda nedibû.

Lê di zimanên niha yê îranî de Q berbelav e. Wisa diyar e ku di hemû zimanên din yê îranî de dengê Q niha heye. Heta zimanê urdûyî yê ne-îranî jî bûye xwedî vî dengî tevî ku di zimanên din yê aryaî (zimanên hindûewropî yê Hindistanê) de ew deng peyda nabe.

Peydabûna Q di zimanên îranî de ji tesîreke ji du aliyan ve ye. Tesîra berçav û diyar ji zimanên samî – bi taybetî erebî – ne. Di pratîkê de di hemû zimanên samî yê niha û berê yê Rojhilata Navîn dengê Q peyda dibe / dibû: erebî, aramî, îbrî, akadî...

Çend nimûne ji erebî:

- qam, qemer, qiyas, qîr, qudret...

<sup>33</sup> Husein Muhammed: *Rêjeya herfan di nivîsên kurmançî de*: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/04/rejeya-herfan-di-nivisen-kurmanci-de/>

Herwiha hin peyvên bi eslê xwe ji zimanên ewropî (bi taybetî ji yûnaniya kevn) bi rêya erebî ketine kurdî û ji ber tesîra erebî Q di wan de heye:

- "qanûn" bi rêya erebî ji yûnaniya kevn "kanon"
- "qelem" bi rêya erebî ji yûnaniya kevn "kalamos"
- "qesir, qesr" bi rêya erebî bi rêya yûnanî ji latînî "castrum"

Ji aliyê din ve xurtbûn û zêdebûna Q di zimanên îranî de ji tesîra zimanên tirkîkî (tirkî, azerî, ozbekî, tirkmenistanî...) ye. Erê di tirkîya stembolî ya standard de Q nayê nivîsîn, lê di piraniya zimanên lêzim de Q heye û mişe ye: "Guh" bi tirkîya stembolî "kulak" e lê bi azerî, teterî, oyxurî, qazaxî "qulaq" û bi ozbekî "quloq" e. "Berf, befr" bi tirkî "kar" e lê bi azerî, qazaxî, teterî û oyxurî "qar" û bi ozbekî "qor" e.

"Reş" bi tirkî "kara" ye lê bi azerî, qazaxî, teterî, kûmikî û oyxurî "qara" û bi ozbekî "qora" ye – heman peyv wek "qere-" ketiye hin gotinên kurdî: "Qeredax" (çiyayek e li Başûrê Kurdistanê), "Qereqoş, Qeretepe" (du navçe ne li Başûrê Kurdistanê), "Qere Tajdîn" (birayê Memê di dastana Mem û Zînê de)...

Di rastiye de di tirkî de jî K berî vokalên paşîn (di tirkî de "a, ı, o, u") ji K-ya kurdî yan K-ya tirkî ya berî vokalên pêşîn (di tirkî de "e, i, ö, ü") zêdetir li paş e û nêzikî Q-ya kurdî dibe.

Di peyvên ku kurdî ji tirkî wergirtine de, heke di tirkî de li pey K-yê vokaleke paşîn hebe<sup>34</sup>, K di kurdî de bi piranî bûye Q: "qazan (ji tirkî "kazan"), qazanc/qezenc (< kazanç), qere- (qereqol (< karakol), qonax/qûnax (< konak), qurm (< kurum), qeytan (< kaytan), qalind (< kalın), quzilqurt (< kızıl kurt), qûm (< kum)..."

Lê heke li pey K-yê vokaleke pêşîn hebe, hingê K wek xwe dimîne: "kelemçe (< kelepçe), kepeng (< kepenek), komir (< kömür), "kok" (< kök), koç (< tirkîya kevn: köç, tirkîya niha: göç).<sup>35</sup>

<sup>34</sup> Heta heke di kurdî de bibe vokaleke pêşîn jî, bo nimûne: "qîz (kız), qere- (kara), qezenc (kazanç)..."

<sup>35</sup> Çend awarte û istisna ji vê qeydê hene, bo nimûne "kon/kûn" (< kon-mak: bi cih bûn, war danîn, kon vedan). Peyva "kol" (mil, şan) jî di kurdî de – bi taybetî di soranî de – bi du awayan cih girtiye: "kol" (wek "kol-ber" anku hemal, piştîhilgir, kesê ku piştîyan hildigire) û "qol" (wek "duqolî" anku "dualî, bîlateral").

Di peyvên ji erebî wergirtî de Q bi amî tê parastin û nabe K. Lê hin nimûneyên wisa jî peyda dibin. Bo nimûne, "qel'e" di devê piraniya kurmancan de bûye "keleh" yan "kelhe". Herwiha piraniya kurmancîaxivan – lê ne hemû – "xelq" a ji erebî dikin "xelk" anku Q bi K diguherînin tevî ku di hevrehên wê yên wek "xaliq, mexlûq, mexlûqat, xuliqandin, xuliqîn" de Q tê parastin jî. Wek din jî niha veguherîna Q di peyvên ji erebî wergirtî de diyardeyeke nadir e.<sup>36</sup>

Li berî konsonantên bêlerz yên wek T, S, Ş, Q-ya erebî di kurdî de bi gelemperî vediguhere X: wext (< weqt), nexş (neqş) û rexs (< reqş)<sup>37</sup>.

Lê mirov dikare kêr nimûneyên guherîna K bi Q jî bibîne. Peyva erebî "fakihe" di hin devokên kurmancî de bûye "fêkî" lê di hinan de jî bûye "fêqî".

## Q di peyvên esil-îranî de

Di peyvên bi eslê xwe îranî yan hindûewropî yên di kurdî de tenê di çend liban de Q heye. Ew jî ji K yan G bi Q veguherîne Mirov dikare van nimûneyan bide: "qa(n)tir, qap, qehreman, quling, quz, qûn..." Ji wan jî gelek bi rêya zimanekî ne-îranî (bi taybetî tirkî) li kurdî vegeherîne, bo nimûne: "qa(n)tir, qap" û belkî "qehreman".

Lê hin peyv di kurdî de xwe de wisa guherîne ku Q hatine cihê K, mînak: "quling, quz, qûn" ku di zimanên din yên îranî de ne bi Q lê bi K ne. Ji bilî van, herwiha di soranî "qûf" (kûr).

Wek din, peyvên bi Q heke ne ji erebî yan tirkî bin, bi ihtimaleke mezin ji zimanekî din yê samî ne, bo nimûne "qêrîn/qîrîn, req" ji aramî û "qîr" ji akadî (bi rêya zimanekî din).

Hin peyvên bi eslê xwe îranî bi K bûn lê ji pehlewî ketine erebî, di erebî de K-ya wan bûye Q û bi Q li zimanên îranî vegeherîne:

- pehlewî "pistek" > erebî "festeq" > kurdî "fisteq" (lê farisî "piste / pistê" ya ne-erebîkirî)
- pehlewî "zendîk" > erebî "zendîq" > kurdî "zendîq"

<sup>36</sup> Ji bilî di axiftin û nivîsîna hin kurdan de di bin tesîra tirkî de, bi taybetî di bin tesîra zimanê nivîskî yê tirkî de.

<sup>37</sup> Ji nimûneyên dayî forma "wext" hema-hema alternatîva tenê ye, di kurdî de "weqt" nayê dîtîn; li gel "nexş"ê mirov carinan "neqş"ê jî dibîne; lê herçi "rexs" e, forma "reqş" jî wê berbelavtir e.



Hin caran Q dîsa bûye K:

- pehlewî "xendek" > erebî "xendeq" > kurdî "xendek" (li gel varyanta "xendeq")

**Q (sor) û lêzimên wê (şîn) li gel konsonantên din (reş) yên kurdî**

	CIH →	du- lêvî	lêvî- didanî	pidûyî	paş- pidûyî	ban- devî	paşdevî	ser- gewrî	zima- nokî	qirrikî
AWA										
BÊVILÎ		<b>m</b>		<b>n</b>						
SEKNÎ										
- bêlerz	<b>p</b>		<b>t</b>			<b>k</b>				<b>?</b>
- bilerz	<b>b</b>		<b>d</b>			<b>g</b>		<b>q</b>		
XIŞOKÊN										
VIZOK										
- bêlerz			<b>s</b>			<b>x</b>				
- bilerz			<b>z</b>		<b>ş</b> <b>j</b>					
XIŞOKÊN										
NEVIZOK										
- bêlerz		<b>f</b>			<b>ç</b>			<b>h</b>		<b>h</b>
- bilerz		<b>v</b>			<b>c</b>					
JENOK				<b>r</b>						
TENGAV	<b>w</b>			<b>l</b>		<b>y</b>				

## Têrmên rêzimanî yên Komxebata Kurmancî

KURDÎ	ÎNGILÎZÎ	MÎNAK
ahenga dengdêran	vowel harmony	<i>Türkiye'de</i> 'li Tirkîyeyê', <i>Almanya'da</i> 'li Almanyayê' [bi tirkî]
alofon (m)	allophone	[sʰad] / [sad] 'sed', [kani:] 'kanî' / [kanɪjan] 'kanîyan'
alomorf (m)	allomorph	<i>Ew niştecih in, ne rêwî ne</i> ['in' û 'ne' alomorfên heman morfemê ne.]
artîkel (m) <b>ART</b>	article <b>art</b>	
artîkela binavkirinê	definite article <b>DEF</b>	<i>the</i> [bi îngilîzî]
artîkela nebinavkirinê	indefinite article	<i>bir elma</i> 'sêvek' [bi tirkî]
aspekt (m) <b>ASP</b>	aspect <b>asp, ASP</b>	
aspekta adetî	habitual aspect	<i>Azad hergav diket</i>
aspekta berdewam <b>BERD</b>	progressive aspect <b>PROG</b>	<i>Azad dikeve; Azad diket</i>
aspekta dubareyî <b>DUB</b>	iterative aspect <b>ITER</b>	<i>Azad diketeve</i> [= <i>diket û diket, dîsa diket</i> ]
aspekta morfolojîk	morphological coding of aspect	
aspekta morfolojîk û ristesazîyî	morphosyntactic coding of aspect	

aspekta netemam	imperfective	<i>Azad <b>dikeve</b>; Azad <b>diket</b></i>
<b>NETEM</b>	aspect <b>IPFV</b>	
aspekta temam	perfective aspect	<i>Azad <b>ketiye</b>; Azad <b>ketibû</b></i>
<b>TEM</b>	<b>PFV, perf, PERF</b>	
awayê dirkandinê	manner of articulation	
awaze (m)	intonation	
bala <b>BAL</b>	superlative <b>sup(l)</b>	<i>baştirîn</i>
[berawirda rengdêran]		
bang (m)	interjection	<i><b>Wey dinyayê!</b>, <b>Ax kurdino!</b></i>
bazinedaçek (m)	circumposition	<i>di...da, bi...ra, ji...va</i>
bazinegir (m)	circumfix	<i>spielen 'lîstin', <b>gespielt</b> 'lîstî' [bi almanî]</i>
bêje (m) <b>B, BJ</b>	word <b>W</b>	
bêjen [ji bo dengan]	voiceless	[p], [k], [s]
bêjesazî (m)	word formation	
bêjeya dariştî	derived word	<i>azadî [Ev navdêr ji rengdêra 'azad' û paşgira '-î' hatiye çêkirin.]</i>
bêjeya ferhengî	lexeme	
bêjeya hevedudanî	compound word	<i>kurxal, destebira</i>
bêjeya prosodîk	prosodic word	
bêjeya sade	simple word	<i>azad</i>
benda îsoglosan	bundle of isoglosses	

berawird (m) [ya rengdêran]	comparison	
berawirda morfolojîk	morphological comparison	<i>baş+tir &gt; baştir</i>
berawirda perîfrazî	periphrastic comparison	<i>herî baş</i>
berawirdî <b>BER</b> [ya rengdêran]	comparative <b>comp</b>	<i>baştir</i>
berdewamîya zaravayan, berdewamîya dîyalektan	dialect continuum	
berkar (m) <b>BK</b>	patient <b>P</b>	<i>Dizan derî şkand</i>
beşên axaftinê biçûkkirî	parts of speech diminutive	navdêr, rengdêr, lêker, hoker, cihnav, daçek, gihanek, bang
bijen [ji bo dengan]	voiced	[b], [g], [z]
biker (m) <b>B</b>	agent <b>A, AG, AGT</b>	<i>Polîsan dizek girt; Diz bi destê polîsan hat girtin</i>
binavkirî <b>BNK</b>	definite <b>DEF</b>	<i>Narînê sêv xwarin; Narînê sêva sor xwar</i> [Nebinavkirî: <i>Narînê sêvek xwar; Narînê sêveka sor xwar</i> ]
binavkirin (m)	definiteness	
bingehîn [berawirda rengdêran]	positive	<i>baş</i>

bingihanek (m)	subordinating	ku
<b>BGIH</b>	conjunction	
	(subordinator)	
	<b>SUBORD</b>	
bingihaneka awayî	manner	<i>wek ku, mîna ku, her wekî</i>
	subordinator	<i>Wê baz dida <b>mîna ku</b> hin li pey wê bin.</i>
bingihaneka berawirdî	comparative	<i>ji</i>
	subordinator	<i>Zanîna wî <b>ji</b> ya ku min texmîn dikir zêdetir e</i>
bingihaneka demî	temporal	<i>gava, dema, piştî, berî, heta (ku)</i>
	subordinator	<i><b>Dema</b> tu digehî, min agahdar bike</i>
bingihaneka fînal	final subordinator	<i>da, da ku, ji bo ku</i>
		<i>Divê em bilezînîn <b>da</b> ji êrişa guran bifilitin</i>
bingihaneka hokarî	causative	<i>çunkî, seba, bona, ji ber ku</i>
	subordinator	<i>Wî nedixwast derkeve <b>çunkî</b> baran dibarî</i>
bingihaneka mercî	conditional	<i>heger, heta (ku)</i>
	subordinator	<i><b>Heger</b> tu bimînî, tu dê wê bibînî</i>
bingihaneka pesendî	concessive	<i>tevî (ku), herçend</i>
	subordinator	<i>Ew rûgeş bû <b>tevî ku</b> (ew) nexweş bû</i>
bingihaneka pirsyarî	interrogative	<i>çend, çima, çawa, ka</i>
	subordinator	<i>Ez nizanim <b>çima</b> ev spîndar ji vê şengebîyê dirêjtir e.</i>
binriste (m)	subordinate clause	<i>Ew ji malê derneket <b>çunkî</b> <b>baran dibarî</b></i>

borîya berdewam <b>BERD</b>	imperfect <b>IMPF</b> , <b>IMPERF</b>	<i>Narîne sêv <b>dixwar</b></i>
borîya berdewam ya subjontîf	imperfect subjunctive	
borîya dûr	pluperfect/past perfect (indicative)	<i>Narîne sêv <b>xwaribû</b></i>
borîya dûr ya subjontîf	pluperfect subjunctive	<i>Belkî Narîne sêv <b>xwaribûya</b>.</i>
cihê dirkandinê [ji bo denga]	place of articulation	
cihgirtin	suppletion	<i>gotin: -got-, -bêj-; dîtin: -dît-, -bîn-; ez, tu</i>
cihguherîn, metatez (m)	Metathesis	<i>nizim → nimiz, befr → berf</i>
cihnav (m) c	pronoun <b>pro</b> , <b>PRO</b> , <b>PN</b>	
cihnav aanaforîk	anaphoric pronoun	<i><b>Çekdar</b> geştiin bajarî û <b>wan</b> dest bi talanê kir</i>
cihnav hevûdinî <b>HEV</b>	reciprocal pronoun <b>recip</b> , <b>RECP-PRO</b>	<i>hev, êkûdu, hevûdin/hevûdu</i>
cihnav karayî	subject pronoun	<i><b>He</b> kissed her 'Wî ew maç kir' [bi îngilîzî]</i>
cihnav kataforîk	cataphoric pronoun	<i><b>Wî</b>, <b>Ehmedê</b> hevalê me, nan nexwaribû.</i>
cihnav kesî	personal pronoun	<i>ez, min, tu, te, hûn, we, ew, wî, wê, wan, kî, kê</i>

cihnava nebinavkirî	indefinite pronoun	<i>kî, kê, yek, hemû, filan(kes), hin, kes, herkes, hertişt, tikes, çikes, titişt, çitişt</i>
cihnava nûsîyayî/likandî	enclitic pronoun	<i>Wî gulek da Narînê → Wî gulek dayê; ew ji <b>hirça hov ya ku dikir wî bixwe</b> filitî → ew jê filitî; birê<b>m</b> wer meke!; serim dêşê 'serê min diêşe' [bi soranî]</i>
cihnava peywendîyê <b>PEY</b>	relative pronoun <b>rel, REL-PRO</b>	<i>Tiştên seyr û ecêb, <b>ku</b> te qet berê nedîtine, li vir peyda dibin.</i>
cihnava pirsyarî	interrogative pronoun	<i>kî, kê, çi, kîj(an)</i>
cihnava rasterast	direct/rectus pronoun	<i>ez, tu, em, hûn, ew, kî</i> <i><b>ez</b> te dibînim</i>
cihnava serbixwe	independent pronoun	<i>ez, min, tu, te, hûn, we, ew, wî, wê, wan, kî, kê</i>
cihnava tewandî	oblique pronoun	<i>min, te, me, we, wî, wê, wan, kê</i> <i><b>ez</b> te dibînim</i>
cihnava tiştayî	object pronoun	<i>She kissed <b>him</b> too 'Wê jî ew maç kir' [bi îngilîzî]</i>
cihnava vegerok <b>VEG</b>	reflexive pronoun <b>ref, REFL-PRO,</b> <b>reflex</b>	<i>xwe</i>
cihnava xwedîtîyê	possessive pronoun <b>pos(s),</b> <b>POS(S)</b>	<i>min, te, me, we, wî, wê, wan</i> <i>kitêba <b>min</b></i>
çendahî (m)	Quantity	

çendî	quantitative	
çendîker (m) <b>ÇEN</b>	quantifier <b>QNT, Q</b>	<i>hemû, gişt, hin, piçek, gelek, kêr, zêde, pir</i>
çendîkera	indefinite	<i>hin kes, gelek zarok</i>
nebinavkirî	quantifier	
çendîkera	partitive definite	<i>hin ji hevalan, gelek ji van zarokan</i>
parçeker ya	quantifier	
binavkirî		
çendîkera	postnominal	<i>Gundî gişt çûne bajaran; Xelk hemû nerazî ne</i>
paşnavdêrî	quantifier	
daçek (m) <b>d, D</b>	Adposition	
daçeka	compound	<i>li bin, li rex, di ber da, ji nav ra, bi hev ra, ji jor va</i>
hevedudanî	adposition	
dahatûya borîyê	future in past	<i>Narîne dê sêv bixwara / Narîn da sêvê xwit</i>
dahatûya temam	future perfect	<i>Berî dawîya mehê, min dê kitêb xwandibe</i>
dar (dem, aspekt, rawe) <b>DAR</b>	tam (tense, aspect, modality) <b>TAM</b>	
dariştin (m)	Derivation	
dem (m) <b>DEM</b>	tense <b>TNS</b>	
dema borî <b>BOR</b>	past tense / preterite <b>PST</b>	<i>Narîne sêv xwar</i>
dema dahatû <b>DAH</b>	future tense <b>FUT</b>	<i>Narîn dê sêvê bixwe</i>
dema ferhengî	lexical tense	
dema morfolojîk	morphological tense	<i>Narîn dixwîne</i> ['di-' û '-xwîn-' morfemên dema niha ne.] <i>Narîne xwend</i> ['xwend-' morfema dema borî ye.]



dema niha <b>NIH</b>	present tense <b>PRS</b> , <b>PRES</b>	
dema niha ya ragihandinê	present indicative <b>indic, INDIC</b>	<i>Narîn sêvê <b>dixwe</b></i>
dema ristesazîyê	syntactical tense	<i>Narîn <b>dê</b> kitêbê <b>bixwîne</b></i> [Dema dahatû bi alîkarîya 'dê' û forma subjektîf/înşayî ya lêkerê pêk têt.]
deng (n)	sound, voice	
dengdêr (m), vokal (m) <b>D, DD</b>	vowel <b>V</b>	
dengê astengkirî	Obstruent	
dengê neastengkirî	sonorant <b>son</b>	
dengê prostetîk	prosthetic sound	<i>station</i> [bi fransî] → <i>istasyon</i> [bi tirkî]
dengnasî (m), fonolojî (m)	Phonology	
dengrêzî	phonotactics	
dengsazî (m), fonetîk (m)	Phonetics	
dereceya sonorîteyê	sonority degree	
dereceya vekirinê	opening degree	
devok (m)	Accent	
didanî	dental	
difnê <b>dif</b>	nasal <b>N, nas</b>	
dîftong (m)	Diphthong	[ui:] <i>dwîr, kwîr, gwîz</i> ; [ua] <i>xwarin, xwe</i> ; [ue] <i>xwê</i>

dîftonga dagêr	falling/descending diphthong	[tʰaj] ‘çay’
dîftonga dawîker	ending diphthong	[vɔɪs] <i>voice</i> ‘deng’ [bi îngilîzî]
dîftonga fireh	wide diphthong	[tʰaj] ‘çay’
dîftonga hilgêr	rising/ascending diphthong	[həʃjar] ‘hişyar’
dîftonga navendker	centring diphthong	[ɪə] <i>ear</i> ‘guh’ [bi îngilîzî]
dîftonga teng	narrow diphthong	[hajv] ‘heyv’
dîftongîzasyon (m)	diphthongisation	[kʰɛf] ‘kêf’ → [kʰajf] ‘keyf’
dijmane (m) <b>DM</b>	antonym <b>ANT</b>	<i>kurt x dirêj</i>
dirkandin, artîkulasyon	Articulation	
dîyarker (m) <b>DÎY</b>	determiner <b>det</b> , <b>DET</b>	
dîyarkera nîşander	demonstrative determiner (adnominal determiner)	<i>ev xanî, ew stêr</i>
dîyarkirî	determined/dete rminatum	
dîyatez (m)	voice	
duhejmar	dual <b>du</b>	<i>kîtaban</i> ‘du kitêb’ [bi erebî]
dulêvî	Bilabial	

dustandardî	Diasystem	
dutêper <b>dut</b>	bi-transitive/ ditransitive <b>ditr</b>	<i>Wî gulek <b>da</b> Narînê</i> [Lêker 'dan' e.]
dûvik (m) <b>D</b>	coda <b>Co</b>	<i>kurd, stêr</i>
erênî	Affirmative	<i>Azad rêber e; Narînê sêv dixwar</i>
ergatîfî (m)	Ergativity	
farîngalîzasyon (m)	pharyngealization	
ferhengnasî	Lexicology	
ferhengnivîsî	lexicography	
fîtok	Sibilant	
fon (m)	Phone	
fonem (m)	Phoneme	
fonetîka dîrokî	historical phonetics	
forma biçûkirî	diminutive form <b>DIM</b>	<i>darik, derok</i>
forma lêkerê	verb form	
forma mezinkirî	augmentative form	<i>lapemezin, ziremêr, çîlspî</i>
fraz (m) <b>F</b>	phrase <b>P</b>	
fraza daçekî <b>FD</b>	prepositional phrase <b>PP</b>	<i>li ser çavan, di nava daristana mezin da</i>
fraza hokerî <b>FH</b>	adverbial phrase <b>AdvP</b>	<i>Ew <b>gelekî zû</b> hat</i>
fraza lêkerî <b>FL</b>	verb phrase <b>VP</b>	<i>ew <b>nehat</b>; ez <b>dikim biçim</b>; sê kes <b>hatin kuştin</b></i>

fraza navdêrî <b>FN</b>	noun phrase <b>NP</b>	<i>kitêba min, kitêba kevn, ev kitêb</i>
fraza rengdêrî <b>FR</b>	adjectival phrase <b>AP</b>	<i>Ev xwarin <b>pir xweş</b> bû</i>
gewrîyî	glottal	
gihanek (m) <b>g, G,</b> <b>gih</b>	conjunction <b>conj</b>	
gihaneka cudaker	disjunctive conjunction	<i>yan, ne...ne jî, yan...yan jî</i> <i>Ev <b>ne</b> dar e <b>ne jî</b> teraş e</i>
gihaneka dijber	adversative conjunction	<i>lê, lê belê, bes</i> <i>Ew feqîr e <b>lê</b> kêfxweş e</i>
gihaneka encamder	conclusive conjunction	<i>(ji) lewra, vêca, îca</i> <i>Narîne ew hişt, <b>îca</b> wî xwe kuşt</i>
gihaneka ronker	explanative conjunction	<i>çunkî, seba, ji ber ku, bona</i> <i>Sebira wî nedihat <b>çunkî</b> hevalan terka wî kiribû</i>
gihaneka zêdeker	additive conjunction	<i>û, (û) herweha</i> <i>Narîn <b>û</b> Amed xwîşk û bira ne</i>
gire (m) <b>G</b>	affix <b>AFF</b>	
gireya cihnavî ya lêkeran	pronominal verb affix	<i>e-<b>tan-nard-în</b> = êwe êmetan enard 'we dê em bişandana' [bi soranî]</i>
girtî	Closed	
graf (m)	Graph	
grafem	Grapheme	

grafemîk	Graphemic	
grafetîk	Graphetic	
guherte (m)	Variety	
gûşîyê	consonant cluster,	<i>stêr, spî, stran, şkeft, bend, cerg, rengspî</i>
nedengdêran,	sound cluster <b>CC</b>	
gûşîyê		
konsonantan <b>GND</b>		
guvaş (m)	Stress	
herf (m), tîp (m)	letter	
hevdeng	homophone	<i>ber 'kevir', ber 'firehî'</i>
hevgihanek	coordinating conjunction	<i>û, yan, lê, bes</i> <i>Narîn derket û baran barî</i>
hevherf	Homograph	<i>ker 'parçe', ker 'heywanê barhilgir'</i>
hevmane (m)	Synonym	<i>difin, bêvil, poz, kepî, lût</i>
hevnav	Homonym	<i>ber 'kevir', ber 'firehî'; ker 'parçe', ker 'heywanê barhilgir'</i>
hevok (m) <b>H</b>	sentence <b>S</b>	<i>Ew ji malê derneket çunkî baran dibarî</i>
hilmandî	Aspirated	[p <sup>h</sup> ], [t <sup>h</sup> ], [k <sup>h</sup> ]
hilmandin (m)	Aspiration	
hîyerarşîya sonorîteyê	sonority hierarchy	
hodêr (m)	Causee	<i>Wî Narîn bi wan da revandin</i>
hoger (m)	Causer	<i>Wî Narîn bi wan da revandin</i>
hokarî <b>HOK</b>	causative <b>CAUS</b>	

hokarîkirin	causativization	
hokarîkirina morfolojîk	morphological causativization	<i>ketebe</i> ‘nivîsand’, <i>kettebe</i> ‘da nivîsandin’ [bi erebî]
hokarîkirina perîfrazî	periphrastic causativization	<i>Wê diz <b>da girtin</b>; Me kir ku ew <b>bireve</b></i>
hoker (m) <b>h, H,</b> <b>hok</b>	adverb <b>adv, ADV</b>	<i>niha, îsal, berê, hêdîka, mêrane, devkî</i>
hokera amrazî	instrumental adverb	<i>bi kêrê, bi dermanan, bê şekir</i>
hokera aspektê	aspectuality adverb	<i>berdewam, tim. pir</i>
hokera awayî	manner adverb	<i>zû, bi lez, hovane, berebere, paşpaşkî</i>
hokera cihî	place adverb	<i>vir, wir</i>
hokera demê	time adverb	<i>do, par, berê, ji mêj ve</i>
hokera deontîk- hilsengandinî	deontic-evaluative adverb	<i>xweşbextane</i>
hokera emfatîk	emphatic adverb	<i>tam, bes, tenê, qet, hîç</i>
hokera epîstemîk	epistemic adverb	<i>teqrîben, bê şik, sedîsed</i>
hokera mêjerî	quantity adverb	<i>bê hed, yekcar, gelek, kêr, hindik, ew qas</i>
hokera modîfîyekirina rengdêran	adverb modifying adjectives	<i><b>pir</b> bedew, <b>zêde</b> jîr, <b>gelek</b> sade, <b>bê hed</b> dirêj</i>
hokera pirsyarî	interrogative adverb	<i>çima, kengî/kînga, ku(sa), çawa(n), çitov</i>
îdyolekt (m)	Idiolect	

îsoglos (m)	Isogloss	
îzafe (m)	Izafe	<i>mêrê wê, jina wî, mêrên wan, mêrekî wê, jineka wî</i>
jargon (m)	Jargon	
jorgewrîyî	epiglottal / pharyngeal	
kamdevî	palatal	
kampidûyî	palato-alveolar	
kara (m) <b>K</b>	subject <b>S, SBJ, SUB</b>	<i>Narîn çû</i>
karakterîzekirina ristesazîyî ya rengdêrê	syntactic characterization of adjective	
kesê duyem pirhejmar <b>2P</b>	second person plural <b>2PL</b>	
kesê duyem yekhejmar <b>2Y</b>	second person singular <b>2SG</b>	
kesê sêyem pirhejmar <b>3P</b>	third person plural <b>3PL</b>	
kesê sêyem yekhejmar <b>3Y</b>	third person singular <b>3SG</b>	
kesê yekem pirhejmar <b>1P</b>	first person plural <b>1PL</b>	
kesê yekem yekhejmar <b>1Y</b>	first person singular <b>1SG</b>	
kêşan	conjugation	

kîte (m) <b>kît</b>	syllable <b>syll</b>	
kîtekirin	syllabification	
kodkirina morfolojîk ya rawetîyê	morphological coding of modality	<i>Azad <b>dikeve</b>; Bila Azad <b>bikeve</b>; Xwezî Azad <b>biketa/ketiba</b>; <b>Bikeve!</b></i>
kodkirina ristesazîyê ya rawetîyê	syntactic coding of modality	<i>Ew belkî <b>bikeve</b> [îmkan]; Divê ew <b>bikeve</b> [ferman]; Ew <b>dikare bikeve</b> [îhtîmal]</i>
kopula	Copula	
kurdîya bakurî (kurmançî) <b>Kur.bak., KBAK</b>	North Kurdish <b>N.Kd.</b>	
kurdîya başûrî (kelhurî, kirmaşanî, lekî, lurî) <b>Kur.baş., KBAŞ</b>	South Kurdish <b>S.Krd.</b>	
kurdîya goranî (hewramî, bacelanî, şebekî, maço) <b>Kur.Gor.</b>	Gorani Kurdish <b>G.Krd.</b>	
kurdîya kirmanckî (kirdkî/zazakî/dimi lkî)	Kirmanckî/Kirdkî/Z aza/Dimilki Kurdish	
kurdîya naverast (mukrî, soranî, <b>C.Kd.</b>	Central Kurdish <b>C.Kd.</b>	



erdelanî, babanî)

**Kur.nav., KNAV**

kurtenav (n)	Acronym	<b>NY</b> = <i>Neteweyên Yekbûyî</i>
kurtkirin (m)	abbreviation	<b>hwd</b> = <i>her wek din</i>
lebatî, aktîf <b>AKT</b>	active <b>ACT</b>	<i>Narînê sêv xwar</i>
lêker (m) <b>I, L, lêk</b>	verb <b>v, V</b>	
lêkera alîkar	auxiliary verb <b>aux,</b> <b>AUX</b>	<i>I do not read 'ez naxwînim' [bi îngilîzî]</i>
lêkera kêşayî <b>KÊŞ</b>	finite verb <b>FIN</b>	<i>Baran dibare</i> [Lêker 'barîn' e]
lêkera nekêşayî	nonfinite verb	<i>Cigareşimtiş rind niyo 'Cigarekişandin ne baş e' [bi zazakî]</i>
leksîkogramer	lexicogrammar	
lerzok	trill	
lêvdidanî	Labiodental	
lêvî	Labial	
lihevhatin (m)	Concord	<i>erevaya kihoya kihani 'erebeya kesk a kevn' [bi zazakî]</i>
manenasî (m)	Semantics	
mê <b>m, M</b>	feminine <b>f, FEM</b>	<i>sêva Narînê, sêva wê</i>
mêjer (m) <b>MÊJ</b>	number <b>NUM</b>	
metafonî (m)	metaphony	[ 'mese] 'meh (yekhejmar)' → [ 'misi] 'meh (pirhejmar)' [bi devoka Calvello ya îtalî]
mezinkirî	augmentative	
modîfîyeker (m)	Modifier	<i>li ser bextê wan, gelek(î) xweş, gelek(î) zû, kitêba kevn kitêba Zeynebê, wî hevalî, çend heval</i>

modîfîyekera	postnominal	<i>kitêba kevn; kurtiya nûçeyan, hevala min</i>
paşnavdêrî	modifier	
modîfîyekera	prenominal	<i>şeş mêr; ew jin; hin heval</i>
pêşnavdêrî	modifier	
modîfîyekera	non-referential	<i>her kes, ti tişt, filan roj</i>
pêşnavdêrî ya	prenominal	
amajenekirî	modifier	
modîfîyekera	deictic prenominal	<i>ev kitêb, ew kitêb, vê kitêbê, wê kitêbê, van kitêban, wan kitêban</i>
pêşnavdêrî ya	modifier	
nîşander		
modîfîyekirî	Modified	
monoftong (m)	monophthong (pure vowel)	
monoftongîzasyon (m)	Monophthongisati on	[k <sup>h</sup> ajf] ‘keyf’ → [k <sup>h</sup> ɛf] ‘kêf’
morfem (m)	morpheme	<i>ciwan+kar+î+kir+in</i> [Ev bêje ji pênc morfeman pêk dihê.]
morfema bendkirî	bound morpheme	<i>ciwan+kar+î+kir+in</i>
morfema dariştinî	derivational morpheme	<i>ciwan+î</i> [Ev navdêr ji rengdêra ‘ciwan’ û morfema dariştinîyê ‘î’ hatiye çêkirin.]
morfema ferhengî	lexical morpheme	<i>Narînê sêvên sor xwarin</i>
morfema rêzimanî	grammatical morpheme	<i>Narînê sêvên sor xwarin</i>
morfema serbixwe	free morpheme	<i>ciwan+kar+î+kir+in</i>
morfolojî (m)	morphology	

mutasyon (m)	mutation	<i>Şivanî/Şivên diz nedît; haak-o ‘pel/belg (yekhejmar)’ → kaak-e ‘pel/belg (pirhejmar)’ [bi fulayî]</i>
navbergir (m)	interfix	<i>destebira, koremar</i>
navdêr (m) <b>n, N, navd</b>	noun <b>n, N</b>	
navdêra cureyî	common noun	<i>gel, kes, kolan, text, şêr</i>
navdêra hejmarbar	count noun	<i>dest, stêr, qelem</i>
navdêra komî	collective noun	<i>pez, dewar, gel</i>
navdêra nehejmarbar	mass noun	<i>av, ba, agir, ax, serbestî</i>
navdêra razber	abstract noun	<i>vîn, bawerî, aşî, tirs, hêvî, hez</i>
	<b>abstr</b>	
navdêra şênber	concrete noun	<i>dîwar, dar, genim, stêr</i>
navdêra taybetî	proper noun	<i>Mem, Zîn, Botan, Dîcle, Cûdî</i>
navdêrî	nominal	
navdêrîkirî	nominalized	
navdêrîkirin	nominalization	
navgir (m)	infix	<i>neşere ‘weşand’, înteşere ‘belav bû’ [bi erebî]</i>
navik (m) <b>N</b>	nucleus <b>N</b>	<i>kurd, stêr</i>
dendik (m) <b>De</b>		
navriste (m)	embedded clause	<i>Ev bajar, <b>yê ku ez lê mezin bûme</b>, bîst sal berê gund bû.</i>
nebinavkirî <b>NBNK</b>	indefinite <b>INDEF</b>	<i>Narîne <b>sêvek</b> [INDEF] xwar. Narîne <b>sêveka</b> [INDEF] sor xwar</i>

[bb. *Narîne sêv* [DEF] *xwar. Narîne sêva* [DEF] *sor xwar*]

nedengdêr (m), konsonant (m) <b>ND</b>	consonant <b>C, CONS</b>	
Nehilmandî	unaspirated	
nêr <b>n, NÊR</b>	masculine <b>m, MAS</b>	<i>destê Azadî, destê wî</i>
Nerêzikî	irregular	
nêtar <b>nêt, NÊT</b>	neuter <b>n, NEUT</b>	<i>doktorê me, doktora me</i>
neyînî <b>ne, NE</b>	negative <b>neg, NEG</b>	<i>Azad ne rêber e; Narîne sêv nedixwar</i>
nihaya subjontîf	present subjunctive	<i>Belkî Narîn sêvê <b>bixwe</b></i>
nîşander (m) <b>NÎŞ</b>	demonstrative (deictic) <b>dem, DEM</b>	
nîşandera cihnavî (cihnava nîşander)	pronominal determiner (demonstrative pronoun)	<i><b>ev</b> bilindtir e, <b>ew</b> geştirîn e</i>
nîşankirina rewşê	case-marking	
Nîvdengdêr	semi-vowel	
Nîvek	middle	
Nîvergatîf	split-ergative	<i>Narîn [NOM] <b>min</b> [AKU] <b>dibîne</b> [Dema niha] <i>Narîne [ERG] <b>ez</b> [ABS] <b>dîtîm</b> [Dema borî]</i></i>
Nîvgirtî	half-closed	
Nîvvekirî	half-open	

palatalîzasyon (m)	palatalization	
Partîkil	particle	<i>Ew ne Narîn e</i>
partîsîp (m)	participle	<i>çûyî, birî, firotî, girtî, firinde, dirinde</i>
partîsîpa borî	past participle / perfect participle	<i>firî 'yê ku firiye' [Lêker 'firîn' e.]</i>
partîsîpa niha <b>PNH</b>	present participle <b>PRESP</b>	<i>firinde 'yê ku difire' [Lêker 'firîn' e.]</i>
paşdaçek (m) <b>PAŞD</b>	postposition <b>pp</b> , <b>post</b>	<i>ra [di zazakîyê da]</i>
paşgir (m) <b>PAŞG</b>	suffix <b>SUFF</b>	<i>dirêjahî, kurdî, derok, biratî</i>
paşgira biçûkker	diminutive suffix	<i>darik, derok</i>
paşgira cihnavî	pronominal suffix	
paşgira kesî	personal ending	<i>Wan ez nedîtîm</i>
paşgira nebinavkirinê	indefinite suffix	<i>sêvek</i>
Paşî	back	
pê (n) <b>P</b>	foot <b>Ft</b>	
pêbest (m) <b>PB</b>	argument <b>arg, A</b>	<i>Wî gulek da Narînê</i>
pêşdaçek (m) <b>PÊŞD</b>	preposition <b>p, pre</b> , <b>PREP, prep</b>	<i>ji, berî, piştî, paş, bi, li, li ser, li/di gel</i>
pêşgir (m) <b>PÊŞG</b>	prefix	<i>vegirtin, bideng, nexweş</i>
Pêşî	front	
pêvaber (m) <b>pêv</b>	predicate <b>pred, P</b>	<i>Narînê sêv xwar; Azad rêber e</i>

Peyvrêzî	word order	
Pidûyî	alveolar	
pirhejmar <b>P, PIR, PH, pirhejm</b>	plural <b>pl, PL</b>	<i>sêvên wan, destên hevalan</i>
Pirmane	polysemous	<i><b>girtin</b>: diz <b>girtin</b>, derî <b>girtin</b>, wêne <b>girtin</b>, rojî <b>girtin</b></i>
pirstandardî/pirna vendî	pluricentrism	
Piştkaî	velar	
Piştpidûyî	postalveolar	
prensîpa sekansa sonorîteyê	sonority sequence principle (ssp)	
prosesa jenîna dengî	fonation process	
prosodî (m)	prosody	
rader (m) <b>RAD</b>	infinitive <b>INF</b>	<i>barîn, standin, çûn</i>
rastnivîsîn (m)	orthography	
Raveker	dependent / modifier	<i>dengê <b>zelal</b>, dengê <b>bilbilan</b></i>
Ravekirî	head / modified	<i><b>dengê zelal</b>, <b>dengê bilbilan</b></i>
rawe (m)	mood	
rawetî (m)	modality	
raweya deontîk	deontic mood	<i>Ew nikare bifire [şiyar]; Bila ew bifire [destûr]; Divê ew bifire [ferman]</i>

raweya divêtî	obligative mood	<i>Divê tu bixwînî!</i>
raweya epîstemîk	epistemic mood	<i>Mimkin e ew ketibe; Belkî ew ketibe; Helbet ew dê ketibe</i>
raweya fermanî	imperative mood	<i>Bifire!</i>
<b>FER</b>	<b>IMP, IMPER</b>	
raweya handanî	hortative mood	<i>Ka/Hela/Bila/Da em herin!</i>
<b>HAN</b>	<b>HORT</b>	
raweya mercî	conditional mood	<i>Heger tu bimînî, tu dê ecêban bibînî!</i>
raweya nerealîs	irrealis mood	<i>Bila Azad <b>bixwîne</b> [bb. Azad dixwîne (raweya realîs)]</i>
raweya qedexeyî	prohibitive mood	<i>Nefire!</i>
raweya	indicative mood	<i>Azad <b>dikeve</b>; Azad <b>ket</b></i>
ragihandinî <b>RAG</b>	<b>IND</b>	
raweya realîs <b>REAL</b>	realis mood <b>REAL</b>	<i>Azad <b>dixwîne</b> [bb. Bila Azad bixwîne (raweya nerealîs)]</i>
raweya subjontîf	subjunctive mood	<i>Bila/Xwezî/Heger Azad bikeve</i>
<b>SUB</b>	<b>SBJV, SJV</b>	
raweya xwestekî	optative mood	<i>Xwedê te bihêle!; Bijî azadî!</i>
reha dema borî	preterite/past stem	<i>-barî- [Lêker 'barîn' e.]</i>
reha dema niha	present stem	<i>-bar- [Lêker 'barîn' e.]</i>
reha lêkerê	verb stem	<i>-bar-, -barî- [Lêker 'barîn' e.]</i>
rêkkeftin <b>RÊK</b>	agreement <b>AGR</b>	<i><b>Ez helbestan dixwînim, Hûn camêr in</b></i>
rengdêr (m) <b>r, R,</b> <b>rengd</b>	adjective <b>adj, ADJ</b>	
rengdêra endazeyê	size adjective	<i>biçûk, mezin, sivik, giran, dirêj, qelew</i>

rengdêra hesta	olfactory/smell	<i>genî, bêhnxweş</i>
bêhnkirinê	adjective	
rengdêra hesta	auditory/hearing	<i>bilind, nizim, xweş, tûj, zelal</i>
bihîstinê	adjective	
rengdêra hesta	gustatory/taste	<i>tirş, şîrîn, tal, miz, bêtam, xav</i>
çêştinê	adjective	
rengdêra hesta	tactile/touch	<i>req, zivir, nerm, zeliqok, tûj</i>
destdanê	adjective	
rengdêra hesta	visual/seeing	<i>dûr, nêzîk, şêlû, biriqî</i>
dîtinê	adjective	
rengdêra	evaluative	<i>qenc, xerab, kirêt, ciwan, jîr, aqilsivik, bênamûs</i>
hilsengandinê	adjective	
rengdêra pêvaberî	predicative adjective	<i>Ev xanî <b>kevn</b> e</i>
rengdêra ravekî	attributive adjective	<i>Xanîyê <b>kevn</b> herifî</i>
rengdêra rengî	color adjective	<i>tarî, kesk, sor</i>
rengdêra rewşa	adjective of	<i>kêfxweş, xeyidî, bilez, sar</i>
bihurbar	transitory state	
rengdêra rewşa	adjective of state	<i>navsere, zindî, nexweş, bêkar</i>
jiyanê	of living	
rengdêra teşeyê	shape adjective	<i>rast, xwehr, vala, bazineyî</i>
rewşa absolutîf	absolute case	<i>Narînê <b>sêv</b> xwar</i>
<b>ABS</b>	<b>ABS</b>	[Rewşa akuzatîf: <i>Narîn <b>sêvê</b> dixwe</i> ]



rewşa akuzatîf <b>AKU</b>	accusative case <b>ACC</b>	<i>Narîn sêvê dixwe</i> [Rewşa absolutîf: <i>Narînê sêv xwar</i> ]
rewşa alatîf <b>ALA</b>	allative case <b>ALL</b>	<i>talo 'xanî', talolle 'bo xanîyê / ber bi xanîyê va'</i> [bi fînlandî]
rewşa amrazî <b>AMR</b>	instrumental case <b>INS</b>	<i>Wan zebeş bi kêrê birî</i>
rewşa bangkirinê <b>BAN</b>	vocative case <b>VOC</b>	<i>Lawo were! Keçê neçe! Xortino rabin!</i>
rewşa bonayî <b>BON</b>	benefactive case <b>BEN</b>	<i>Ez dê bona te werim; Wan derî ji wê ra venekir; Were em ji xwe ra derkevin</i>
rewşa cihî <b>CIH</b>	locative case <b>LOC</b>	<i>li ser maseyê, di dolabê da</i>
rewşa datîf <b>DAT</b>	dative case <b>DAT</b>	<i>Wî gulek da Narînê; Min qeseyek gote wî</i>
rewşa derketinê <b>DER</b>	ablative case <b>ABL</b>	<i>Deng ji destekî nayê</i>
rewşa elatîf <b>ELAT</b>	relative case <b>ELAT</b>	<i>talo 'xanî', talosta 'ji xanîyê (va)'</i> [bi fînlandî]
rewşa ergatîf <b>ERG</b>	ergative case <b>ERG</b>	<i>Narînê sêv xwar</i> [Rewşa navkî: <i>Narîn sêvê dixwe</i> ]
rewşa navkî <b>NAV</b>	nominative case <b>NOM</b>	<i>Narîn sêvê dixwe</i> [Rewşa ergatîf: <i>Narînê sêv xwar</i> ]
rewşa pevrabûnê <b>PEV</b>	associative case <b>ASS</b>	<i>Ez bi te ra têt; Ez li/di gel te têt; Em bi hev ra diçin</i>
rewşa rasterast <b>RST, RAS</b>	rectus/direct case <b>DIR</b>	<i>Narîn sêvê dixwe</i>
rewşa tewandî <b>TEW</b>	oblique case <b>OBL</b>	<i>Narîn sêvê dixwe</i>

rewşa xwedantîyê	genitive case <b>GEN</b>	<i>çavên keçikê, destê min, lîstikên zarokan, xewa rojê</i>
<b>XWED</b>		
rexkî, lazimanî	lateral	
Rêzikî	regular	
Rêziktî	regularity	
riste (m)	clause	<i>Ew ji malê derneket çunkî baran dibarî</i>
ristesazî (m)	syntax	
risteya hevedudanî	compound clause	<i>Baran dibarî û ba dihat</i>
risteya hokerî	adverbial clause	<i>Ew berî ku roj ava bibe gehişt malê</i>
risteya karayî	subject clause	<i>Ew kesên do me ew nas kiribûn nehatine</i>
risteya mercî	conditional clause	<i>Heger baran bibare, ew ji malê dernakeve</i>
risteya peywendîyê ya paşnavdêrî	postnominal relative clause	<i>kitêba ku min dixwend</i>
risteya sade	simple clause	<i>Baran dibarî</i>
risteya têkel	complex clause	<i>Ew ji malê derneket çunkî baran dibarî</i>
risteya tiştayî	object clause	<i>Ez mirovên ku bêbextî bi te kirine efû nakim.</i>
serbêje (m)	head noun <b>H</b>	<i>gelek(î) xweş, gelek(î) zû, kitêba kevn pir xweş, pir zû, kitêba Zeynebê</i>
serik (m) <b>S</b>	onset <b>O, Ons</b>	<i>kurd, stêr</i>
serriste (m)	main clause	<i>Ew ji malê derneket çunkî baran dibarî</i>
serwa (m)	rhyme	<i>kurd, stêr</i>

sonorîte (m)	sonority	
sosyolekt (m)	sociolect	
sûyok, xişok	fricative	
sûyoka girtî	affricate	
şidandin (m)	gemination	
tamergatîf	full-ergative	<i>Narîne</i> [ERG] <i>ez</i> [ABS] <i>divê</i> m [Dema niha] <i>Narîne</i> [ERG] <i>ez</i> [ABS] <i>vîyam</i> [Dema borî]
tebatî, pasîf <b>TEB</b> , <b>PAS</b>	passive <b>PAS</b> , <b>PASS</b>	<i>Sêv hat xwarin</i>
temam <b>TEM</b>	perfect (indicative) <b>PERF</b> , <b>PRF</b> , <b>PF</b>	<i>Narîne sêv xwariye</i>
temama subjontîf	perfect subjunctive	<i>Belkî Narîne sêv xwaribe</i>
temamker (m)	complement <b>comp</b>	<i>Azad rêber e</i> [temamkera karayê]; <i>Me Azad kir rêber</i> [temamkera tiştayê]
têneper <b>tnp</b> , <b>tn</b>	intransitive <b>intr</b>	<i>Narîn çû</i> [Lêker 'çûn' e.]
têneperkirin	detransitivization	<i>Azad xwe dibîne</i> , <i>Azad hat dîtin</i> , <i>Wan hev dîtin</i> .
têper <b>tp</b> , <b>t</b>	transitive <b>tr</b> , <b>trans</b>	<i>Narîne sêv xwar</i> [Lêker 'xwarin' e.]
têperî (m)	transitivity	
tepok	Flap	
teqok	stop/plosive	
termînolojî (m)	Terminology	

tişte (m), bireser (m), objekt (m)	object <b>O, OBJ, OB</b>	<i>Wî gulek da Narînê</i>
<b>TIŞ, BIR, B, bires</b>		
tişteya nerasterast	indirect object <b>IO</b>	<i>Wî gulek da Narînê</i>
<b>TN</b>		
tişteya rasterast	direct object <b>DO</b>	<i>Wî gulek da Narînê</i>
<b>TR</b>		
ton (m)	tone	
valens (m)	valency	
vekirî	open	
yeke (m)	unit	
yekhejmar <b>Y, YEK,</b> <b>YH, yekhejm</b>	singular <b>sg, SG,</b> <b>sing</b>	<i>sêva wê, destê wî</i>
yektêper	monotransitive	<i>Narînê sêv xwar</i> [Lêker 'xwarin' e.]
zarava (m), dîyalekt (m)	dialect	
zaravanasî (m), dîyalektolojî (m)	dialectology	
zayend (m) <b>Z</b>	gender <b>G</b>	
zimannasî	linguistics	
zimanokî	uvular	

## Marogulov û alfabe ya wî ya kurdî-latînî

### Çiya Mazi

**Marogulov kî ye?** Îsahak Marogulov, pêşengê elfabe ya kurdî ya bi Latînî ye. Lê belê kurdên Bakur pir ew nebihîstine. Di der barê berhemên wî de û di der barê alfabe ya wî de. Min xwest ez hinekî di der barê wî de agahiyan berhev bikim an hînî jiyan û keda wî bibim. Lê di înternetê de mixabin tenê çend heb nivîsar hebûn. Ew jî pêşî bi tirkî hatine nivîsandin. Ew nivîsar jî ji pirtûka bi navê “Ji Dîroka Gelê Kurd 13 Pelên Balkêş (Kurt Halk Tarîhînden 13 ilginç yaprak)” hatine girtin. Pirtûk a Rewşenbîr Celîlê Celîl û ji Wesanxaneya Evrensel Basın Yayın, bi wergera nivîskar Hasan KAYA di sala 2007’an de hatiye çapkirin. Bi rastî, divê zimanzan li ser vê yekê bisekinin û nîqaş bikin.

Min got bila carekê jî ez balê bikişînim ser vê mijar û vî mirovê qedirbilind bi nivîsareke kurdî bi bîr bînim ji bo xwendevanên Diyarnameyê.

### Tê Gotin ku;

Îsahak MAROGULOV lawê Fahred ê ku bi eslê xwe Asûrî ye. Di sedsala 19’an de ji Îranê koçî Ermanistanê kiriye. Û li gundê Divîn ku bi ser Erîvanê ve ye bi cih bûne. Marogulov di sala 1868’an de hatiye dinê. Piştî ku dibistana mamostetiyê qedandiye di sala 1888’an de pêşî li gundê Şatextê ya Nahcîvanê û dû re li gundê Qemerlî mamostetî kiriye. Ji ber ku her sal bi malbata xwe re diçe Zozanê Elegezê nava malbatên kurdan bi zarokên wan re fêrî kurdî dibe û wekî zimanê xwe yê zikmakî xweş hîn dibe û dipeyive.




*Isahak Marogûlov*

Di sala 1905'an de ji bo mamostetiyê wî didin gundê Zorê, gundê kurdan. Li gor lawê wî gotiye, li vir amadekariya alfabeya zimanê kurdî dike. Di salên 1920'an de şiyarbûn û pêşketina kurdên Sovyetê rû daye. Di wan salan de ji bo zimanê milletên hindik, dewlet dixwaze alfabeyan çêbike. Ji bo vê pirsgirêkê Dewleta Sovyetê, wezîfeyê dide dewletên Qafqasyayê û ji mirovên pîspor lijneyekê ava dikin û dest bi xebatên ji bo amadekirina alfabeyên hindikahiyan dikin. Ji bo gelek miletan (tirk, kurd, asûrî, oset) biryara Alfabeya Latînî tê stendin û ji zanayên wan neteweyan dixwazin ku li himberî dangan tîpan peyda bikin û wekî rapor pêşkêşî lijneyê bikin.

Ji bo vê yekê pêşî zanyarên mîna Orbellî û N. MARR xebitîne lê bi ser neketine. Di wê demê de Marogulov jî xebateke zexm dike ji bo Alfabeya Zimanê Kurdî. Di sala 1928'an de li gor deng û fonetika turdî alfabeyekê amade dike û pêşkêşî lijneyê dike. Ji alî lijneyê tê pejirandin û pêşkêşî devletên Qafkasya dikin. Di sala 1929'an de dewletên Qafqasya bi fermî vê alfabeya MARAGULOV dipejirînin. Piştî ku alfabe tê pejirandin. Marogulov dest bi danasîna alfabe û zimanê kurdî dike. Mamosteyên kurd dide hev du û vê alfabeyê fêrî wan dike. Li nava kurdan digere û şanî wan dike.

Lê belê di sala 1930'yî de ev alfabe ji alî wan Sovyetan ve tê betalkirin. Di sala 1941'ê de bi biryareke li Ermenistanê alfabeyeke kurdî bi tîpên kirîlî tê amadekirin û pejirandin. Ne tenê alfabeya kurdî alfabeyên ku bi latînî hatine amadekirin gişan betal dikin û derbasî alfabeya kirîlî dibin. Ev bêyî vîna kurdan û her wiha neteweyên din pêk tê.



MAROGULAV heta mirina xwe (6 rezber 1933) li ser alfabe û zargotina kurdî dixebite. Di kovareke Rûsî “wêje û çanda rojhilat” nivîsareke zanistî li ser alfabeya kurdî diweşîne û ev nivîsar pir balê dikişîne. Heta ku dimire jî li ser ziman û zargotina kurdî gelek pirtûk û dosyayan amade dike.

Wekî ku van salên dawiyê mirovên ku behsa Marogulov kirine, gişan heyf û mixabinek anîne zimên. Ji ber ku di heman dem û salên ku Marogulov xebitiye Celadet Bedirxan û hevalên xwe jî, li ser alfabe û rêzimanê kurdî xebitîne. Lê çî ku haya wan ji hev du çênebûye û nîqaş û xebata wan ji hev du sûd wernegirtiye. Li gor ku xuya ye alfabeya

Marogulov ji 37 tîpan pêk hatiye. Tu xisara nîqaşan tune ye û xisara vê alfabe û xebatan jî ez dibêjim tune ye, tenê wê sûdê bide zimanê kurdî.

Çavkanî: “Ji Dîroka Gelê Kurd 13 pelên balkêş (Kurt Halk Tarîhînden 13 ilginç yaprak)” Celîlê Celîl, wesaxaneya Evrensel Basın yayin, wergêr, Hasan KAYA , 2007.

## Nerîtêkî nwê le ferhegnûsîy Kurdî da

*Rehber Mehmûdzade*

Ew taybetmendîyaney debine hoy ewey ferhengêk be ferhengêkî çak binasîn û le hellsengandin da cêgayekî berzî pê bideyn, kamanen? Le wane ye kodengîyekî rêjeyî le ser em taybetmendîyaney xwarewe le nêw xuwêneran da hebêt:

1. Giştgirbûnî (camê' bûden) ferhengeke. Wate katêk be nîyazî dozînewey medxelêk lêkî dekeyewe destit be rûyewe nenê û medxelekey girtibêt.
2. Lêkdanewe û manakirdnewey rast. Giştgirbûn katêk bayexî heye eger ew şîkirdneweş ke le beranber medxelekan da hatûn berrastî erkî çawsaxîy xoyan berrêwe biben û xuwêner be larrêda neben û zanyarîy helle û hellxelletênerî lê neden.
3. Zanistîbûn. Ew dû taybetmendîyey berê amajeman pê kird herremey xellk razî deka, bellam em taybetmendîyey duwaweye ke le lêkdanewey wurdtir û hellsengandinî pisporraretir da wêrray ew taybetmendîyaney pêşû serincî pê dedirêt.

1-3 dîyarî kirdinî corî wuşe yan zarawe yan rêkewendêk ke wek medxel dandirawe. Bo nimune le ferhengî wuşeda mêtodî zanstî wa dexuwazê, corî wuşekan le barî rêzimanîyewe dîyarî bikrên.

2-3 lêk hellawardinî kertekanî wuşe, eger wuşeke lêkdiraw bê.

3-3 nîşandanî reçellekî zimanîy wuşe.

4-3 hênanewey şayed û nimûne bo wuşe.

Êsta eger be guwêrey em pêweraney begîştî ta êsta basman kirdin, henbane borîney hejar legell qamûsî Zebîhî hellsengênîn le waneye be xuwêdineweyekî xişkeyî, bem encame bigeyn ke henbane borîne le qamûs giştgirtire (dîyare hellsengandinekeman her wuşekanî dû herifî «elf» û «bê» degirêtewe, çunke qamûs her heta ew dû herfe hatûwete lêş) bellam qamûs le Henbane borîne



zanstîtire. Le henbane borînedada zor wuşe dedozînewe ke le qamûsda nîn, wekû: aşmay, aşo (be manay wuçan), aşot, aşujin1 û ..., bellam eger ew çuwar wurde taybetimendîyaney basim kirdin bikeyn be pêwerî zanistîbûn, le taybetimendîy çuwaremda nebê (hênanewey şayed û nimûne bo wuşe) ke henbane borîne le qamûs namênêtewe, bo reçawkirdinî sê mercekey tir ewe qamûse ke goy girêwî birdotewe. Ba birwanîne em nimûnaney xwarewe:

Le Henbane borînedada le beranber wuşey ajodan, her hênde nûsirawe: bo şewlewerr birdinî mêgel2. Le qamûsda sereta kertekanî wuşe lêk cuda kirawinetewe: ajo+dan, duwaye corî wuşeke le barî rêzimanîyewe dîyarî kirawe: (مصتـ). [yanî mesderî têkellaw] mit.[yanî mute'edî] încâ manay wuşeke lêkdirawetewe: birdine derewey ajall be şew bo lewerrandin ... Duwatir ew wuşeye le rsteyekda wekû nimûne kellî lê wergîrawe: eme çend rojêke raneke ajo dedeyn. Duway hemûyan be nîşaney estêre, hawta (muteradif)î wuşeke hatûwe : şewbekêw3.

Le qamûsda reçellekî wuşekanîş dîyarî kirawin. Bo nimûne le pêş wuşey asar nûsirawe [a : آar]. Nîşaney «'E» kurtkirawey 'Erebîye. Le pêş wuşey asan nûsirawe [ph : asan]. «ph» kurtkirawey pehlewîye4.

Eger em sê xalle bikeyn be pêwerî hellsengandinî ferhengî zarekîy mukirîyan, em ferhenge lem taqîkarîyeda çon derdeçê? ber le weî wellamî em pirsîyare bideynewe ba sûkelengerêk bigrîn û le ser ew nerîte ferhengnûsîyey -em ferhenge pêyîewe bestirawetewe nextêk bidîwêyn.

Xuwa lê xoş bû duktur Ewrrehmanî Hacî Marif le wutarêkî bepêzîda be nawî «ferhengnûsî» be şeweyekî têrutesel awirî le mêjûy ferhengnûsîy Kurdî dawetewe5. Lem wutareda ferhengekan le hendêk barewe polên kirawin. Bo nimûne basî cîyawazîy ferhengî înskilopîdî û ferhengî filolojî kirawe (duwatir lem bareyeda dedîwêyn): yan basî cîyawazîy ew ferhengane kirawe ke be kerestey zimanî zigmak, manay wuşey zimanêkî bêgane lêk dedenewe legell ewaney bepêçewane be kerestey zimanêkî bêgane, manay zimanî zigmak lêk dedenewe. Herweha lem wutareda ferhenge Kurdîyekan be guwêrey şuwên û katî nûsiranîşîyan polîn kirawin, bellam heta kotayî wutareke, kem û zor basî cîyawazîy nîwan ferhengî zarekî û ferhengî nivîsarî nekirawe.

Herweha mamosta Hejarîş le pêşekîy henbaneborîne yoxda basî cîyawazîy nêwan ew ferhenganey kirdûwe ke wuşe Kurdîyekanîyan be 'Erebî yan be Farsî lêk dawetewe legell ewaney ferhengî Kurdî be Kurdîn. Bellam ewîş basî cîyawazîy nêwan ferhengî nivîsarî û ferhengî zarekî nekirdûwe.

Le Kurdistanî Îranda le sallî 1367î koçî hetawî be duwawe, hendêk ferheng nûsirawin ke nakirê be hasanî nawî ferhengî wuşeyan le ser dabinêyîn. Herweha nawdêrkirdinîyan be ferhengî nivîsarîş cêgey dirrdongî û têrramane. Em ferhengane birîtîn le:

1. ferhengî wuşe dûwanekanî zimanî Kurdî, nûsirawî Xuwa lê xoş bû Teha Feyzîzade. Le paşkoym em kitêbeda dû namîlkey «nobre» û «hewên» peywest kirawin ke le yekemîyanda tewawî ew rêkewend û zarawe û pend û mesel û beyt û bawaney hellgirî çawgî«çûn»n ko kirawinetewe û le dûwemîşîyanda ewaney wuşey «dest»îyan le xo girtûwe, rêçkeyan pê bestirawe<sup>6</sup>.
2. pendî pêşînîyan, nûsirawî Seyd 'Ebidulhemîd Hîret Seccadî<sup>7</sup>.
3. Emsal û hukem kirdî, nûsirawî Qadir Fetahî Qazî dû berg<sup>8</sup>.
4. destebuxçe zarawey jinanî Mukirîyan, kokirawey Hêdî (Ce'fer Husênûr)<sup>9</sup>.

Dîyare em ferhengane le çeşinî henbaneborîne û qamûs nîn.

Bo cîyawazî danan le nêwan ferhengî le çeşinî henbaneborîne û le çeşinî ferhengî zarekîy mukirîyan, hewell bîrokeyek ke mêşikman xtûke deda le waneye em bîrokeye bê ke billêyîn henbaneborîne ferhengêkî tewtoye, em wuşaney le xo girtûwe ke le nûsînî Kurdîda be kar dehêndirên, bellam ferhengî zarekîy mukirîyan hellgirî ew peyvaneye ke be ser zarî xellkewen û le şêwe axaftinekanî xomanetirda kelkîyan lê werdegîrê. Em bîroke seretayîe çend giriftêkî heye. Yek lewane eweye ferhenge be zarekî nawdêrkirawekan detwanin le xogirî zarawe û rêkewendî ewto bin ke bo bekarhênanîyan le nêw zimanî nivîsarîda lemperêk le gorrêda nebê, bigre be karîş hatibin, kê dellê nakirê zarawey aw le awerro derkirdin le zimanî nûsînda kelkî lê werbigîrê? Bepêçewane ferhenge be nivîsarî nawdêr kirawekan wa heye wuşey ewtoyan girtibê ke taybet be axaftinî xellkî remekîn û le zimanî nûsînda layan lê nakirête. Bo nimûne henbaneborîne wuşey «cuhme»î ke şêwey be helle gorrdirawî wuşey «cum'e»îye, girtûwe. Tenanet mamosta Hejar le beranberîda nûsîwîetî «cu'eme»<sup>10</sup>.

Giriftî dûhem le rastîda giriftî zimanî nûsînî Kurdîye ke hêsta le rewî standard bûnda neytwanîwe zor qonaxan berew pêş bibirrê. Êstaş le nûsînî Kurdîda ke qerare standard bê hiç sillemîneweyek le ast be kar hênanî tenanet be lêşawî peyvî sûkellekiraw û seruguwê perrîw û le rêsaladaw ke taybete be zimanî remekî û rojane le gorrêda nîye. Lewaneye xuwêner çeşinêk be sûkdananî zimanî axaftin û berztir nirxandinî zimanî nûsîn lem gutey serewe bixuwênêtewe. Bo ewey pêş bem xirap têgeyştine bigrîn bo labasêkî dîke ke pêwendîyekî qaym û qûllîşî legell basî ferhengî zarekî heye qellembazêk dedeyn, hêndêk le xawenrrayan Leser em birrwayen ke zimanî zarekî xoy dû leqî serekî lê debêtewe. Yekîyan «zimanî rojane» û yekîşîyan «zimanî remekî»<sup>11</sup>. Zimanî remekî le farsîda (zeban 'amîyane)î pê dellên û le înglîsîda (slang)î pê dellên. Zimanî remekî zimanî ew xellkeye ke bebê sillemînewe û azadanetir û dûr le hendêk sinûrdananî resmî be yekewe deduwên û le qise kirdinîyanda peyvî ewto bekar dehênin ke lewaneye le bone resmîyekanda tewaw xoyanî lê biparêzin, kabiray fars dellê: «biru gum şu be weqtiş hisabit ru mîrisem». Wergêdirawî Kurdîy em ristane her lem aste remekîyeda debête şitêkî nizîk leme: «birro de xot hellde, wextî xoy mişûrt dexom». Em derbirrînaney le astî zimanî remekî (zeban 'amîyane . slang) dan. Bellam zimanî rojane yan zimanî qise kirdinî rojane zor le zimanî nûsîn dûr nakewêtewe. Legell zimanî nûsîn cîyawazîyekey lewe daye nextêk narresmîtir û herweha sûkellekirawe. Bo nimûne fars dellê: «kitabiş ru xundem» eger her em risteye le zimanî standardî nûsînda be kar bihênê denûsê: «kitabiş ra xandem».

Hemû ew derbirrînaney xwarewe ke le ferhengî zarekîy mukirîyan hellbijêrdirawin nimûney derbirrînî remekîn: emin dellêm nêre ew dellê bîdoşe, espê de gîrifanîda sewzelley dellê, esp be kurtanî kerê razî nabê, Kirmanc wek kermîz waye rû le her kuwê ka awedanî deka, ew babet mird. Em derbirrînaney xwareweş nimûney derbirrînî rojanen. Le mukirîyan dellên: hatoyan hatotewe. Le erdellan bo nimûne dellên eyhênêto. Bekarhênanî em wuşane her bem şêweye le zimanî standardî nûsînda helleye û zebir le standardibûnî ziman deweşênê. Le zimanî standardida denûsîn «hatûwe»: (hato şêwey sûkellekirawî «hatûwe»îye), «hatûwetewe» (hatotewe şêwey sûkellekirawî «hatûwetewe»îye), «deyhênêtewe» (eyhênêto, şêwey sûkellekirawî «deyhênêtewe»îye).

Êsta ke zanîman çî sinûr û serawirdêk le nêwan zimanî zarekî û zimanî standardida heye. Ewcar norey eweye awirr le bayex û girîngîy zimanî zarekî bo zimanî nûsîn bideynewe. Gutiman zimanî zarekî be birruway hendêk zimannas dû beşî heye, yekîyan zimanî qisekirdinî rojane û yekîşîyan zimanî remekî: (duwatir nîşan dedeyn ke zimanî zarekî beşêkî zor benirxî tirîşî heye). Êsta dellêyîn zarawey

zimanî nûsînîş her barteqay zimanî standard bertesk nabêtewe. Zimanî nûsîn le bekarhênanî resmîda debê standard bê. Wek ew zimaney le kitêbe dersîyekanda kelkî lê werdegîrê. Bellam zimanî nûsîn bo nimûne le biwarî edebî dastanîda pêwîstîyekî yekcar zorî be zimanî zarekî . be hemû beşekanîyewe . heye. Le xorra nîye hem le «ferhengî zarekî mukirîyan»da û hem le «destebuxçe»da ke qerare peyve kokirawekanîyan le zimanî xellk xwastirabêtewe, be lêşaw kelk lew zarawe û pend û meselane wergîrawe ke le romanekanî kak fetah emîrî (hawarebere û mîrza)hell.êncrawin. (her lêrewe lewaneye ew sûkerrexine meylew pêşînîyare berew rûy kak Selah bibêtewe ke madam ew dû romaney kak Fetah serçawey hênde be kelk bûn bo ferhenge zarekîyekey, edî boçî kelkî le romanî zîndexew werinegirtûwe? yan wekû nimûneyekî tir eger kelkî le berhemêkî kembarrstayî wergêrrêk wergirtûwe (romanî gêlêlîyaw) boçî kelkî le berheme pirrbarrstayî û qebetirekanî her ew wergêrre, wek «hemedok û dan çermû» werinegirtûwe? Êstaş neçûwe biçê, ba bo amade kirdinî bergekaniî dîke ew berhemanêş bixrêne rîzî serçawekan).

Wate dellêyîn beşêk le zimanî zarekî (ew beşey pêyî dellêyîn zimanî remekî) kelkî yekcar zorî bo beşêk le zimanî nûsîn (ew beşey pêyî dellêyîn zimanî nûsînî xeyre standard ke bo nimûne le edebîda kelkî lê werdegîrê) heye. Bellam deretane lebinnehatûwekanî zimanî zarekî bo zimanî nûsîn barteqay hêndey basman kird bertesk nabêtewe. Zimanî zarekî bêcge le dû beşî zimanî qise kirdinî rojane û zimanî remekî beşêkî zor heraw û girîngî dîkeşî heye. Ew beşey wek çon le zimanî zarekîda kelkî lê werdegîrê, her awa dekirê le zimanî standarişda be şeweyekî berifrawan kelkî lê werbigîrê: êstaş basî çend nimûneyek dekeyn. Le Kurdîda zorcar bebê girift «yay nîsbet» be duway nawewe denûsêndirê, bo nimûne Mehabad debête Mehabadî. Bellam hendêk wuşe hen xoyan duwayîn tîpîyan «î»îye, wek «Silêmanî» û «celî». Încâ çon detwanîn yay nîsbet bem uşanewe zîyad bikeyn? çunke dû «î» be duway yekda bêj nakirên. Hestêkî un xtûkeman deda billêyîn le nêw sûçêkî piştguwêxirawî zimanî zarekîy xellkda 'îlacêkî ew girifte kirawe. Her awaşê mamosta Mes'ûd Mihemmed bo çareserî em girifte pena debate ber zimanî zarekî û dellê: «le gutarêkêmda nûsîbûm «î»î nîsbet lew wuşaneda ke kotayîan be «î» dêt, le dewruberî Soran be hênanî «t» bo nêwan «î»î kotayî wuşe û «î»î nîsbet, em deqe nîsbete deparrêzin û dellên kabiray celîyetî, smaquîlyetî ke nîsbete bo celî û smaquîlî. Duway nûsînî gutareke û billaw bûnewey le govarî korri zanîyarî Kurdida be mawey sallêk yan ptir kaxezim le xuwêndikarêkî xellkî Silêmanî ke le Mosko deyxuwênd wergirt. Têyîda nûsîbûy ke xoy le çend gencêkî xuwêndikarî koyî pirsîbûy aya «celîyetî, Silêmanîyetî . . .»

bekar dê le koyê? gutibûyan hergîz şitî wehaman nebîstûwe. Bêguman ewan rastîyan kirdûwe, çunke be zehmet degene ladêyîyek ke carê deqî Kurdî resenî lebîr mawe heta lêyî bibîyen. Silêmanetî . . .»<sup>12</sup>

Ke wate beşêk lew rêsa zimanîyane ke le nêw zimanî zarekîda hen, bellam hêşta nedozrawinetewe û be şêwey zanstî şîtell nekirawin, girîngayetîyekî zorîyan bo zimanî standard heye. Bo zimanêk wekû zimanî Kurdî ke nûsînî rêziman be şêweyekî hemelayene û zanstî û têrutesel nekirawe. Ew girîngîye hêndey dîkeş tox debêtewe. Cige lem rêsa keşfnekirawane, zorbey ew zarawe û derbirrîne zaraweyîyaney (idioms and idiomatic expressions) le zimanî zarekîda hen. Her bem şêweyêş dekirê le nêw zimanî standardida kelkîyan lê werbigîrê. Ke wate êsta dellêyîn zimanî zarekî lexogirî sê jêkomaye: 1. zimanî rojane 2. zimanî remekî 3. beşêkî hawbeş legell zimanî standard ke yan ta êsta le zimanî standardida dekar kirawe yan egerîş dekar nekirawe boy heye be şêweyekî sîstimatêk dekar bikrê. Dîsan wekû nimûne dellêm way dabinêyîn xerîkîn deqêk le zimanî Farsîrra werdegêrrînewe ser zimanî Kurdî, tûşî ew çend risteyey xuwarewe hatûyn:

- Badincan bem/ bed afet nedared.
- Filanî xurde şîşe dard.
- Der heft asiman yik stare nedarem.
- Buruw ser û guşî ab bidih û zûd bergerd.

Em ristanê çon wergêrrîne ser zimanî Kurdî? Beşî sêhemî zimanî zarekî lêreda zor be hasanî defiryaman dê. Wergêrrdirawî hemû ew ristaneman le ferhenge zarekîyekey kak Selah payanîyanîda dozîwetewe:

- Badincan bem/bed afet nedard: espêyî genimî weber naye.
- Flanî xurde şîşe dard: flan kes esponekey wurde. (lêkdanewey kak Selah bo em derbirrîne awaye: wate «'eybî dekarîda heye. espon eger wurd bû, le tirsî ewey geplley degell lêk dirabê, be napesendî dezanin».)
- Der heft asman yik sitare nedarem: le hewt aşan denke coyek şik nabem.
- Buruw ser û guşî ab bideh û zûd birgird: biçû derawan be taqî kewe û xêra bigerrêwe.

Eger le bîrtan bê le beşêkî em witareda gutiman giriftêk bo ewey ferhengêkî le çêşinî em ferhengey kak Selah be «ferhengî zarekî» nawdêr bikeyn emeye ke le nêw em core ferhenganeda zarawe û rêkewendî ewto hen ke bo bekar hênaniyan le nêw zimanî nivîsarîşda hîç lemperêk nîye. Êsta dezanîn her ew beşey sêhemî zimanî zarekîye ke dekirê le zimanî nûsînîşda kelkî lê werbigîrê. Bellam le binerretda zimanî nûsîn ya zimanî standard em beşey le zimanî zarekî xuwastotewe. Ke wate êsta detwanîn be xatircemîyewe billêyîn em ferhengey kak Selah ser be suninetêkî ferhengnûsîy Kurdî ye ke dekirê be nerîtî ferhengnûsîy zarekî nawdêrî bikeyn û eger le heqîş lanedeyn le nêw em ferhenganey lem sunineta nûsirawin ferhengî zarekîy Mukirîyan şan û qellafetekey hênd berze ke ferhengekanî dîke deşarêtewe.

Demanewê be guwêrey ew sê taybetimendîyaney le seretay em witareda basman kirdin (gîştgir bûn, cêgay mtimane bûnî lêkdanewekan û zanstîy bûnî mêtodî nûsînî ferheng), hellsengandinêkman le ser ferhengî zarekî mukirîyan hebê.

Bo selmandinî gîştgir bûnî em ferhenge tegereyekî ewtoman nayête ser rê. Ew bergey bo herfî «.» terxan kirawe be tenîya 550 laperre ye û bergî duwayêş ke her be tenîya bo herfî «b» terxan kirawe 590 laperre ye. Dekirê pena bibeyn bo nimûneyekî berhesttirî dîke.

Medxelî aw, medxelî jimare 764e. Hetakû jimarey 1424 wate rêk 660 medxelî pêwendîdar be wuşey aw lem ferhengeda hatûn. Îtir le naw û awellnaw û çawgewe bigre heta dabunerît û da û derman û pend û mesell û metell û kaye û Goranî û firr û cinêw û suwênd û du'a. Ewey pêwendî be wuşey awewe hebê, em ferhenge girtû ye. Em taybetimendîye sêkewellwêsteyekiman pê deka heta be têrrwanînêkî tir bo ferhengî zarekîy Mukirîyan birrwanîn. Katêk debînîn kem babet heyê ke bo nimûne pêwendî be dîyardey aw le komellgay nerîtîy Kurdewarîyewe hebûbê û em ferhenge neygirtibê, bem encame degeyn em ferhenge her be tenîya be karî lêkollînewey zimanî naye. Bo nimûne xuwêndikarêkî komellnasîş ke dexuwazê leser komellgay Kurdî û ferhengî nerîtîy Kurdî lêkollînewe bika zehmete bitwanê serçaweyekî girdukotir û rêkupêkitr lem ferhenge bidozêtewe. «ferhengî zarekî Mukirîyan» le rastîda dayretulme'arîfêkî ferhengî nerîtîy Kurdî ye. Eger lew cîyawazîyey duktur Ewrrehmanî Hacî Marif basî deka wurd bînewe em mebesteman zor çakitr bo rûn debêtewe. Duktur dellê: «her çend ferheng corî zore, bellam legell eweşda detwanrê dû corî serekî cîya bikrêtewe: 1. ferhengî înskilopêdî [ewey le êran pêyî dellêyîn dayretulme'arîf], 2. ferhengî

fîlolojî. Ferhengî înskilopêdî sebarete be rûdaw û dîyarde û xellk . . . Htd deduwê. Herçî ferhengî fîlolojîye le wuşe dekolletewe. Wate wuşe ke daney zimane kerese serekîy ferhengî fîlolojîye».13

Ke wate ferhengekey kak Selah le rastîda ferhengî înskilopêdîye û ferhengî fîlolojî nîye. Înce dêyîne ser basî cêgay mtimane bûnî lêkdanewekan. Seruber kirdinî karêkî lem çêşine wate nûsînî ferhengêkî zarekîy bawerrpêkiraw, her be tenîya be gerranewe bo serçawe resen û destlênedirawekanî zimanî axaftinî xellkî Kurd meyser debê. Serleberî em ferhenge lîlpawlîp le nîşaney ewton ke pêman deselmênin kak Selah lem gerranewe bo serçaweye çakî bo de binawan kirawetewe. Dîyare nûser ber lem pirroje gewreyeş ezimûnêkî le çêşinî «kanî miradan» hebûwe. Bo nîşandanî rijd bûnî ew hewraze û pişûbirr bûnî zebirî awzengî ke swar bo serkewtin lem hellemûte hezar be hezare debê dekarî bika lewaneye her hênde bes bê ke billêyîn lem meydaneda Kurdîzanî le zebirî wek mamosta Hêminîş wa hebûwe biglê. Kak Selah xoy lew pêşekîyey bo bergî yekemî kitêbekey nûsîwe amaje bem şê'rey mamosta deka:

### **Hêştâ dûr nebûm le hellgurd kîjim dehatin le şe û gurd**

Lew ferhengokey duktur Ewrrehmanî Hacî Marif bo «tarîk û rûn»î kirdûwe, le beranber wuşey «şe û gurd»da nûsirawe «juwanî şewane» le medxelfî jimare 1983î bergî yekem le lêkdanewey zarawey «dellêy benî estûrî, qet de şe û gurdî kes nayey» awa hatûwe:

«şe: şê, şane, dane daney tan û rayellî benî cacm ya popeşmîn ya berrmall ya bûzû, be kelên denkekanî ew şeyeda rayell dekirên. Gurd: dû cût çuwarçêwey darînin ke le panayîyewe rîze benêk wekî denke şane be yek mewda qaym kirawe û dekewête piştî şê. [manay em zaraweye debête ewe:] be karî kes nayyey, de xem û xoşîy kesda nî. [şayed le beytî ehmedî şeng:] bîst û pênc kes hemû serdar'êl, hemû pîyawî wêçû, îdî her zemaney kesêk de şe û gurdî dinîyaye dekişê...»14.

Raste ferhengokî tarîk û rûn mamosta Hêmin neynûsîwe, bellam be serênî xoy nûsirawe û agay lê hebûwe. Le zor lêkdanewey ferhengî zarekîy Mukirîyan da, nûser helley ferhengekanî pêş xoy rast

kirdotewe; bo nimûne kak Ce'fer hosînpûr (hêdî) le kitêbî destebuxçe le beranber zarawey «dellêyî awî danûant be xoda kirdûwe»<sup>15</sup>da nûsîwîe: [wate] zor bêtamî; awî danûan bêtam û bê xiwêye; boye wa dellên. Kak Selah le beranber medxelî awî danûn be xoda kirdin, em helleyey destebuxçey awa rast kirdotewe: [wate] tembellî û kar nekirdin. [nimûne] «dest le reş û spî nada û be carêkî awî danûanî be xoda kirdûwe»<sup>16</sup>. Ber lem zaraweyêş nûser zor bewurdî le ser rêkewendî awî danû û dabî pêwendîdar bem dîyardewe le mukirîyan, duwawe. Le barey layenî zanistîy ferhengî ber bas pêwîste amaje bem xallaney xuwarewe bikeyn:

Yekem. Nûserî ferhengî zarekîy Mukirîyan le bergî yekemda bêcge le medxele serekîyekan medxele ferîyekanî le şazde beşda lêk cuda kirdûnewe; em beşane birîtîn le: bawerr, pend, cinêw, dab, da û derman, du'a, rêkewendekan, rêkewendekanî risteyî û amall risteyî, zarawe, ziman xelletêne, suwênd, firr, kaye û Goranî, lêkdanewey xewin, metell û mesel. Le bergî dûwem, dû beşî dîke wate nêw û nirtke û heqayetîş bem beşanewe zîyad kirawin. Em lêk cuda kirdineweye sîmayekî zor rêk û pêk û tekûz û zanistî dawe be ferhengî zarekîy Mukirîyan.

Yekem car nûserî destebuxçe, hem le pêşekîy kitêbekey û hem le witarêkda be nawî «snûrêk le nêwan pend û zarawe»da le govarî sirwe le ser pêwîstîy lêk cuda kirdinewey corekanî derbirrîn le zimanî axaftinda babetî nûsî. Kak Ce'fer husênpûr (hêdî) le barey cîyawazîy nêwan pendî pêşînîyan û zarawe û mesel denûsê: «pendî pêşînîyan şêweyek qîsey be (idiom) wek le nêwekeyirra dîyare pendêkî têdaye, bellam zarawe (Proverb) tuwêkille û manayekî têda şardirawetewe nek pendêk. Bo nimûne «bazarî kesade», «ba ew suwêndem lê bikewê», «ba noş bête ser dey» [...] hemûyan zarawen, keçî [le sirweda] le jîr nawî pendî pêşînîyanda billaw kirawinewe; bellam «destit be kewgîr bê, çawt le feqîr bê», «pîyawî destewestan, çi le germên, çi le kuwêstan» pendin nek zarawe. Meselîş qîseyekî nesteqe ke be dastanêk yan rûdawêkewe debestirêtewe, wek: dimdimî bo billêyî kullî girîyanî helldestê»<sup>17</sup>. Egerçî lêk cuda kirdinewey em şêwe derbirrînanê hendêk car berrastî dijware û tenanet kak Ce'fer boxoşî wa hebûwe bo nimûne Goranî daykan bo korre sawakanîyanî be nawî zarawe billaw kirdotewe (hey kurre nan û hey kurre do, berxel berbû bere co. Destebuxçe, lap. 228), bellam begîştî em şêwe lêk cuda kirdineweye bû be rênuwênêkî baş bo towêjeranî duwatir. Pêştir basî eweman kird ke hênanî hejde cor derbirrîn ya dabunerîtî pêwendîdar be babetêkewe, ferhengî zarekîy mukirîyanî kirdûwe be dayretulme'arîfêkî kem wêne. Lem rûwewe ferhengî zarekîy Mukirîyan ta êsta taqaneye.



Dûhem. Nûserî ferhengî zarekîy Mukirîyan, bo rîzbandîy medxel û jêrmedxelekan le niwêtirîn mêtodî zanistî ke be «rîzbandîy hêşûyî» denasirê, kellkî wergirtûwe. Lem mêtededa medxele serekîyekan le rûy elfubêwewe be duway yekda rêz kirawin, bellam medxele fer'îyekanî pêwendîdar be medxele serekîyeye be şêwe hêşûyî û wekû endamanî xêzanêk le jêr çetirî medxele serekîyekeda ko bûnetewe. Seretî û qanî berçawî reçaw kirdinî em mêtode eweye ke wa deka derbirrîne pêwendîdarekan, hemû be yekewe le jêr çetirî medxelêkî serekîda kobibnewe. Eger wa nebuwaye, derbirrîne be yekewe xizmekan wekû towî herzin le hemû kitêbekeda billaw debûnewe û pêwendîy organîkîyan lêk depîçrra. Le ferheng nûsîy Farsîda, bo nimûne le berhemî benirxî «ferheng Farsî 'amîyane»î nûsirawî mamosta Ebulhesenî Necefî, kellkî lem mêtode wergîrawe. Dîyare kak Selah sererray kellkî wergirtin lem mêtode zanistîye le paşkooy ferhengekeyda le beşî çawsaxî elfubêyîda bo rênuwênîy xiwêner kelkî le şêwey elfubêyîş wergirtûwe ke zor çak bo dozînewey medxelekan destî xiwêner degirrê.

Sêyîem. Nûserî ferhengî zarekîy Mukirîyan be pêçewaney ferhengekanî pêşû, derbirrînekanî be şêwey mesderî nûsîwin. Le zanistî ferhengnûsîy modêrinda zarawekan be şêwey gerdankiraw û bo biker yan cênawêkî taybet nanûsirên û em kare be karêkî nazanistî hîsab dekirrê. Bellam bo nimûne mesel nabê be şêwey mesderî binûsirê. Kak Selah bo nûsînî derbirrînekan be şêwey dirustî xoyan, amancekey be çakî engawtûwe û bebê zêderroyî debê billêyîn ke çak be ser karekeyda zall bûwe û be taqî tenê karêkî kirdûwe ke le willatanî dîke rêkxirawêk deyka. Hîwadarim çawiman be dîtinî berge yek le duway yekekanî ferhengî zarekîy Mukirîyan rûn bêtewe.

#### **Serçawe û perawêzekan:**

1. Hejar, henbane borêne, bergî yekem, çapî yekem, Sirûş, 1368, lap 7
2. serçawey pêşû, lap 6
3. Ebidurrehmanî zebîhî, qamûsî zibanî Kurdî, întşaratî Selahedîn Eyûbî, 1367, lap 26
4. serçawey pêşû, lap 27
5. Dr. Ewrrehmanî Hacî Marif, ferhengnûsî, le pêşekî serçawey jimare 3
6. Taha Feyzîzade, ferhengî wuşe dûanekanî zimanî Kurdî, întşaratî Selahedîn Eyûbî, 1367
7. Sîd 'Bidalhmîd Hîrt Scadî, pind pîşînîyan, cild ewel, Intişarat Selahaldînay Eubî, 1369

8. Qadir Fetahî Qazî, Emsal û Hukem Kurdî
9. Ce'fer Husên-pûr (Hêdî), destebuxçe, zarawey jnanî Mukirîyan, Swêd, kitêbî Herzan, 1999
10. serçawey jimare 1, li 186
11. em polên kirdine. Hî mamosta Ebulhesenî Necefî ye, birrwane: beha Eldîn Xuremşahî, noqte 'etf û tehewul jerf der ferhengi nigarî Farsî
12. Mes'ûd Mihemmed, kurteyekî bîrurra le ser pêşgirekanî lê, tê, pê, sirwe, jimare 73, li 18
13. serçawey jimare 5, li 72
14. Selah Payanîyanî, ferhengî zarekî Mukirîyan, bergî yekem, dezigay çap û billaw kirdinewey rehrrew , 1385, 3865
15. serçawey jimare 9, li 121
16. serçawey jimare 14, li 265
17. serçawey jimare 9, li 11

## Gulbijêrek ji zargotina kurdên Xorasanê (1)

*Ebdullah Hacıyan û Umîd Demirhan*

Pêşgotin û Diyarî Ez vê xebatê diyariyî dayika xwe dikim ku ne tenê bi şîrê xwe her wiha bi zimanê kurdî jî ez mêjandim û firê xistim.

Li aliyekî ez vê berhema xwe pêşkêşî pejirandina mamosteyê hêja Kelîmullah Tewehudî (Kanîmal) dikim. Ji ber ku wî bi xebatên xwe yên li ser ziman, çand û dîroka kurdên Xorasanê nasnameya min ji bin xweliyê derxist. Ne tenê ku wî dîrokek ji nû ve nivîsand, bi rastî wî qehremanên neteweya kurdên mînanî Cecoxan, Serdar Êwez, Tofegul û Gulmuhemmed cardin vegerandine jiyana kurdên Xorasanê.

Serê pêşîn divê bê zanîn ku ev berhem ne ji afirandina min e; lêbelê afirandina gelê kurd ê Xorasanê ye ku bi sedsalan ev çand û edebiyat jidil parastine û min jî tenê ew ragihandiye we. Armanca min a ji vê berhevkirinê ew e ku bikaribim rûbarê zimanê kurdî bi çendek nimûneyên çanda kurdên Xorasanê ve xurt bikim. Rûbarê zimanan bi berhemên devokan tê herikandin û hêvîdar im ku ev xebata min a li ser kurmanciya Xorasanê bibe sedemê nasandina devokek ji devokên zindî yên kurdî. Ji helbestvanê gewre yê kurdên Xorasanê Cehferquliyê Zengelî bigire hetanî Ismayîlê Husênûr kurmanciyê helbestkî û bi dehan stranên gelêrî her tim jiyana kurdên herêmê bi zimanê kurdî ve girêdane. Kurdên ku di getoya Xorasanê de hatine dorpêçkirin zimanê xwe ji xwe re kirine welat û ev welatê resen û kurdeker gihandina nifşa îroyîn. Wek kurdekî ez qîma xwe bi sînoren heyî yên di navbera kurdan de nayînim. Ji ber ku bawerîya min ew e ku zimanê min welatê min e û ez dikarim bi riya edebiyatê xwe bigihînim birayên xwe yên li makewelat û biyanistanan. Lewre ez bi vê xebata xwe ya biçûk hem çanda beşeke gelê xwe derbasî ser kaxezê dikim hem jî pîreyekê di navbera kurdên cîhanê de ava dikim.

Serpêhatiya vê berhemê gelekî dûr û dirêj e; lê ez dikarim bibêjim ku bi riya ger û geşta li Xorasanê hatiye hûnandin. Min di vê berhevkeriya xwe de sêxiştî, gotinên pêşiyar, çîrok, nifir û mijarên din ji devê gel tomar kirin. Paşê ez bi rojan li ser xebitîm ku van axaftinan derbasî ser kaxezê bikim. Her

wiha di vê berhevkerinê de gelek kesan alîkariya min kir û ez nikarim navên giştan li vê derê bi lêv bikim. Bi taybetî ez sipasiyên xwe pêşkêşî xanimên mînanî Mahbanûya Şehriyanî, Fatimeya Şehriyanî, Lalezara Şehriyanî, Mesûmeya Şehriyanî, Zehraya Ilahiyan, Gulxanima Ilahiyan, Medîneya Dîwanî, Ekrema Ibrahîmiyan, Zehraya Rûhî, Gula Rûhîzade û camêrên mînanî Emîrquliyê Şehriyanî, Ibrahîmê Ruhî, Mêhdiyê Hacıyan, Muslimê Hacıyan, Muhsinê Dîwanî, Hesenê Ezîmî, Qulamrizayê Nîkdil, Beratê Muhemmedî, Ebulhesenê Delêriyan, Ebasê Dildade, Muhemmedê Ezîmî, Şîreliyê Şehriyarî, Bêhnamê Sultanî, Samanê Esedî, Hesenê Rûhîzade, Axayê Cehferzade dikim.

### **Kurdên Xorasanê**

Kurdên Xorasanê li bakûrê rojhilatê Îranê, nêzî sînore Turkmenistanê dijîn. Ew bi zaravayê kurmançî diaxivin û misilmanên şîî ne. (Tewehhudî, c. 1, 28, Madih, 2007, 11-31)

### **Erdnîgarî**

Mezinahiya erdnigariya Xorasanê digihêje 64.144 kîlomêtro çarçikî. Çemê herî mezin ê herêmê Çemê Etrakê ye, ji berfa heliyayî ya çiyayên Hezar Mescîdê pêk tê û diherike behra Xezerê.

Çiyayên sereke yê herêma Xorasanê ev in: Çiyayên Hezar Mescîdê (rojhilat), Çiyayê Şahcîhanê (başûr), Çiyayê Aladaxê (rojawa) û Çiyayê Gulîlê (bakur).

Bajarên sereke yê herêma ev in: Aşxanê, Bajgiran, Bojnûrd, Çinaran, Deregez, Isferayên, Faric, Kelat, Layîn, Mane û Similqan, Qûçan, Şîrvan. (Reşî, 2014, Shekufte, 2013)

### **Dîroka bicihbûnê**

Tê zanîn ku di navbera sedsalên 13 û 14an de li Heratê serdestiyeke kurdan hebûye û li vê derê xanedaniyek damezrandine (Oberling, 2008). Lêbelê hemû binemayên êlên kurdan dîroka hatina xwe dispêrin heyama Xanedana Sefewî. Li gorî hinek çavkaniyên berdest jî kurd di nava salên 1598 û 1602an de li Xorasanê hatine bicihkirin. Di sedsala 16an de Xanedaniya Sefewî (Îranî) û Osmanî reqîbên hev bûn. Ji ber ku ev du împêratoriyan mezin bi hev re şerên dijwar dikirin, kurd di nava

osmaniyên sunnî û sefewiyên şîî de mabûn. Di şerê Çaldiranê yê sala 1514an de, şahê sefewî û siltanê osmanî hatin hemberî hev û şerekî gelek dijwar li ser erdnîgariya kurdan rûda. Di encama vî şerî de sînorekî tampon di navbera her du împatoriyan de hate kişandin û bi vî rengî erdnîgariya kurdan di nava wan de hate parçekirin. Bi vî awayî zêdetirî 45.000 malbatên kurd ên şîî koçî împatoriya sefewî dikin. Diyar e ku sedema koçkirinê ya sereke mezhebî û siyasî bû. Ji aliyê împatoriya sefewî ve jî sedema koçberkirinê bêguman qelskirina hêza kurdan a li rojhilata navîn bû. Her wiha sefewiyan dixwestin ku sînore împatoriya farsan ji êrîşên eşîrên ûzbekî û tirk ên din biparêzin. Kurd di wan sedsalan de bi şervaniyê navdar bûn û dema li herêma Xoresanê bi cih dibin jî şerên dijwar di navbera wan û gelên din de (tirkmen, ûzbek, tatar ...) diqewimin. Her çiqas ew 1500 – 2000 kîlomêtroyî ji welatê xwe dûr bûn jî, axa biyanî bi ked û xebatê ji xwe re kirin welat. Di dema Xanedaniya Qacarî de ji bakurê Xorasanê re digotin Kurdistana Xoresanê.

Eşîrên sereke yê Xoresanê: Zaferanî, Şadî, Keywanî û Emarî ne. (Shekufte, 2013)

Zaferanî derdora salên 1600î de li Xoresanê hatine bicihkirin. Pêşiyê li bakurê çemê Etrakê rawestiyane û di heyama Şah Husênê Yekem de (1694 – 1722) koçî başûrê vî çemî kirine. Ji ber ku ev herêma çiyayî ewle û dûrî êrîşên derveyî bûye. Niha ji Rizaabadê bigire heta Şîrvan, Çinaran û nêzikî bakurê Meşhedê rûdin. Zaferaniyan eşîra tirk a bi navê Gerayî ji vî herêmê avêtine û ji heyama Şah Ebasê Yekem hetanî heyama Şah Rizayê Pehlewî li bajarê Qoçanê bi awayekî xanedanî rêvebirî kirine. Li gorî hinek çavkaniyên leşkerî 1929an de bi qasî 50 hezar kesên zaferanî li Qoçanê jiyane û li gorî çavkaniyeke brîtanî jî 1945an de 12400 malbatên zaferanî li Qoçan û Şîrvanê binecih bûne. Eşîra Şadiyan jî di heman heyaman de li Xoresanê hatine bicihkirin û li gorî çavkaniyeke leşkerî di sala 1929an de gelheya vî eşîrê 75 hezar bûye û li gorî heman çavkaniya brîtanî di sala 1945an de 15 hezar malbatên şadiyan li herêmê hebûne. (Oberling, 2008)

Eşîrên mezin ên din: Baçevan, Badelan, Bêçare, Pehlewan, Topkan, Celalî, Hemzik, Reşvan, Zeydan, Şêxan, Mîlan, Sofiyan û gelek eşîrên din. (Shekufte, 2013)

Li gorî hinek çavkaniyan îro li Xorasanê nêzî 2 mîlyonan kurd dijîn. Ji wan 60% li gundan, 35% li bajaran dijîn û 5% jî weke rêwend/koçber jiyana xwe derbas dikin.

Kurdên Xorasanê bi zaravayê kurmançî diaxivin (Shekufte, 2013: 7) û wêjeya wan a nivîskî jî gelekî pêşketî ye. Li gorî Mêhrdad Îzadî li Xorasanê gelheyeke lekî jî heye (Izady, 1992, r. 175). Her wiha

qala gelheyeke lorî jî tê kirin ku li Kelatê dijîn. (Reşî, 2014) Lê civaknas û dîrokknasê kurdên xoresanî Kelîmullah Tewehudî derheqa gelheya herêmê de wiha dibêje:

Ji bo ku çiqas kurd li Xorasanê hene heya niha amar û ankêtek çênebûye. Di çaxê Nadir Şah de erknişînên Meşhedê kurd bûne. Li wir hemamên wan hebûne, mizgeftên wan hebûne, lê pişt re hatine hilkirin û bûne fars û tirk. Dema ku Holagûyê moxilî hat û Îran girt, destûr da ku hemû navên kurdî û farsî ji holê bêne rakirin û li şûna wan navên moxilî û tirkî bêne danîn. Vê yekê derbeyek mezin li çanda neteweyên Îranê da. Dema Şah Ismaîlê ku dayika wî ji tirkên Aq Qûyinlo bû bi zimanê kurdî jî diaxivîn, lê zimanê dayikê li ser wan pir bandor dikir û bi tirkî diaxivîn. Zimanê tirkî wî çaxî gelekî bandor li ser zimanê kurdî kiriye. Çaxê Riza Şahê Pehlewî jî perwerdehî bi zimanê farsî bû û kurd di vê navberê de pir hatine bişaftin. Ji bo wê jî niha pir zehmet e ku mirov bibêje çiqas kurd li Xorasanê dijîn. Di çaxê qacarîyan de ji sedî 25ê (25%) gelheya Xorasanê kurd bû. Niha mirov dikare bibêje milyonek û 200 hezar kurd li Xorasanê dijîn. Ciwanên kurd niha pir pêş ketine. Mezintirîn navenda kombûna kurdên Xorasanê Tehran û Meşhed e (Oremar, 2005).

### **Aborî**

Li gorî hinek çavkaniyên kurdan rewşa aborî ya niha di bin rêjeya xizaniyê de ye. Di hevpeyvîneke digel Şoreş Reşî de, camêr van agehiyan dide:

Rewşa aborî gelek xirab e; ji ber ku erd û av kêr e; çandinî jî nîn e. Hinek malbat bi xwedîkirina pez, dewar û darên meyweyan debara xwe dikin. Lê ew jî zikê kesî têr nake. Ji aliyê aborî ve dewletê ew dorpêç kirine, li herêmê tenê mizgeftên nûjen ava kirine... Ne fabrîkeyek ava kiriye ne jî tiştêkî ku xelk pê zikê xwe têr bike. Riya ku ji xelkê re vekirî ye tenê tiryaq e! Ji Afxanistanê gelek tiryaq tê, xelk kom bi kom bûne mibtelayê vê jehrê; zarok jî êdî bi kar tînin û li hinek deveran gund bi temamî bi kar tînin. Êdî wek şermekê jî nayê dîtin, berevajî vê yekê cixarekêşî şerm e! Ew jî polîtîkaya dewletê ya li hemberî însanên me ye û bi vî awayî dixwaze wan ji hêzê bixîne. (2014)

### **Çand û huner**

Kurdên Xorasanê her çiças ji hêla erdnigariyê ve ji Kurdistanê dûr bibin jî bi ziman, çand û hunera xwe pir nêzîkî Kurdistanê ne.

Bêguman, kurdên Xorasanê bi dengbêjên xwe bi nav û deng in. Muzîk û huner ji bo wan gelekî girîng e, ji ber ku ew navnîşana nasnameya wan e. Gelek komên muzîkê yê Xorasanê tevî mihrîcanên cihanî dibin. Her wiha Unescoyê muzîka Xorasanê hildaye bin parastinê. (Shekufte, 2013)

Ji bo ku çand û hunera xwe biparêzin kurdên Xorasanê salê carekê Cejna Çand û Hunera Kurdên Xorasanê pîroz dikin. Di van pîrozbahiyên de bi taybetî muzîk, cil û berg û helbestvanên Xorasanê tî pêşkêşkirin. Li gorî hin kurdnasan, bêrêxistinî û paşvemana çand û hunera kurdên Xorasanê ji rewşa xirab a perwerdehî û aboriya herêmê tê. Heta demekê hinek xwendevanên zanîngihan kovarên bi navê Kurmanj û Dengê Kurmanc diweşandin, û ev yek ji aliyê xoresaniyan ve wekî xizmeteke mezin ji bo pêşxistina çand û hunera herêmê tê binavkirin.

### **Cil û berg**

Jinên kurd ên Xorasanê hûnandin, çirpandin û boyaxkirina cil û bergên xwe bi destan çêdikin. Cil û bergên jinên Xorasanê bi gelemperî ji sê perçeyan pêk tî: Kofî, kiras û şelwarê jinan. Kofî ji qedîfeyî tê çêkirin, bi gelemperî sor û kesk e; ango xerî ye. Her wiha kofiyên jinan bi diravên zîvîn tê xemilandin. Taybetiyê kofiyê ew e ku, bi meş û tevgera jinê ve ew diravên lêkirî dengê rîtmîk derdixînin. Berstukên kirasên fireh in û bi heman rengê kofiyê tî lêkirin.

### **Dawet û lîstik**

Di dawetên kurdên Xorasanê de govend tune, lê bazdanên ku dişibin semaha elewîyan hene. Taybetiyêka din a dawetan ew e ku jin û zilam bi hev re dilîzin. Tê gotin ku ev lîstikên dawetan ên niha lîstikên şerî yê berê bûne. Li gorî vê agehiyê jinên kurd ên Xorasanê mîrên xwe bi van lîstikan şandine şer an jî şervanên xwe bi van lîstikan pêşwazî kirine. Mixabin êdî li bajar û gundan ev kevneşopî, cil û bergên resen tûşî karesata modernîteyê hatine û di vê encamê de cil û bergên gelêrî di jiyana rojane de êdî zêde nayên lixwekirin.

## Kurdên Xorasanê yên navdar

Ceco Xan: Lehengê neteweyî yê kurdên Xorasanê ye û di dîroka kurdan de rola Robin Hoodê inglîzîyan lîstîye.

Serdar Ewez: Li hember zilma qaçariyan û ûrisan, girankirina bacan û firotina keçên kurd têkoşîneke bêhempa dide. (Ferhadî, 2011: 79)

Gul Mihemed: Li hemberî sitemkarên fars ên dema xwe serhildaneke xurt pêk aniye û niha navê wî didine ser gelek zarokên tezebûyî.

Tofegul: Şêrejineke navdar e ku li hember qaçarî û ûrisan têkoşînek nimûneyî daye û navê wê heyecanê dide jinên Xorasanê.

Kanîmal: Ev nav nasnava mamoste Kelîmullah Tewehudî ye. Vî civaknas û dîroknasî berhemeke ji şeş cildan pêkhatî li ser dîroka herêmê nivîsiye û gelek xizmetên din ji bo dîrok, edebiyat û çanda kurdên Xorasanê pêk anîne.

## Helbestvan

Ceferquliyê Zengelî: Dîwaneke wî ya çapkîrî heye û ji aliyê mamoste Kelîmullah Tewehudî ve digel lêkolîneke kûr û wergera wê ya farsî ve hatiye amadekirin.

Ismayîlê Husênûr: Dîwaneke wî ya bi navê Asman bê merz e hatiye çapkîrin.

Hesenê Roşan: Dîwaneke wî ya bi navê Çîksa hatiye çapkîrin.

Elîrizayê Sipahî: Helbestvan û rojnamevan e. Di gelek mihricanan de helbest xwendine û hinek helbestên wî li ser internetê peyda dibin.

Yehya Elewîferd: Dîwaneke wî ya bi navê “Şelpe û sêv” hatiye weşandin. Piranî ji bo zarok û ciwanan helbestan dinivîse û gelek xelatên edebiyata zarokan wergirtine.

## 1. NIMÛNEYÊN KURMANCIYA XORESANÊ

### 1. 1. Gotinên Pişîniyan /Gotinên Pêşîyan



Afatê mêr merar e, rindîyê bêx je nar e. /Karesata marî pezkûvî ye, başiya bêx ji henarî ye./

Ahê bizina kul le ê we-şax namîne. /Aha bizina kol ji bizina biqiloç re namîne./

Ar deşewite şûna xwe reş deke. /Agir dişewite, şûna xwe reş dike./

Arşûjinik je ayemê bêkar rindtir e. /Bendê şûjinê ji mirovê bêkar çêtir e./

Aşê xalo du toze ye. /Aşê (xelkê yekê yê) xalo du kodikan heqê xwe distîne./

Av berve kotel hildan, le Xwedê xweş nê. /Kîşandina avê ber bi jor bi Xwedê xweş nayê./

Avê bin kawê mewe, pe dûlebê mewe. /Nebe ava bin kayê, bi bablîsokê re tevnegere./

Avê nav gurum zelal nawe. /Ava nav peynî zelal nabe./

Ayemê bê şans vî çîya le ser wê çîya de, je berê, xêrê xwe tune. /Mirovê bêşans ji vî çîyayî here wî çîyayî jî, hê di berê de xêrek nedîtiye./

Ayemê zalim, salim. /Mirovê zalim, silamet e./

Bara dizan her çi giran e, velî xanîyê wan xiraw e. /Behra (para) dizan her çiqas giran be jî mala wan xerab e./

Barê xafil ba ye, hewanê wî tiji ka ye. /Barê xafilan ba ye, hewana wan tijî ka ye./

Bariş sa dêmekar e, derewîn ustixar e. /Baran ji bo xwediyê erdê dêm e, derewîn stûxwar e./

Bia ser hewe, kum pir e. /Bila serî hebe, kum pir in./

Bia Xadê xizan bide, gurî we. /Bila Xwedê zarokekî bide, bila gurî bibe./

Bia xalîyê kerîyan, kûr ke çavê xwadîyan. /Bila xweliya kerîyan, kor ke çavên xwedîyan./

Bax bê gul, gul jî bê tîkan, kunê piling bê hesti nawe. /Bax bê gul, gul jî bê strî, lana pilingî bê hestî nabe./

Bia Xwedê yar we, doşmen we sê har we. /Bila Xwedê yar be, dijmin bi segê har be./

Beq we avê çax nawe. /Beq bi avê qelew nabe./

Bertal ke hûşa xwe, rûnî pe hemtûşa xwe. /Betal ke hişê xwe, rûne bi hemtemenê xwe./

Bêgane eger biwi pirê je ser red mewe. /Biyani bibe pire jî bi ser re derbas nebe./

Biraka rind bira ye, dapîr je tirsan pa ye. /Destebirakê baş bira ye, dapîr ji tirsan şiyar e./

Birake mal û minal bayî daye, we dû nîvenîvê ketiye. /Destbirakî zar û zêçên xwe winda kirine, li pey nîvenîvê (karên biçûk) ketiyê /

Birayî derewîn, carek narî deke. /Birayê derewîn, carekê navrojê dixwe./

Biroş degeri derxûna xwe dewîne. /Biroş digere, devikê xwe dibîne./

Biroşê got: "Binê min je zêr e!" Kefgîrê got: "Ez le ku me?" /Biroşê got: Binê min ji zêr e! Kefgîrê got: Ez li ku me?/

Bitirs je ara bê tutûn. /Bitirse ji agirê bê dûman./

Bîçax meger je zêr we, gerê we zika xwe da lêxî? /Kêr ji zêr bibe jî, ma divê tu bi zikê xwe xî?/

Bîçax zêr wû jî nakî zikî xwe. /Kêr zêrîn be jî, li zikê xwe nexê./

Bîvil nêli biçêre! /Bêvil nahêle ku biçêre./

Bûk, weşe nekirîye bilîzi, yegotîye zemîn xwar e. /Bûkê nikaribûye bilîze, gotiye zemîn xwar e./

Bûta hewşanê deşewtê tutûn radewe, velî qelwa adem deşewte kes halî nawe. /

Tûmê hewşanê dişewite dûman radibe, lê qelbê mirovî dişewite kesek fehm nake./

Cewan we qelîştîkî dîffil jî yekene. /Civan bi qelîştêka dîwarî jî dikene./

Cwîtê gan û cwîtê solan tu wexti yêk nawin. /Cotê gan û cotê solan tu wextî nabin yek./

Çavê kwîr kil meke kerê guri cil meke. /Çavê kor kil meke, kerê gurî cil meke./

Çav li deriyan xwellî li seriyan. /Çav li deriyan xwellî li seriyan./

Çere dîk ban kir mirîşkê fam kir. /Çawa ku dîkî bang kir, mirîşkê fehm kir./

Çi dîk le siwê ban ke ya ban neke ro verdekeve. /Dîk berbangê bang bike yan jî neke dîsan jî roj hiltê./

Çiya her çi bilind we axir rê we ser dekewe. /Çiya çiqasî bilind be jî, dawiyê rê bi ser dikeve./

Derdê le hevîl, kuna le dîffil. /Derdê li hevêl, kuna li dîwêr./

Derê kelê meger têye girtin, ku zimanî xelkê bêwi dagirtin? /Ma derê gund tê girtin ku zimanê xelkê bê girtin./

Dêri bigir, se we te negirin. /Dêrî bigire, bila seg te negirin./

Dest destan nas deke, diz jî yêkê xas deke. /Dest destan nas dike, diz jî yekî tazî dike./

Derd çîyan av deke, rev hespan zirav deke. /Derd çîyan av dike, rev hespan zirav dike./

Derza çîyan tê girtin, velî feka jinan nakevi hev. /Derza çîyan tê girtin, lêbelê devê jinan nakeve hev./

Deve eger gir e barê wê jî gir e. /Eger hêştir girs be, barê wê jî girs dibe./

Deve eger şorê bixazi ostiya xwe dirêj deke. /Hêştir gava giyayê şorik bixwaze, stûyê xwe dirêj dikê./

Dilê şivên bixazi je nîrî jî şîr dedoşe. /Dilê şivên bixwaze, ji nêriyî jî şîr didoşe./

Du ber jî we paşilekê da le hev dekevin. /Du ber di paşilekê de li hev dikevin./

Du şûr nawe kalanek, du ker nare bin palanek. /Du şûr naçine kalanekî, du ker naçine bin palanekî./

Dûmano birev, kerê qolo we-zengil hat. /Mijê bireve, kerê qolo yê bizengil hat./

Eger cêwek xwe tiji heq kirî, cêwa dinê tiji zêr ke ta bigînî miracê. /Heke cêbeke te tijî dirav be, cêba xwe ya din jî zêr bike da ku bigihêjî miracê (armancê)./

Eger çavan le hev faîde bida Xweyê bîvil le arê wan daneyewa. /Heke çavan fayde bidana hev, Xwedê bêvil di navbera wan de danetanî./

Eger je asimîn zêr û zîv bibare sewa aşiqan tuşt tunîni. /Heke ji esmên zêr û zîv bibare, ji bo evîndaran tişteke tune ye./

Eger pişik kûr e, dîsa je mişkan des nakşîne. /Heke pisîk kor be jî dest ji mişkan nakşîne./

Eger teşîrêş î, bi kîrî kerê jî yerêşî. /Heke teşîrêş bî, bi kîrê kerê jî dikarî birêşî./

Espan nal dekirin, keran lingê xwe le hewa dagirtin. /Esp nal dikirin, keran lingên xwe bilind dikirin./

Espê pîr je qamçiyê natirsê. /Hespê pîr ji qamçiyî natirse./

Ew kerek wû ki guran xwar. /Ew kerek bû ku guran xwar./

Ez dewêm nêr e, ew dewê bidoş. /Ez dibêjim nêr e, ew dibêje bidoşe./

Ez î je êş têm, ewî dewêji nowê nawê. /Ezî ji êş têm, ewî dibêje dor nagihêje te./

Ez le xizanê xwe lê dixînim, cînarê min je hev verdekevê. /Ez wisan li zarokên xwe didim ku cînarê min ji hev derkeve (diteqe)./

Ez weqe le xizanê xwe lê dixînim ta cînarê min bidire. /Ew ewqasî li zarokên xwe didim heta ku cînarê min bidire./

Êr mekşîne ser komacê xwe. /Agirî neavêje ser nanê xwe yî ku ji dîwarê tendûrê ketî./

Feksistê du jin e, hewan binî kun e. /Kesê devsist bi du jinan e, binê hewana wî jî qul e./

***Dê bidome.***

## ÇEND GOTIN LI SER KURMANCÎ YA MAMEDÎ

*Mehmet İncesu*

Em dikarin zerawa yê kurmancî di bin se baş ên binatî de da başkin. Gelek zimanzan jî usa dibêjin. Botî, Mamedî û Silvî(silwî).

Le li gor min kurmancî ya Şikakî jî başekî teybet e.

Sedam a vê mijare:

1 – Kurmanciya mamedî di nav Kurmanc ên din û zarava yê din de pir nayê naskirin, loma jî li vî devokî xweşik û dewlemend ne heqî yeke mezin dibe.

2 – Dewlemendî ya kurmanciya mamedî; hîç çi(qet tu) zerawe û devokî ên kurdî bi qas kurmanciya mamedî dewlemend nînin. Em dikarin bêjin ku ew dewlementirîn devokî e zimanê Kurdiye.

3- Kurd ên ku bi vî devokî dipeyivin(diaxivin), xwedan çandêke dewlemend in. Bi vî devokî gellek sitran, heykat(hikayet) metalok hene. Le çi mixabin ku Kurdên din vî zaravayî baş nenasin û ji vî dewlemendiye bê xeber in.

4- Xetereke mezin li ser vî devokî heye. Li alîkî ve tesîra asîmlasyona devleta Tirka bendor a herî mezin li vî devokî dike. Li nav wan Kurda de tirk niştecih bîne. Kurdê Mamedî berî Kurd ên din hînî tirkîye bûn. Sal bi sal tesîra asîmlasyone zêdetir dibe. Li aliye din ve jî. Ji ber ferqa devokê xwe; Kurmancen din kurdiya wan wek Kurdî nehesabînin. Ewa jî dibe sedama ku ew bi kurmanc ên din re bi tirkî bipeyîvin hem jî ew Kurda na xemgînî ya ku zimane wan ne kurdî ye dijîn.

Her çi qest navend a Kurmancî ya Mamedî Ferat û Toros bin jî, Ev devoka li Anatolye û li Xorasane ye jî tê axivtin. Bi goteneke din, Kurmanc ên li Sêvas, Erzingan, Dêrsim, Meletî, Semsur, Meraş, Riha, Dîlek(Entab), Heleb, Kobanî, Afrîn, Xetay, Adane, Kurdên Anatolye û Xorasanê bi vî devokî diaxivin. Li Serxete û Azarbeyjan û Kazakistan û Ozbekistane jî Kurdên ku bi vî devokî diaxivin hene.

Ferq a ku di navbera Kurmancî ya mamedî û kurmanciya Botî û Silvî de ya herî mezin; di vî devokîde gellek bêje yê Zarawa yê din e Kurdî hene. Em dikarin bêjin ku ev Kurmanciya li hev qelivîn a Kurmancî, Lorî, Kelhorî, Goranî û Kirmanckî ye çebûye. Bingehiya xwe zarava yê Kurmanciye; lê tê de gellek bêje yê, bi zarawa yê din hene.

Navê MAMEDÎ ji ku tê:

Navê MAMEDÎ li gorî min ji (MAH – MAD – Î) yê tê. Yanî “ji Meda de mah” an jî “Madî - Mah”. Ya duwem jî dibe kû ji nawê eşîrek an jî konfederaliyoneke be. Le bi her awayî bi navê MED a re tekiliyeke xwe heye. Kurdên Mamadî an jî Mah MADÎ.

Navê Mamedî(Mamadiyan) li Îrane bi hinek Kurdên ku di navbera Kermanshan, Areq, Hemedan, Lorîstan, îlam û Qaşan(Kaşan) de dijîn re hatiye gotin. Ew Kurda na di eslên xwe de Kelhûr û Lor û Gor in. Ger zimanê kurmanc ên mamedî, ger devok ên wan ger jî bêjeyên ku di zimanê wan û neawçeya ku me gotî de tekiliyeke mezin heye. Ew herêma nawenda MAD(med)a bû. Piştî ku împaratoriya Mad'a tekçû Kurd ên wê navçe yê ew nava hilgirtin. Kurden ku ji MED a mahî. “MaMadî”.

Ji kurdên ku bi Kurmanciya Mamedî diaxivin hinek aşîr ên mezin wek Atmî(Atmanî-Etmankî), Kurecix, Sînemilî û Kelhor li we navçeyê hatîne. Ew aşîrane û Şêxbiziniya di eslên xwede ne Kurmanc bûn. Ewane hinek goran, hinek lorî hinek jî kelhorî bun. Le hinek soran jî hatî bûn e wê navçeye. Ew li navçe de bi nav ên Mamedî hatine bi nav kirin. Ji ber ku wan Aşîran bi xwe ji bi xwe re digot in em mamedî ne. Hen jî gotinek di nav aşîra Atmî ya de heye ev dibêjin: “Em ji eslê MAMEDÎ ye gulhurî Iraqî ne” . dibê em bizani bin ku ev iraqa ne iraqa îro yî ye. Dibe ku Araq bê jî. Dîsa gulhur jî dibe ku KELHUR be.

Loma jî kurdên din bi zimanê wan re gotin “Mamedî”. Le di nav demê de zimanê wan ji sedan 70 bû yê Kurmancî û le Kurmancan jî ji zimanê wan gellek bêje girtin. Ji aliye din ve jî gellek kurd ên ku bi Kirmançkî(zazak jî) daxivin hadin terev wan bûn. Hem cîranê wan jî Zaza bûn. Bi minakî di nav eşîra Dirêjyana de gellek zaza hene. Qoçgîrî, Canbegî, Balî, Kawî, Îzolî, Reşû, Xaçowe, Birazî û wkd. ewana Kurmanc bûn. Bi tekalaviya Kurmancî, Goranî, Lorî, Kelhorî û Zazakiye devokekî nû. Bi vî awayî Kurmanciya mamedî çê bû.

Kurmancên mamedî dikarin Kurmancên din û zimanê zeraw yê din bi esanî fambikin ji ber ku di zimanê wan de bêje yê her zerawayekî hene. Le kurden din nikarin axavtina wan baş fam bikin, ji

ber ku zimane wan tekelave(tevliheve). Di Kurmanciya mamedî de gellek bêje yên ku weta ya xwe yek hene. Bi mînakî. “şikest”(işkest, işkî), “pişirî” û “xişbû” hemiya wataya xwe yêke le kurmancana van hemiya dizanin. Disa wek: “Tevabû”, “Xwelasbû”, “Qediya” û “Birî” Her yek in. Heger mirov ji van bêjeyan yêke bi kar bîne ev hemî tedikin(tedigeşin - famdikin).

Kurdên navçe ya Ferat û Toorosa ji her dere Kurdistanê hatîne. Hinek ji aliye Loristane, hinek ji aliye Kermanshan, ji aliye Urmiye, ji aliye Kerkukê, ji Şengale, ji Xorasanê(çuyîne û hatîne) û hema ji her aliyên Kurdistanê hatîne ye din jî li serî de liwê bûn. Lomaj jî li gel(li ba, li cem, li rev) dewlemendiya zimane wan. Çanda wan jî gellek dewlemend e.

Kurmancî ya mamedî di nav xwede du baş in. Yêk devokê Feratî, ya din jî devokê Torosî ye.

Ferqa herî mezin e ku di nav devokê Feratî û Torosî ye de, bi kar anîn a deng ya. Devokê Fêratî nêrmik e lê devokê Torosî hişke. Wekî ku Lor û Kelhor bi Kurmancî bipeyivin. Peyvîn a Feratiya her vek Botî î silviya ye. Le peyvîn a Torosiya wek Lorî û Kelhurî ye. Dengên dengdar ên wekî “A”, “E”, “I”, “Ê”, Carcaran bi deng ên “O”, “Â” û “A”, “Î” ye re cîh diguharin. Bi mînakî, “Nan” û “Non”, “Ez” û “Âz”, “Li” û “Lâ”, “Fêmkirin” û “Famkirin”, “ce were” û “ca were”, “Din” û “Dîn” .

Ferqeke dine ku di nav davokê feratî û torosîde jî, “Jî” ye. Yen ku bi davokê Faratî dipeyivin nikarin bê “Jî” biaxivin. Ew “jî” ya ku li paş peyva tê bi karanîn. Bi mînakî; “Ez jî”, “tu jî”, “nebe jî”, “bibe jî”. Yên ku bi devoke torosî qisedikin li şuna “Jî” e, “Ê”, “YÊ” ye bi kartînin. Bi mînakî “Ez ê”, “tu ê”, “ku neb(î) yê”, “ku Bib(î) yê”.

Her çiqes ev gellek peyva zanibin jî, bi kar anîna peyva de jî ferqik heye.

Hemî dizanin ku “tevbû” û “xwelas bû” û “qediya” bi yek watayî ne. Le hin bi piranî dibêjin “Xelasbû”, hin bi piranî “Tevabû” ye bikartînin, hinek jî “Qediya” e.

Yên feratî, dibêjin “mîna”, yên torosî “Weke”, li cem van herdû gotina “Tona”, “Nola”, “Notira” jî tê bi kar anîn. Le ev bêje yên, “Tona”, “Nola”, “Notira” bi piranî di revşên teybet te tên bi kar anîn.

Yên feratî dibêjin “cem min”, yên torosî dibêjin “rev min”. Le herdûk jî “Hinda min ( Henda min)” e jî bi kar tînin.

Bi devokê feratî bi piranî dibêjin “Mezin”, Yên devok ê Torosî deyndikin dibêjin “Gir”  
Bi devokê feratî bi piranî dibêjin “Gî”, Yên devok ê Torosî deyndikin dibêjin “Gişt”  
Bi devokê torosî bi piranî dibêjin “deynkîrin”, Yên devok ê feratî deyndikin dibêjin “qisekîrin”,

“şorkirin“

Bi devokê torosî bi piranî dibêjin “mezeke“, “mezke“ Yên devok ê feratî deyndikin dibêjin “binêre“.

Bi devokê torosî bi piranî dibêjin “hes“ Yên devok ê feratî deyndikin dibêjin “deng“.

Yên ku bi davokê feratî diaxivin ji esle xwede Kurmancên kurmancin, Yên kû bi devok ê torosî dixaviv Mamediyê asil in û ji eslê xwede Kurmancên(Kurd ên) ku Kelhor û Lor û Gor in.

Yên Faratî qise dikin dibêjin: “li“, “ji“, “bi“, “di“ Yên torosî deyndikin; bibêjin “lâ“, “ja“, “dâ“, “bâ“ ev dengên dengdar şûne digahrin.

Lê teybetmendiyeke Kurmanciya Torosî heye ku Pir caran “B“ bi dengê “W“ û “V“ ye re şune diguhre. Eva jî, ji tesîra zeraweyî Kelhuriye tê. Li ciye “bi“, “wâ“, Bi mînaki. “Hun bi çi çûn“, “Hun wâ çi çûn“, “bi ku de“ “We ku dâ“. “ji derdê te“ “Jâ dêrde tâ“ an jî “wâ darde tâ“

Şun guhartin a “B“ ye bi “V“ ye re ; bes bi kar anîna “B + Ê“ re tê mezete. Li şuna “bê“, “ve“ te bi kar anin  $B + Ê = V + E$  . Bi mînakî “Bê kes“ , “Ve kâs“. “Ê“ û “E“ jî pir caran şune diguhrin.

Di kurmanciya mamediyede bêje yê zarawayî kirmançki jî hene. Wekî Mak= Dak, Fek= Dev.

Teybetmendiya van kurmancan. Ew di eslê xwe de hemî ji ayînde ya “REA HEQÎ“ ne. Le niha yê ku li dor hêla ferat û torosa û yê ku li Antoliye, bi zordariya dewlet a Osmanniye hinek bûne Henefî. Dîsa yê ku li Xorasane jî bi zordestiya Dewlet a Safawiya hinek bûne Şîa.

Dibê em vî zarava yî dewlemend binasin û Kurdên herême jî her bi vî zarawayî biniwisin.



## KURDKUJÎ û nîqaşa zarave û alfabeyên kurdî

*Îbrahîm Seydo Aydogan*

Kesên ku van demên dawîn bi nîqaşa li ser zimanê kurdî û zarave û alfabeyên wî ve hisiyane, dê bibêjin qey ev nîqaş bi bandora hêz û rêxistinên siyasî ve tê kirin, loma jî kî çi bibêje, rîska wî h eye ku navekî siyasî lê were kirin. Li welatên rojhilatî, mîna welatê me û welatên din yên ku welatê me di nava wan de hatiye parvekirin, heçî fikra ku têkildarî karên civakî be, bi vî awayî ve dê bibe « siyasî » an jî îdeolojîk. Li welatên Rojavayê, gava ku mirov nîqaşekê li ser zimên bike, mirov illeh naxin nava tevger an jî rêxistinekê, lewre mirov bi « behsa zimên » ve, bi tenê « behsa zimên » dike û tu xema zimannasên ewropî ya weha nemaye ku mirov carinan xweziya xwe bi dilê wan tîne.

Ev çend sal in ku, qey ji ber ku li Başûr êdî hikumeteke kurdî heye û desthilatdariya Herêma Kurdistanê hatiye bidestxistin, em dibînin ku hin hewldanên li ser zimên jî tên kirin. Hêzên ku ji ber peywendiyên tevgerên Kurdan yên berê (birakujî) newêribin dest biavêjin vê mijarê, bi rêya hin kesayetiyên navdar, rewşenbîr, stranbêj, helbestvan û rojnamegeran ve vê nîqaşê gurtir dikin.

Divê were destnîşankirin ku herçend berê di nava tevgeran bi xwe de pirsgirêka her du zaravayên sereke (kurmanciya jorê û ya xwarê) peyda bûbe û di binî re bûbe yek ji sedemên xurt yên cudabendiyê jî, heta piştî avabûyina hikumeta Herêma Kurdistanê jî ev pirsgirêk weha weke şerrê du seriyên cuda ewqasî belloq û aşkere nebûbû. Ji xwe, binavkirina weke kurmancî û soranî jî (ku di sedsala 18 û 19'an de nebû) nîşana vê pirsgirêkê ye. Em ê weke hin « rewşenbîrên kurd » peyva dawîn di serî de nebêjin û bihêlin dawiya vê gotarê

Weke ku tim tê gotin, millet û netewe li ser nixên hevpar tên avakirin ku li hin welatan ziman ne alava hevpar e, lê ji dêleva wê alavine xurttir hene. Hejmara wan nixên hevpar çendî zêde be, jihevqetîn û jihevqetandina wan jî ewqasî dijwar e. Yekzimanî di avakirina neteweyan de ne xala

mecbûrî ye (mîna Swîsre û Kanada), lê belê xaleke gellekî girîng e, bi taybetî jî gava ku cuda hiyên ziman-zarava-devok hebin û welatekî serbixwe ji bo vehewandina van cihêrengiyên nebe. Dijwariya cihêrengiyên zimanî ji devokan dest pê dike, xala wan ya duyem dijwariya zaravayan e û ya herî mezin jî dijwariya zimanan e. Heger cihêrengiya devokan baş neyê îdarekirin û peywendiya devokan çênebe, ew devok dikarin bibin zarave û ji hev gellekî bi dûr ve bikevin. Ev guherîn û jihevdukirina devokan dikare pêvajoyeke bi sedan salan û hezar salan jî bide ber xwe, heta ku bigihîje encama dawîn, yanî zaravebûyinê. Di rewşa zaravebûyinê de xeteriya cudabûnê mezintir dibe, lewre heger baş neyê birêvebirin û peywendî û danûstendinên baş di nava wan de neyê avakirin, zarave dê bi temamî ji hevdu bi dûr bikevin, xalên xwe yê bingehîn yê hevpar dikarin wenda bikin û bibin weke zimanên serbixwe. Vegera ji vê yekê bi awayekî zimannasî û mentiqî ne pêkan e. Di rewşa zimanên serbixwe û cuda de, sedemên bihevrejîyînê divê werin avakirin ku em li Tirkîyeyê li gellek awayên vê siyasetê rast tên, weke yekîtiya olî, yekîtiya axî û yekîtiya alayî ku li dijî daxwazên Kurdan mîna « sembolên pîroz » tên nîşandayin. Îroj di rewşeke guncaw ya hikumeteke temsîlkar ya Kurdistaneke guncaw de, Kurd, weke komên ji hev cuda, nehatine wê astê ku li hebûna neteweyên cuda yê nava Kurdan bifikirin. Lewre, pirsgrêka devokan ji têgihîştinê re nabe asteng û ya zaravayan jî di nava kesên xwende de weke asteng nayê nirxandin, lewre yê ku bi zaravayê kurmanciya jorê baş bizane, ji zaravayê kurmanciya xwarê (sorani) jî fahm dike. Ji bilî mijara zimanî, digel bandora sedsala 20'an ku ew ji hev cuda kirin û xistin bin bandora ziman û çandên (tirkî, erebî, farisî, ermenî, gurcî, rûsî) ji hev gellekî cuda, hişmendiyeke Kurdan ya hevpar hê jî heye ku weke ku hemû birêvebirên kurd jî dibêjin « xewna Kurdan yekîtiya axê û Kurdistana mezin » e. Ev xewn bi êş û xemên hevpar ve jî hatiye xurtkirin ku hin ji wan ev in : Di qirkirina Helebçeyê de li Mêrdîn û Diyarbekirê jî xelkê xwepêşandan li dar xistin ku wê demê mirov karîbû ji bo vê kirinê bihataya kuştin ; Kurdên Sûrî piştî 1980'ê li Kurdên Bakurî bi xwedî derketin û yê Bakurî jî piştî 1988'an li yê Başûrî bi xwedî derketin ; li Başûr jî û li Bakur jî û li Rojavayê Kurdistanê jî, dîroka Komara Kurdistan ya Mehabadê weke parçeyekî dîroka hemû Kurdan tê fahmkirin ; li her çar parçeyan jî *Ey Reqîb* weke sirûda neteweyî tê pejirandin û Ahmedê Xanî û Melayê Cizîrî weke milkên neteweyî tên xwendin. Lê belê, kîjan netewe an jî neteweyeke çawa ?

Neteweyek herçend ji ber dîroka xwe, êşên xwe yên hevpar, qedera hevpar û simbolên hevpar yên “pîrozkirî” (ziman û al û sirûd û ax) dibe komeke mirovan ya mezin jî, ya ku wê neteweyê temendirêj dike û dibe sedema “yekîtiya neteweyî” armancên hevpar û xweziyên hevpar e.

Nîqaşa dawîn ya li ser zarava û alfabeyên kurdî, nîşanî me hemûyan daye ku hin kesayetiyên başûrî « têgeha neteweyê » ji van fikrên jorê cudatir dinirxînin û ji « yekîtiya axê » vegeriyane ser « cudahiya herêmî » û « cudahiya alfabeyî » û hetta bi « yekkirina Başûr û Rojhilatê welêt » ve, axir gihîştine « cudahiya zaravayî » jî, lewre li Başûr û li Rojhilatê welêt (em aşkere ji hevdu re bibêjin) hejmara soranîaxêvan ji ya kurmancîaxêvan zêdetir e an jî weha tê zanîn. Hingê di nîqaşa alfabeyan de pîrsgirêka yekem di “binavkirina pîrsgirêkê” de diyar dibe. Weha diyar e ku “alfabe bahane ye” û peyamîne din di wan beyannameyan de hene. Ji ber ku nîqaşa li ser alfabeya kurdî ji zû ve ye ku tê kirin.

Gava ku em bala xwe didin dîroka zimanê kurdî, em cara yekem bi awayekî aşkere di kovara *Rojî Kurdê* de li nîqaşeke mîna vê ya dema me rast tên ku gellek kes tev lê bûbinê. (Bêguman, ji ber ku Xeznedar (2009)<sup>[1]</sup> behsa Yusiv Ziyaeddîn Paşa kiriye, em li vira tiştêkî nû li ser agahiyên wê gotarê zêde nakin û nakevin wê behsê.) Hingê divê mirov li wê dewra serê sedsala 20'an li sedemên vê nîqaşê bigere, da ku mirov xwe şaş neke.

Di salên 1910'î de, berdewamiya çavdêriyêke rojnameya *Kurdistanê* dihat kirin ku li ser “nexwendebûna Kurdan” bû. Weke ku tê zanîn, heta bi dema *Hawarê* ve jî, vê çavdêriyê xeta karên wêjeya kurdî bi rê ve biriyê. Ji ber ku Kurd ne xwende bûn û dibistanên weke dema me yên giştî (bi wateya “ji bo herkesî û mecbûrî”) jî nebûn, rewşenbîrên kurd li rêyên çareseriyê digeriyan da ku bikariyana di demeke kurt de xelk fêrî xwendinê bikirana. Divê were destnîşankirin ku ev têgihîştin wê demê li seranserê dunyayê hebû, lewre pêleke modernîzmê hemû welat dabûn ber xwe û vê yekê jî jakobenîzma çandî û siyasî, ne bi tenê di nava Kurdan de, li seranserê dunyayê kiribû serdest. Hêjayî gotinê ye ku Rûsyayê jî hêdî hêdî alfabeya latînî cerriband, lê belê bi dû re ji ber sedemên îdeolojîk dev ji vê bernameya xwe berda.

Alfabeya osmanî yan jî ya erebî (ji ber ku ew alfabe ji bo wan zimanan dihat bikaranîn) herweha ji zimanê kurdî re jî dihat bikaranîn, lê belê, diyar e ku wê alfabeyê rewşenbîrên kurd têr nedikirin;

loma jî Abdullah Cewdet di hejmara *Rojî Kurdê* ya yekem de dibêje « *Pêwîst e ku kurd alfabeya xwe biguherînin, ... û alfabeya heyî biterikînin.*»<sup>[2]</sup>. Sedemên vê çavdêriyê îroj jî ji aliyê herkesî ve tên zanîn. Lewre, hin deng hebûn ku nivîsandina wan ya cuda ne pekan bû û her di wê serdema belavkirina “zanîne” de, rewşenbîrên kurd gihîştin wê baweriyê ku alfabeya heyî ya aramî-erebî ku li Dewleta Osmanî dihat bikaranîn ji bo zimanê kurdî nikarîbû bihataya bikaranîn. Hetta, Abdilrezaq Bedirxan, bi ihtimaleke mezin bi fikra civata Kurdên Stenbolê yê ku ji kurmanç û soran û zazayan pêk dihat, wê demê çûye cem Orbelî da ku tev li amadekirina alfabeya latînî bibe û wê alfabeyê bi xwe re bîne Stenbolê<sup>[3]</sup>, lê belê şert û mercên wê dewra Abdulhemîdê ku ji cudaxwazan ditirsiya destûr neda ku ev kar bigihîştaya serî. Ji ber van sedeman, di *Rojî Kurdê* de alfabeyê nû hat pêşniyarkirin ku tê de bi hemze û fethe û kesreyan ve adaptasyoneke alfabeya aramî ji bo zimanê kurdî hatibû danîn.<sup>[4]</sup>

Hingê em dizanin ku, di nîqaşên li ser alfabeyê kurdî de, armanc û motivasyona bingehîn **hêsankirina fêrkirin û hînkirinê** bû. Weke ku me got, sîstema dibistanên mîna ya îroj tunebû û ji ber wê jî ne hêsan bû ku mirov zû bi zû fêrî nivîsandinê bibûya, ji ber sedemên guherîna tîpan ya di serê peyvan, nava peyvan û dawiya peyvan de. Nebûna bersiva hin dengên kurdî jî ev yek diwartir fikir. Mîna Kurdên Bakurî yê ku bi alfabeya kurdî-latînî nizanin û peyva “Xwedê” weke “Hede” dinivîsin<sup>[5]</sup>.

Pirsgirêkên alfabeya kurdî-erebî yê wê demê sala 1919’an Celadet Bedirxan ber bi fikra adaptasyona alfabeya latînî ve biriyê û her wê demê dest bi danîna alfabeya kurdî-latînî kiriye. Celadet Bedirxan bi xwe di hejmara 13’an ya *Hawarê* de behsa vê serboriya xwe ya 1919’an dike.<sup>[6]</sup> Lê belê, piştî ku li Tirkiyeyê jî derbasî alfabeya latînî dibin û sîstema dibistanan tê danîn, Celadet Bedirxan hin guherînan di alfabeya xwe de dike, mîna tîpên “ş, ç”, da ku Kurdên Bakurî yê ku ji perwerdehiya zimanî bêpar hatine hiştin bi hêsanî derbasî alfabeya kurdî bibûna. Îroj em dibînin ku li Bakur mirov pirr bi hêsanî fêrî alfabeya kurdî-latînî dibe û serboriya peyvên “Xwedê” û “Hede” ku me sala 1997’an nivîsandibû jî delîleke wê ya piçûk e. Ev jî nîşana “pêşbîniya” Celadet Bedirxan e ku di vî warî de rê li ber jibîrkirina nivîsîna kurdî girtiye. Bi vî awayî, Kurdan him formeke alfabeya aramî/erebî û him jî formeke latînî adapteyî zimanê kurdî û “kurdî ya xwe” û pê nivîsîn û dinivîsîn<sup>[7]</sup>.

Amadekirina alfabeya latînî (ku ya Rojavayîyan bû), li hember alfabeya erebî (ku ya Qur'anê û Îslamê bû) û li welatê Osmanî (ku ji cudaxwazan ditirsiya) ne pêkan bû. Ne dûrî aqilan e ku ji ber wê ye ku pêşniyara Abdullah Cewdet ji dêleva alfabeya latînî ber bi adaptasyoneke alfabeya erebî ve çûye. Piştî avakirina Komara Tirkîyeyê, Başûriyan bi alfabeyeke kurdî-erebî çalakiya nivîsînê dewam kir û Bakuriyan jî bi derengî be jî çalakiyên xwe veguherandin ser alfabeyeke kurdî-latînî û bi herdu alfabeyan jî îroj standardeke kurdî heye. Ji xwe, pêdivî pê nîne ku em bibêjin ku di nava zaravayên kurdî de êdî pirs standardiyê tune, lewre ew standardî kême zêde hatiye avakirin[8].

Bê guman, armanca vê gotarê ne ew e ku bikeve nava danberheveke alfabeyên kurdî an jî danberheveke zaravayên kurdî û wê nîqaşa bêwate ya derzanistî ku amatorên zimên gellekî jê hez dikin gurtir bike. Lê belê, divê em bi bîr ve bixin ku, ji peydabûna alfabeya kurdî-erebî û alfabeya kurdî-latînî û bi vir ve, di herdu alfabeyan de jî, çi di warê fonetîkê de be û çi jî di warê ortografê de be, guherîn pêk hatine û her du alfabe jî bi zimanê kurdî gihîştine standardeke berbiçav ya ku herkes bikare jê fahm bike. Ji xwe îroj bi herdu alfabeyan jî, bi kumancî jî jî û bi soranî jî wêjeyeke geş hatiye afirandin.

Mixabin, digel dîroka zimanê kurdî ya “mişt qedex û êş” û dîroka herdu alfabeyan ya kurt jî, em dibînin ku hin kesên ku tev li van nîqaşên zarave û alfabeyan dibin, hewl didin ku nîşan bidin bê kîjan alfabe baştir e û argumentan li gora xwe tînin. Divê em dîsa balê bikişînin ser ku di zimannasiyê de tu teorî an jî metod nînin ku nîşan bidin ku zimanek ji zimanekî baştir e û alfabeyek ji alfabeyeke din baştir e, ji bilî metod û teoriyên şovenîst[9]. Ji xwe, kes guh nade van metod û teoriyên ku bi bandora îdeolojî û hesabên siyasî ve tên pêkanîn. Loma jî em ê nekevin behseke bi vî rengî an jî hewla îspata başbûna alfabeyekê ji ya din û zaraveyekî ji yê din an jî zimanekî ji yê din.

Divê em bibêjin ku zimannasî qebûl nake ku zimanek ji yê din dewlemendtir e, zaravayek ji yê din xurttir e an jî alfabeyek ji ya din baştir e. **Her ziman li gora xwe xurt e û di warê bikaranîna xwe de dewlemend e. Herweha, li ser ruyê dunyayê hîç alfabeyek jî nîne ku bikare hemû dengên zimanekî derxe.** Mirov bi îşaretan û adaptasyonan tîpan nêzîkî dangan dike, lê belê hejmara dengên zimanekî tim jî ya tîpên alfabeya wî zêdetir e. Di zimanan de, ya esil “deng” e, ne “tîp û alfabe”. Ji ber vê sedemê jî, em nîqaşa li ser alfabeya latînî an jî erebî ji amatorên zimanî re dihêlin, ew ne karê me ye.

Her ziman an jî zarave li gora pêdivî û îhtiyacên axêverên xwe bi peyvan tê dewlemendkirin û rêyên derbirîna zimanî tîr firehkirin<sup>[10]</sup>. Weke mînak, heger îroj “termînolojiya astronotiyê” bi kurmancî an jî bi soranî an jî bi hewramî û kirdkî (zazakî) tunebe, ev nayê wê wateyê ku Kurd tucarî nikarin biçin fezayê, lê belê tê wê wateyê ku Kurd heta nuha neçûne fezayê û zanîna fezayê jî bi kurdî nehatiye kirin. Lê belê, îroj, di hemû warên zanistiyên civakî û îdarî de tecrubeyeke her du zaravayan jî heye, lê ev nayê wê wateyê ku hewramî an jî kirdkî nikare di birêvebirina dewletan û sîstema perwerdehiyê de were bikaranîn. Em dizanin ku tibba nava xelkê ji ber “textorê kurmancî” di nava xelkê de xwedan warekî dewlemend e. Hingê em dibînin ku zimanê kurdî bi hemû zaravayên xwe ve xwedan wê şiyane ye ku di warên ku ji xelkê kurd re pêwîst in de were bikaranîn û ev nayê wê wateyê ku nikare li gora pêdiviyên “dema nû” warê bikaranîna wî berfirehtir bibe.

Lê belê, em dîsa dibînin ku li Başûrê Kurdistanê ku Hikumeta Herêma Kurdistanê lê desthilatdar e û otonomiyeke Kurdan heye, ji ber serdestiya zaravayê soranî ya ji 1920’an û bi şûn ve hin kesên ku di nava civaka başûrê de weke rewşenbîr û zimannas û wêjevan tîr naskirin ketine nava hin hewldanan ku hin bibîrxistin û hişyarkirinan pêwîst dikin.

Berî her tiştî, heger em hin bûyeran bi bîra xwe ve bînin, ew ê ji bo baştir fahmkirina mijara nîqaşê alî me bike.

1- Berî her tiştî, li Herêma Kurdistanê, nîqaşên li derdora zimanê standard û zaravayên kurdî û alfabe-yên kurdî, di eslê xwe de li ser soranî û kurmancî (behdînî) ne û mijara alfabe-yê mijareke perîferîkê ye. (Em ê bi dû re vegerin ser vê mijarê).

2- Li Başûrê Kurdistanê perwerdehiya giştî heta demên nêzîk jî hebûna zaravayê kurmancî qebûl nedikir. Di salên 90’î de, bi civîneke li wezaretê û bi fermana Hikumeta Hewlêrê ve hin zimannasên herdu zaravayan hatin cem hev û biryar hat dayin ku çend salên destpêkê yê dibistana seretayî li parêzgeha Dihokê kurmancî jî were perwerdekirin. Bi dû re, pêl bi pêl, kurmancî jî kete sîstema perwerdehiyê, lê belê niha bi tenê li parêzgeha Dihokê bi awayekî giştî tê fêrkirin. Ji ber ku derfetên tîr û pêwîst jê re nayên avakirin, bê guman, perwerdehiya kurmancî bi qasî ya soranî nehatiye bipêşxistin. Li zanîngehên Herêma Kurdistanê, îroj, mirov dikare lêkolînan bi soranî bike, lê belê ji bilî parêzgeha Dihokê lêkolînan bi kurmancî nayên qebûlkirin. Li Zanîngeha Selehedîn û Zanîngeha

Silêmaniyê tezên doktorayê nikarin bi kurmancî werin nivîsandin, digel ku li Zanîngehên Dihok û Zaxoyê tu astengî li hember nivîsandina tezên master û doktorayan ya bi soranî nîne.

3- Sala 2008'an, 53 rewşenbîrên kurd yê soranîxêv ku dîsa Şêrko Bêkes di nava wan de bû, nameyek ji Serokatiya Herêma Kurdistanê re şandin û heman name di rojnameya Hewlatî de dan çapkirin. Di nameyê de ji serokatiya herêmê, civata wezîran û parlamentoya herêmê re dihat xwastin ku zaravayê soranî weke zimanê fermî bi qanûnan ve were parastin, lewre ew êdî bûye "zimanê bi hezaran pirtûk û bi sedan rojnameyan" û "êdî dibe zimanê fikrînê jî" [11]. Ev tevger bû sedema nerazîbûneke mezin di nava kurmancîxêvên herêma Behdînanê [12][13]. Hêjayî gotinê ye ku heta nuha kesî bangê li rayedarên kurd nekiriye ku zaravayê kurmancî weke zaravayê fermî were qebûl kirin û alfabeya kurdî-latînî bikeve şûna ya kurdî-erebî.

4- Li ser banga 53 xwaziyarên soranî weke zimanê fermî, derdora 150 nivîskar û rewşenbîrên kurd yê ji her çar parçeyan jî daxuyaniyek belav kir û bi bîr ve xist ku zimanê kurdî li Tirkiye û Sûriyeyê di qedexeyan re derbas bûye û îroj cihê mixabinê ye ku heman siyaseta bi destê Kurdan ve li ser beşekî civaka kurdî tê birêvebirin. Di wê daxuyaniyê de, bang li rayedar û berpirsên Herêma Kurdistanê dihat kirin ku rêyê li ber hewldanên bi vî rengî bigirin.

5- Bi dû re, saziya ku li Başûr bi navê Akademiyê tê naskirin, di navbera 20 û 23. 12. 2009'an de Konferansê li Hewlêrê li dar xist, da ku rêyê çareseriyê were peyda kirin; lê belê armanca wê konferansê ji serî ve diyar bû: navê konferansê "Konferansa Zimanê resmî yê Herêma Kurdistanê" bû [14]. Hewl hatin dayin ku bi biryarên siyasî ve û bi "entrîkayên mîna yê osmaniyan" ve zaraveyêkî li ser yê din ferz bikin [15]. Herkes dizane ku ji wê civînê dê biryara "fermîkirina zaravayê kurmancî li Herêma Kurdistanê" derneketaya. Piştî wê konferansê, aşkere bû ku ew konferans jî bi meqsed bû.

6- Piştî nîqaşên li ser van bûyer û kirinên jorê, Hikumeta Herêmî biryar da ku digel beşdariya zimannas û rewşenbîrên ji beşên din jî Konferansa Zimanê Kurdî li dar bixistaya. Vê carê nav rast hatibû hilbijartin. Ji bo sazkirina wê konferansê, bi nûnerên Akademiyê, nûnerên Zanîngehên Herêma Kurdistanê, yê Kurdên Bakurî û yê Ewropayê û yê wezaretê ve civîn hatin lidarxistin, da ku li ser bernameya Konferansê lihev kirinek pêk were. Di gava dawîn de Akademî ji civînan û ji Konferansê vekîşiya. Di wê konferansê de (îlon 2011) tu biryarên li ser "ferzkirina zaraveyêkî li ser

zaraveyên din, an jî ferzkirina alfabeyekê li ser alfabeyên din” derneket. Lê belê gava ku “pêşniyar” hate kirin ku ji ber sedemên coxrafî li Dihokê navendeke zimanê kurdî were danîn, da ku navbeyniya her çar parçeyan (bi taybetî Bakur û Başûr) bike, beşdarên soranîaxêv ku ji kurmancîaxêvan zêdetir bûn rabûn ser xwe ku salonê û konferansê terk bikin. Ji ber vê, ew pêşniyar hate betalkirin, lê belê biryara jiyana bi hev re ya zarave û alfabeyan bi pirraniya dengên hate wergirtin û li ser plandaîna zimanî hin pêşniyarên realist li hikumetê hatin kirin. Konferansa Amedê (adar 2012) jî biryarên Konferansa Hewlêrê hatin teyidkirin.

7- Komeke nivîskarên kurd yê soranîaxêv ya 27 kesî meha bihurî bangê belav kir û tê de daxwaza fermîkirina alfabeya kurdî-erebî dihat kirin û bi dû re ev daxwaz bi înzeya 471 kesên aşkere kir. Dîsa navê Şêrko Bêkes û Ferhad Şakelî weke serkêşê vê komê diyar dibû. Vê koma ku ji xwe re digot “Grûpa Inîsyatîf ji bo Parastina Zimanê Kurdî” digot ku li Rojhilat û Başûrê Kurdistanê alfabeya latînî ji bo wan “xeta sor” e û ew ê qebûl nekin ku alfabeya latînî li ser wan were ferzkirin. Herweha digotin ku hewleke bi vî rengî “lîstina bi agirî” ye. Di wê bangê de dihat gotin ku Kurd weke millet rojhilatî ne, misilman in û alfabeya wan erebî ye; alfabeya latînî ya kemalîstan e û ya krîlî jî ya Stalîn e.

8- Komeke nivîskarên kurd yê kurmancîaxêv ya 80 kesî jî bangê belav kir û got ku hewlên dabeşkirina Kurdan ya bi herêman û gefên li ser bikarhênerên zaravayên din û alfabeyên din li dijî “Yekîtiya Kurdan” e û “esasen ev hewldan lîstina bi agirî ye”. Di wê bangê de jî banga parastina cihêrengiya zaraveyan û bihevrejîyîna beşên cuda dihat kirin.

Lê belê, nîqaş ne bi tenê bi daxuyaniyan ve tîn meşandin û herweha bi gotar û beşdariyên li ser medyaya kurdî ve jî tîn dewlemendkirin. Fikrên beşdarên wan daxuyaniyan an jî fikrên yê ku li derveyî daxuyaniyan rawestiyane aşkere diyar dikin ku tiştine veşartî jî hene ku kes newêre bibêje: pirsgerêk bihevrejîyîna soranî û kurmancî ye.

Sedema vê tîbîniya me ev e: **di banga Grûpa Inîsyatîf ji bo Parastina Zimanê kurdî (bi kurtî em ê bibêjin GIPZK) de ji her çar parçeyên Kurdistanê, bi tenê behsa parçeyên Rojhilat û Başûr tê kirin û bi tenê behsa alfabeya erebî tê kirin, ku ev sembolen ku hatine bikaranîn, bi pirranî weke sembolen “zaravayê soranî” tîn naskirin.** Em hemû dizanin ku li Rojhilat û Başûrê Kurdistanê û bi



alfabeya erebî, rasterast behsa zaravayê kurmançiya xwarê (sorani) tê kirin. **Ev jî îşareta parçekirina Kurdan e.** Bi banga 80 kurmançîxêvan ve jî ev yek dihat destnîşankirin.

Di daxuyaniya GIPZK'ê de, şêwazeke weha ya tund hatibû bikaranîn ku asta wê bangê gellekî kêr dikir û ew kesên ku bi îddiyên zanistî ve radibûn (lewre ji beşdarên Konferansên Hewlêr û Amedê re digotin “ne pispor in”) dixistin regekî “kûlubeke hevalan” an jî “piştgirên tevgereke siyasî”. **Peyvên mîna “xeta sor” di siyasî de tîn bikaranîn, lewre di warê zanistî de “xeta sor” nîne. Herweha peyvên “lîstina bi agirî” jî rasterast û bi awayekî aşkere û zelal “gef” e ku mirov ancax di zimanê çete û mafyayan de hevokên bi vî awayî peyda bike.**

Di daxuyaniya GIPZK'ê de tê gotin ku ji hilî “hin kesan” beşdarên wan konferansan ne pisporên zimanî bûn û behsa “siyasîbûna organîzasyonê” tê kirin. Ev, heqareteke mezin e, lewre herkes dizane ku li Bakurê Kurdistanê perwerdehiya kurdî nîne (ji bilî hin zanîngehên ku van du sê salên dawîn hin hewlan nîşan didin) û li Ewropayê jî kêr dever hene û ji xwe derfetên herkesî nînin ku biçin Ewropayê û dîplomayên zimanê kurdî werbigirin. Ji xwe, **hemû beşdarên bakurî jî pisporên zimanê kurdî bûn û mamostetiya kurdî dikirin, lê GIPZK dixwaze balê bikişîne ser fikrên hin beşdaran yê siyasî yê ji derveyî wan konferansan**[\[16\]](#). Li Bakur û Rojavayê Kurdistanê di dewrên xirab de û bi berdêlên mezin ve, kêr kesan xwe fêrî kurdî kiriye û bûye “pispor” ku hin ji wan beşdarên wê konferansê bûn. Herkes bi vî rewşê dizane û loma jî li Bakur kes li dîplomaya mirov napirse û unwanên akademîk ewqasî bi pêş dernakevin û nebûne adet.

Herkes dizane ku Celadet Bedirxan jî û Cegerxwîn jî ne doktorên zimanê kurdî bûn, lê herduyan jî rêziman nivîsandine.

Lê ya herî xirab ne ew e: Heger “diploma” argumenteke pêbawer be, gava ku mirov bala xwe dide banga GIPZK'ê, mirov dibîne ku stranbêj û helbestvan û weşanger jî di nava wan de hene ku mirov dibêje qey “festivaleke çandî û hunerî” ye. Ji bo ku mirov bibêje “hûn ne pispor in”, divê pêşi mirov bi xwe pispor be. **Bi qasî ku em dizanin Nasir Rezazî û Şêrko Bêkes û Ferhad Şakelî û Bedran Hebîb û Bextiyar Emîn bi xwe jî ne pisporên zimanê kurdî ne û doktoraya wan ya li ser zimanê kurdî nîne.** An jî bila hin kes ji me re bibêjin gelo mirov çawa dibe “pispor”, lewre rewş bi vî awayî piçekî tev li hev dibe.

Xaleke din ku balê dikişîne ew e ku di van nîqaşan de **helwêsta GIPZK'ê û ya Akademiyê bi awayekî gellekî aşkere dişibe hevdu.**

Xala herî girîng jî ew e ku heta nuha berî hertiştî behsa zaravayan dihat kirin, lê vê carê zarava di binî re xuya dibin û “alfabe” weke pirsgerêka sereke hatiye nîşandayin. Gelo çawa dibe ku **heman kesayetiyên ku demek berê “fermîkirina zaravayê kurmançiya xwarê” dixwast, nuha dageriyane ser “fermîkirina alfabeya kurdî-erebî”?** Ev jî weke stratejiyeke kone ya sedsala 19'an xuya dibe, **lewre di vê dewra “aqilan” de kes bi van stratejiyan ve naxape.**

Divê em balê bikişînin ser ku fermîkirina zaravayê soranî cara yekem pişt şerê cîhanê yê yekem û bi desthilatdariya Brîtaniyan ve tê. Wê demê êdî jê re dihat gotin “soranî” û navê “kurmançiya xwarê” hêdî hêdî hate jibîrkirin ku bi tenê hin rewşenbîrên kêmhejmar vê peyvê bi kar tînin. Îroj li Başûr ji soranî re dibêjin “kurdî” û ji kurmançî re dibêjin “kirmancî” an jî “behdînî”.

Guherîna wateya peyv an jî referansên wan jî stratejiyeke siyasî ye û heger mirov bixwaze bikole, diçe heta bazarên Hikumeta Tirkiyeyê ya bi Brîtaniyan re. Lewre, piştî şerê cîhanê yê yekem, Brîtaniyan soz dabû Civata Neteweyan (îroj bûye Yekîtiya Neteweyan) ku wê dê mafên hindikahiyan bidana û ev yek ne li gora hesabê “kemalîstên tirk” bû. Ji ber ku wan qebûl nedikir ku milletekî bi navê “kurd” heye û heger hebe jî “zimanê wî tuneye”. Heger ji wê demê û bi şûn ve li Iraqê “zimanê kurdî” bihataya qebûl kirin, bicîhkirina vê siyaseta wan dê ne guncaw bûya û kes jî dê pê nexapiyaya. Ji ber wê jî Brîtaniyan “zaravayê soranî” weke zimanê kurdî qebûl dikir. Soranî wê hingê ket perwerdehiyê, weşangeriyê û medyayê; kurmançî jî di heman waran de dihat bikaranîn, lê belê soranî bêtir dihat favorîzekirin. Ji ber wê ye ku kovarên wêjeyî yên mîna *Gelawêjê* derdiketin, lê belê kovareke kurmançî ya xurt dernediket. Ji wê rojê ve ye ku ancax piştî *Destûra* Iraqê ya piştî Sedamî, di xala 4'an de behsa zimanê kurdî dihat kirin beyî ku behsa zaravayan bibe. Ji xwe, hemû nîqaşên li ser zarava û alfabeyan jî piştî teqezkirina desthilatdariya Hikumeta Herêma Kurdistanê derket holê. Liberxwedana axêverên kurmançî ya ji bo bikaranîna zaravayê xwe ya di sîstema perwerdehiyê de xof bera dilê hin kesan da ku hesabê wan li ser giştîkirina zaravayê soranî bû. Weke nimûne, **di pêvajoya salên piştî 1991'ê de ku herêma otonom hate saz kirin, nameyên master û doktorayê li Zanîngeha Selehedînê bi kurmançî an jî li ser kurmançî nedihatîn qebûl kirin [17].**

Hingê, piştî van serboriyan, divê mirov bang û daxuyaniya GIPZK'ê bi çavekî din jî bixwîne. Ka gelo GIPZK di eslê xwe de dixwaze çi bibêje?

Gelo "agir" çi ye?: Yekîtiya Kurdan e. Hingê, ji bo vê yekîtiyê divê em hemû "bi soranî bipeyivin" û "bi alfabeya kurdî-erebî binivîsînin". Heger weha nebe, gelo dê çi bibe?

Kî bi "agirî" dilîze?: Kesên ku bixwazin taybetmendiyên beşekî civaka kurdî li ser yên din ferz bikin û bibin sedema kî nê neyariya nava Kurdan.

Erê, lê kî vî karî dike? Ev çi tatelokên van camêran in? Ji wan pê ve kesî zaravayek li ser zaravayên din ferz nekiriye û alfabeyek li ser alfabeyên din nedaye sepandin.

Di eslê xwe de, kesî zaravayekî din jî û alfabeyekê din jî li ser wan bi xwe jî ferz nekiriye. Bi tenê di Konferansa Hewlêrê de hatiye "pêşniyarkirin" ku ji bo "danîna pîreyekê di navbera Başûr û Bakur de", hefteyê saetek be jî li Herêma Kurdistanê alfabeya kurdî-latînî jî were fêrkirin. **Ji xwe, gava ku 53 kesan ew daxwaza dilê xwe aşkere kir, hê sê sal hebûn ji Konferansa Hewlêrê re.**

**Hingê "xeta sor" û "lîstina bi agirî" di eslê xwe de sepandina alfabeyekê û bi vê rêyê ve sepandina zaravayekî din e. Divê ev daxwaz rast were xwendin. Lewre ji vê daxwazê û bi şûn ve "qedexekirin" dest pê dikin ku li Tirkîyeyê heman siyaseta li ser zimanê kurdî dihat meşandin. Hingê, gelo "kî kemalîst e?"**

Di vê dîroka Kurdên Bakurî de ku zimanê wan 90 salan hatiye qedexekirin û bi wê alfabeya Celadet Bedirxan ve zimanekî û wêjeyekê û heta milletekî li ber xwe daye, **bikaranîna peyva "kemalîst" ji bo wê alfabeyê, û ji bo wî millet ku ji ber kemalîzmê zulm kişandiye, bi tenê "haqaret" e û "tahrîk" e.** Heger zanistî be, ev ne zanistî ye; heger siyasî be, divê rayedarên Hikumeta Herêma Kurdistanê lêpirsînê di vî warî de bidin destpêkirin, lewre **di wê bangê de "daxwaza şerr" û "provokasyon" heye û "gef" li beşekî civaka kurdî tê xwarin.** Weha diyar e ku di bernameya wan de piştî qedexeya alfabeya latînî, dor dê were ser qedexeya kurmancî û zaravayên din, paşê jî qedexeya Êzdayetiyê û Xrîstîyanîyê li Kurdistanê, paşê jî dê nexweş û seqet û homoseksuelan bixin odeyên gazê. **Lewre, gava ku mirov hevdu red bike, divê mirov li dorê negere û aşkere bibêje. Navê vê, "so-ve-nî-zm" e û rêya wê heta bi "fa-şî-zm" ê jî diçe.**

Hingê, heger hişê mirov li serê mirov be û mirov bi rastî xêra Kurdan bixwaze, divê mirov bibêje ku ne bi tenê kurmançî an jî soranî, lê belê **“hemû zaravayên kurdî” ji bo me “xeta sor” in û rehên “yekîtiya neteweyî” ne. Heger yek ji wan bixitime, yekîti namîne**, lewre beşekî civaka Kurdan çi gava ku fersend bikeve destê wan dê ji parçeyên din cuda tev bigere û biryarên cuda bide. Ji xwe, li Rojhilata Navîn gellek caran fersend dikevin destê mirov. Heger 471 Kurdên Başûrî tiştêkî weha bixwazin, divê daxwaza xwe aşkere bibêjin.

**Bihevreyîna zaravayan qet nabe asteng, ne li hember yekîtiya neteweyî û ne jî li hember yakîtiya hişmendiyê.** Nimûneya Swîsre û Norwecê di vî warê de nimûneyên herî baş in ku li Swîsreyê 4 ziman fermî ne û li Norwecê jî du zarava bi hev re fermî ne û heta nuha jî herdu welat parçe nebûne.

Herçî pirsgirêka alfabeyê ye, ew jî ancax dikare bibe biryara siyasî ya plandanîna zimanî. Ev mijar ne karê zanist û pisporan e. **Zimannas nikarin biryara zimanê fermî an jî planeke siyasî bidin.** Ew bi tenê dikarin lêkolînên xwe bikin û heger bi kêrî siyasiyan ve were, baş e. Hingê gelo “kî siyasî ye?” [18]

Ji ber van sedem û pirsên jorê, **ev kirinên Akademiyê û GIPZK'ê bi me weke hewldanên provokatîf yên siyasî xuya dibin.** Ji xwe, ji ber wê ye ku banga GIPZK'ê bi destê kesên ne zanist ve û bi zimanê kolanan yê tehdîtgar ve hatiye nivîsîn û armanc jê “kurdkujî” ye. **Sibehê, heger ew camêr kêr û demançeyan rahijin û derkevin pêşiya nivîskarên kurmanç, divê mirov şaş nebe.** Lewre tayên qels yên yekîtiya Kurdan bi hewlên bi vî rengî ji hev tîn veqetandin.

---

[1] Marif Xeznedar (2009), “Mêjûya danîna alfabeya zimanê kurdî” in *Kulturname*, <http://www.kulturname.com/?p=1859>

[2] Abdullah Cewder, « Bir Hitab » in *Rojî Kurd*, h. 1.

[3] Husên Hebeş di lêkolîna xwe ya bi navê *Raperîna çanda kurdî di kovara Hawarê de* radigihîne ku Evdilrezzaq Bedirxan di sala 1913'an de ji bo amadekirina alfabeyeke kurdî çûye ba kurdologê navdar

Orbelî ku Celîlê Celîl jî di *13 rûpelên balkêş ji dîroka gelê kurd* de behsa wî dike û dibêje ku ew li ser alfabeya kurdî ya latînî xebitîye, lê bi dû re ev kar teslîmî Isahak Marogulov kiriye (r. 139-149). Herweha Celadet Bedirxan di hejmara 10'an de dide zanîn ku Tewfîq Wehbî jî ji bo kurdî li ser alfabeyekê xebitîye, lê ji ber ku hê alfabeya wî temam nebûbû, wan nikarîbûye alfabeyan bikin yek

[4] Em ê li vira behsa dîroka alfabeyên kurdî nekin û loma jî nekevin behsa alfabeya latînî yak u ji hêla Orbelî ve hatiye destpêkirin û bi qasî deh sal bi şûn ve ji hêla Maragulov ve hatiye dawîya salên 1920'î temamkirin ku her di dewra Hawarê de jî hatiye bikaranîn. Herweha em ê behsa hemû guherînên li ser alfabeya kurdî-erebî an jî kurdî-latînî nekin û nekevin pirsgirêkên wan yên temsîla dengên kurdî.

[5] Me di nivîseke xwe de behsa serborîyeke xwe ya li ser nivîsandina hin dengên kurdî kiribû ku di alfabeya tirkî-latînî de nînin: “Kuştina Seydo, Kerba Bavê Min û Pênûsa Min” in

[6] Ev alfabeya 1919'an îroj li ber destan nîne, lê belê tê zanîn ku di Dadgeha Erziromê de yek ji delîlên ku li dijî tevgera kurd hatiye bikaranîn jî ev alfabe bûye û weke cudaxwaziyê hatiye nirxandin. Ne dûrî aqilan e ku ew alfabe ji aliyê dadgehê ve hatibe şewitandin.

[7] Em li vira behsa serborîya alfabeya krîlî û adaptasyonên Kurdên sovyetê nakin, lewre nîqaş bêtir li ser alfabeyên aramî û latînî tê kirin. Ji bo wan agahiyan, binihere li Xeznedar (2009).

[8] Emîr Hesênûr (2008), “Kurdî wekî zimanekî cot-standart”, *Rwange*(Kurmanciya wê : <http://www.kulturname.com/?p=68>)

[9] Emîr Hesênûr (2010), « Şovenîzmî soranî û efsanekanî » in *Ferheng*, h. 22 û h. 24, Hewlêr, (kurmanciya wê : <http://www.kulturname.com/?p=3094>)

[10] Nivîskarê vê gotarê teza xwe ya doktorayê li ser hevokên kompleks yên zaravayê kurmancî û di romanên kurmancî de pêşkêş kiriye û li ser demsazî, hevoksazî, watesazî, termînoloji û gotarbêjiya kurmancî lêkolînên wî bi fransî û bi kurdî hatine çapkirin.

[11] çavkanî: “Bila soranî bibe zimanê standart û kurmancî zimanê arşîvê” , malpera *Avesta*, [http://www.avestakurd.net/arshiv/V1/news\\_detail.php?id=518](http://www.avestakurd.net/arshiv/V1/news_detail.php?id=518)

Ev mijar di hevpeyvînên rojnameya *Çawdêr* yên sala 2008'an de jî bi berfirehî hate nîqaşkirin ku malpera Avestayê beşek ji hevpeyvîna Şêrko Bêkes bi kurmanciya jorê jî belav kiribû:

[http://www.avestakurd.net/arshiv/V1/news\\_detail.php?id=2472](http://www.avestakurd.net/arshiv/V1/news_detail.php?id=2472)

[12] Hesên Silêvanî & Dilbixwîn Dara (2008), "Hevpeyvîn: Em qebûl nakin ku kesek soranî li ser me feriz bike", *Avesta*, [http://www.avestakurd.net/arshiv/V1/news\\_detail.php?id=647](http://www.avestakurd.net/arshiv/V1/news_detail.php?id=647)

[13] Mueyed Teyib (2008), "Kurd û Pirsê zimanê standard" in *Peyv*, h. 46, Herêma Kurdistanê (cf : <http://www.kulturname.com/?p=332>)

[14] Emîr Hesênpûr (2009), "Nameyek bo Konferansa Akademiya Zimanê Kurdî" in *Kulturname* <http://www.kulturname.com/?p=2653>

[15] Hesên Qazî (2009), "Ew du nameyên nehatine xwendin", <http://www.kulturname.com/?p=2730>

[16] Nexweşiyêke din ya Kurdan jî ew e ku nikaribin tahammulî hevdu bikin. Ne bi tenê aliyek weha ye, lê hemû alî weha ne. Kêm kurd hene ku dikarin tahammulî piştgir û endamên rêxistinên din bikin. Ev jî diyar dike ku şopên serboriya rêxistinên Bakurî ya berî 1980'ê û dewama wê, hê jî nehatine jibîrkirin. Li Başûr ji xwe ev bêtehammulî bûbû sedema şerrê birakujiyê.

[17] Serboriya kesên pêşîn ku di vî warî de diploma wergirtine li Başûr baş tê zanîn ku mînaka Dr. Abdilwehab Xalid Mûsa û ya Dr. Bahîez Omer Ehmed ya herî naskirî ye. Zanîngehê wê demê dîplomaya wan nedabû wan û heta ji wan re gotibû "hûn bi ser neketine û vegezin mala xwe" û beyî ku tu biryareke nivîskî bidaya wan, daxwaza wan ya agahiyan red kiribû. Lê bi dû re, ev mijar bûbû cîhê nakokiyêke siyasî û Zanîngeh hingê mecbûr mabû ku dîplomaya wan bide wan. Herdu pisporên zimanê kurdî îroj li Zanîngeha Dihokê û ya Zaxoyê dixebitin û Dr. Abdilwehab Xalid Mûsa cîgirê serokê Zankoya Zaxoyê ye. Ev herdu akademîsyenên kurd jî beşdarî Konferansa Hewlêrê bûbûn.

[18] Bersiva argumentên wan yê din ji aliyê Prof. Dr. Emîr Hesênpûr (2010) hatiye dayin. Ji ber wê, em nakevin wê behsê jî.

## Rêbera rastnivîsînê

### *Komxebata Kurmancî*

#### Ji bo rastnivîsîneke standard

Ziman di axaftinê da û di nivîsînê da bi awayên cuda dîyar dibin. Ji ber wê ye ku meriv wekî dipeyive, nanivîse. Zimanê axaftinê bi dangan peyda dibe û bi bihîstinê dihê wergirtin. Lê zimanê nivîsînê bi nîşanên grafîkî pêk dihê û bi bînahîyê dihê wergirtin. Loma dihê gotin ku axaftin zimanek e ku ji bo guhan e û nivîs jî zimanekî din e ku ji bo çavan e. Ji ber vê yekê ye ku gelek kes zimanê axaftinê û zimanê nivîsînê hema hema wekî “du zimanên cuda” jî dibînin.

Gava ku meriv dipeyive, gelek awa hene ku hem alîkarîya derbirînê dikin hem jî alîkarîya têgihîştinê dikin. Ji ber ku meriv bi jest û mîmîkan, bi nîşandana hisên xwe, bi rawest û vehesê, bi guvaşa hin kîteyan, bi bilindkirin û nizmkirina dengê xwe û hwd dixebite ku alîkarîya axaftinê bike û pê ra şertên têgihîştineke rast peyda bike.

Ji bo nivîsîneke baş, birêkûpêk, fêambar û her weha ji bo berlêgirtina tevlihevî û sergêjîyan qayîdeyên zelal -çi yên ku xwe bispêrin rêzimanê, çi jî yên ku xwe bispêrin hev fikirî û lihev kirinê- şert in. Lewra gava ku qayîdeyên rastnivîsînê yên li ser bingehe navbirî hebin, xwendin hêsantir û zelaltir dibe. Rê li ber şaş têgihîştinan venabe. Her weha naveroka zimanê nivîskî jî dikare bi mebesta xwe ra guncayî bihê ragihandin.

Her çî nivîsîna rêbereke rastnivîsînê ye, ji bo wan zimanan hêsantir e ku di warê qayîdeyên rastnivîsînê da lihevhatinên wan yên civatî hene. Lewra meriv weha dihizire ku rêberên

rastnivîsînê yên van cureyên zimanan dê ji rêzkirina qayîdeyan pêk bihên û yên ku karê nivîsînê dikin jî ji bo nivîsîneke li gor qayîdeyên lihevkerî, dikarin li wan binêrin û pêgirîya wan bikin. Di vê çerxa teknîka enformasyonê da êdî ev qayîdeyên rastnivîsînê wekî bernameyên rastnivîsînê di komputeran da jî bicihkirî ne. Heger daxwazên ji bo guherîna hebin jî minaqeşeyên wan bi awayekî din dihên kirin û heta gihîştina encamê, ango heta ku li ser wan pirsan lihevhatineke civatî peyda nebe, qayîdeyên tesbîtkirî bi awayekî giştî nahên pêpeskirin. Ji bo nivîsîna rêberên rastnivîsînê yên zimanên weha, helbet pêwîstî dê bi şirove, ravekirin û argumanên zêde tune be. Lewra wan qonaxên weha bi awayekî giştî li dû xwe hêlane.

Her weha divê bihê diyarkirin ku di rêberên rastnivîsîna zimanên weha da, meriv li gel mijarên rastnivîsînê yên adetî, mijarên mîna *raçandina tekstê, nivîsên taybetî, tablo, dîyagram, nîşanên kêmnas, sembolên fonetîkê, di komputerê da nîşanên taybetî, vavêrtina alfabetîk, ji bo nivîsîna di komputerê da rêyên pratîk, nivîsîna çavkanî û referansan, nîşanên rastkirinê* û hwd jî dibîne ku êdî ew jî di vê çarçoveyê da dihên qebûlkin.

Ji bo zimanên ku nivîsîna wan zêde pêş neketiye û qayîdeyên wan yên rastnivîsînê cara yekem dihên nivîsîn jî problem dê hinde ne zêde bin.

Kurmancî bi xwe, nakeve nava her du kategorîyan jî. Ji ber ku rewşeke kurmancîyê ya taybetî heye, rêbera wê ya rastnivîsînê jî di vê qonaxê da dê li gor vê rewşa taybetî be. Pir eşkere ye ku di rewşeke weha da amadekirina rêbereke rastnivîsîna kurmancîyê ne karekî hêsan e. Ji ber ku nivîsîna kurmancîyê di van 30 salên dawî da -bi saya îmkanên teknolojiyê jî- bi qasî ku meriv nikare bide ber tu demên din têrbelav e. Lê her beşekî kurmancîaxêvan li parçeyên welatê xwe yên cuda di bin tesîra zimanên dewletên serdest yên cuda da ye û rastnivîsîna wan zimanên serdest, bivê nevé, tesîrê li awayê nivîsîna kurmancîya wan jî dike.

Hin kurmancîaxêv jî hene ku li welatên cîhanê yên cuda dijîn. Loma pir normal e ku kurmancîaxêvên weha di bin tesîra zimanên wan welatan da bimînin û rastnivîsînên zimanên wan welatan bi awayekî xurt tesîrê li awayê nivîsîna wan jî bikin. Ji ber vê yekê, ne dûrî aqilan e ku kurmancîaxêv -çi pê bihesin çi jî pê nehesin- di bin tesîra wan zimanan û wan rastnivîsînan da li rastnivîsîna kurmancîyê binêrin.



Gelek nivîskarên kurmançiyê tevî ku li welatê xwe ne jî di bin tesîra rastnivîsîna zimanên xwe yê bîyanî yê din da ne. Nimûneyên rastnivîsînê yê cuda di berhemên wan da xwe didin der. Hin nivîskar jî bi temamî bi tesîra devokê xwe dinivîsin. Her çî kitêbên dersan in jî bi cudayîyan va mişt in. Di her kovar û rojnameyeke me da, meriv pir bi hêsanî dikare behsa qayîdeyên cuda bike. Di medyaya dîjîtal da em hertim bi van cudayîyên nivîsîna kurmançiyê ra rû bi rû dibin. Kitêbên rastnivîsînê yê ku berî niha hatine weşandin jî ji cudayîyan ne bêpar in. Di dezgehên me yê weşanê yê din da jî standardên cuda xuya dibin. Heta, di warê herfên alfabeya kurmançiyê da jî cudayî hene.

Ji ber gelek problemên din û van sedemên dîyarkirî ye ku gava mijar kurmançî be, ji bo rêbereke rastnivîsînê, pêwîstî dê bi şirove, arguman, nimûne û ravekirinan jî hebe. Heger di warê rastnivîsînê da problemên navbirî tune bûna, pêwîstiya me jî dê ne bi argumanan ne bi şiroveyan ne jî bi ravekirinan hebûya.

Lê wekî ku dihê zanîn, di warê rastnivîsîna kurmançiyê da problem pir in. Endîşeya di warê peydakirina hizireke hevbeş û lihevkerineke civatî da mezin e. Loma di vê qonaxê da ji bo yeqînî û piştrastiyê û peydakirina hizireke hevbeş, di nivîsîna rêbereke rastnivîsînê da pir normal e ku meriv hin caran xwe bispêre dengnasî û manenasîyê, zorê bide sînorên rêzimanê yan derbasî nav sînorên fonetîkê û hwd bibe.

Her çî xalên rastnivîsînê ne, hin tişt hene ku meriv dikare li ser wan li hevûdin bike. *“Gelo em apostrofê bi kar bînin yan na?”* yan jî *“Navên netewe û zimanan bila bi hûrdekan dest pê bikin yan bi girdekan?”* û hwd nimûneyên wan xalan in ku meriv dikare li ser wan li hevûdin bike.

Lê hin tişt jî hene ku ji bo lihevkerinê ne qabil in; ango meriv nikare li ser wan li hevûdin bike. *“Bila nêr û mê di kurmançiyê da bimînin yan na?”* yan *“Gelo em êdî dest ji ergatîfîyê berdin yan na?”* û hwd ji wan xalan in ku bi lihevkerinê nabin. Ji ber ku ew di xwezayîya kurmançiyê da bi awayekî sistematîk hene û taybetmendiyên kurmançiyê yê bingehîn in. Loma gava ku em bixwazin bi vî zimanî binivîsin, divê ku em pêgirîya wan bikin.

Divê bihê zanîn ku pêwîstiya nivîsîna kurmançiyê bi standardekê heye û ji bo standardekê jî qayîdeyên rastnivîsînê şert in.

Ji bo nivîsîna vê rêberê, em, Komxebata Kurmancîyê di 27.02.2016an da berê li Mêrdînê û bi dûre jî di 09.07.2016an da li Stenbolê civîyan.

Bingehê mînaqêşeyên her du civînan kitêba Mistefa Aydoganî (Rêbera rastnivîsînê) bû. Loma rojeva her du civînan jî bi awayekî giştî xwe spartiyê xalên naveroka vê kitêba navbirî.

Divê bihê zanîn ku di her xalê da ew awayên heyî yên cuda hatin mînaqêşekirin ku di axaftin û nivîsîna kurmancîyê da dihên bikarînan.

Beşdarên Komxebatê bi awayekî giştî li ser bingehê lihevkerî gihîştine vê encamê. Lê li gel wê jî divê bihê dîyarkirin ku li ser hin xalan bîr û rayên cuda hebûn.

Hêvîya me ew e ku hûn dê pêgirîya vê rêberê bikin û bi vî awayî nivîsîna we ya kurmancîyê dê serrasttir bibe û her weha tiştên ku hûn binivîsin jî dê ji bo xwendevanan zelaltir û fêmbartir bin.

## 1. Alfabe

### 1.1. Herfên alfabeya kurmancîyê

Di alfabeya kurmancîyê da 31 herf hene.

**Gîrdek:** A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U û V W X Y Z

**Hûrdek:** a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

**Dengdêr:** a e ê i î o u û

**Nedengdêr:** b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

### 1.2. Bilêvkirina herfên nimînendeyên nedengdêran

Her çî bilêvkirina 23 nedengdêrên alfabeya kurmancîyê ye, bi vî awayî dihê kirin:

<b>B</b>	<b>C</b>	<b>Ç</b>	<b>D</b>	<b>F</b>	<b>G</b>	<b>H</b>	<b>J</b>	<b>K</b>	<b>L</b>	<b>M</b>
be	ce	çe	de	Fe	ge	he	je	ke	le	m e

<b>N</b>	<b>P</b>	<b>Q</b>	<b>R</b>	<b>S</b>	<b>Ş</b>	<b>T</b>	<b>V</b>	<b>W</b>	<b>X</b>	<b>Y</b>	<b>Z</b>
ne	pe	qe	re	Se	şe	te	ve	we	xe	ye	ze

## 2. Alfabeya herfgotinê

Her çî **alfabeya kurmancîyê ya herfgotinê** ye, ango alfabeya herf bi herf gotinê ye, maneya wê ew e ku gotinek herf bi herf û her herfeke wê jî bi alîkarîya navên merivan dihê bilêvkin.

**Armanç** ji alfabeyên weha ew e ku gotin bi awayekî zelal bihê dîyarkirin û bi vî awayî rê li ber şaştêgihîştinan bihê girtin.

**Navên ku ji bo alfabeyê bi kar dihên**, bi awayekî hatine hilbijartin da ku ev armanca navbirî bi hêsanî pêk bê.

Hemû navên merivan yê vê alfabeyê **dukîteyî** ne. Ev navên dukîteyî bi nêrîneke weha hatine tesbîtkirin da ku di navbera navên jin û mêran da ji alîyê hejmarê va niwênerîyeke wekhev peyda bibe.

### 2.1. Herfgotina li gor navên merivan

Rêz	Herf	Nav	Rêz	Herf	Nav
1	A	Azad	16	M	Mizgîn
2	B	Berfîn	17	N	Newroz
3	C	Cîhan	18	O	Omo
4	Ç	Çîya	19	P	Pola
5	D	Dildar	20	Q	Qenco
6	E	Evîn	21	R	Robîn
7	Ê	Êvar	22	S	Serdar
8	F	Ferat	23	Ş	Şîlan
9	G	Gulçîn	24	T	Tîrêj
10	H	Hêvî	25	U	Urfî
11	I	Idrîs	26	Û	Ûsif
12	Î	Îskan	27	V	Vîyan
13	J	Jîyan	28	W	Welat
14	K	Kawa	29	X	Xunav
15	L	Laleş	30	Y	Yekbûn
			31	Z	Zelal

### 3. Kîtekirin

**Maneya kîtekirina di nivîsê da** ev e; gava ku beşê bêjeyekê di rêzê da hilneyê, bi bendikekê va dihê veqetandin û beşê veqetandî dadikeve rêza piştî wê.

Bendik piştî beşê bêjeyê yê yekem dihê danîn û divê ku di navbera bendikê û beşê yekem da tu valayî tune be. Ango bendik bi beşê bêjeyê yê yekem va ye.

**Armanca kîtekirina di nivîsê da** jî wekhevkirina dirêjîya rêzan e. Divê ku dirêjîya hemû rêzan di kêleka nivîsê ya rastê da bi qasî hevûdin be da ku nivîs xweştir xuya bike.

Kîtekirin di esilê xwe da, di xwendinê da navbirek e, her weha astengek e jî. Ji ber vê yekê, heta ku ne pêwîst be, ya baş ew e ku meriv kîtekirinê neke. Lewra gava ku ev navbir zêde bibe, pir mimkin e ku ew tesîreke neyînî li xwendinê bike. Gava ku hejmara kîtekirinê zêde bibe, xwendina nivîsê jî dikare dijwartir bibe.

Di dema me da, êdî piranîya nivîsan di komputerê da dihên nivîsîn û gelek caran dihê xwastin ku hêla rûpelan ya rastê rast be. Di rewşeke weha da bivê nevé, kîtekirin ferz dibe û hingê divê ku bernameya nivîsînê vî karî li gor hin prensîpan bike. Divê ku ev prensîp zelal bin û di bernameyê da hatibin bicihkirin da ku bername jî li gor tiştên bicihkirî karê kîtekirinê pêk bîne.

**Gava ku kîtekirin pêwîst be**, divê ku bi awayekî weha bihê kirin ku tesîreke zêde neyînî li xwendinê nebe.

Divê ku her du beşên bêjeya kîtekirî bikarin bi serê xwe bihên bilêvkirin.

#### 3.1. Qayîdeyên kîtekirinê

Bi giştî du prensîpên kîtekirina bêjeyên sade hene:

1. Prensîpa yeknedengdêrî (prensîpa yekkonsonantî)

## 2. Prensîpa morfolojîk an jî prensîpa movika bêjeyan

### 3.1.1. Kîtekirina bêjeyên sade

#### 1. Prensîpa yeknedengdêrî (yekkonsonantî)

Ji bo vî awayê kîtekirinê, prensîpa mekanîk jî dihê gotin. Di vî awayî da, ya bingehîn ew e ku beşê bêjeyê yê piştî bendikê bi nedengdêrekê (konsonantekê) dest pê dike. Yên ku li gor vî awayî dikin, kîtekirinê di cihekî bêjeyê da pêk diînin ku herfa nimînendeya nedengdêrekê ya li alîyê bendikê yê rastê dadikeve rêza piştî bendikê.

#### Nimûne:

zaro-kê, za-rokê, zaro-kên, hes-pê, hes-pên, kur-dên, defte-ra, def-tera

